



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**BINYAT Ê RASTNIVÎSÎNA LÊKERAN
DI BERHEMÊN RÊZIMANÊ YÊN
KURMANCÎYA BAKUR DE**

Mehmet Gemsiz

14711025

Şêwirmend

End. Hdk. Dr. Mustafa Aslan

Mêrdîn 2018

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**BINYAT Û RASTNIVÎSÎNA LÊKERAN
DI BERHEMÊN RÊZIMANÊ YÊN
KURMANCÎYA BAKUR DE**

Mehmet Gemsiz

14711025

Şêwirmend

End. Hdk. Dr. Mustafa Aslan

Mêrdîn 2018

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**Binyat û Rastnivîsîna Lêkeran di Berhemên Rêzimanê yên Kurmancîya Bakur de**” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

Tezimin 1 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

23/02/2018

Mehmet Gemsiz

KABUL VE ONAY

Mehmet GEMSİZ tarafından hazırlanan “Binyat û Rastnivîsîna Lêkeran di Berhemên Rêzimanê yên Kurmancîya Bakur de” adındaki çalışma, 23/02/2018 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Bilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

Doç. Dr. Abdurrahman ADAK (Başkan)

[İ m z a]

Yrd. Doç. Dr. Mustafa ASLAN (Üye)

[İ m z a]

Yrd. Doç. Dr. Ayhan TEK (Üye)

PÊŞGOTIN

Ji bo yadkirina pêşeng û xemxurê zimanê kurdî Ehmedê Xanî...

Ji bo zimanekî nivîskî yê standard sê stûnên bingehîn hene: Alfabe, rêziman û ferheng. Ji van stûnan a girîngtirîn rêziman e. Ji lew re rêziman tevahiya rêzîkên zimanekî li xwe vedihewîne. Ji ber wê jî bi hêsanî jê re dikare were gotin ku ew rêbera zimanekî ye jî. Her wisan ji bo axaftin û bikaranîneke rast û di heman demê de ji bo zimanê nivîskî jî ew xwedî girîngiyê kekilî ye. Ji ber vê girîngiyê, xebatên rêziman ên li ser zimanê kurdî, nemaze yên li ser zaravayê kurmancî tim bala me kêşaye ser xwe û heta ji dest hatiye û derfetên me destûr daye, me ew şopandine.

Beriya salên 90'î wekî her berhemeke kurdî, peyda kirina berhemeke li ser rêzimana kurdî jî wisan ne tiştekî sanayî bû. Hesreta mirov ew bû ku mirov berhemeke li ser kurdan bi dest bixe. Ji bo kesên wekî nifşên me, vê rewşê demeke dirêj wiha ajot. Di sala 1991'ê de piştî hilanîna qedexeya li ser zimanê kurdî ya qismî, di gel berhemên kurdî rêzimanên kurdî/kurmancî jî hatin weşandin, ku hinek ji wan jixwe berê hatibûn çapkirin. Bi taybetî di van salan de rêzimanên li ser kurdî yên kesên mîna Celadet Bedirxan & Roger Lescot, Qanatê Kurdo, Kemal Badıllı, Feqî Huseyn Sagniç û hwd. wek çavkaniyên serlêder bûn. Lê dikare bê gotin ku ji bo gelek kesan a herî navdar û pêbawer xebata hevpar a Celadet Bedirxan & Roger Lescot bû. Piştî, bi taybetî di van 15-20 salên dawî de gelek rêziman, xasma yên li ser zaravayê kurmancî hatin amadekirin û weşandin.

Gava hejmara rêzimanên li ser kurmancî kêm bû, arîşe jî ew çend ne bêhtir bûn, lê belê bi pîrbûna hejmara van berheman re mixrikî û cudahiyên der barê mijarên rêzimanê de jî pirtir û aşkeratir bûn. Di navbera danerên rêzimanên zaravayê kurmancî de dibe ku raman û nêzîkahîtdanên cihê hebin. Li gorî me meseleya esasî ne navlêdanîna peyitandinan rêzîkên zimên, nîşandana qanûnên awayê xebitîna zimên û bikaranîna termînolojî ye. Dabaşa hîmî şayesandin, peyitandin û ravekirina

rêsayên zimên e, di warê mijarên berbiçav de jî helwest û nêrînên cihêwaz ên danerên van rêzimanên kurmancî ne.

Piştî xwendin, têfikirîn, lêkolîn û lêhûrbûnên li ser rêzimanên kurmancî ev yek bi me re jî çêbû. Nêrîn û angaştên hevnegir ên zimannas û amadekarên rêzimanan ên li ser zaravayê kurmancî, ku tebîr di cih de be serî li me bi xwe jî gerand. Di pey civariya ku di encama salên dûr û dirêj de bi me re çêbû, em gihîştin wê baweriyê ku divê xebat li ser hin mijarên kêşedar û yên nîqaşbar bên kirin. Loma di vê xebatê de me xwest em li ser cureyên bêjeyan, senifana lêkerên kurmancî yên ji aliyê binyatî ve (tevî mînakên ku ji bo polînkirina wan hatine derpêşkirin) û rastnivîsîna wan rawestin, ku zimannas û danerên rêzimana zaravayê kurmancî di van waran de mîna hev nafikirin. Bi vê lêkolîn û xebatê daxwaz ew e ku li ser van warên navborî hewla zelalkirinekê bê kirin û ji bo çareserkirina kêşeyên amajepêkirî jî rêzik bên peyitandin.

Rêziman, ji ber ku di navbera wê û zimanê nivîsînê de têkiliyeke gelek xurt heye û vekîta zimanekî jî bi rêjeyê gelek zêde xwe dispêre rêzimanê, divê qet nebe ji kêmasî û şaşiyên beloq xalî be. Nebûn an jî kêmbûna van tiştan dike ku zimanekî nivîskî yê rast pêk were û di navbera bikarhênerên zimên de li ser rêzîkên rêzimanê lihevkerineke giştî çêbe. Ev xebat, dikare ji bo pêkanîna vê daxwazê wek hewlekê bê dîtî û nirxandin.

Spasî

Di heyna amadekirina vê xebatê de alîkariya gelek kesan gihîşt me. Ji bo warên cur bi cur kesên me hawara xwe gihand wan, mala wan ava be ku wan zanyariyên xwe ji me hîç nehêvişandin. Bi gotina kurmanciya gewr, canik û camêran tu tiştek ji me teksîr nekir û wan alî me kir. Wan bi raman, nêrîn, pêşniyaz û alîkariyên xwe rê li ber me ronî, barê me sivik û riya me kurt kir. Beriya ku em spasiyên xwe pêşkêşî wan hemûyan bikin, wek sêr û adet, divê pêşî em malavahî di şêwirmend û mamostayê xwe birêz Alk. Doç. Mustafa Aslan bidin. Di pey re ji ber ked û alîkarina wan, mala heval û dostên hêja Şerîf Derînce, Malmîsanij, Denîz Gunduz, Ergîn Opengîn, Mistefa Aydogan, Mîkaîl Bulbul, Newzad Hirorî, Aysel Çetîn, Samî Tan,

Semra Ecer, Ebdilwehab Xalid Mûsa, Michael L. Chyet, Sewda Orak Reşîtoğlu û Hemdullah Reşîtoğlu ava be.

Şêkirdarî û spasiyeke taybet jî ji bo hêja H. Mem ku bi saya handan û piştvanekiya wî em ketin ser vê riyê û me mirad bi daxwaza xwe kir. Li dawiyê jî spasiyeke taybet ji bo hevpara jîn û jiyara min SULTANê ku heqê wê li ser min gelek e.

Mehmet Gemsiz
Stenbol, 12.12. 2017

KURTE

Rêziman wek hêman û stûneke girîng a zimanê nivîsînê ya zimanekî tê hesibandin û ji ber ku şayesandin û peyitandina rêzikên zimên jî li xwe digire, ew bi rola rêbera zimanekî radibe. Di gel vê yekê, gava bi çavekî hûrbînî li pirtûkên rêzimanên kurmancî tê nihartin, tê dîtin ku ne tenê di warê mijarên taybetmend de, her wisan di biwara hin mijaran de ku ew wek ên sereke tîr pejirandin, zimannas û rêzimannas ne li hev in û di navbera wan de nêrînên cuda yê berbiçav xwe tafilê didin der. Mîna mijarên cureyên bêjeyan, cureyên lêkeran û ji aliyê binyatî ve senifana lêkeran.

Di vê xebatê de li ser yazdeh rêzimanên zaravayê kurmancî tê rawestandî û bal li ser warên cureyên bêjeyan (beşên axaftinê), lêker, ji aliyê binyatî ve senifana cureyên lêkeran (tevî mînakên lêkeran ku ji bo wan hatine pêşkêşkirin) û rastnivîsîna lêkeran ên di rewşa raderî û navdêrî de tê kêşandin. Ji ber ku ev berhem bi rêbaza rêzimana klasîk hatine amadekirin, bi heman rêbazê tiwêjandin li ser wan tê kirin. Li ser warên ku bûne mijara xebatê, ji nû ve senifanek der barê cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî de tê kirin û bi navê lêkerên veqetînbare jî senifanek li wan tê zêdekirin ku bi awayekî serbixwe di tu rêzimanê de cih ji van re nehatiye veqetandin. Ji bo çareserkirina kêşeyên rastnivîsîna lêkeran ên di rewşa raderî û navdêrî de jî, rêzikên ku li gorî rêzimana kurmancî hatine peyitandin tîr pêşkêşkirin.

Peyvên Sereke

Bêje, lêker, cureyên lêkeran, senifana lêkeran, lêkerên veqetînbare, rastnivîsîna lêkeran.

ÖZET

Dil bilgisi, yazılı bir dilin önemli öge ve sütunlarından bir olarak kabul edilmekte ve bir dilin tasviri ile dilin kurallarının tespitini içerdiği için de o dilin rehberi olarak görülmektedir. Buna karşın, eleştirel bir gözle Kurmançça dil bilgisi kitaplarına bakıldığında sadece spesifik konularda değil genel kabul gören bazı konularda da dil bilimciler ile gramercilerin uzlaşmadığı ve aralarındaki bariz görüş ayrılıkları hemen göze çarpacaktır. Sözcük türleri, fiil türleri ve yapı bakımında fiil türlerinin sınıflandırılması konuları gibi.

Bu çalışmada on bir Kurmançça dil bilgisi çalışması ele alınıp sözcük türleri, fiiller, yapı bakımından fiil türlerinin sınıflandırılması (onlar için örnek olarak verilen fiiller de dahil olmak üzere) ve fiillerin mastar ile isim halindeki imla konularına dikkat çekiliyor. Bu çalışmalar, klasik gramer yöntemiyle hazırlandıkları için aynı metotla ele alınıp inceleniyor. Çalışmaya konu olan alanlarla ilgili yapı bakımında fiil türleri hakkında yeni bir sınıflandırma yapılarak ayrılabilir fiiller adıyla da yeni bir sınıflandırmaya gidiliyor ki bağımsız bir ad altında hiçbir gramer çalışmasında bunlara yer verilmemiştir. Mastar ve isim haldeki fiillerin yazım sorununu çözme konusunda ise Kurmançça dil bilgisine uygun tespit edilen kurallar da çalışmada sunuluyor.

Anahtar Sözcükler

Sözcük, fiil, fiil türleri, fiil sınıflandırması, ayrılabilir fiiller, fiillerin yazımı.

ABSTRACT

Grammar is regarded as an important item and pillar of the written language, and it also bears the role of a guide for a language since it includes the description of the language and also setting its rules. Yet, when grammar works in Kurmanji are scrutinized with a critical eye, it is seen that linguists and grammarians are in disagreement not only over some specific topics but also some subjects which are accepted as basic. The obvious differences between them are immediately striking. The differences in question cover word types, verb types and classification of verb types in terms of their structures.

In this research, eleven grammar works in Kurmanji are examined with reference to word types, verbs, classification of verb types in terms of their structures (including verbs which are used as examples for them) and spelling of verbs in their infinitive and gerund forms. Since these works are prepared by the classical grammar method, they are examined and studied with the same method. A new classification called separable verbs is introduced for the first time in this research within the verb types in terms of their structure. In terms of solving the problem of spelling the infinitive and the gerund forms, the suggestions are presented in accordance with the Kurmanji grammar rules.

Key Words

Word, verb, types of verbs, classification of verbs, separable verbs, spelling of verbs

NAVEROK

PÊŞGOTIN	I
KURTE	IV
ÖZET.....	V
ABSTRACT	VI
NAVEROK	VII
KURTEBÊJE	XI
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEM

CUREYÊN BÊJEYAN Û LÊKER	10
1.1. CUREYÊN BÊJEYAN	10
1.2. JI CUREYÊN BÊJEYAN LÊKER.....	13
1.3. SENIFANA LÊKERAN	15
1.3.1. Ji Aliyê Avaniyê ve Lêker	15
1.3.1.1. Avaniya li Gorî Bireserê.....	16
1.3.1.2. Avaniya li Gorî Kirdeyê	17
1.3.2. Ji Aliyê Teşeyê ve Lêker.....	20
1.3.3. Ji Aliyê Binyatî ve Lêker	21
1.4. LI GORÎ 11 RÊZIMANÊN KURMANCÎ SENIFANA CUREYÊN LÊKERAN A JI ALİYÊ BINYATÎ VE	26
1.4.1. Kürtçe Gramer.....	31
1.4.2. Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer	36
1.4.3. Gramera Zmanê Kurdi (Kurmanci-Sorani).....	39
1.4.4. Hêmana Rêzımanê Kurdi	43
1.4.5. Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi).....	48

1.4.6. Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi Kurmanc Lehçesi	49
1.4.7. Kürtçe Dilbilgisi Türkçe Açıklamalı, Rêzimana Kurdî	52
1.4.8. Rêzimana Kurmancî.....	55
1.4.9. Gramera Kurdî (Kürtçe Gramer).....	58
1.4.10. Rêzimana Kurmancî.....	61
1.4.11. Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilgisi (Kurmancî Lehçesi)	64
1.5. HEVBERÎKIRINA BERHEMÊN KU BÛNE MIJARA XEBATÊ.....	66

BEŞA DUYEM

JI ALİYÊ BINYATÎ VE SENIFANA CUREYÊN LÊKERÊN KURMANCÎ... 71

2.1. LÊKERÊN XWERÛ	71
2.2. LÊKERÊN DARIŞTÎ.....	73
2.2.1. Lêkerên Dariştî yên bi Paşgiran	73
2.2.2. Lêkerên Dariştî yên bi Pêşgiran	76
2.2.2.1. Lêkerên ji Pêşgir û Lêkereke Xwerû	78
2.2.2.2. Lêkerên ji Pêşgir û Lêkereke Dariştî	78
2.3. LÊKERÊN HEVEDUDANÎ.....	78
2.3.1. Lêkerên bi Bêjeyeke Xwerû û Lêkereke Alîkar.....	79
2.3.2. Lêkerên bi Bêjeyeke Hevedudanî û Lêkereke Alîkar	80
2.3.3. Lêkerên bi Bêjeyeke Dariştî û Lêkereke Alîkar.....	80
2.3.3.1. Lêkerên bi Bêjeyeke Dariştî ya bi Pêşgiran û Lêkereke Alîkar	80
2.3.3.2. Lêkerên bi Bêjeyeke Dariştî ya bi Paşgiran û Lêkereke Alîkar	81
2.3.3.3. Lêkerên bi Bêjeyeke Dariştî ya bi Navbergiran û Lêkereke Alîkar ...	83
2.3.3.4. Lêkerên bi Bêjeyeke Dariştî ya Kompleks û Lêkereke Alîkar.....	83
2.3.4. Lêkerên bi Paşdaçek, Bêjeyek û Lêkereke Alîkar.....	84
2.3.5. Lêkerên bi Cînavkeke Lihevxiştî ya Berbihevîn û Lêkereke Alîkar.....	84
2.4. LÊKERÊN VEQETÎNBAR.....	85
2.4.1. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkên Lihevxiştî	87
2.4.1.1. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkeke Lihevxiştî û Lêkereke Xwerû .	88
2.4.1.2. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkeke Lihevxiştî û Lêkereke Dariştî .	90
2.4.1.3. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkeke Lihevxiştî û Lêkereke	
Hevedudanî.....	90

2.4.1.4. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkeke Lihevxiştî, bi Paşdaçek û Lêkereke Xwerû	91
2.4.1.5. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkeke Lihevxiştî, bi Paşdaçek û Lêkereke Dariştî	91
2.4.1.6. Lêkerên Veqetînbar ên bi Bêjeyek, bi Cînavkeke Lihevxiştî û Lêkereke Alîkar	92
2.4.2. Lêkerên Veqetînbar ên bi Morfema “-a”yê.....	92
2.4.3. Lêkerên Veqetînbar ên bi Morfema “-î”yê	93

BEŞA SÊYEM

RASTNIVÎSÎNA CUREYÊN LÊKERAN	96
3.1. RASTNIVÎSÎNA CUREYÊN LÊKERAN A DI REWŞA RADERÎ DE	99
3.1.1. Rastnivîsîna Lêkerên Xwerû yên bi Awayê Raderî	99
3.1.2. Rastnivîsîna Lêkerên Dariştî yên bi Awayê Raderî	104
3.1.2.1. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên Bipaşgir	105
3.1.2.2. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên Bipêşgir	105
3.1.3. Rastnivîsîna Lêkerên Hevedudanî yên bi Awayê Raderî.....	106
3.1.3.1. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên ku bi Bêjeyeke Xwerû û Lêkerekê Çêbûne	107
3.1.3.2. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên ku bi Bêjeyeke Hevedudanî û Lêkerekê Çêbûne	108
3.1.3.3. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên ku bi Bêjeyeke Dariştî û Lêkerekê Çêbûne	108
3.1.3.4. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên ku bi Pêşdaçek, Bêjeyek û Lêkerekê Çêbûne	109
3.1.3.5. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên bi Cînavkeke Lihevxiştî ya Berbihevîn û Lêkerekê Çêbûne	110
3.1.4. Rastnivîsîna Lêkerên Veqetînbar ên bi Awayê Raderî	110
3.1.4.1. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkeke Lihevxiştî û Lêkereke Alîkar	111
3.1.4.2. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên Veqetînbar ên bi Morfemên /-a/ û /-î/yê û Lêkereke Alîkar Çêbûne.....	111

3.2. RASTNIVÎSÎNA CUREYÊN LÊKERAN A DI REWŞA NAVDÊRÎ DE	112
3.2.1. Wek Navdêr Rastnivîsîna Lêkerên Xwerû, Dariştî û Hevedudanî	113
3.2.2. Wek Navdêr Rastnivîsîna Lêkerên Veqetînbar	115
3.3. DI REWŞA KÊŞAYÎ DE RASTNIVÎSÎNA LÊKERÊN DARIŞTÎ YÊN BI PÊŞGIRAN.....	117
3.3.1. Di Dema Kêşanê ya Lêkerên Dariştî yên bi Pêşgiran de Cihê Gireyên /di-/ û /na-/yê.....	117
3.3.2. Di Dema Kêşanê ya Lêkerên Dariştî yên bi Pêşgiran de Mijara /bi-/ya Fermanî	121
ENCAM.....	124
ÇAVKANÎ.....	134

KURTEBÊJE

<i>alk.</i>	alîkar
<i>amd.</i>	amadekar
<i>b. î.</i>	beriya Îsa
<i>bnr.</i>	binêrin
<i>b. z.</i>	berî zayînê
<i>c.</i>	cild
<i>h.</i>	hejmar
<i>h.b.</i>	heman berhem
<i>hwd.</i>	her wekî din
<i>p. z.</i>	piştî zayînê
<i>r.</i>	rûpel
<i>s.</i>	sal
<i>ss.</i>	sedsal

DESTPÊK

Ziman ku berhemeke xwedî wesfekî civakî ye, hîn berî zayînê bala filozof û ramanwerên demên kevnar (antîk) kêşaye ser xwe û ew bi “raz”ên xwe ve bilandine. Li gorî berhemên nivîskî û zanyariyên li ber dest ên B. Z’ê, ji bilî ramanên der barê kok û peydabûna zimên de, li ser hêmanên zimên ên wekî bêje û têkiliya di navbera bêje û wateyên wan de jî hatiye rawestandî.¹ Van xebatan kiriye ku di warê zimên de hîn hîm bîn danîn ku loma jî koka lêkolînên zimannasiyê yê li Rojava xwe dispêre felsefeya Yûnana qedîm.²

Hin pêker (faktor) bûne sedem da xebat li ser zimên bîn kirin ku ev diyardeya hanê xwedî lihevkirina civakî ye. Yek ji van pêkeran, pêkera dînî³ ye û ew bûye sedem ku mirov bayex bi diroz (dua) û metnên dînî bidin. Li Hinda berê, ji bo berhevokên olî, ango nivîsarên ola brahmanîzmê “veda”yan, ku tê pejirandin ew aîdî sedsala X’an a B. Î. ne, ji bo ew şaş neyên xwendin, çewt neyên bikaranîn û bi qonaxa demê re daneşorin, hin hewldan hatine kirin. Wekî tê zanîn, tu dîn qebûl nake dirozên wî dînî şaş bîn xwendin, ew bi awayekî hele (xelet) bîn nixandî û şirovekirin. Ji lew re, ji bo ku pirtûkên pîroz û deqên (metnên) der barê olê de, bi awayekî rast derbasî nifşên nûhatî bibin, xebatên li ser zimên hatine kirin. Bi saya van hewldanan jî rêzikên rastnivîsîn û xwendinê yê zimên hatine danîn, her wisan têgihên rêzimanê derketine holê û li ser van têgihan jî bi awayekî berfireh û bi girîngî hatiye sekinandin.⁴ Bi vê armancê, li Hinda berê zimanzanan hîn B. Z’ê (di navbera salên 800 û 150’yî de) li ser gramerê xebitîne, ku berhema pêşîn a mezin a tê zanîn jî aîdî Panînî ya bi navê “*Astadhyayî*” (Heşt Kitêb) ye. Tê angaştin ku ev berhema navborî, B. Z’ê di navbera salên 600-300’î de, bi awayekî nivîskî yan jî devkî li

¹ Ji bo agahiyên berfirehtir *bnr.* Doğan Aksan, **Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim**, C. 1, 4. baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2007, r. 16-17.

² Süheylâ Bayrav, **Yapısal Dilbilimi**, Multilingual, İstanbul 1998, r. 29.

³ Doğan Aksan, *h.b.*, r. 16.

⁴ Ji bo agahiyên hîn zêdetir ên der barê van dabaşan de *bnr. h. b.*, r. 16-18.

nifşên nû hatiye veguhastin û ew berhem li ser rêzimana sanskrîtî ye.⁵ Ji bilî Panînî, dîsan li Hindê zanyarê zimên Yaska jî, ku B. Î. di ss'a IV'an de jiyaye, berhema bi navê “*Nirukta*” ya li ser zimên, li dû xwe hiştiye.⁶

Di dema Yûnana kevnar de jî filozof û ramanwer, bi mijarên cur bi cur ên têkildarî zimên bilîne. B. Z'ê ji sedeyê VI'an ve mijarên wekî rêziman, zimannasî û yên ku îro di nav çarçoveya felsefeya zimên de cih digirin, bûne mijarên nîqaş û xebatan. Her wiha li ser peydabûn û rayeka zimên jî hin dîtane (teorî) hatine derpêşkirin. Qeyda xebatên li ser zimên ên li Yûnana berê, aîdî sedeya V'an a B.Z'ê ye. Filozofên mîna Platon (B.Z. 427-347), Arîsto (B.Z. 384-322) û zanyarên îskenderiyeyî li ser meseleyên zimên serê xwe êşandine û hin raman rapêş kirine.⁷

Ji bilî pêkera olî, yek ji pêkerên sereke yên der barê xebatên zimên de jî, nîgerana têngihîştina deqên edebî û nirxandina van nivîsaran e ku ev yek jî bûye sedema derketina holê ya filolojiyê.⁸ Van xebatan, ne ku kiriye bi tenê nivîsarên kevn bîn ravekirin, her wisan zemîn ji peydabûna rêzimanê re jî xweş kiriye. Dionysios Thrax (B.Z'ê teqriben sala 170-90), pirtûka bi navê “*Tekhne Grammatike*” ya li ser zimanê grekî amade kiriye, ku ev nimûneya pêşîn a kitêba gramere ya kevnepî ya li Rojava ye û tê gotin ev berhem, berhevoka encama xebatên bi teqribî ya 400 sal beriya wî û yên dema wî ye.⁹

Ji van her du dibistanên navborî, ên li Hind û Yûnana berê, ku wan wek du dibistanên serbixwe geşe bi xwe daye¹⁰, nemaze xebatên dibistana Rojava rê li ber rêzimana klasîk/rêzikparêz vekiriye. Bi taybetî, bi saya berhemên Platon û Arîstoteles cara pêşîn termînolojiyeke zimannasiyê ya ku hemû pêvajoyên taybetiyên zimanekî Ewrûpayê pê hatiye şayesandin, çêbûye û bêjeyên havildar ên mîna “navdêr” û “lêker” jî hatine bikaranîn.¹¹ Herçî berhema Dionysios “*Tekhne Grammatike*” ye, ji bilî hevoksaziyê (sentaksê), der barê hemû mijarên zimên de 13

⁵ Steven Roger Fischer, **Dilin Tarihi**, 3. basım, Muhtesim Güvenç (Çev.), Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul 2015, r. 138-139.

⁶ Doğan Aksan, *h.b.*, r. 16.

⁷ Süheylâ Bayrav, **Filolojinin Oluşumu**, Multilingual, İstanbul 1998, r. 110.

⁸ *h.b.*, r. 10.

⁹ Doğan Aksan, *h.b.*, r. 18.

¹⁰ *h.b.*, r. 17.

¹¹ Steven Roger Fischer, *h.b.*, r. 144.

qirn wek deqeke hîmî û sereke li Rojava hatiye pejirandin.¹² Ji ber ku gramera Dionysios li zimanên neteweyên derî coğrafyaya ewrûpayê hatiye wergerandin, wekî zimanên ermenî û suryanî û ji xebatên li ser rêzimanê yên îbranî û erebî re jî bûye rênîşander,¹³ loma dikare bi hêsanî bê gotin ku ew xebat bi domana demê re ji bo piraniya berhemên rêzimanê yên zimanên neteweyên din jî bûye nimûne, çavkanî û palpişt. Ev xebata Dionysios bûye maka rêzimana kevneşopî û ji bilî rêzimana zimanên neteweyên Rojava, wê bi awayekî hîkarî li xebatên rêzimana zimanên neteweyên derrojawayî jî kiriye. Ji lew re, gava bê gotin ên ku ji gelek aliyan ve berek daye her cure xebat û vekolînên li ser zimên û zimannasiyê yûnaniyên berê ne, dê ne tişteki zêde pirole (mibalexe) be.

Rêziman ku şaxeke pir kevn a zanistê ye û destpêka wê heta beriya zayîne diçe, yek ji armancên wê yên sereke jî perwerdehiya zimên e û ew bi xwe rêsparêz (rêzikparêz) e,¹⁴ ku tevahiyan rêzikên zimanekî li xwe vedihewîne. Ev nêzikahîtdan, a rêzimana rêzikparêz e ku dixwaze rêzikên zimên ên ku bikaranîna zimên bi rê ve dibin bipeyitîne û der barê wan de agahiyan bide xwîneran. Îcar rêzimana şayesî (teswîrî) berevajî ya rêzikparêz, hewl dide ku di serdemeke diyar de li ser zimanekî yan jî li ser zimanên lêzim raweste û rêzikên wan bişayesîne, ne ku der barê rêzikekê de darazeke vebir bide. Di roja îro de êdî mijarên bi gramerê eleqedar di bin banê zimannasiyê de tên kirin ku ev zanista zimên jî di sedsala XIX'an de bi pêş ketiye û bûye zanistekê serbixwe.

Rêzikên rêzimanê, bi awayekî giştî ji bingeha zimên bi xwe tên derxistin ku her zimanek xwedî taybetiyên xwe yên xweser in. A girîng ew e ku ne li gorî zimanekî din rêsayên zimanê ku dabaşa lêkolînê ye bînin diyarkirin, lê rêzikên wî zimanî bi xwe bînin aşkerakirin û li gorî termînolojiya zimannasiyê jî nav li wan bînin danîn û ew rewş bînin tegihîkirin, şayesandin û ravekirin.

Rêzimanên ku li ser zaravayê kurmancî hatine amadekirin, eger bi awayekî giştî bê gotin, ew ji xebatên gramera kevneşopî/klasîk ne serbixwe ne. Ji xwe çaxa bi çavekî lêkolînî û hilseganî li wan were mêzandin, dê bi hêsanî bê dîtin ku ew

¹² *h.b.*, r. 144.

¹³ Süheylâ Bayrav, **Yapısal Dilbilim**, Multilingual, İstanbul 1998, r. 30-31.

¹⁴ Zeynel Kıran & Ayşe (Eziler) Kıran, **Dilbilime Giriş**, 3. baskı, Seçkin Yayıncılık, Ankara 2010, r. 47.

berhemên hanê rasterast nebe jî, lê qet nebe bi awayekî neyekser di bin hikariya vê paşxaneyê dîrokî de ne. Bi awayekî girêdayî vê rêbazê mane û ew xebat li gorî rêbaza rêzimana rêzîkparêz hatine amadekirin.

Di gel vê yekê, zimannas û amadekarên rêzimanê yên li ser zaravayê kurmançî di gelek waran de xwedî ramanên cuda ne. Peyt û hizirên wan ên li ser rêzîkên rêzimanê bi temamî hev nagirin, di navbera wan de nakokiyên zehf berbiçav hene. Mîna nêrînên wan ên li ser cureyên bêjeyan, senifana cureyên lêkeran, navlêkirina rêzîkên rêzimanî (têgihîkirina diyardeyên zimanî û rêzimanî), tewang û rastnivîsînê. Ev rewş dibe ku ji ber sedemên formasyona/perwerdehiya wan a ji ber zimanê serdest an jî ji ber hikariya wî zimanê be ku daneran ango yên ku rêziman amade kirine, xwestibe bi termînolojî û rêbaza zimanê xwe yê perwerdehiyê, zimanê xwe yê dayikê jî bişayesîne, rêzîkên zimanê xwe bipeyitîne û der barê vê yekê de agahiyên raveker û vebir bide bikarhênerên zimên. Loma dikare bi angaştin ku yek ji sedemên vê cudabûna wan a ji hev jî, ji ber vê rewşa amajepêkirî be ku di berhemên wan ên li ser rêzimana kurmançî de, mijarên wekî tesnîfa lêkeran, senifan û pîvaneyên ji bo polînkirina cureyên lêkeran û nimûneyên ku hatine dayîn, dûrî hev bin û nakokiyên berbiçav di navbera wan de hebin. Tiştêkî asayî ye ku zimannas û danerên rêzimana kurmançî yên kurd di bin hikariya metodolojî û termînolojiya zimannasiyê û yên rêzimanê de bimînin, lê belê tiştê dibe rexne lê bê girtin ew e ku taybetmendî û xweseriyên zimanê kurdî li gorî rêzîkên zimanekî din bîn şayesandin û ravekirin.

Xaleke din a girîng jî bi ya me ew e ku kêma danerên rêzimana kurmançî xwedî formasyona rêziman/zimannasiyê ne û xwedî nasavekî akademîk in. Bi piranî warê ku tê de perwerde bûne, qadên cuda ne. Bi me wisan tê ku nepisporbûna wan tam a li ser mijarê û kêmagahiya wan a ji zimannasî û rêzimanê, kiriye ku nêrînên wan ên der barê diyardeyên zimanî û rêzimanî de ji hev cudatir bin.

Ji ber van mijarên nakokdar ên di navbera wan de, me jî xwest ku em mijara ji aliyê binyatî¹⁵ ve lêker û pê ve eleqedar rastnivîsîna lêkerên zaravayê kurmançî bikin warê xebata xwe.

¹⁵ Ji ber ku di rêzimanên kurmançî de bi piranî ji bo senifana lêkeran a ji aliyê bastûrê ve têgiha binyatî (structure) hatiye bikaranîn, me jî ji bo senifana lêkeran a ji aliyê binyatî ve ev têgih tercîh kir.

1. Mijara Lêkolînê

Mijara vê xebatê cureyên bêjeyan, ji aliyê binyatî ve lêker û rastnivîsîna lêkeran a di rewşa raderî û navdêrî de ye. Ji ber ku di xebatên li ser rêzimana zaravayê kurmancî de, ji hêla van mijarên navbrorî ve kêşe heye (ku ev rewş di navbera rêzimanan de xwe bi awayekî pir beloq dide nîşandan) dê bi taybetî bal li ser sê warên girîng bê kêşandin: Cureyên bêjeyan, senifana ji aliyê binyatî ya cureyên lêkeran û rastnivîsîna wan.

Îcar ji bo ku hem ji mijara lêkeran a bi awayê giştî hem jî ji mijara lêkeran a ji aliyê binyatî ve serwextbûneka baş pêk were, hewce bi nasîna bêjeyan heye û divê ew ji hêla morfolojîk û bastûrî ve bîn dahûrandin. Wekî bêjeya xwerû, bêjeya hevedudanî û bêjeya dariştî (ka bi pêşgiran an bi paşgiran çêbûne). Eynî wisan pêwîst e lêker jî, ku ew jî ji cureyên bêjeyan in, hem ji aliyê binyatî ve bîn senifandin hem jî divê bîn diyarkirin bê ka ew xwerû ne, dariştî ne yan jî hevedudanî ne. Bi hizira me, heta rayek û gireyên ku bêjeyan, her wisan ên ku lêkeran pêk tînin, neyên zanîn, şeweyên dariştina bêjeyan neyên peyitandin û awayên pêvebûna wan neyên hînkirin, ne veqetandina ji hev a cureyên bêjeyan, ne senifana lêkeran a ji aliyê binyatî ve gengaz e, ne jî der barê rastnivîsîna wan de dikare biryareke rast û di cih de bê dan. Ji lewre divê gireyên kêşanê, gireyên kesane û gireyên dariştinê bi zelalî ji hev bîn cihêkirin, her wisan divê ku morfemên zimên jî tevî erka (fonksiyona) wan bîn diyarkirin. Ji ber vê yekê pêşî hewce ye ku bi perspektîfeke dîrokî ji beşên axaftinê were behskirin.

Mijara rastnivîsînê ya lêkeran çendî tişteki normatîf be jî, lê ev mijar bi awayekî rasterast bi binyata lêkeran ve têkildar e. Loma pêwîst pê hat dîtin ku her du mijar pêkve bîn analîzkirin û nêrîn der barê wan de bîn derpêşkirin.

2. Armanc û Girîngiya Lêkolînê

Li ber dest gelek rêzimanên zaravayê kurmancî hene ku bi taybetî di warê senifana lêkeran a ji hêla binyatî ve û di biwara vekîta wan a wekî rewşa raderî û navdêrî de, ew ne xwedî nêrînên wekî hev in. Ev rewş jî ji bo bikarhênerên zimên

dibe sedema aloziyê û di warê zimanê nivîskî de jî nahêle ku zimanekî nivîskî yê hevîrtî bê holê. Warekî wiha gelşdar jî hêjayî lêkolîn û analîzê ye.

Bi vê xebatê, daxwaz ew e ku mijar bê zelalkirin, xalên kêşedar bîn nîşandan, bal li nakokiya di warê senifana lêkeran û nimûneyên wan ên pêşkêşkirî de û li ser vekîta wan were kêşandin. Ji bo vê yekê jî pêdivî pê hat dîtin ku di bin ronîya xebatên teorîk de yê têkildarî mijarê, li ser cureyên bêjeyan bê sekinandin û di vê çarçoveyê de jî mijara lêkeran a ji aliyê binyatî ve bê vekolan. Nasîna lêkeran a ji aliyê binyatî ve û analîzkirina wan a ji aliyê morfolojîk ve, dê bibe sedema polînkirineke rast a lêkeran a ji aliyê binyatî ve û ji bo mijara rastnivîsîna lêkeran a raderî/navdêrî jî dê zemîn xweştir bibe. Ji ber raman ew e ku eger peyitandîna kêşeyan gavavêtineke pêşî ya ber bi çareserkirina kêşeyan ve be, lê şayesandin, pênasekirin, ravekirin û peyitandîna rêzikan û pêşniyazkirina wan jî, hewleke xurt û kartêker a çareserkirina pirsgerêkan e.

Ji bo vê yekê, tê hizirandin ku ji nû ve peytek li ser mijara ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran ên di kurmancî de bê kirin. Di pey re jî ji bo çareserkirina gelşên peyitandî rêzik bîn derpêşkirin da ku di wan warên diyarkirî de standardek bê pêkanîn.

3. Çarçoveya Lêkolînê û Sînorên Xebatê

Çarçoveya vê xebatê cureyên bêjeyan, ji cureyên bêjeyan lêker, senifana lêkeran û rastnivîsîna wan e. Mebest ji cureyên lêkeran jî, ji aliyê binyatî ve lêker, ji aliyê avaniyê ve lêker û ji aliyê teşeyê ve lêker in. Ji van jî, dabaşa bingehîn senifana lêkeran a ji aliyê binyatî ve û vekîta wan e.

Sînorê xebatê yazdeh (11) berhemên rêzimana kurmancî ne ku ew li welêt, li nav Tirkiyeyê çap bûne. Bi mebesta ku di navbera wan de têkiliyeke kronolojîk heye û mirov dikare wan wekî peyrewên hev bi nav bike, ev hîlbijartin hat kirin. Di çarçoveya diyarkirî de dê tiwêjandin li ser mijarên amajepêkirî bê kirin da ku wan ron û zelal bike. Ji bo çareserkirina gelşên heyî yê têkildarî dabaşê jî, daxwaz ew e ku tîbînî, pêşniyaz û rêzîkên peyitandî yê der heqê dabaşê de bîn pêşkêşkirin.

4. Rêbaza Lêkolînê û Teknîkên ku Hatine Bikaranîn

Ji bo xebatê rêbaza lêkolînê, lêgerînên qadî û lêpîrsînê¹⁶ hatin bikaranîn. Di heyne vê xebatê de bi gelek kesên kurmançîxêv ên ji herêmên cuda re dîdariyên (çavpêketên) rû bi rû hatin kirin. Li aliyê din ji hin kesan bi riya telefon û emailan pîrs hatin kirin, ji nivîsar û berhemên kurmançî yên kesên ji deverên cur bi cur jî sûd hat wergirtin.

Di xebatê de piştî dayîna hin agahiyên pêwîst ên li ser cureyên bêjeyan û senifana lêkeran a ji aliyê binyatî ve, piştî li ser hin rêzimanên kurmançî yên ku ji bo xebatê hatine hilbijartin tê sekinandin. Ew rêziman, bi zanebûn ji nav berhemên destpêkê, ji yên peyhatiyên wan û ji yên nîfşên nû hatin bijartin, ku her yek bi ya me xwedî sedemeke girîng e û danerên wan jî, ji deverên cuda ne. Ew, wek sê nîfşên li pey hev jî dikarin bîrên dîtin ku bi awayek pêwendiyek di navbera wan de heye û bi şêweyeke ne rasterast be jî dikare ji hikariyeke wan a li hev were behskirin. Bi vê yekê dê hem der barê senifan û mînakên wan de nêrîn bîrên pêşkêşkirin hem jî ev berhem dê hinekî li hev bîrên hevberîkirin da ku bê nîşandan bê kîjan aliyên wan hev digirin û kîjan aliyên wan jî ji hev cihê ne. Bi gotineke din dê der barê mijarê îşaretpêkirî de eynîbûn û cihêwaziyên wan bîrên nîşandan. Di pey analîza berheman re, dê li ser mijara rastnivîsîna rewşa raderî û ya navdêrî ya lêkeran bê rawestandî û ramanên ji bo çareserîya kêşeya rastnivîsîna lêkeran bîrên pêşkêşkirin.

Her wisan di xebatê de serî li berhemên akademîk ên tîkildarî mijarê, bi taybetî yên tîkildarî rêzimana dîrokî/kevneşopî, tê xistin da ku zemîna lêkolîn li serê tê kirin, hîn bêhtir ronî bibe. Ji ber ku rêzimanên bûne mijara xebatê bi tevahî, bi perspektîfa rêzimana klasîk, ku jê re gramera rêsaparêz jî tê gotin, hatine amadekirin û bi rêbazên wê li ser mijarên cureyên bêjeyan û yên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve hatiye sekinandin, loma bi heman rêbaza rêzimana klasîk nêzikahî di wan tê dan, krîtîk û nirxandin li ser wan tên kirin. Ji bo mijara lêkeran a ji aliyê binyatî ve jî senifaneke nû tê kirin.

¹⁶ Mebest ji gotina “lêgerînên qadî û lêpîrsîn”ê ev e ku ji ber xebatê û lêkolînên li ser zimanê kurdî, salên dûr û dirêj ji aliyê me ve di pêvajoyên ji hev cihê de, ji bilî devera xwe, li deverên wekî Bazîd, Gîngîm, Nîsêbîn, Cîzîr, Semsûr, Zara, Qangal, Çêrmûk û Dihokê jî xebatên meydanî hatibûn kirin û gelek keresteyên zimanî hatibûn berhevkirin. Di vê xebatê de ji van civariyan jî sûd hat wergirtin.

5. Pirsgirêk û Astengiyên Lêkolînê

Ji ber ku di warê senifana lêkerên kurmancî ya bi her awayî û rastnivîsîna wan de, her wiha li ser hevberîkirina rêzimanên kurmancî ya ji van aliyan ve, nikare ji xebatên teorîk ên akademîk ên têr û tije bê behskirin, loma arîşe û aloziyên mijarê bivê nevê xwe bi mirov didin hisandin. Hem di warê têgih û termînolojiyê de hem jî di warê çavkaniyên têkildarî mijarê de hebûna astengan û pirsgirêkan, kir ku zemîna xebatê hîn zehmettir bibe.

Heta niha amajepênêkirina ji hin cureyên lêkeran (wekî lêkerên bi forma “*hînî... kirin*” û “*bera... dan*”) an jî lihevnekirina li ser navlêkirina lêkerên ku bi alîkariya cînavkên lihevxiştî yên *jê, lê, pê û tê* yê tîr duristkirin (*mîna jê çûn, lê dan, pê ketin, tê gihîştin, pê ve danîn û tê re kirin*), bi tena serê xwe besî zorbûna (çetînbûna) xebatê ye. Gava xebatek cara pêşîn ji hebûna diyardeyekê behs bike û jî bo wê diyardeyê jî têgihêkê bi kar bîne, jixwe têra xwe tûşî astengiyan dibe û her wisan duçarî bertekan tê.

Ji ber hin sedemên ku li jorê bal li hinan hat kêşan, nebûn an jî kêmbûna çavkaniyên ronîker, nepeyitandîna hin diyardeyên rêzimanî yên gramera kurmancî û têgihînekirina wan, ji bo xebatê hin ji pirsgirêk û astengiyan bûn ku derketin pêşberî me. Mesela di xebata me de hebûna kategoriyeke din a cureyekî lêkeran a ji aliyê binyatî ve tê angaştin (îdiakirin) û navê lêkerên veqetînbare li wan tê kirin ku di hin rêzimanên zaravayê kurmancî de ji wan re lêkerên hevedudanî, lêkerên biwêjî û lêkerên bidaçek hatiye gotin. Lê ne di bin navekî serbixwe de ne jî di rêzimanan de cihêkî taybet ji bo wan hatiye terxankirin.

Li ser rastnivîsîna awayê raderî û ya navdêrî ya lêkerên kurmancî jî nebûna xebatên teorîk ên têrker yek ji astengiyên vê xebatê ye. Di gel vê yekê, hin peytên Celadet Bedirxan ên ji bo rastnivîsîna û helwesta wî ya zanistiyane ji bo xebatên li ser rêzimana kurmancî wek hewlên rênîşander dikarin bîr dîtin.

Ev xebat ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de, ji cureyên bêjeyan, mijara lêkeran, awa û pîvaneyên senifana cureyên lêkeran tê behskirin. Ji bo vê beşê jî berhem û çavkaniyên ji destê ewilî yên li ser dîroka zimên û lînguîstîkê hatin

tercîhkirin ku ew bi ya me hem ewlebar in hem jî danerên wan di warê xwe de wek kesên otorîte tîn pejirandin. Di pey re îcar bi heman çavî li berhemên rêzimanên zaravayê kurmancî tê nihartin, bi helwesteke rexneyî nêzikahî di wan tê dan û nirxandin li ser senifana wan a cureyên lêkeran û navlêkirina kategoriyên wan tîn kirin.

Di beşa duyem de, piştî lêhûrbûna li ser senifana lêkeran a ji aliyê binyatî, avanî (voice/çatî) û teşeyî ya cureyên lêkeran ên di van rêzimanên li ser zaravayê kurmancî de, hewl tê dan ku ji aliyê binyatî ve senifaneke cureyê lêkeran ji nû ve bê kirin û bi dorfirehî li ser “lêkerên veqetînbar”¹⁷ bê sekinandin; ku ev mijara hanê yek ji taybetiyên vê xebatê bi xwe ye.

Beşa sêyem ji bo rastnivîsîna cureyên lêkeran hat veqetandin. Ji ber ku hem di biwarê zimanê nivîskî de hem jî di navbera danerên berhemên li ser rêzimana kurmancî de ev war xwedî gelşeke gelek zêde ye. Nemaze der barê rastnivîsîna lêkerên hevedudanî û yên veqetînbar de. Di vê beşê de mijar, rastnivîsîna lêkeran ên wekî rewşa lêkeran a raderî, navdêrî û rewşa kêşandî ya lêkerên dariştî yên bi pêşgiran e. Ji bo awayê rastnivîsîna cureyên lêkeran, bi awayekî giştî daxuyanî û ravekirinên Celadet Bedirxan wek jêder, bûn palpişt û belgeyên pêselmîn ku bi ya me ew hîn jî derbasdariya xwe dihêvişînin.

¹⁷ Ev têgih ji aliyê me ve wek berginda têgiha bi îngilîzî “*separable verbs*” û ya bi almanî “*trennbare verben*”ê hat çêkirin. Di bin vî navî de, dê ji hêla me ve senifaneke din a cureyên lêkeran a ji aliyê binyatî ve bê çêkirin.

BEŞA YEKEM

CUREYÊN BÊJEYAN Û LÊKER

Berî ku xebatên rêzimanên kurmancî ji hêla mijara senfina lêkeran, nemaze “ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran” ve bên vekolan û lêhûrbûnek li ser lêkerên kurmancî bê kirin, behskirina ji cureyên bêjeyan û balkêşandina li ser wan a ji aliyê dîrokî ve dê ji bo dabaşê tişteki havildar be. Ji ber ku lêker jî, ji cureyên bêjeyan in. Îcar cureyên bêjeyan jî (navdêr, rengdêr, cînavk, hoker, daçek, gihanek, baneşan û lêker), peyvên wisan in ku di navbera wan de ji aliyê manendiya binyat, têgih û erkê ve têkiliyeke gelek xurt heye. Di gel vê rewşê, lêker beşeke girîng a rêzimana zimaneke ne û herçî cureyên bêjeyan in, ew jî di rêzimanan de xwedî cihê berfireh in. Loma di serî de destpêkirina ji cureyên bêjeyan, ji cureyên bêjeyan jî ji lêkeran dê ji bo ronîbûna mijarê bi kêr bê. Jixwe piştê dê bi dorê, bi awayekî berfireh û bi kitekit pêdeçûnek li ser van warên navborî bê kirin.

1.1. CUREYÊN BÊJEYAN

Bêje hêmanên sereke ne ku ziman bi wan pêk tê. Xebata li ser mijara cureyên bêjeyan jî digihîje heta Yûnana berê. Fîlozofên navdar û nasyar ên mîna Platon (Eflatûn) û Arîsto, li ser cureyên bêjeyan rawestiyane. Platon behsa navdêr û lêkeran kiriye û wî ew ji aliyê kategoriya kirde û pêveberê ve, ji hev veqetandine.¹⁸ Arîsto jî beşên rapeyvê (nutqê) wekî herf, kîte, gihanek, herfa terîf, navdêr û lêkerê¹⁹ bi rêz kirine. Divê bê gotin ku yê cara ewilî ji bo cureyên bêjeyan têgihên wekî navdêr, lêker, daçek û rewşê peyitandine Arîsto ye, ku îro jî ew tên bikaranîn. Lê ji nav van têgihên hanê, wî navdêr (onoma) û lêker (rhêma) cuda hildane dest.²⁰ Îcar Dionysios, rapeyv li heşt bêjeyan dabeşandiye: navdêr, rengdêr, herfa terîf, hoker, lêker,

¹⁸ İsmail Yergüz, “İkinci Baskıya Önsöz”, di Süheylâ Bayrav **Yapısal Dilbilimi** de, Multilingual, İstanbul 1998, r. 9-11.

¹⁹ Süheylâ Bayrav, **Filolojinin Oluşumu**, Multilingual, İstanbul 1998, r. 111.

²⁰ Doğan Aksan, **Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim**, C. 1, 4. baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2007, r. 18.

gihanek, daçek û cînavk.²¹ Lê belê piştire, ji ber ku di zimanê latînî de herfa terîf (artîkel) tune ye û zimanê grekî ji aliyê hebûna cureyên peyvên ve ji hemû zimanên din re nabe bibe mînak, loma ji hêla zimannasan ve bêjeya “baneşan”ê li şûna herfa terîfê hatiye bicihkirin û bi vê yekê cureyên peyvên gihîştîye heştan²², ku roja îro jî ev peyta hanê ya dibêje beşên axaftinê heşt in, bi awayekî giştî derbasdar e. Eger bi awayekî din were gotin, çendî ev mijar mijareke gelek nîqaşbar be jî, meyla giştî ew e ku cureyên bêjeyan li ser heşt beşan tîr dabeşandin.

Ne tenê ev mijara hanê, ya rast xebatên li ser zimên ên yûnaniyan bandoreke mezin li ser zimannasiyê û rêzimana zimanê gelek neteweyan jî kiriye. Nemaze xebata Dionysios pêşî jî bo rêzimana zimanê latînî bûye çavkanî û her wisan termên rêzimana latînî jî, ji ber ên grekî hatine dariştin. Piştire, P.Z’ê rêzimanên zimanên ku li Ewrûpayê tîr axaftin îcar di Serdema Navîn de, di dem û mêjûyên cuda de, ji ber rêzimana zimanê latînî hatine çêkirin û her wiha ew girêdayî termînolojiya wê jî mane²³ ku loma ji ber vê yekê rexne li termînolojiya gramere ya neteweyên ewrûpî tê kirin û tê gotin ku ew tîgih li zimanên wan nayên û ne li gorî mantiqa zimanê wan in.²⁴

Herçî rêzimana yûnan e, ku ew nimûneya pêşîn a kitêbên rêzimanî yê Rojava yê kevneşopî ye, bi domana demê re jî zimanên din re, ango jî zimanên derî cografyaya Ewrûpayê re jî bûye nimûne. Ev rêzimana hanê, paşê li zimanên ermenî û suryanî hatiye wergerandin û ji xebatên li ser rêzimana erebî û îbrankî re jî bûye rênîşander.²⁵ Wekî tê dîtin, gramera zimanê yûnanî ne tenê kartêkerî li hemû rêzimanên zimanên gel û neteweyên rojavayî kiriye, ne bi awayekî yekser be jî, dikare bê gotin ku qet nebe bi taybetî di demên modern de bi awayekî neyekser hîkarî li rêzimanên neteweyên rojavayî jî kiriye û ew şewandine.

Divê bê aşkerakirin ku li ser hejmara cureyên bêjeyan di navbera zimannas û rêzimanasên kurd de lihevkirineke tam nîn e û ew mijareke nîqaşdar e. Bav û hîmdarê kurdiya nûjen Celadet Bedirxan, ku ji cureyên bêjeyan re tîgihên wekî

²¹ Süheylâ Bayrav, *h.b.*, r. 111.

²² Süheylâ Bayrav, *h.b.*, r. 111.

²³ Süheylâ Bayrav, *h.b.*, r. 112.

²⁴ Süheylâ Bayrav, **Yapısal Dilbilimi**, Multilingual, İstanbul 1998, r. 30.

²⁵ Ji bo zanyariyên li ser mijarê *bnr. h.b.*, r. 30-31.

“birên qisetê” û “texlîtên bêjeyan”²⁶ bi kar anîne, daxuyandiye ku cureyên peyvan ên “kurdmancî”deh in; mîna “*navdêr, veqetandek, rengdêr, pronav, lêker, jmarnav, hoker, daçek, gihanek, baneşan.*”²⁷ Wî, ji bilî heşt beşên axaftinê, têgihên “veqetandek” û “jmarnav”ê jî li cureyên bêjeyan zêde kirine. Şayanî gotinê ye, ji van têgihên hanê yên ku Bedirxan ew dariştine, tenê “pronav” îro bi awayekî giştî nayê bikaranîn, li şûna wê bi piranî bêjeya “cînav/cînavk”ê tê tercîhkirin. Kesên bi awayekî hişk li ser raman û şopa Celadet Bedirxan in, di vî warî de bi wî re ne û hejmara cureyên bêjeyan ên kurdî wekî deh heb bin, dipejirînin. Li gel vê yekê, hin kes jî xwedî angaşt in ku wekî zimanê tirkî²⁸ di kurdî de jî cureyên bêjeyan heşt heb in.²⁹ Lê divê bê diyarkirin ku der barê hejmara cureyên bêjeyan ên di zimanê tirkî de jî angaştên cuda hene û rexne li senifana klasîk tê girtin. Her wisan îtiraz li ser senifana heşt cureyan bêjeyan jî tê kirin û tê gotin ku nabe li gorî kategoriyên zimanên êndamên Malbata Hind-Ewrûpî yên wekî almanî, fransî, îngilîzî, latînî û yûnanî nêzikahî di xebatên li ser zimanên din bê kirin.³⁰

Di gel vê yekê, çendî rexne lê hebin jî û cureyên bêjeyan bi awayê wateyî û peywirî yan jî bi awayê bêjeyên guhêrbar û neguhêrbar bên senifandin jî, li gorî tesnîfa klasîk bi xwe meyla me li ser wê ramanê ye ku dide dibêje cureyên bêjeyan heşt in. Jixwe di tesnîfa Celadet Bedirxan de “jmarnav” (hejmarnav) û veqetandek, ku ew wek cureyên bêjeyan hatine destnîşankirin, ne ji beşên axaftinê ne. Bi gotina Celadet Bedirxan “jmarnav”, yek ji cureyên navdêran e. Ew bi tena serê xwe ne ji cureyekî bêjeyan e û veqetandek (îzafe) jî amrazeke/morfemeke rêzimanî ye, ne bêjeyeke ji beşên axaftinê ye. Wekî gireyên/morfemên kêşanê, veqetandek têkildarî morfosentaksê ne. Ji aliyê gramera klasîk ve mijarên wekî fonetîk, morfolojî û sentaksê ji hev cuda tên vekolan, lê li gorî gramera nûjen ji ber ku ew gişt bi hev re di nav têkiliyê de ne, loma hewce dike ku hem li ser foneman hem jî li ser morfeman

²⁶ Celadet Alî Bedirxan, **Bingehên Gramêra Kurdmancî**, Avesta, İstanbul 2010, r. 24.

²⁷ Celadet Alî Bedirxan, *h.b.*, r. 24.

²⁸ Ji bo zanyariyên zêdetir ên der barê vê mijarê de *bnr.* Doğan Aksan, **Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim**, C. 2, 4. baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2007, r. 84, D. (oğan) Aksan “Sözcük Türleri”, di Neşe Atabay, Sevgi Özel & İbrahim Kutluk, **Sözcük Türleri** de, 2. baskı, Papatya Yayıncılık, İstanbul 2003, r. 21-23.

²⁹ Li gorî Kemal Badıllı û Feqî Huseyn Sağnıç, cureyên bêjeyan heşt in. Ji bo vê dabaşê *bnr.* Kemal Badıllı, **Türtçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)**, Med Yayınları, İstanbul 1992, r. 35, Feqî Huseyn Sağnıç, **Hêmana Rêzimanê Kurdi**, Melsa Yayınları, İstanbul 1991, r. 29.

³⁰ Ji bo agahiyên berfirehtir ên der heqê vê yekê de *bnr.* Emel Huber, **Dilbilime Giriş**, Multilingual, İstanbul 2008, r. 218-225.

di çarçoveya morfofonolojî û morfosentaksê de bê sekinandin. Îcar her çi qas li ser dabaşa hejmara cureyên bêjeyan di navbera danerên rêzimana zaravayê kurmancî de lihevnekirineke tam tune be û di navbera wan de ev nakokî hîn berdewam be jî, lê rastiyeke heye ku meseleya peyta cureyên bêjeyan a ji bo gelek gramera zimanan a ji aliyê senifana kevneşopî ve, xwe dispêre xebatên filozof, ramanwer û zimannasên Yûnana berê û hejmara beşên axaftinê jî wek heşt heban, qebûleke gelemper e.

Divê bê diyarkirin ku cureyên bêjeyan (beşên axaftinê) jî ji hev tèn cudakirin. Ew wekî I) bêjeyên ji esilê navdêran (*navdêr, rengdêr, cînavk û hoker*), II) bêjeyên ji esilê daçekan (*daçek, gihanek û baneşan*) û III) lêker (*lêker; tewrlêker/qertaflêker*), li sê beşan tèn dabeşandin.

1.2. JI CUREYÊN BÊJEYAN LÊKER

Cureyên bêjeyan û ji wan jî lêker ji demên berî zayînê ve bûne mijara rêzimana klasîk. Ji beşên axaftinê “rengdêr” û “navdêr” an jî “cînavk” û “lêker”, hem ji hêla hêmanên sereke (kirde û bireser) ve hem jî ji hêla pêwendiya bêjeyan a wateyî ve gelek girîng in. Ji ber ku lêker yek ji hêmanên girîng ên cureyên bêjeyan tèn pejirandin û “yekeya hîmî ya tenebihur a zimên e”³¹, di xebatên gramere de cihekî pir girîng distînin.

Li ser lêkeran hewce bi balkêşana ser nîqaşeke dêrin a der barê təkiliya lêker û navdêran de heye. Hîn di demên kevnar (antîk) de pirs hatiye kirin bê ka serê pêşîn lêker hebûye yan jî navdêr, ango kîjan ji wan berê hatiye afirandin? Li gorî angaştan hin zimannasan, mirovan ji cureyên peyvên serê ewilî lêker afirandine. Eger bi şêweyêke din were gotin, peyvên pêşîn ên mirovan ew gotine û bi lêv kirine, lêker in û navdêr jî ji lêkeran hatine afirandin.³² Wekî dixuye mijara lêkeran mijareke zehf kevn û nîqaşbar e. Hîn di demên dêrin de lêkeran zimannas bi xwe bilandine û ji aliyên wan ve li ser lêkeran jî gengeşiyên kûr û dûvdîrêj hatine kirin.

Mijara ka berê lêker hebûn an jî navdêr li aliyekî, tiştê diyar û yê tê pejirandin ew e ku lêker yek ji beşên axaftinê yên bingehîn ên zimên in û ew kir û karekî,

³¹ Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, 3. baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2009, r. 527.

³² Ji bo agahiyên hîn berfirehtir *bnr.* Ragıp Özden, *Dil Türeyişi Teorilerine Toplu Bir bakış*, Ankara 1944, r. 24, 57, 73-74.

qewimîn û bûyînekê, bizavek û tevgerekê û rewşekê didin zanîn. Di heman demê de ew têgiha kes û demê jî didin xuyakirin.³³ Wekî ji pênaseyê jî tê fehmkirin, ew hem kar, rûdan û tevgerên heyberan û rewşa wan a ku ew tê de ne radigihînin, hem jî ew çemka kes, dem û darazê jî didin diyarkirin. Ev bêjeyên ku di lînguîstîkê de ji wan re lêker tên gotin, hîmên (ruknên) zimên in, di heman demê de ew hêmana bîngêhîn a hevokê ne. Her wisan lêker hêmaneke girîng a pêveberê ne ku hevok bi wan sergîhayî dibin; lê eger hevok bêlêker bin, ew wek hevokên nîvçe tên pênasekirin. Li gel vê, ew hêmaneke karîger a maka gelek bêjeyan in û gelek peyv jî ji rayekên wan tên çêkirin. Eger bi taybetî ji aliyê zimanê kurdî ve were gotin, lêker kana dariştina bêjeyên wekî navdêr û rengdêran in. Tevî vê rewşê, ew kan û jêderka çêkirina kirdenavan (îsmê failan) û tiştênavan (îsmê meful) in ku nemaze kirdenav ji rayeka lêkeran, bi piranî ji morfema rayeka dema niha ya lêkeran tên duristkirin. Wekî “*firoş*”a ji rayeka dema niha ya lêkera *firotin/firoştinê* ku bi alîkariya wê bêjeya “*zembîlfiroş*” hatiye çêkirin. Taybetiyeke din a lêkerên kurdî ew e ku di rewşa xwe ya raderî de, di heman demê de jî navdêr in; bi gotineke din ew navdêrên lêkerî ne.

Belê mirov bi saya lêkeran ji kar, bûyîn/qewimîn, bizav û rewşê haydar dibe, lê kategoriyên rêzimanî yên mîna avanî, rawe, dem, kes û mêjer (mîqdar/hejmar) jî, dîsan têkildarî lêkerê ne. Di senifana klasîk a bêjeyan de, lêker hêmana sereke ya xwedî wesfê avakar a bastûra hevokê ango ya sentaksê ye. A ji ber van taybetiyên hanê yên lêkeran, pêwîstî bi nasîna çawanî û wesifên lêkeran jî çêbûye û ji hin aliyan ve ew hatine senifandin. Îcar ev polînkirin bivê nevwê li gorî rewş û taybetiya her zimanî ye û heta li gorî nêzikahîtdana zimannasan a li mijarê jî ev rewş diguhere. Di berhemên rêzimanê yên zaravayê kurdî yê kurmancî de jî, cih ji çawanî û cureyên lêkeran re hatiye veqetandin. Zimannas û amadekarên rêzimanan, li gorî hin rêzikan ew senifandine û nav li senifanên xwe kirine.

³³ Der barê vê mijarê de *bnr.* Qanatê Kurdo, **Gramera Zmanê Kurdi (kurmancî-sorani)**, Koral Yayınları, İstanbul 1991, r. 117, Samî Tan, **Rêzimana Kurmancî**, Çapa nûkirî ya 3., Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2015, r. 215, Mehmet Hengirmen, **Türk Dilbilgisi**, 8. baskı, Engin Yayın Evi, Ankara 2005, r. 200, Doğan Aksan, **Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim**, C. 2, 4. baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2007, r. 98.

1.3. SENIFANA LÊKERAN

Lêker, li gorî pîvaneyên wekî forma lêkerê, erka (fonksiyona) wê, wate (semantîk) û peywira wê ya ji hêla avaniyê (voice, bîna/çatî) ve jî tîn vekolan û nirxandin. Lê ji aliyê perspektîfa rêzimana klasîk ve lêker, bi awayekî giştî li sê beşan tîn levakirin. Mîna I) ji aliyê binyatî ve lêker (wekî *lêkerên xwerû*, *lêkerên dariştî* û *lêkerên hevedudanî*), II) ji aliyê avaniyê ve lêker (*lêkerên têper*, *lêkerên teneper*, *lêkerên lebatî*, *lêkerên tebatî*, *lêkerên dançêker*, *lêkerên vegerok* û *lêkerên berbihevîn*) û III) ji aliyê teşeyê ve lêker (*lêkerên rêzîkî* û *nerêzîkî*).³⁴

Ji van her sê beşan, beriya behs ji aliyê binyatî ve ji cureyên lêkeran bê kirin, divêtî pê heye ku pêşî bi awayekî puxtayî be jî li ser senifana cureyên lêkeran ên ji aliyê avanî û teşeyê ya lêkeran bê rawestandî û bal li pênase û taybetmendiyên wan bê kêşan. Ji ber ku ev yek dê piştî der barê mijara “ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran” de, rê li ber me ronî û bergehê jî firehtir bike.

1.3.1. Ji Aliyê Avaniyê ve Lêker

Gava ku lêker ji ber kirde yan jî bireserê wate wergire û bikeve teşeyekê, jê re avanî tê gotin. Ji lew re lêker li gorî stendî û nestendî kirde û bireserê jî tîn senifandin û ev senifan jî avahîsaziya lêkeran nîşan dide. Ji avaniya lêkerê tê zanîn bê ka lêker tekûz an jî kême e. Eger lêker tekûz be, bûyer li kirdeyê lê ku kême be îcar bûyer li tiştêkî/kesekî din vedigere. Bi vî awayî têperî yan jî teneperiya lêkeran tê zanîn.

Ji ber meseleya kirde û bireserê, avaniya lêkeran li du koman tê dabeşkirin: Wekî avaniya li gorî bireserê û avaniya li gorî kirdeyê. Gava di vê çarçoveyê de li mijarê tê mêzandin, tê dîtin ku polînkirinê di pirtûkên rêzimana zaravayê kurmançî yê zimannas û rêzimannasên kurd de, ên li ser warê “avaniya lêkeran”, ne wekî hev in û kêşeya heyî tafîlê xwe dide der. Mesela, hin kesan li bin jênavê “Avaniya

³⁴ Ji bo agahiyên zêdetir ên der barê mijarê de *bnr.* Doğan Aksan, *h.b.*, 2007, r. 103-105, Mehmet Hengirmen, *h.b.*, r. 200-213, Neşe Atabay, Sevgi Özel & İbrahim Kutluk, *Sözcük Türleri*, 2. baskı, Papatya Yayıncılık, İstanbul 2003, 182-195, A. Bali, *Kürtçe Dilbilgisi Türkçe Açıklamalı/Rêzimana Kurdî*, Alan Yayıncılık, İstanbul 1992. r. 71-72.

lêkeran”³⁵, “Di lêkeran de avani”³⁶ û ”Ji aliyê avaniyê ve lêker”³⁷ cih dane lêkerên têper, lêkerên têneper, lêkerên tebatî, lêkerên lebatî û lêkerên dançêker. Lê Kamûran Bedirxan li gorî fonksiyona lêkeran ew kirine pênc bir: Lêkerên têper, lêkerên têneper, lêkerên tebatî, lêkerên pronavkî (ango lêkerên vegerok) û lêkerên nekesîn.³⁸ A. Balî, bi jêrnave “Li gorî kirdeyê lêker”, îcar lêker wek “lêkerên lebatî, lêkerên tebatî û lêkerên pronavkî”³⁹, di sê beşan de senifandine. Kemal Badıllı di xebata xwe de, bi sernave “Ji aliyê kirdeyê ve lêker”, lêker wek lêkerên tebatî, lêkerên lebatî, lêkerên vegerok û lêkerên berbihevîn⁴⁰, ji hev cuda kirine.

Ji van jêgiran û kurtebehskirinan xweş dixuye ku dabeşandina lêkeran a ji aliyê avaniyê ve ya danerên rêzimana kurmancî yên kurd kêşedar e. Di navbera senifanên wan de nakokiyeye pir mezin heye. Ji ber ku gava ji avaniya lêkeran tê behskirin, pîvan ew e bê ka kar rasterat pêk tê yan jî bi destê yekî din tê kirin, tê de bireser (tişte) heye yan nîn e, kirde bi xwe wê kir û kiryarê dike yan jî bi yekî dide kirin û hwd. Ji lew re, bi me wisan tê ku eger di bin du jêrnavan de (ji aliyê bireser û kirdeyê ve) li ser vê mijarê bê rawestandî û pêdeçûneke wisan lê bê kirin, dê ji bo mijarê û zelaliya wê, azîneke hîn çêtir be.

1.3.1.1. Avaniya li Gorî Bireserê

Lêker di dema kêşanê de, li gorî erka ku li xwe digirin bi karê xwe radibin û di vê rewşê de têperî û têneperiya (gerguhêzî û negerguhêziya) wan diyar dibe. Ji ber vê rewşê, ji van cure lêkeran re, “ji aliyê erkê ve lêker” jî tê gotin. Ev lêker, ji hêla stendî û nestendîna bireserê ve dibin du beş: I) Lêkerên têper û II) lêkerên têneper.

Wekî hat daxuyandî, têper û têneperiya lêkeran, di dema kêşanê de dixuye. Eger di wexta kêşanê de biresera hevokê hebe, ango eger heyberên candar û bêcan gava ji kirina kirdeyê (bikerê) hîkarîdar bibin, ew lêker têper e. Lê eger di dema

³⁵ Mûrad Ciwan, *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanc Lehçesi)*, Weşanên Jîna Nû, Balinge 1992, r. 94.

³⁶ Samî Tan, *h.b.*, r. 318-324.

³⁷ Kadri Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilgisi (Kurmancî Lehçesi)*, 2. baskı, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul 2012, r. 96-107.

³⁸ Kamuran Ali Bedir-Xan, *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri*, Weşanên Deng, İstanbul 1991, r. 39.

³⁹ A. Balî, *h.b.*, r. 183-185.

⁴⁰ Kemal Badıllı, *h.b.*, r. 119-120.

kêşana lêkerê de heyberên candar û bêcan ên ji kirina kirdeyê tesîrdar bûbin tune bin, ew lêker têneper e.

Bi kurtasî, têperî û têneperiya lêkeran, di dema kêşanê de ji hebûn û nebûna “bireser”ê diyar dibe, ku nemaze ji bo zaravayê kurmançî ev taybetî tiştêkî zehf girîng e. Di zaravayê kurmançî de (wekî zaravayê kirmanckî/zazakî) du kom cînavk hene, ku loma jî ev cure cînavk li gorî vê taybetiyê tên bikaranîn. Hemû demên lêkerên têneper bi cînavkên xwerû ango bi koma yekem (*ez, tu, ew, em, hûn, ew*) tên kêşan. Herçî lêkerên têper in, dema wan a niha⁴¹ bi cînavkên xwerû û hemû demên wan ên borî jî bi cînavkên tewandî/koma duyem (*min, te, wî/wê, me, we, wan*) tên kêşan. Ji ber di kurdî de rewşa ergatîfiyê (ku kurdî zimanekî nîvergatîf e) heye, ev taybetiya lêkeran û hebûna du komên cînavkan ji bo vê rewşê pir girîng e. Ji lew re lêkerên têper di dema niha de li gorî kirdeyê, di demên borî de jî li gorî bireserê tên çevandin. Ji ber vê yekê, di dema niha de kirde xwerû, bireser tewandî ye. Îcar di demên borî de kirde tewandî û bireser jî xwerû ye. Gava bireser tewandî û kirde xwerû be, lêker û kirde bi hev re ahengdar in. Yanê ji lêkerê kirde tê naskirin. Di kêşana demên borî de, berevajiyê vê rewşê, ji lêkerê bireser (tişte) tê nasîn, loma jî bireser û lêker bi hev re ahengdar in. Eger ev yek bi awayekî puxteyî bê formulekirin; di hemû demên kêşana lêkerên têneper de, gireyên (qertafên) kesane yên ku tên dawiya lêkerê, bikerê nîşan didin, herçî lêkerên têper in, ji bilî wekî dema niha, dema bê û raweya fermanî, di hemû kêşana demên wan ên borî de, gireyên ku tên dawiya lêkerê, berevajiyê lêkerên têneper, rewşa yekhejmar û pirhejmariya bireserê nîşan didin.

1.3.1.2. Avaniya li Gorî Kirdeyê

Li gorî avaniya kirdeyê, bi awayekî giştî lêker li pênc beşan dabeş dibin: I) Lêkerên lebatî, II) lêkerên tebatî, III) lêkerên dançêker, IV) lêkerên vegerok û V) lêkerên berbihevîn.

Lêkerên lebatî ew lêker in ku kirdeyên wan kar dikin û rasterast hîkarî li heyberên zindî (candar) û nezindî (bêcan) dikin. Kirde bi xwe karê ku lêker vedibêje

⁴¹ Ji niha pê ve, hem ji bo pratîkbûnê hem jî ji bo bi awayekî ekonomîk bikaranîna zimên, li şûna demên niha, dahatû û wekî raweyên fermanî, xwestek, daxwazî, şert, divêti û bilaniyê, carinan li gorî pêwîstiyê dê bi tenê “dema niha” bê bikarînan.

û diqewimîne, dike. Di lêkerên lebatî de kirde diyar e û ev cure lêker dibe ku têper û teneper bin jî. Ji ber ku kirde diyar e, bersiva pirsê “*kî/kê*”yê jî heye. Lê di lêkerên tebatî de, kirdeya rast û rasteqîn, ne diyar e.

Lêkerên ku kirdeya wan ne diyar be, ew lêker tebatî ne. Ne aşkera ye bê ka kar ji aliyê kê ve tê kirin. Eger kirde diyar be jî, ev yek ne bi awayekî rasterast e. Ji hevokên ku bi lêkerên tebatî hatine çêkirin, bireser li pêş e û ev cure lêker di kurmançî de (ku kirmançî jî wekî kurmançî ye) bi alîkariya lêkera “*hatin*”ê û ji lêkerên lebatî tên kêşan. Ji ber ku ji lêkerên teneper avaniya tebatî nayê çêkirin. Ji bo rewşa van lêkeran, a girîng ew tiştê ku qewimiye, yanê tiştê bûyî mihîm e. Taybetiyeke din a lêkerên tebatî jî ev e: Lêkera alîkar “*hatin*” li gorî deman û kesan tê kêşan, lê lêkerên bingehîn di halên xwe yên raderî de dimînin, tu guherîn di wan û rayeka wan de rûnadin. Eger bi dayîna nimûneyekê hewla zelalkirina mijarê were kirin: Lêkera “*hîn bûn*”ê, lêkereke hevedudanî û teneper e. Ji bo avaniya vê lêkerê ya tebatî ku bi alîkariya lêkera “*hatin*”ê pêk tê, nabe “*hatiye hînbûn*”, were gotin. Ji ber ku divê lêker di rewşa tebatî de be, hewce ye ew bi awayê “*hatiye hînkirin*” bê kêşan. Tebatiya lêkerê, bi lêkera alîkar “*hatin*”ê çêdibe û ev lêker li gorî dem û kesan tê çevandin. Lê belê ya wateyê derdibe, “*hîn kirin*” bi xwe ye.

Lêkerên dançêker (sedemkar), ew cure lêker in ku kar bi yekî din tê kirin. Avaniya dançêker, bi alîkariya lêkera “*dan*”ê tê çêkirin û wekî lêkerên tebatî, lêkerên hîmî yên têper (eynî mîna lêkerên tebatî û ji aliyê binyatî ve cureyên wan çî dibe bila bibe) di rewşa xwe ya raderî de dimînin û lêkera alîkar li gorî kes û deman tê kêşan. Ji bo ronîkirina avaniya dançêkerê jî ku ji lêkereke teneper wek mînak “*rawestîn*” bê dayîn: Eynî mîna awayê “*hîn bûn*”ê, ew bi wê rewşa xwe wek avaniya dançêker nayê çevandin. Divê bikeve teşeya têperiyê ya bi awayê “*rawestandin*”ê û wisan bê kêşan. Mîna “*dide rawestandin*.” Lê di zimanê nivîskî yê kurmançî de mirov rastî awayê bikaranîna avaniya tebatî û dançêker ên wekî “*hat hînbûn*” û “*dabû rawestîn*” tê, ku ew awa ji binî ve şaş in û ji bilî zimanê nivîskî, di zimanê axaftinê/devkî de ev awa hîç nîn in. Mesela di berhemeke rêzimanê de ku bûye mijara xebata me awayê lebatî bi şêweya “*hate çêbû*”⁴² hatiye bikaranîn, ku divê awayê wê yê rast “*hate çêkirin*”

⁴² Halil Altuğ, **Gramera Kurdî (Kürtçe Gramer)**, Avesta, İstanbul 2013, r. 412.

be. Ji ber ku lêkera alîkar a rewşa tebatîyê pêk tîne (*hatin*) li gorî dem û kesan tê kêşan, lê lêker bi xwe (*çêkirin*) di rewşa raderî de dimîne.

Wek gotina puxteyî ku ji bo van her sê cure lêkerên hanê bê gotin; ew her sê awa jî bi lêkerên têper pêk tên. Lê herçî avaniya tebatî û ya dançêker in, ew bi lêkerên alîkar “*hatin*” û “*dan*”ê, tên çevandin.

Çendî di hin devokên kurmancî de, wekî devoka Serhedê, meriv leqayî awayê avaniya tebatî û dançêkerê bê ku /-ê/ya tewanga mêtîyê ya diyar a yekhejmar tê dawîya lêkerê jî, lê îcar ew şêwe di warê wateyî (semantîkî) de dibe sedema gelemşeyê. Mîna; “*ew hatiye xwarinê*” û “*dabû xwendinê*.” Li gorî rêzîka rêzimanê, divê ew bi awayê “*hatiye xwarin*” û “*dabû xwendin*”ê be. Bi şêweya pêşîn, a rast ew di halê kêşana lêkerên “*hatin*” û “*dan*”ê” de ne, ku “*xwarin*” û “*xwendin*” di hevokê de navdêr û bireser in. Gava tê gotin “*hatiye xwarinê*”, wate ew e ku kesek hatiye yan xwarinê bibe yan jî xwarinê bixwe. Dîsan ji hevoka “*hatiye xwendinê*”, mehneya kesê bi mebesta xwendinê hatiye jî jê diçe. Loma di zimanê nivîsînê/nivîskî yê standard de, ji bo rewşa avaniyê ya van her du cure lêkeran, şêweya devokî ya ku dabaş li ser e, nayê tercihkirin.

Piştî van her sê lêkerên ku li ser wan hat rawestandin, her du lêkerên ku ji aliyê kirdeyê ve divê ji wan bê behskirin, lêkerên vegerok û berbihevîn in. Di serî de hewce pê heye were gotin ku ev her du lêkerên hanê, di kurmancî de bi tena serê xwe nîn in. Ew bi alîkariya cînavkan tên kêşan. Bi cînavka vegerok “*xwe*”yê awayê lêkerên vegerok (wekî; *xwe xemilandin*, *xwe xurandin*, *xwe şeh kirin*) û bi cînavkên berbihevîn “*hev*” û “*êk*”ê jî, awayê berbihevîn/hevûdinî (mîna; *hev nasîn*, *hev şewitandin*, *êkdû dîtin*) tên çevandin. Ev rewş, bi zêdebûn an jî guherîna dangan ên di binyat û hîmê lêkerê de pêk nayên.

Li ser cînavkên berbihevîn pêwîstî bi amajekirina çend tiştan heye. Di kurmancî de rêjeya bikaranîna cînavka berbihevîn a “*hev*”ê, ji “*êk*”ê pir zêdetir e û “*êk*” bi piranî di devokên kurmancî yê Badînan û Hekariyê de tê bikaranîn. Li gel vê yekê, di zimanê devkî de, di wexta bikaranîna wan de hin hêmanên din ên zimên

jî, bi ûcba xurtkirinê li wan cînavkan zêde dibin. Mîna “*hev û din*”, “*hev û dû*”, “*hevdû*”, yan jî “*êk û dû*”, “*êkdû*” û “*êkdî*.”⁴³

1.3.2. Ji Aliyê Teşeyê ve Lêker

Lêker ji aliyê teşeyî ve di nav xwe de dibin du bir: I) Lêkerên rêzîkî û II) lêkerên nerêzîkî.⁴⁴ Herçî lêkerên rêzîkî ne, di kêşana hemû deman de, ji bilî tewang û ketina deng ku di rayeka lêkeran de çêdibe, tu guherîn di rayeka wan de çênabe. Dem li ser wan rayekan tèn kêşan. Qertafên demê û yên lêkera bûnê (gireyên kesane) li wan tèn zêdekirin. Loma ew xwedî qaydeyên diyar in. Çendî ji ber sedemên cihê hin deng ji wan ketibin jî, di wan de pergalek heye û hemû dem li ser heman rayek û binyata heman lêkerê tèn kêşan.

Tewanga lêkeran jî ew tişt e ku di wexta kêşana demên mîna dema niha, bê û wekî raweyên fermanî, xwestek, daxwaz û bilaniyê de, di rayeka lêkerê de dengdar û dengdêr diguherin û li dengdar û dengdêrên din dadigerin. Bi taybetî, ji bilî awarteyan, wek mînak di rayeka dema niha ya lêkeran de fonema/dengdara /f/yê li /v/yê (peyvî/peyîft), dengdara /p/yê li /b/yê (diqelibe/qelapt), dengdara /s/yê li /z/yê (dibihîze/bihîst) û dengdara /ş/yê jî li /j/yê (dibirêje/biraşt) dadigere. Her wisan, dengdêr jî di dema çevana lêkeran de, di rayeka lêkeran de diguherin. Wekî fonemên/dengdêrên /a/ û /e/yê ku di wexta çevandinê de, di rayeka dema niha de li dengdêrên /ê/yê (diparêzim/parast), /î/yê (binivîsîne/nivîsand) û /i/yê (diaxive/axaft) dadigerin.⁴⁵

Ji bo lêkerên nerêzîkî, bi awayekî kurtasî dikare bê gotin ku hemû dem li ser heman rayekê nayên kêşan. Rayeka wan a dema niha û ya borî ji hev cuda ne. Ji lew re di van lêkeran de, guherîna ku çêdibe ne guherîna dangan a ji ber tewanga lêkeran

⁴³ Bi ya me, ji bo “*hev*”ê, eger awayên din di zimanê nivîskî de bèn bikaranîn, tenê awayê “*hev û din*”ê û ji bo “*êk û dû*”ê bê tercihkirin dê rastir be. Ji ber ku bi qonaxa demê re, ji ber sedemên rêzîka hewla herî hindik a zimên û hwd. ew bi ser hev de quncivîne û ketine rewşa xwe ya devokî.

⁴⁴ Di kurmançî de ji bo têgiha rêzîkî bêjeyên mîna *rêzgîn*, *rêzdar*, *saz* û *biqayde* û ya nerêzîkî peyvên wekî *nerêzgîn*, *nesaz*, *bêrêz* û *bêqayde* jî tèn bikaranîn.

⁴⁵ Ji bo zanyariyên hîn zêdetir ên li ser tewanga lêkeran *bnr.* Zana Farqînî, “Tewang û Rayeka Lêkeran”, *Zend* (Havîn 2005), Weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, r. 28-31. Her wiha Celadet Bedirxan jî di rêzimana xwe de behsa guherîna dengdarên *f*, *s*, *ş*’yê bi dengdarên *v*, *z* û *j*’yê û guherîna dengdêra *a*’yê ya bi *ê*’yê dike. *Bnr* Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, *Kürtçe Gramer*, 2. baskî, (Wergera ji Fransî; li jêr çavdêriya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê), Avesta, İstanbul 2004, r.128-129.

e. Loma ji ber vê rewşê lêkerên nerêzikî wekî du beşan jî dikare bên senifandin: I) Lêkerên nerêzikî yên ku tenê dema niha, dema bê, raweya fermanî, xwestek, daxwazî û hwd. bi wan tên kêşan; mîna lêkerên ‘*her*’in, ‘*bîn*’in û ‘*bêj*’in û II) lêkerên nerêzikî yên ku tenê demên borî bi wan tên kêşan. Wekî *anîn*, *dîtin* û *gotin*’ê. Divê bê aşkerakirin ku lêkerên dariştî yên bi pêşgiran ji van cure lêkeran çêbûne jî, tevde nerêzikî ne.

Di zaravayê kurmançî de lêkerên nerêzikî yên ji van her du koman ku heta niha ji hêla me ve hatine peyitandin, ev in: *bêj’in*, *bîn’in*, *her’in*, *vebêj’in*, *vebîn’in* û *wer’in*. Ji van şeş lêkerên hanê, tenê lêkera “*wer’in*”ê ji yên din hinekî cuda ye. Yên din, bi wan dema niha, dema bê û wekî raweya fermanî, xwestek hwd. tên çevandin, lê bi “*werin*”ê tenê dema niha nayê kêşan. Lêkerên nerêzikî yên ji bo demên borî jî *anîn*, *danîn* (*da+anîn*), *deranîn*, *hılanîn*, *veanîn*, *weranîn*, *dîtin*, *vedîtin*, *gotin*, *vegotin*, *hiştin*, *vehiştin*, *miştin* û *vemiştin* in. Ev çar deh lêker tev li gorî demên borî wekî ku rêzikî bin, tên çevandin, lê kêşana wan a wekî dema niha û ya raweyan, mîna raweya fermanî, xwestek û daxwaziyê nîn e.⁴⁶

1.3.3. Ji Aliyê Binyatî ve Lêker

Lêker wekî çawan ji aliyê erk, wate, teşe, peywir û avaniyê (voice) ve tên senifandin her wisan ji hêla binyatê ve jî tên polînkirin. Ji ber ku warê bingehîn ê xebatê “ji aliyê binyatî ve lêker” e, hewce bi ronîkirina têgiha binyatê (structure) heye da ku mebest tam zelal bibe. Binyat, ku têgiheke zimannasiyê ye û her wisan di warê gramerê de jî tê bikaranîn, bi awayê “pergala ku ziman û hêmanên di nav zimên de pêk tînin”⁴⁷ an jî “pergala ku ji têkiliya di navbera beşên cur bi cur ên ku tevahiyeke çêdikin û ji fonksiyona ku ew di nav tevahiyeke de tînin cih, tê pê”⁴⁸, tê ravekirin.

⁴⁶ Der barê lêkerên nerêzikî de, ji bo agahiyên berfirehtir *bnr.* Zana Farqînî, “Lêkerên nerêzikî”, *Zend* (Bihar 2007), Weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Îstanbul, r. 55-62.

⁴⁷ Kâmile İmer, Ahmet Kocaman, A. Sumru Özsoy, *Dilbilim Sözlüğü*, Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi, “Yapı”, İstanbul 2011.

⁴⁸ Günay Karaağaç, *Dil Bilimi Terimleri Sözlüğü*, Türk Dil Kurumu Yayınları, “Yapı”, Ankara 2013.

Binyat wekî “riayeta li pergala anîna cem hev a tevahiyê”⁴⁹ jî tê pênasekirin. Îcar gava ji bo rêzimanê bêjeya “binyat”ê tê gotin, mebest jê jî amrazên ku bêjeyê pêk tînin (morfem), taybetiyên van keresteyan (yekeyên zimanî), pergala anîna ba hev a van morfeman tê fehmkirin.⁵⁰ Ji lew re ji bo vekolîna zimanekî, ji bo têgihîştina bê zimanek çawan dişikule/dixebite, yekeyên wî zimanî çawan tên cem hev, ji bo şayesandin û ravekirina vê yekê hewce bi peyitandina rêzikên zimanekî, ango bi binyata wî zimanî heye.⁵¹ Bi kurtî eger ji bo lêkeran bê gotin, mebest ji binyatê awayê çêbûna lêkerê, pêkhatina wê ya bi morfem û gireyan, pergala wan a hatina cem hev û fonksiyona wan e. Çawan bêje ji aliyê binyatî ve tînin vekolan, her wisan bi heman azîne li ser lêkeran jî, ku ew ji cureyên bêjeyan in û wek ruknên ziman tînin pênasekirin, tê rawestandîna ew ji van hêlan ve tînin nirxandin. Senifandina lêkeran jî ji hêla binyatî ve tê kirin, bê ka ew xwerû ne, dariştî ne yan jî hevedudanî ne û hwd.

Di berhemên li ser rêzimana kurmancî de, ji aliyê binyatî ve ji mijara lêkeran hatiye behskirin, lê tiştê balkêş e ku senifanên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve ya danerên berhemên rêzimanê hev nagirin, ji hev pir cuda ne. Bi awayekî giştî, tê dîtin ku daner û amadekarên van rêzimanên li ser zaravayê kurmancî wek nav, behsa cureyên lêkerên xwerû, dariştî, hevedudanî û yê biwêjî kirine. Ji bilî van, dê ji aliyê me ve cureyekî din bi navê “lêkerên veqetînbare” li senifanê bê zêdekirin ku di tu rêzimanê kurmancî de wek kategoriyeke cuda cih ji bo wan nehate veqetandin. Lê belê, berî ku ji aliyê binyatî ve behsa cureyên lêkeran were kirin û li ser senifanên wan bê rawestandîna hewce pê heye ewilî serî li pênaseyên van cure lêkeran bê dan, da ku ji bo ronîbûna mijarê ew bibin alîkar. Di pey vê yekê re, bi ya me tefikîrîna li nêrîn û ramanên danerên kurd ên ku li ser zaravayê kurmancî berhem nivîsandine, dê hîn baştir be.

Lêkerên xwerû⁵² ew e cure lêker in ku ew bi serê xwe ne, ew ne bi alîkariya gireyên (qertafên) dariştinê ne jî bi riya hêmanên zimên hatine çêkirin. Bi gotineke

⁴⁹ Hüseyin Toptaş, **Türkçe Dersler 1. Kitap**, Papatya Yayıncılık Eğitim, İstanbul 2016, r. 479.

⁵⁰ *h.b.*, r. 479.

⁵¹ Emel Huber, *h.b.*, r. 129.

⁵² Ji bo bêjeya xwerû, têgihên wekî *sade*, *besîd* û *saltgir* jî tînin bikaranîn.

hîn aşkeratir, ew lêkerên eslî ne ku ji yek bêjeyê pêk hatine û di rewşa rayekê de ne⁵³ û ew li yekeyên watedar nayên parevekirin. Lêkerên dariştî⁵⁴, wekî ji nav jî dixuye ew bi gireyan hatine dariştin, ji hêmaneke tenê çênebûne û ne bi tena serê xwe ne. Ew an ji lêkereke xwerû yan jî ji cureyekî peyvê hatine piraştin.⁵⁵ Di kurmancî de lêkerên dariştî bi pêşgir û paşgiran çêdibin.

Mijara lêkerên hevedudanî (lêkdayî) mijareke xwedî kêşe ye, hem der barê pênaseya wan de, hem jî der barê senifana wan de di navbera zimannas û amadekarên rêzimana kurmancî de lihevkerin nîn e. Li gorî hinekan ew cure lêkerên wisan in ku bi alîkariya lêkerên alîkar û ji bêjeyê ji esilê navdêran çêdibin.⁵⁶ Di gel vê yekê, kesên ku berevajiyê vê pênaseyê nêzikahî di terîfa lêkerên hevedudanî didin jî hene. Wek nimûne, li gorî Qanatê Kurdo, lêkerên hevedudanî ji navên heyînê, ji rengdêran, ji pêşgir û paşgir û ji lêkerên xwerû û yên dariştî pêk tên.⁵⁷ Kamûran Bedirxan li ser lêkerên hevedudanî dadixuyîne ku lêkerên hevedudanî du cure ne; yek jê bi pêşgirek û lêkereke xwerû ya din jî ji rengdêrek an jî ji navdêrekê û ji lêkereke xwerû pêk tê.⁵⁸ Li vir mebest ji pêşgirê jî ew pêşgir in ku bi wan ji lêkerên xwerû lêkerên dariştî tên çêkirin. Ramana Rojen Barnas a der barê lêkerên hevedudanî de jî wiha ye: “... *gewda lêkerê bi piranî ji lêkereke û ji pêrkîteke xwerû an ji pêrkîteke hevedudanî, ji navdêrekê, ji rengdêrekê, an ji hokerekê pêk tê.*”⁵⁹ Wekî ji van kurtedaxuyanan jî aşkera dibe, ramanê hevpar a li ser pênaseya lêkerên hevedudanî nîn e. Ne tenê di navbera rêzimannasên kurd de, di navbera yên tirk de jî der barê pênaseya lêkerên hevedudanî de gelşeke wiha heye. Yên ku pênaseya lêkerên hevedudanî bi awayê “...*ew cure lêker in ku ji navdêrek û ji lêkereke alîkar an ji du şekilên cuda yên lêkeran an jî ji peyvek an ji yekê zêde ya ji bêjeyên esilê navdêrê û ji lêkereke eslî bi hev dikevin*”⁶⁰, dikin hene. Lê li gorî

⁵³ Der barê mijarê de ji bo agahiyên hîn berfireh *bnr.* Samî Tan, *h.b.*, r. 230, Mûrad Ciwan, *h.b.*, r. 81, A. Bali, *h.b.*, r. 172, Hanifi Vural & Tuncay Böler, **Ses ve Şekil Bilgisi**, Kesit Yayınları, İstanbul 2014, r. 207.

⁵⁴ Di kurmancî de ji bo têgiha “dariştî”yê, çemkên wekî *pêkhatî*, *piraştî* û *çêkirî* jî tên bikaranîn.

⁵⁵ *Bnr.* Samî Tan, *h.b.*, r. 257, Qanatê Kurdo, *h.b.*, r. 129.

⁵⁶ *Bnr.* Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, **Kürtçe Gramer**, 2. Baskı (Wergera ji Fransî; li jêr çavdêriya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê), Avesta, İstanbul 2004, r. 182, Mûrad Ciwan, *h.b.*, r. 88.

⁵⁷ Qanatê Kurdo, *h.b.*, r. 151.

⁵⁸ Kamuran Ali Bedir-Xan, *h.b.*, r. 47.

⁵⁹ Rojan Barnas, “Lêkerên Hevedudanî”, **Kurmancî**, h. 5, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs 1989, r. 2.

⁶⁰ Hanifi Vural & Tuncay Böler, *h.b.*, r. 244.

Ferhenga Tirkî ya Saziya Zimanê Tirkî, lêkera hevedudanî wek “*ew lêker e ku ji hêla teşe û wateyê ve bi bêjeyeke ji esilê navdêrê ve bi yek bûye*”⁶¹ tê kirin.

Wekî dixuye, der barê pênaseya lêkerên hevedudanî hene raman û nêrînên ji hev cuda. Loma, bi ya me qet nebe ji bo lêkerên hevedudanî yên zaravayê kurmancî hewce bi pênaseyê hevpar heye. Gava ji pênaseyên jorê jî sîd bê wergirtin, mirov dikare xwe bigihîne terîfeke wiha: Lêkerên hevedudanî hem bi alîkariya lêkerên alîkar û bêjeyeke ji esilê navdêran (wekî navdêrek, rengdêrek an jî hokerekekê), hem jî bi çend cureyên bêjeyan (mîna daçek û bêjeyeke ji esilê navdêrê) û ji lêkereke alîkar çêdibin. Îcar bêjeya ji esilê navdêran dibe ku xwerû, dariştî yan jî hevedudanî be, her wiha lêkera alîkar jî dibe ku xwerû yan jî dariştî be. Li hêla din, li gorî zaravayê kurmancî, rêza bêjeyan a ku bi wan lêkerên hevedudanî pêk tê, bi temamî ne wisan e ku divê lêkera alîkar bê dawiyê. Awarte ev e ku di hin lêkerên hevedudanî de, li derî rêza bêjeyan a gelemper, lêkera alîkar tê destpêkê û bêjeyeke ji esilê navdêrê tê dawiyê. Wekî lêkera hevedudanî ya “*çûn ava*”yê (ku rewşa kêşayî bi vê şêweyê “*roj çûbû ava*”dibe).⁶² Di encamê de lêkera hevedudanî, komeka bêjeyê ye û hemû hêmanên wê divê ji cureyekî bêjeyê bin. A hîmî ew e ku ji aliyê wateyê ve tevahiyekê pêk bîne û di hevokê de jî kirariya bêjeyê bîne cih. Her wiha divê ku her lêkereke hevedudanî, tenê têgihekê derbibe.⁶³

Ji bo “lêkerên biwêjî” tê gotin ku ew “*ji gelek hêmanên ku ne lêker in (daçek, pêşdaçek, paşdaçek, cînavk, rengdêr, navdar) û ji hêmana lêkereke sade yan jî ji ya hevedudanî pêk tî.*”⁶⁴ An jî “*ew ji lêkereke û ji çend hêmanên nelêkerî tî himatê.*”⁶⁵ Bi ya me, ji bo van cure lêkeran, bikaranîna têgiha “lêkerên biwêjî” ne rast e, ji lew re gotina biwêjê bi wateyê re têkildar e. Ji ber ku lêkerên di forma lêkerên hevedudanî de, yên ku ji bêjeyeke esilê navdêrê û ji lêkereke alîkar jî pêk hatine dikarin bikevin nav kategoriya wateya biwêjî. Mîna “*sor bûn*”ê, ku ne bi wateya reng lê bi wateya rewşa ji ber şermê ye. Dîsan lêkera “*bi serî kirin*”ê, ku ne bi mehneya

⁶¹ Türkçe Sözlük, “Birleşik fiil”, Türk Dil Kurumu Yayınları, 11. baskı, Ankara 2011.

⁶² Di beşa lêkerên hevedudanî de dê bi berfirehî li ser vê yekê bê rawestandî û nimûne bîn pêşkêşkirin.

⁶³ Necmettin Hacıeminoğlu, *Türk Dilinde Yapı Bakımından Fiiller*, Bilge Kültür Sanat, İstanbul 2016, r. 299.

⁶⁴ *Bnr.* Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, *h.b.*, r. 190, Mûrad Ciwan, *h.b.*, r. 86, Kadri Yıldırım, *h.b.*, r. 42.

⁶⁵ Rojan Barnas, *h.b.*, r. 2.

tijebûna heta ber dev, lê bi wateya “zewicandin”ê. Ji van ravekirinan, bi awayekî pir zelal diyar dibe ku divê ew û lêkerên hevedudanî ji aliyê binyatî ve, ji hev cihê bin. Loma senifana bi navê “lêkerên biwêjî” senifaneke wateyî (semantîk) tîne bîra mirov ku êdî ew ne di wateya xwe ya rast de lê bi wateyeke din e û ew nabe senifaneke lêkeran a ji aliyê binyatî ye. Eger wek dubare bê gotin; lêkerên biwêjî ne kategoriyeke lêkeran a ji aliyê binyatî ve ye, ew kategoriyeke semantîk e. Jixwe gava ji hêla wateyî ve li ser lêkeran bê rawestandî; a bi awayê wateya rast, wateya layekî û wateya mecazî, ew dibe nêziktêdaneke semantîk a lêkeran. Bi ya me, ji aliyê binyatî ve ew jî ji cureyên lêkerên hevedudanî ne ku bi daçekan çêbûne û ji wan re lêkerên hevedudanî yên bidaçek⁶⁶ û kombêjeyên lêkerî⁶⁷ jî tê gotin.

A dawî jî lêkerên veqetînbar in ku ev cure lêker ji cînavkeke lihevxiştî û ji lêkereke alîkar, an jî ji bêjejeke esilê navdêrê, ji cînavkeke lihevxiştî û lêkerekê, her wisan ji bêjejeke ji esilê navdêrê, ji hêmaneke/amrazeke morfosentaktîkê yên mîna “-î” û “-a”ya⁶⁸ ku bi dawiya cure bêjeje ve dizeliqin û ji lêkerekê pêk tên. Taybetiya van cure lêkerên hanê ew e ku di dema kêşanê de hêmanên cînavkên lihevxiştî li esilê xwe vedigerin û bireser dikeve navbera daçek an jî bêjeja ji esilê navdêr û lêkerê. Ev jî taybetiyeke veqetîner û cadaker e ji lêkerên hevedudanî ku divê ev rewşa wan bi rastî li ber çavan bê girtin.

Divê bê gotin ku di kurmancî de cînavkên lihevxiştî jî du tof in: A pêşîn ji “*jê, lê, pê û tê*”yê pêk tê ku ew tenê ji bo cînavkên tewandî yên kesên sêyem ên yekhejmar (*wî/wê*) û ji bo cînavkên îşarkî (*vî/wî, vê/wê*) tên bikaranîn û ji çûna ser hev a yek ji van cînavkan û ji pêşdaçekekê (*wekî ji, li, bi û di*’yê) çêbûne. Tofa diduyan jî “*jev, lev, pev, tev, jêk, lêk, pêk û têk*” in ku îcar ew jî ji pêşdaçekek (*ji, li, bi û di*) û ji cînavkeke berbihevîn “*hev*” û “*êk*”ê, bi awayê civitîna ser hev, hatine holê. Mebest ji lêkerên veqetînbar ew e ku ew ji cînavkên lihevxiştî yên ji tofa pêşîn çêdibin. Ji lew re ji aliyê binyatî ve di kîjan cureya lêkerê de cînavka lihevxiştî ya ji tofa yekem hebe, bi ya me ew lêkereke veqetînbar e.

⁶⁶ Bi zimanê îngilîzî ji wan re “phrasal verbs” tê gotin û ew di nav lêkerên hevedudanî de cih digirin ku ji du yan jî sê bêjeyan pêk tên. Wek mînak; “look out” (dîqat kirin) , “to keep on” (dewam kirin, domandin).

⁶⁷ Kamiran Bêkes, **Bingehên rêzimana kurdî/zaravê kurmanciya bakur**, Weşanxane?, Osnabrück 2004, r. 211.

⁶⁸ Ev ên hanê di dema pêkhatina lêkerê de ne bi rola gireyê ne jî bi rola veqetandekê radibin.

Piştî van ravekirin û daxuyaniyên li ser pênaseyên ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran, ew ê hîna serî li çend rêzimanên kurmancî bê dan û lêhûrbûnek li ser wan çêbe bê ka zimannas û danerên gramerê yên li ser zaravayê kurmancî ji bo senifana ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran çî mînak dane û çî derpêş kirine. Di pey tiwêjînên li ser berhemên ku bûne mijara xebatê, ew dê di çarçoveya pênaseyan de, ku li jorê li ser cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve hatine kirin, nirxandin bên kirin û raman bên derpêşkirin. Piştî wan îcar dê hewl bê dan da ku ji aliyê binyatî ve senifaneke nû ya cureyên lêkeran were kirin.

1.4. LI GORÎ 11 RÊZIMANÊN KURMANCÎ SENIFANA CUREYÊN LÊKERAN A JI ALIYÊ BINYATÎ VE

Di serî de divê ji hin berhemên li ser zimên û rêzimana zaravayê kurmancî piçekî bê behskirin, da ku ji aliyê me ve ji bo xebatê sûd ji wan bê wergirtin, hatine peyitandin. Ev berhemên ku dê navên wan û danerên wan bên diyarkirin, bi tevahî li nav welêt, li Tirkiyeyê nehatine çapkirin. Hin ji wan li welatên cur bi cur hatine weşandin. Ev lîste bi awayê kronolojîk hat amadekirin ku di nav kevanekê de navê daner, weşanxane, cih û sala çapê hatine aşkerakirin:

Mêtodîka Zmanê Kurmancî (Heciyê Cindî, Neşra hukumeta Ermistanê, Rewan 1932), Awa û Destûra Zimanê Kurdî (Cegerxwîn, Weşanxane?, Bagdad 1961), Destpêka Xwendinê, Rêzana Zmanê Kurdî, perçeyên bijarte (Kamran Bedir-xan, Kamran Bedir-xan, Parîs 1971), Rêzana Zimanê Kurdî (Kamran Bedir-Xan, Weşanxane?, Parîs 1971), Zmanê Kurd Kürt/Dili (K. Bedirxan, S. Şivan, Kava, İstanbul 1976), Rêzman (Torî, Aza, Leuven 1987), Rêzman a ziman ê kurmancî (Reşîd Kurd, Kombenda Kawa; Dar El-katib, Norsborg/Beyrût 1990), Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer (K. A. Bedîrxan, Özgürlük Yolu, Köln 1986), Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer (Kamuran Ali Bedir-xan, Özgürlük Yolu Yayınları, Ankara 1986), Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer (Kamuran Ali Bedir-Xan, Deng, İstanbul 1991), Hêmana Rêzimanê Kurdi (Feqî Huseyn Sağniç, Melsa Yayınları, İstanbul 1991), Gramera Zmanê Kurdi/Kurmanci-Sorani (Qanatê Kurdo, Koral Yayınları, İstanbul 1991), Çend têbîniyên li ser rêzimanê kurdî (Maruf Yilmaz, Jîndan, Stockholm 1991), Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi Kurmanc Lehçesi (Mûrad Ciwan, Jîna Nû, Balinge 1992), Türtçe İzahlı Kürtçe Grameri Kürmançça lehçesi (Kemal Badıllı,

Med Yayınları, İstanbul 1992), Kürtçe Dilbilgisi Türkçe Açıklamalı/Rêzimana Kurdi (A.Bali, Alan Yayıncılık, İstanbul 1992), Zimanê Kurdî/Kürt Dili (Nurettin Karacadağ, Weşanxane?, İstanbul 1993), Dersên Zimanê Kurdi (Baran, Deng, İstanbul 1993), Lêkolînekî Qicik Li Ser Zimên (Beyhani Şahin, Fırat, İstanbul 1995), Kolay Kürtçe (Kamuran Bedir Xan, Doz, İstanbul 1997), Rêzimanê kurdî Kurmancî (Selîm Bîçûk, Weşanên Înstîtûta Kurdî, Berlîn 1997), Kürtçe Dilbilgisi (Emîr Celadet Bedir Xan, & Roger Lescot, 3. baskı, Doz, İstanbul 1997), Zimanê Kurdî Rênivîs (Deham Ebdulfetah, Kawa, Beyrût 1998), Elfabêya Kurdî Bingehên gramera kurdmancî (Celadet Alî Bedir-Xan, Arif Zêrevan (amd), Doz, İstanbul 1998), Waneyên Rêzimana Kurmancî (Samî Tan, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2000), Xulek li ser rêzman a kurdî/A Course in Kurdish Language (Îbrahîm Remezan Zaxoyî, Î. R. Zaxoyî, Dihok 2002), Kürtçe Gramer (Celadet Ali Bedir Han, & Roger Lescot, Wergera ji fransî; li jêr çavdêriya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Avesta, İstanbul 2004), Bingehên rêzimana kurdî/zaravê kurmanciya bakur (Kamiran Bêkes, Weşanxane?, Osnabrück 2004), Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî (Samî Tan, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2005), Cînav di zimanê kurdî de/Kurmanciya Jorîn (Deham Ebdulfettah, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul 2006), Nav di zimanê kurdî de/Kurmanciya Jorîn (Deham Ebdulfettah, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul 2006), Rêzmana kurdî/Kurdish grammar (Îbrahîm Remezan Zaxoyî, Î. R. Zaxoyî, Dihok 2007), Kesandina Lêkerên Kurmancî (Aynur Bozkurt, Weşanên Dozê, İstanbul 2008), Rêzimana Kurmancî (Mikaîl Bilbil & Bahoz Baran, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul 2008), Rêzimana kurdî/Qewaîdu l-luxetî l-kurdiyye (Îbrahîm Remezan Zaxoyî, Spîrêz, Dihok 2008), Dersên Zimanê Kurdî/Türkçe İzahlı Kürtçe Dil Dersleri (Kemal Burkay, Deng, İstanbul 2009), Kurdîzan Rûberîna Zaravên Kurdî (Fêrgîn Melîk Aykoç, Weşanên Enstîtûta Kurdî Ji bo Lêkolîn û Zanist, 1996 Berlîn), Fermo bi Kurdî/Lütfen Kürtçe, kendi kendine öğrenme metodu (Fêrgîn Melîk Aykoç, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2009), Zimanê Kurdî (Azad Zal, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul 2009), Bingehên Gramêra Kurdmancî (Celadet Alî Bedirxan, Avesta, İstanbul 2010), Kêşana Lêkeran bi zaravayê Kurmanci (Brahîm Xelîl Taş, Lîs, İstanbul 2011), Kar (Lêker) di zimanê kurdî de/Kurmanciya Jorîn (Deham Ebdulfettah, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul 2011), Rêzimana

Kurdî/Kurmanciya Jorî û Jêrî ya hevberkirî (Sadiq Bahaeddîn Amêdî, Dîwan, İstanbul 2012), Uygulamalı Kürtçe Dersleri, Dersên Kurdî (Baran Rizgar, 2. Baskî, Doz, İstanbul 2012), Rêzimana Kurmancî (Bahoz Baran, Belkî, İstanbul 2012), Temel Alışırma ve Metinlerle Kürtçe Dilgisi/Kurmancî Lehçesi (Kadri Yıldırım, 2. baskî, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul 2012.), Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî (Çetin Taş, Diwan, İstanbul 2013), Rêzimana fermî (Xazî Elî Xurşîd, Serdem, Silêmanî 2013), Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî (Qanatê Kurdo, Zülküf Ergün (Ji kurdiya Soranî), Nûbihar, İstanbul 2013), Gramera Kurdî/Kürtçe Gramer (Halil Altuğ, Avesta, İstanbul 2013), Ez Kurdî Hîn Dibim/Geçişli Fiiller ve Ergatif (Abdullah İncekan, Nûbihar, İstanbul 2014), Waneyên Rêzimana Kurmancî (Nezîr Ocek, Sîtav, İstanbul 2014), Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî Diyalekt, Alfabe û Fonetik, Morfolojî (Seîd Verroj, Weşanên Ava, İstanbul 2014), Pirsên Rêzimana Kurmancî (Eşref Keydanî, Belkî, İstanbul 2014), Kurdiya Kurmancî/Rêziman (Azîz Samur, Nûbihar, Çapa 2., İstanbul 2014), Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi/Rêzimana Kurdî bi şîrovekirina Tirkî (Mûrad Ciwan, Weşanxane?, Diyarbakır 2014), Rêzimana Kurmancî (Samî Tan, Çapa nûkirî ya 3., Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2015), Kurmanca ile Karşılaştırmalı Kırmanca (Zazaca) Dilbilgisi (M. Malmisanij, Vate, İstanbul 2015), Rêziman û Peyvsaziya Kurdî (Abdurrahman Bakir, Aram, İstanbul 2015), Zimanê Kurdî (Azad Zal, Weşanên J&J, Çapa 2. İstanbul 2015), Kendi Kendine Kürtçe Öğren/Kurmanci Lehçesi I, (Mevlut Aykoç, Weşanên Ar, İstanbul 2015), Rêzimana Destî /Zaravayê Kurmancî (Mevlut Aykoç, Weşanên Ar, İstanbul 2016) û Pirtûka Rêziman Zaravayê Kurmancî (Subhî Ahmed, Most, sal?..).

Di dema lêkolîna li ser “Ji aliyê binyatî ve lêkerên kurmancî” de, veshîkirinek li weşanên mîna kovar û gotaran jî hat kirin. Mîna hemû hejmarên Zendê (weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, ku di warê zimanê kurdî, nemaze zaravayê kurmancî de gotarên girîng tê de hene), kovara Nûbiharê û xebata Newzad Hirorî ya bi navê “Bibliografiya nivîsarên li ser zimanê kurdî” (nefel.com, pdf). Her wisan berhema Yusif Diyadîn Paşa ku di destpêka ferhenga wî de li ser rêzimana kurmancî hin agahî hene (Ferhenga Hemîdî Kurdî-Kurdî, Yusif Diyadîn Paşa, Amadekar û wergêr: Jan Dost, Weşanên Dara, İstanbul 2017), gotara Ayhan Geverî ya bi navê “Sê tabloyên

Ebdurrehîm Rehmî Hekarî yê Derheq Kêşana Lêkerên Kurdî” (Derwaze/Kovara Kurdî ya Zanistên Civakî û Mirovî, h.1. s. 2017, r. 148-155) jî ji bo xebatê hatin vekolan. Di van berhemana de em leqayî mijara lêkeran a ji aliyê binyatî ve nehatin ku bi awayekî hewcedar ji babetê hatibe behskirin.

Ji keresteyên berdest, ên ku ji bo xebatê hatibûn peydakirin, ji ber hewce pê hat dîtin ku tenê di çarçoveya “ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran” mijar were sînordarkirin, berhemên wekî yê li ser kêşana deman a zaravayê kurmancî û berhemên ji bo fêkirina kurmancî li derveyî lêkolînê hatin hiştin. Çendî di wan de mijara eleqedar bi awayekî kurt û serkî hebû jî, ya çêtir ew bû ku tenê serî li rêzimanan bê dan, ku jixwe di rêzimanan de agahiyên der barê mijarê de têra xwe hebûn. Îcar ji ber ku peydakirin û bidestxistina hemû berhemana ne gengaz bû (wekî Metodîka Zmanê Kurmancî ya Hecîyê Cindî, Awa û destûra zimanê Kurdî ya Cegerxwîn, Zmanê Kurd/Kürt Dili ya K. Bedirxan, S. Şivan û Rêzman a Torî), der barê hîlbijartina berhemana de, ji neçarî serî li hin pîvaneyan hat dan. Wekî pîvaneya weşandina wan a li Tirkiyeyê, li welêt, li gorî sala wan a çapê, bandora wan a li axêverên civata zimanî, bikaranîna van berhemana di dam û dezgehana de, hebûna têkiliya wekî nîşandana lêkera alîkar a wek cureyekî ji lêkerên binyatî, dariştina lêkeran a bi morfema /-t/yê, rewşa kêşandî ji bo cureyên lêkeran a ji aliyê binyatî ve wek nimûne nîşandana lêkeran, dîsan ji bo vê yekê di rewşa rayeka dema borî de destnîşankirina lêkeran û hwd). Bandora devoka herêmî ya li wan berhemana jî li ber çav hat girtin, ku qet nebe ji hêla dayîna lêkerên nimûneyî ya di rewşa raderî de tesîra vê yekê tê dîtin. Mîna nîşandana rewşa raderî bi şeweya “*bûn*” û “*bûyîn*”, “*çûn*” û “*çûyîn*”, “*daleqîn*” û “*daliqîn*”, “*jîn*” û “*jiyan*” û hwd. Pîvaneya din jî ew bû ku diviya di berhemana de bi awayekî berfireh an jî bi awayekî pêwîst ji mijara “ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran” hatibûya behskirin. Ji ber van pîvaneyên amajepêkirî, ji lîsteya berhemên li ser rêzimanên kurdî yê li jorê, 11 berhemên li jêrê hatin vavartin û xebat bi wan hat vesînorkirin:

Türkçe izahlı Kürtçe Grameri (Kamuran Ali Bedir-Xan, Weşanên Deng, İstanbul 1991), Hêmana Rêzimanê Kurdî (Feqî Huseyn Sağnıç, Melsa Yayınları, İstanbul 1991), Gramera Zmanê Kurdî Kurmancî-Sorani (Qanatê Kurdo, Koral

Yayınları, İstanbul 1991), Türtçe İzahlı Kürtçe Grameri Kürmançça lehçesi (Kemal Badıllı, Med Yayınları, İstanbul 1992), Kürtçe Dilbilgisi Türkçe Açıklamalı Rêzimana Kurdi (A.Bali, Alan Yayıncılık, İstanbul 1992), Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi Kurmanc Lehçesi (Mûrad Ciwan⁶⁹, Weşanên Jîna Nû, Balinge 1992), Kürtçe Gramer (Celadet Ali Bedir Han, & Roger Lescot, Wergera ji fransî; li jêr çavdêriya Enstîtuya Kurdî ya Parisê, Avesta, İstanbul 2004), Rêzimana Kurmancî (Bahoz Baran, Belkî, İstanbul 2012), Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilgisi Kurmancî Lehçesi (Kadri Yıldırım, 2. baskı, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul 2012), Gramera Kurdi/Kürtçe Gramer (Halil Altuğ, Avesta, İstanbul 2013), Rêzimana Kurmancî, (Samî Tan, Çapa nûkirî ya 3., Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2015).

Di van berheman de kesên ku li ser zaravayê kurmancî rêziman amade kirine, wan ji aliyê binyatî ve cih daye cureyên lêkeran, ku hinekan bi dorfirehî û hinekan jî hîn kurttir ji dabaşê behs kiriye. Lê senifan û mînakên ku ji bo senifanê hatine dayîn, hev nagirin û bi hev re nakokdar in. Loma di bin vî sernavî de hewl dê were dan ku ev berhemên hîlbijartî ji aliyê binyatî ya cureyên lêkeran ve bînen vekolan û bi hûrbînî li ser wan bê sekinandin. Lê bêyî dest li rastnivîsa danerên berheman bê gerandin, dê tenê nimûneyên wan bînen hildan, ku jixwe kêşeyeke din jî mijara vekîtê (rastnivîsînê) ya van cureyên lêkeran e. Ji ber ku niha ya girîng polînkirina cureyên lêkeran û terîfa wan e, dê bi tenê ji vî aliyê ve bal ji hêla binyatî ve li senifana cureyên lêkeran bê kêşandin û ji aliyê rastnivîsînê ve jî dê têkilî bi jêgiranên ku wek mînak ji berheman hatine veguhastin, neyê kirin. Ev rêgez dê ji bo hemû jêgiranên ji berheman wisan be. Çendî ji bo dêhnkêşana ser mijara rastnivîsîna lêkerên mînak, bal pê were dan jî, dê paşê jixwe beşeke serbixwe ji bo mijara rastnivîsîna van cureyên lêkeran bi awayekî hîn berfirehtir û bikitekit bê veqetandin. Ev çend berhemên ku ji xebatê re bûne çavkanî, dê ne navên danerên wan lê navên wan bi xwe bînen dan û bi wî awayî dê ji bo derpeşkirina têbîniyan lêhûrbûnek li wan bê kirin.

⁶⁹ Ev berhema Mûrad Ciwan, piştê bi navê “Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi, Rêzimana Kurdi Bi şîrovekirina Tirkî, di sala 2014’an de li Amedê hatiye çapkirin ku Weşanxane ne diyar e. Ji ber ku mijarên eleqedar eynî bûn, me çapa Balingeyê ji bo xebata xwe tercih kir.

1.4.1. Kûrtçe Gramer

Di serî de hewce dike ku ji pîr û bavê kurdiya nûjen, ji hîmdarê alfabeya kurdî ya latînî ya di rewacê de û ji vekîta kurdî ya bi vê alfabeyê, ji Celadet Bedirxan⁷⁰ dest bê kirin ku ji bo rêzimana kurdî, nemaze ji bo zaravayê kurmançî xebatên wî hem girîng in hem jî ji aliyê xebatên nûjen ên li ser kurmançî ve ew kesê pêşeng e. Di gel ku di hin warê rêziman û rastnivîsîna kurmançî de, zimannas û rêzimanasên kurd ji xebat û ramanên wî hinek averê bûbin jî (wekî mijara hejmarê cureyên bêjeyan, nenivîsîna gireya dema bê ya bi cînavkê ve, bi lêkerê ve nivîsîna gireya/morfema neyîniyê /ne-/, di dema boriya çîrokî de bi lêkerê ve nivîsîna /-bû/yê, bikarneanîna hin çemkên wî û awayê vekîta hin bêjeyan), ew ji gelek kesên peyhatiyên xwe re, ji aliyê ramanên xwe yê li ser zimanê kurdî bûye rêber û rênîşander, her wisan xebatên wî bi xwe jî, ji bo wan kesan bûne çavkanî, jêderk û referans.

Ev berhema hanê ya pêşîn, xebateke hevpar a Celadet Bedirxan⁷¹ û Roger Lescot e. Di vê berhemê de hatiye diyarkirin ku di kurdî de ji bilî lêkerên xwerû û hevedudanî, lêkerên biwêjî jî hene.⁷² Ji bo lêkerên xwerû mînakên wekî “*hatin, xistin, xwarin, kirin, anîn, dan*”, ji bo lêkerên hevedudanî nimûneyên mîna “*dahatin, pêxistin, vexwarin, deranîn, bazdan, ava kirin*” û ji bo “lêkerên biwêjî” jî mînakên nolî “*li hev hatin, tê derêxistin, bi lêv kirin, ber hev kirin*” hatine dayîn.⁷³

Di vê berhemê de, di bin sernavê Lêkerên hevedudanî de bi şêweyê berfireh bal li van cure lêkeran hatiye kêşan û hatiye daxuyandin ku lêkerên hevedudanî “*ji hêmaneke ku ne lêker e (navdêr, rengdêr, daçek, hoker û hwd.) û ji hêmana lêkerê (bi giştî lêkerekê alîkar) pêk tê.*”⁷⁴ Piştî jî lêkerên hevedudanî li du koman hatine dabeşkirin. Ji bo koma yekem ev terîf hatiye kirin: “*Ev lêker, bi zeliqîna hêmaneke*

⁷⁰ Wekî tê zanîn alfabeya kurdî ya latînî cara pêşîn li Sovyetên berê ji aliyê Erebe Şemo û Îsahak Marogûlov ve (sala 1928’an) hatiye amadekirin, lê piştî ew ji aliyê Stalîn ve hatiye qedexekirin. Alfabeya Celadet Bedirxan bi weşandina kovara Hawarê (15 Gulan 1932) re hatiye bikaranîn. Loma bikaranîna vê tebîrê ji bo wî ji aliyê me ve minasib hat dîtin.

⁷¹ Her çendî ev xebat bi navê wî û Roger Lescot e jî, giraniya berhemê ya Celadet Bedirxan e, ku jixwe Lescot di pêşeka xwe ya vê berhemê de vê yekê aşkera dike.

⁷² Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, *h.b.*, r. 119.

⁷³ Ji bo agahiyên bikitekit ên li ser mijarê *bnr. h.b.*, r. 119-120.

⁷⁴ *h.b.*, r. 182.

*ne lêker a bi raderê çêdibin. Hêmanên ku lêker û ne lêker in, wek bêjeyekê tenê tên nivîsandin.*⁷⁵ Koma yekem a lêkerên hevedudanî li sê binbeşan hatiye levakirin:

I) Bi pêşgirên xwerû; di vê binbeşê de lêkerên mîna “*rabûn, rakirin, vexwarin, dagirtin, hilgirtin, hilatin (hilhatin), vekirin û vexwandin*” hatine dayîn ku ew bi gireyên wekî /*da-*/, /*hil-*/, /*ra-*/ û /*ve-/yê* hatine piraştin. Ji bo van cure lêkeran hatiye gotin ku ew bi pêşgirên xwerû çêdibin.

II) Bi pêşgireke hevedudanî; di binbeşa duyem de jî ji bo lêkerên ku ji cînavkên lihevxiştî hatine çêkirin, wek mînak ev hatine pêşkêşkirin: *lêxistin, pêketin, jêkirin*.

III) Bi navdêr an jî bi rengdêra ku bi peywira pêşgirê radibe; ji bo binbeşa sêyem jî lêkerên mînak ên ku hatine dayîn ev in: *rêkirin, girêdan, çêbûn û çêkirin*.⁷⁶

Ji bo koma duyem a bi navê lêkerên hevedudanî, nimûneyên “*limêj kirin, hazir kirin, ava kirin, tijî kirin, vala kirin, pîr bûn, qaîl bûn, av dan, guh dan û mukir hatin*” hatine nîşandan û pênaseya wan jî bi şêweya “*ev lêkerên ku ji berê ve pir tên bikaranîn, ji navdêr an ji rengdêr û raderekê çêdibin*” hatiye kirin û her wisan der barê rastnivîsîna van cure lêkeran de jî hatiye diyarkirin ku ew wek lêker ji hev cuda û wek navdêr jî bi hev ve tên nivîsandin.⁷⁷

Bi navê “*lêkerên biwêjî*” jî di xebatê de beşek hatiye veqetandin. Ji bo pênaseya wan jî hatiye gotin ku “*... lêkerên biwêjî ji gelek hêmanên ku ne lêker in (daçek, pêşdaçek, paşdaçek, cînavk, rengdêr, navdêr) û ji hêmana lêkereke sade yan jî ji ya hevedudanî pêk tên*”⁷⁸ û ew wek lêkerên biwêjî yên têper û têneper hatine senifandin. Bêyî ketina nav kitekitan, dê bi tenê çend mînakên ku ew ji bo yên têper û têneper hatine nîşandan werin pêşkêşkirin: *bin av bûn, li hev hatin, bi hev ketin, lê geriyan, bi rê ketin, ji hev danîn, dev jê berdan, dest pê kirin, ji bîr rakirin, berê xwe*

⁷⁵ *h.b.*, r. 182.

⁷⁶ *h.b.*, r. 182-183. Me bi zanebûn dest neda awayê rastnivîsîna mînakên, heta ji bo vê yekê me serî li heman berhema wan da ku ew ji nav Weşanên Dozê derketiye. *Bnr.* Emîr Celadet Bedir Xan & Roger Lescot, **Kürtçe Dilbilgisi**, 3. baskî, Weşanên Dozê, İstanbul 1997, r. 176.

⁷⁷ Ji bo zanyariyên berfirehtir ên vê mijarê *bnr.* Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, **Kürtçe Gramer**, Avesta, 2. Baskî (Wergera ji Fransî; li jêr çavdêriya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê), İstanbul 2004, r. 183-184.

⁷⁸ *h.b.*, r. 190.

*dan, dest dan hev, xwe dan revê û hatin ser xwe.*⁷⁹ Der barê vekîta “lêkerên biwêjî” de hatiye aşkerakirin ku gava tenê wek navdar tên bikaranîn, mîna peyvekê bi hev û din ve tên nivîsandin.⁸⁰

Eger bi awayekî kurtasî bê gotin; li gorî Celadet Bedirxan, di kurmancî de ji aliyê binyatî ve sê cure lêker hene: Lêkerên xwerû, lêkerên hevedudanî (ku ew jî di nav xwe de sê kom in) û lêkerên biwêjî (yên têper û yên têneper).

Di vê berhemê de, senifana lêkeran a ji aliyê binyatî ve ku divê bi zêdehî bal lê were kêşan, beşa lêkerên hevedudanî û ya “lêkerên biwêjî” ne. Der barê lêkerên sade de hem ji hêla pênaseyê ve hem jî ji hêla dayîna mînakên lêkeran ve gelş nîn e. Eger cardin bê gotin; kêşeya herî zêde di warê senifana lêkerên hevedudanî de heye ku ji hêla danerên berhemê ve ew li du koman hatine dabeşandin û koma yekem jî li sê binbeşan hatiye parevekirin. Bi ya me ev polîn û terîfên wan hewceyî nirxandinê ne. Wekî çawan koma yekem a lêkerên hevedudanî di bin sê binbeşan de hatiye nimandin, eynî wisan pêwîstî pê tê dîtîn ku dîsan di bin navên wan her sê binbeşan de ew bîna vekolan. Lê beriya wan ji ber ku ji lêkerên li jêrê re jî, lêkerên hevedudanî hatiye gotin, hewce bi ravekirina wan heye: *dahatin, pêxistin, vexwarin, deranîn, bazdan, ava kirin*. Ji van, ji bilî “*baz dan*” (ku bi awayê “*bazdan*” hatiye rapêşkirin û li gorî rêzikê diviya wek rewşa raderî ya lêkerê ew jev cuda bûna) û “*ava kirin*”ê, lêkerên din ne lêkerên hevedudanî ne. Lêkerên “*dahatin*”, “*vexwarin*” û “*deranîn*” lêkerên dariştî yên bi pêşgiran û “*pê xistin*” jî lêkerekê veqetînbare e ku ji cînavka lihevxiştî ya tofa yekem û ji lêkerekê alîkar a xwerû çêbûye.

I) Lêkerên mîna “*rabûn, rakirin, vexwarin, dagirtin, hilgirtin, hilatin (hilhatin), vekirin û vexwandin*”ê wek lêkerên ku bi “pêşgîrên xwerû” (mîna /*da-*/, /*hil-*/, /*ra-*/ û /*ve-*/) pêk hatine, hatine nîşandan. Divê di serî de bê gotin ku bi van hinek pêşgiran hem ji lêkerên xwerû lêkerên dariştî hem jî ji cureyên navdêran peyvên dariştî tên çêkirin; wekî “*derpê, radest, raçav, vebîr, werçerx*”ê. Rast e, ev lêkerên ku wek mînak hatine derpêşkirin “bi zeliqîna hêmaneke ne lêker a bi raderê” ve çêbûne û “hêmanên ku lêker û ne lêker in, wek bêjeyekê” divê bi hev ve bîna nivîsandin. Îcar ji ber ku pênaseya lêkerên hevedudanî bi awayê “*ew cure lêker in ku bi alîkariya*

⁷⁹ *h.b.*, r. 190-191.

⁸⁰ *h.b.*, r. 192.

lêkerên alîkar, bi piranî ji navdêr û rengdêran, ango bi bêjeyên ji esilê navdêran hatine çêkirin” e, nabe mirov ji van cureyên lêkerên ku dabaş li ser wan e, bibêje lêkerên hevedudanî. Ew lêkerên dariştî ne ku ji pêşgiran hatine piraştin û jixwe pêşgir, ne ji bêjeyên esilê navdêran in.

II) Lêkerên ku bi “pêşgireke hevedudanî” hatine çêkirin; wek mînak *lêxistin, pêketin, pêxistin* û *jêkirin*. Mebest ji “pêşgira hevedudanî” jî cînavkên lihevxiştî yên ji koma yekem in, ku di xebatê de hatiye daxuyandin ew ji daçekê û cînavkekê hatine pê. Nexwe nabe ji wan re jî tenê “pêşgira hevedudanî” bê gotin û nabe ev cure lêker wek lêkerên hevedudanî bîn hesibandin. Ji ber ku çendî ew ji daçek û cînavkekê hatibin pê jî, êdî ew bi erk û fonksiyoneke din radibin. Loma jî ew lêkerên welê ne ku ji cînavkên lihevxiştî hatine bidestxistin û di dema kêşanê de hêmanên wan ji hev dibin, ango ew li esilên xwe vedigerin û tiştayeke (biresereke) neyekser dikeve navbera daçek û lêkerê. Ji bo nimûne, lêkera “*lê xistin*”ê di dema kêşanê de, wekî di van kurtehevokan de, “*li sazê dixê*”, “*li wî/wê dixist*” û “*lê xist*” tê dîtin, “*lê*”ya wê ya wek “paşgir”ê dixuye, li daçeka “*lî*”yê û li cînavka kesê sêyem a tewandî ya yekhejmar (wekî *wî/wê*) dadigere. Ji lew re ew lêkerên ku bi cînavkên lihevxiştî hatine dariştin, ji aliyê me ve wek cureyekî “lêkerên veqetînbar” tên binavkirin (ku dê di Beşa Duyem de bi awayekî bikitekit ev mijar bê vekolan û dê ravekirinên pêwîst li ser wan bîn kirin).

III) Ji bo lêkerên bi navdêr an jî bi rengdêra ku bi peywira pêşgirê radibe, mînakên hatine pêşkêşkirin ev in: *rêkirin, girêdan, çêbûn* û *çêkirin*. Divê careke din bi bîr bê xistin ku bêtî dest li rastnivîsa wan hatibe gerandin, mînak ji berhemê hatine veguhastin. Bi raya me, ev nimûne dikevin nav kategoriya lêkerên hevedudanî, ku di berhemê de, di koma duyem a lêkerên hevedudanî de hatine derpêşkirin û hem jî bo wan lêkerên nimûneyî (yên wekî *limêj kirin, hazir kirin, tijî kirin*) hatine pêşkêşkirin hem jî der barê awayê vekîta wan de daxuyanî hatiye kirin. Hatiye aşkerakirin ku “*ji navdêr an ji rengdêr û raderekê çêdibin*” û wek lêker ji hev cuda û wek navdêr jî bi hev ve tên nivîsandin. Li gorî vê pênaseyê, rêgez û awayê dayîna hin lêkerên hevedudanî (wekî “*tijî kirin*”ê) hewce ye hemû lêkerên hevedudanî di rewşa raderî de mîna “*av dan, baz dan, bi rê kirin* û *girê dan*”ê bîn nivîsandin. Ji ber di lêkerên nimûneyî de “*girê*” û “*baz*” navdêr in, pêwîst e di rewşa

raderî ya lêkerê de ji lêkera alîkar cihê bên nivîsandin. Herçî “*rêkirin*” e, ya rast ew jî divê bi awayê “*bi rê kirin*”ê be ku ew jî lêkereke hevedudanî ye. Awarteya “*çêbûn*” û “*çêkirin*”ê jî ev e ku çendî wek rêgez (prensîb) ew lêkerên hevedudanî bin jî, lê gava “*çê*”, ku ew rengdêr e, ji lêkera alîkar cuda bê nivîsandin wateyeke din ji lêkerê diçe û ew dikeve rewşa kêşana bêjeyên ji esilê navdêran. Wekî “*xwarina wan çêbû*” û “*xwarina wan çê bû*.” Wek rewşeke awarte, da ku wate tevî hev nebin, nivîsîna bi hev ve ya lêkerên “*çêbûn*” û “*çêkirin*”ê terciheke di cih de ye, di gel ku hin kes birijd (biisrar) dixwazin wek rêzika gelemper a lêkerên alîkar, wan ji lêkera alîkar cihê binivîsin.⁸¹

Di beşa “lêkerên biwêjî” de, ev mînak hatine dayîn: *berê xwe dan*, *ber hev kirin*, *bi hev ketin*, *bi lêv kirin*, *bin av bûn*, *bi rê ketin*, *dest dan hev*, *dest pê kirin*, *dev jê berdan*, *hatin ser xwe*, *ji bîr rakirin*, *ji hev danîn*, *lê geriyên*, *li hev hatin*, *tê derêxistin* û *xwe dan revê*. Ji van mînan “*tê derêxistin*”, “*lê geriyên*”, “*dest pê kirin*” û “*dev jê berdan*” lêkerên veqetînbare in û ew bi cînavkên lihevxiştî yê *jê*, *lê*, *pê* û *tê* yê çêbûne. Nnimûneyên “*berê xwe dan*”, “*dest dan hev*”, “*hatin ser xwe*” û “*xwe dan revê*” ji aliyê binyatî ve nakevin nav tu kategoriyê û ew kombêje û qalibên vegotinê ne. Di dema ristesaziyê (sentaksê) de gava li hêmanên risteyê (hevokê) bê mêzandin dê bê dîtî ku ew hemû hêman bi hev re lêkerê pêk nayînin û hêmanên ji bilî lêkerê yê din dibin hoker an jî tişte (obje). Lê ji bo ku ew gişt wek lêker bên dîtî, hewce ye ew pevne bibin pêveber. Her wiha, çaxa ew hêman tev pêkhênerên lêkerê bin pêwîst e ku wek navdêr pêkve bên nivîsandin, lê belê ev yek jî çênabe. Wek mînak: *dest dana hev* (ne *destdanhev*), *hatina ser xwe* (ne *hatinserxwe*), *xwe dana revê* (ne *xwedanrevê*) û ya din jî *dana berê xwe* (ne *berêxwedan*) ye. Eger bi awayekî giştî ravekirinek li ser şeweya rastnivîsîna lêkeran a di rewşa navdêrî de bê kirin: Der barê awayê rastnivîsîna navdêrî ya lêkerên xwerû û ya lêkerên dariştî (çi bi pêşgiran çi jî bi paşgiran) de, lihevkirineke giştî heye. Ji bilî çend awarteyan a li ser lêkerên dariştî yê bi pêşgiran her kes pêşgiran bi lêkerê ve dinivîsîn, lê ya ku kêşedar e lêkerên hevedudanî û yê “biwêjî” ne ku ya dawiyê (lêkerên biwêjî) ji aliyê me ve, ji bo mînakên “ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran” nayê pejirandin. Ji

⁸¹ Wek mînak, lêkera “çêkirin”ê di hevoka “Li gor bûka ku em dixwazin çê bikin...” de, ji hev cuda hatiye bikaranîn. *Bnr.* Ridwan Dîzman, “Bûk, bûka Ûzerlikê”, **Folklor a Kurdan**, h. 1, Weşana Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, Îstanbul 2015, r. 52-53.

ber ku ew ji aliyê wateyî ve dikevin nav kategoriya biwêjan, ne ji aliyê binyatî ve. Herçî lêkerên hevedudanî ne, hemû hêmanên wan di wexta sazkirina risteyê de dibin pêveber û wek navdêr jî gişt hêmanên pêkhêner ên lêkerê bi hev ve tên nivîsandin.⁸²

Mînakên din, ên ku mane jî tevde ji aliyê binyatî ve dikevin nav senifana lêkerên hevedudanî. Lê hewce bi rawestandina li ser rastnivîsîna “*ji bîr rakirin*”ê heye. Di zimanê devkî de ji bo lêkera “*ji bîr kirin*” awayê “*ji bîra kirin*” jî tê bikaranîn. Lê ne di zimanê devkî ne jî di çavkaniyeke nivîskî de em leqayî şeweya bikaranîna mîna “*ji bîr rakirin*”ê nehatine. Loma nabe ew wek “*ji bîr rakirin*” bê pejirandin. Mînaka din jî “*tê derêxistin*” e, ku ji aliyê rastnivîsê ve cînavka lihevxiştî (*tê*) ji lêkera dariştî “*derêxistin*”ê cuda hatiye nivîsandin. Ev lêkera dabaş li ser e, wek mînak di devoka Hekariyê de wisan e û awayê wê yê zêde berbelav jî “*tê derxistin*” e, ku ew jî dikeve nav polîna lêkerên ji cînavkên lihevxiştî hatine pê; wekî “*lê xistin, pê ketin, pê xistin û jê kirin*”ê. Çawan li jorê îşaret pê hat dan, ji ber ew ê di mijara lêkerên veqetînbare de, bi dorfirehî û bi hûrgilî ji wan bê qalkirin, niha tenê qîm pê tê anîn ku bê diyarkirin ew ji lêkerên veqetînbare in.

1.4.2. Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer

Ev berhem a Dr. Kamûran Alî Bedirxan e ku tê de bi awayekî xulase li ser rêzimana zaravayê kurmançî hatiye sekinandin. Di xebatê de bi kurtasî cih ji mijara lêkeran re jî hatiye veqetandin û ji hêla binyatî ve (d’après leur structure) lêker li çar beşan hatine dabeşandin. Wekî lêkerên alîkar, lêkerên xwerû, lêkerên hevedudanî û lêkerên biwêjî.⁸³

Lêkerên alîkar li du biran hatine parîkirin û hatiye aşkerakirin ku ew hem ji bo diyarkirina raweyên hevedudanî dibin alîkar (mîna *bûn, kirin, dan, hatin*)⁸⁴ hem jî ji bo çêkirina lêkerên hevedudanî dibin alîkar (nolî lêkerên *hatin, dan, kirin*).⁸⁵ Ji bo lêkerên xwerû jî hin mînak hatine dan, ku hin ji wan ev in: *dan, bûn, hebûn, kirin,*

⁸² Ji niha bi şûn de, dê wiha bi berfirehî ravekirin li ser van cure lêkeran neyê kirin, dê tenê qîm bi dana agahiyên pêwîst bê anîn û sedema nelêkerbûna wan bê aşkerakirin.

⁸³ Kamuran Ali Bedir-Xan, *h.b.*, r. 39.

⁸⁴ Divê bê diyarkirin ku Weşanxaneya Dengê bi taybetî herfên alfabeya kurdî “î” û “î”yê bi zanebûn wekî alfabeya tirkî bi awayê “i” û “i”yê dane. Lê em ew li gorî alfabeya Celadet Bedirxan guhartin û ji niha pê ve jî dê jêgiranên ji vê berhemê li gorî vê yekê bînin dayîn.

⁸⁵ *h.b.*, r. 39.

*anîn, avêtin, hatin û ketin.*⁸⁶ Herçî lêkerên hevedudanî ne, ji aliyê daner ve hatiye daxuyandin ku ew bi alîkariya lêkerên xwerû pêk tên û du tof in. Lêkerên koma yekem ji pêşgirek (*ra-, ve-, hil-, da-, ber-, der-, vê-, wer-, rû-*) û ji lêkereke xwerû tên pê. Ji bo vê komê çend nimûne: *rakirin, hilkirin, derkirin, rêkirin, vebûn, çêbûn, dadan, berdan, girêdan, werhatin, vexwarin, vêketin.* Ji bo koma duyem jî, hatiye ravekirin ku ew lêker ji rengdêrekê yan jî ji navdêrekê û ji lêkereke xwerû bi dest dikevin. Da ku qenaetek çêbe, çend libên ji nav mînakên derpêşkirî hatine hilbijartin, ev in: *ava kirin, nas kirin, rast kirin, dan pey.*⁸⁷ Li gorî vê xebata navborî, beşa dawî ya ji aliyê binyatî ve “lêkerên biwêjî” ne û ji aliyê Kamuran Bedirxan ve bi zimanê fringsawî ji wan re “locutions verbale” hatiye gotin. Ev cure lekêr jî wek du tof hatine nîşandan: I) Lêkerên ku ji daçekeke xwerû yan jî hevedudanî û ji lêkerekê, II) lêkerên ku ji daçekeke xwerû yan jî hevedudanî, ji lêkerekê û ji rengdêrekê yan jî ji navdêrekê çêdibin. Di pey pênaseyê re jî lêkerên nimûneyî hatine pêşkêşkirin. Ji bo zelaliya mijarê ev lêkerên li jêrê ji nav wan hatin bijartin: *lê ketin, lê xistin, jê geriyan, li hev anîn, jê hez kirin, ji bîra kirin, dest pê kirin, ser jê kirin, anîn ber çav, lê siwar bûn û jê peya bûn.*⁸⁸

Wekî tê dîtin, li gorî danerê berhemê, ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran çar tof in û lêkerên alîkar jî (ku ew li du cureyan hatine dabeşandin) di nav senefanê de hatine dayîn. Divê hema di destpêkê de bê gotin ku lêkerên alîkar ji aliyê binyatî ve nakevin nav tu polînê. Çawan nav li ser e, ew ji bo pêkanîna lêkerên hevedudanî, ji bo kêşana bêjeyên ji esilê navdêran tên bikaranîn û bi erka alîkariyê radibin. Loma “lêkerên alîkar” nabe ji aliyê binyatî ve wek cureyên lêkeran bîr hesabandin.

Di nav lêkerên xwerû de lêkera “*hebûn*”ê jî wek mînak hatiye nîşandan, lê divê bê gotin ku di rastiya xwe de ew ne lêkereke sade ye, ew ji “*he*” û ji lêkera alîkar “*bûn*”ê hatiye pê. Berginda wê ya di zaravayê kirmanckî de jî “*estene*”⁸⁹ ye ku forma wê ya bi awayê “*estbîyene*”⁹⁰ jî heye. Di gel vê yekê, di zimanê farisî de jî awayên

⁸⁶ *h.b.*, r. 46.

⁸⁷ *h.b.*, r. 47-48.

⁸⁸ *h.b.*, r. 48-49.

⁸⁹ Grûba Xebate ya Vateyî, **Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî**, “Estene I”, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2016.

⁹⁰ Çeko Kocadağ, **Ferheng Kirmanckî (zazkî) - Kurmancî, Kurmancî - Kirmanckî (zazakî)**, “hebûn”, Weşanên Komkar, Berlîn 2010.

wê yê “*hesten*”, “*hest kerdên*” û “*hest ameden*”⁹¹ hene. Ji van mînanan, ango bi saya berawirdkirina kurmancî bi kirmanckî û dîsan kurmancî bi zimanê farisî, pir xweş xuya dibe ku “*hebûn*” ne lêkereke xwerû ye û bi qonaxa demê re her du dengdarên dawîn /-st/ ji dawiya “*he*”ya kurmancî ketine. Ev ketina deng a ji dawiya bêjeyê ye.

Elbet bi rêbazên senkronîk û diyakronîk, her wiha bi azîna berawirdî ya di navbera zimanên heman kom û malbatê, heta bi ya zaravayên heman zimanî de guherîna dengan, ketina dengan û ketina kêteyan dikare bi vebirî bîn tespîtîkirin. Di zaravayê kurmancî de meseleya ji bêjeyê ketina dengan û heta ya kêteyê jî heye. Wekî ketina kêteya pêşîn a ji van bêjeyan: *hejar* û *jar*, *hejmar* û *jimar*, *hêşîn* û *şîn*, *şîkestin* û *keştin*. Ji navê ketina kêteyê, wekî *hilweşandin* û *hilşandin*, *malnivînk* û *malvînk*, dîsan ji paşiyê ketina kêteyê *çûndin* û *çûn*, *jîndin* û *jîn*. Ji bilî vê ketina dengê paşî yê ji bêjeyê heye. Mîna van nimûneyan: *pir* û *pir*, *bend* û *ben*, *guneh* û *gune*, *roj* û *ro*.

Lêkera “*hebûn*”ê, çendî lêkereke hevedudanî be jî, li derî rêzika giştî ya lêkerên hevedudanî, bi awayekî awarte bi piranî hem wek lêker hem jî wek navdêr beşên wê pevve tî nivîsandin.

Lêkerên hevedudanî di bin du jênavan de hatine senifandin û ji bo jênavê yekem lêkerên wekî “*rakirin*, *hilkirin*, *derkîrin*, *rêkîrin*, *vebûn*, *çêbûn*, *dadan*, *berdan*, *girêdan*, *werhatin*, *vexwarin*, *vêketin*”ê û ji bo jênavê duyem jî lêkerên wekî “*ava kirin*, *nas kirin*, *rast kirin*, *dan pey*” mîna nimûne hatine nîşandan. Ji nav koma yekem, lêkerên “*rakirin*, *hilkirin*, *derkîrin*, *vebûn*, *dadan*, *berdan*,⁹² *werhatin* û *vexwarin*”ê, lêkerên dariştî ne ku bi pêşgiran hatine piraştin, herçî lêkerên “*çêbûn*”⁹³ û *girêdan*”ê, lêkerên hevedudanî ne, ku ew ji bêjeyê esilê navdêrê û ji lêkereke alîkar çêbûne. “*Rêkîrin*”, lêkereke hevedudanî ye ku bi daçekê çêbûye û şeweya wê ya eslî

⁹¹ Mehmet Kanar, **Büyük Sözlük Türkçe Farsça**, “Var olmak”, Birikim Yayınları, İstanbul 2008.

⁹² Ev /ber-/a di lêkera “*berdan*”ê de pêşgir e ku ji bilî lêkerên “*berhelistin*” û “*berketin/berkeftin*”ê em rastî mînakên din nehatine. Di devokên herêmên Tor û Hakarî/Behdînan de, ji awayê devokên din ên kurmancî cuda, qertafên neyîniyê û hinên deman tî serê lêkera dariştî. Wekî “*naberdin*” û “*divexwim*”. Ji şeweya bikaranîna “*naberdin*”ê dixuye ku /ber-/ pêşgir e. Li gel vê yekê, divê bê xuyakirin ku di zimanê farisî de jî /ber-/ pêşgir e û pê lêkerên dariştî tî çêkirin (wek “*bergeştin*”). Her wisan, em dizanin bi /ber-/a ku bi wateya “*pêş*” û “*pêşî*” ye, di kurmancî de lêkerên hevedudanî yê wekî “*berasteng bûn*”, “*berbelav kirin*”, “*berbend bûn*” û bêjeyên dariştî û yê hevedudanî yê mîna “*berdestîk*”, “*bermirad*”, “*berzewac*”, “*berguman*” û “*bersûc*” tî duristîkirin.

⁹³ Li jorê li ser lêkerên “*çêbûn*” û “*çêkîrin*”ê hin zanyarî hatibûn dan, loma cardin hewce bi dubarekirina ravekirinê nehat dîtin.

jî “*bi rê kirin*”e. Wekî tê zanîn di hin devokan de (nemaze devoka hêla Serhedê ev yek berbelav e) bikarneanîn an jî ketina pêşdaçekê (wekî daçeka “*bi*”ya di mînakê de) tiştêkî adetî ye. Ji koma duyem a lêkerên hevedudanî, ji bilî “*dan pey*”ê ku wek lêkereke hevedudanî hatiye pêşkêşkirin, îtiraz li yê din nîn e. Ev “*dan pey*” ne lêker hevedudanî ye, wekî tê dîtin lêker li serî ye û “*dan*” bi xwe lêkereke sade ye. Pê, bêjeya “*pey*” hatiye kêşandin û “*pey*” di risteyê de bi erka bireserê radibe. Bi vî qalibî mînakên wiha jî dikarin bîst duristkirin: *dan dû*, *dan navê*, *dan avê*, *dan rû*. Ji lew re, ji bo nimûneyên ku piştî lêkerê bêjeyêke ji esilê navdêrê tê nabe ji wan hemûyan re lêkerên hevedudanî bê gotin. Wekî di mijarên berê de amaje pê hatibû kirin û pênaseya van cure lêkeran hatibû kirin, ji bilî çend awarteyan (wekî *çûn ava*; roj çû ava, *dan hev*; mala xwe daye hev, *dan xeberan*; jê re da xeberan), bi giştî piştî bêjeya ji esilê navdêrê hîna lêkera alîkar tê û lêker pêwîst e di wateya xwe ya hîmî de bê bikaranîn. Lê ev lêker naşibe qalibê pênaseyê û nabe ku ew di nav vê senifanê de bê hizirandin.

Li jêr sernavê lêkerên biwêjî (di bin du jêrbeşan de), piştî pênaseya wan hin lêker wek mînak hatine rapêşkirin, wekî van mînakên: *lê ketin*, *lê xistin*, *jê geriyan*, *li hev anîn*, *jê hez kirin*, *ji bîra kirin*, *dest pê kirin*, *ser jê kirin*, *anîn ber çav*, *lê siwar bûn*, *jê peya bûn*. Ji van nimûneyan “*lê ketin*”, “*lê xistin*”, “*lê geriyan*”, “*jê hez kirin*”, “*lê siwar bûn*”, “*jê peya bûn*” û “*dest pê kirin*” lêkerên veqetînbare in û bi cînavkên lihevxiştî çêbûne. Mînaka “*anîn ber çav*” di rewşa biwêjê de ye. Di mînakê de ya bi tena serê xwe kar dike “*dan*” e, loma ew ne lêkera alîkar e. Jixwe ev qalib dikare wiha jî biguhere; “*dan ber dest*”, “*dan ber xwe*”, “*dan ber malê*” û hwd. Wekî ji van nimûneyan jî diyar dibe gava qalib biguhere jî ya kar dike lêker bi xwe ye û yê din li gorî hêmanên hevokê di rewşa tiştêyê de ne. Herçî nimûneya “*ser jê kirin*”ê ye, bi vî awayî ew lêkereke veqetînbare e, lê forma wê ya bi şêweya “*şerjê kirin*”ê, ji qalibê xwe yê rastîn derketiye û bûye wekî lêkereke hevedudanî. Mînakên “*li hev anîn*” û “*ji bîra kirin*”ê jî, lêkerên hevedudanî ne.

1.4.3. Gramera Zmanê Kurdi (Kurmanci-Sorani)

Di vê berhema Qanatê Kurdo de her du zaravayên sereke yê kurdî, kurmançî û kurmançiya naverast (sorani) hatine hevberîkirin û bi hûrgilî lêhûrbûnek li ser mijara lêkeran hatiye kirin, lê bêtir ku ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran bîst

senifandin. Di gel vê yekê, bi awayekî berfireh behsa lêkerên ku dabaş li ser wan e, hatiye kirin. Bêyî ketina nav kitekitan, bi awayekî hewce û puxteyî dê hewl bê dan da ku ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran ên ji hêla wî ve amaje bi wan hatiye kirin, li xebatê bîn veguhastin û derpêşkirin.

Ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran ji hêla daner ve bi navên wek “fêlên kokanî” (lêkerên xwerû), “fêlên efrînok” (lêkerên dariştî), “fêlên bargiranî/lêkdiraw” (lêkerên hevedudanî) û “fêlên ardîmiyê” (lêkerên alîkar)⁹⁴ hatine diyarkirin û ji van cure lêkeran jî îcar hinek ji wan di nav xwe de, li binbeşan hatine dabeşandin.⁹⁵

Lêkerên xwerû di şeş binbeşan de hatine nîşandan: I) lêkerên ku radera wan bi “-tin”ê kuta dibin (*ketin, gotin, bihîstin, xwestin, jimartin, firotin*), II) lêkerên ku radera wan bi “-din”ê diqedin (*standin, çandin, xwendin*), III) lêkerên ku radera wan bi “-în”ê bi dawî dibin (*kirîn, dizîn, rizîn, dirîn, girîn, çinîn*), IV) lêkerên ku radera wan bi “-an”ê temam dibin (*kutan, hêran, dan, kolan, man/mayîn*), V) lêkerên ku radera wan bi “-ûn”ê sergîhayî dibin (*bûn, çûn, dirûn, cûn/cûyîn*) û VI) lêkerên ku radera wan bi “-rin”ê diqedin- ku di soranî de bi “-din”ê ye- (*kirin/kirdin, birin/birdin, xwerin/xwerdin, mirin/mirdin*).⁹⁶

Der heqê lêkerên dariştî (fêlên efrînok) de hatiye diyarkirin ku ev cure lêker “*ji navan, ji binyata fêlên kokanî hatine efrîndin*”⁹⁷ û ew di sê binbeşên de hatine senifandin; wekî lêkerên ku radera wan bi “-în” û “-an”ê kuta dibin (*tirs/tirsîn, êş/êşîn, werm/werimîn, bez/bezîn, tirsîn/tirsan, lertzîn/lerzan* (ev her duyên dawîn ji bo zaravayê soranî wisan in), lêkerên têper ên ku radera wan bi “-andin”ê diqedin (*şikandin, vekujandin, gerandin, lertzandin, xurandin*) û lêkerên dariştî yên ku bi pêşgiran hatine dariştin (*hilweşandin, daxistin, derketin*).⁹⁸

Di bin sernavê lêkerên hevedudanî (fêlên bargiranî) de jî hatiye aşkerakirin ku ev lêkerên hanê; I) “fêlên ji navan û fêlên ardîmiyê” û II) “fêlên ji pêşpirtikan û fêlên

⁹⁴ Navên di nav kevanekê de ji hêla me ve hatine danîn û armanc ji vê yekê ew e ku reseniya termînolojiya rêzimana kurdî ya Prof. Qanatê Kurdo jî bê dîtin.

⁹⁵ Ji bo zanyariyên zêde yên li ser lêkeran *bnr.* Qanatê Kurdo, *h.b.*, r. 117-182. Divê bê diyarkirin ku di vê xebatê de jî herfên “î” û “î”yê mîna alfabeya zîmanê tirkî, bi şêkilê “i” û “i”yê hatine bikaranîn. Lê me ew li gorî alfabeya Celadet Bedirxan guhartin.

⁹⁶ *h.b.*, r. 127-129.

⁹⁷ *h.b.*, r. 129.

⁹⁸ *h.b.*, r. 130-144.

kokanî û efrînok”, tên çêkirin. Ji bo her du koman gelek lêkerên mînak hatine nîşandan, lê ji bo ku hizirek bi mirov re çêbe, ji nav wan hin nimûne hatin hilbijartin. Ji bo koma yekem lêkerên wekî “*temaşe kirin, qise kirin, hûr kirin, hûr-hûrî kirin, zîtol-zîtolî kirin, xwar bûn, kor bûn, reng-rengî bûn, hîn bûn, şiro kirin, nîşan dan, nexweş ketin, xwe sax kirin, xwe dûr xistin, hev paç kirin, rastî hev hatin, ji dest çûn û dest pê kirin*”ê hatine pêşkêşkirin, ku ew ji navdêr, rengdêr, cînavka veжерок, cînavka berbihevîn û ji daçek û lêkerên alîkar hatine pê. Koma duyem a lêkerên hevedudanî li du tofan hatine dabeşkirin û nimûneyên ku hatine rapêşkirin jî tev bi pêşpirtikan (pêşgiran) çêbûne. Hewce pê heye were gotin ku pêşgir jî li du paran hatine parevekirin. Bi gotina Qanatê Kurdo ew “pêşpirtikên sivik” (wekî *da, ra, ve, hil, ser, ber, paş, pêş, bin, jêr*) û “pêşpirtikên bargiranî” (mîna *pê, tê, lê, têra, têda, pêva, pêda, serda, serra, binra, berra, navra, pêşda, paşda, lev, pev, tev, jev, lêk, pêk, têk*) ne. Ji bo koma duyem, ku gelek mînak hatine dan, bêyî dirêjîpêdanê, ji bo serwextiya ji mijarê dê tenê bi dayîna çend mînakên hilbijartî qîm bê anîn: “*wer anîn, wer kirin, raxistin, radan, daketin, dagirtin, vekirin, vexwarin, hildan, hilhatin, vêketin, vêsandin, li ser rêtin, kirin ser, derketin, kirin der, ji ber revîn, ji ber girtin, anîn ber, ji bin xistin, li bin danîn, ketin bin, pêş ketin, çûn pêş, paş ketin, nav ketin, ketin nav, pey xistin, çûn pey, lê dan, temaşe lê kirin, jê ketin, jê dûr ketin, pê ketin, bawer pê kirin, tê dan, tê gihîştin, lev hatin, pev ketin, jev kirin*” û mînakên wekî “*dî navra çûn, bi binda çûn, binra birin, rexda birin, pêşda çûn, paşda birin, pêva girêdan, pêda ketin, têra hatin.*”⁹⁹

Der barê “fêlên ardimiyê” de hatiye gotin ku ew “wextan û teherê kirinê” didin afirandin û ji bo wan jî lêkerên wekî “*bûn, dan/dayîn, hatin, heyîn, ketin*”ê hatine derpêşkirin.¹⁰⁰

Li gorî Kurdo, ji hêla binyatî ve cureyên lêkeran çar in: Lêkerên xwerû, dariştî, hevedudanî û lêkerên alîkar. Eger bi awayekî giştî bê gotin; der barê kategoriya wî ya lêkerên xwerû û yên dariştî de na, lê der heqê lêkerên hevedudanî û yên alîkar de, hewce pê heye li ser wan hinek bi zelalî bê sekinandin. Ji ber ku ji hêla daner ve lêkerên hevedudanî wekî du beş hatine sêwirandin, dê bi heman azîne pêdeçûn li

⁹⁹ Ji bo zêdetir agahiyan *bnr.* Qanatê Kurdo, *h.b.*, r. 151-180.

¹⁰⁰ *h.b.*, r. 180-182.

mijarê bê kirin. Mînakên ji bo koma yekem a lêkerên hevedudanî hatine derpêşkirin, hemû dikevin nav senifana lêkerên hevedudanî. Lê koma duyem a ji bo lêkerên hevedudanî aloz û kêşedar e, ku hatiye daxuyandin lêkerên di koma duyem de bi pêşgirên sivik û yên giran tên çêkirin. Bi pêşgirên wekî /da-/, /ra-/, /ve-/, /hil-/ û /wer-/ê ji lêkerên xwerû, lêkerên nû tên dariştin, lê herçî “ser”, “ber”, “paş”, “pêş”, “bin” û “jêr” e, ew ne gire ne, ew bêjeyên ji esilê navdêrê ne û bi alîkariya wan hem peyvên hevedudanî hem lêkerên hevedudanî hem jî biwêj û qalib bi dest dikevin. Ji lew re “*wer anîn, wer kirin, raxistin, radan, daketin, dagirtin, derketin, vekirin, vexwarin, hildan, hilhatin, vêketin, vêsandin*” lêkerên dariştî ne ku bi pêşgiran çêbûne û divê hemû pêşgirên dariştinê bi lêkeran ve bê nivîsandin (mîna *weranîn*, ne *wer anîn*). Mînakên wekî “*anîn ber, çûn pêş, çûn pey, ketin bin, ketin nav, kirin der û kirin ser*”, ne lêkerên hevedudanî ne, lêkerên di wan de lêkerên xwerû ne û bi wan bêjeyên ji esilê navdêrê tên kêşan.

Li hêla din, lêkerên “*ji ber revîn, li ser rêtin, ji bin xistin, li bin danîn, di navra çûn, bi binda çûn, binra birin, rexda birin, paşda birin*”ê jî ne aîdî tu senifana ji aliyê binyatî ve ya cureyên lêkeran in. Ji van mînakan jî, ji hinekan pêşdaçek ketiye. Wekî nimûne; *binra birin* “di bin re birin”, *rexda birin* “di rex de birin” û *paşda birin* jî “bi paş de birin” e. Hêmanên beriya lêkerê, di ristesaziyê de bi erka hokerê radibin, pêkve nabin pêvebera rîsteyê.

Lêkerên “*ji ber girtin, bi pêş ketin, bi paş ketin, bi nav ketin, bi pey xistin, lev hatin, pev ketin, jev kirin, bi pêş de çûn*”ê ji aliyê binyatî ve lêkerên hevedudanî ne. Ji van mînakan “*lev hatin, pev ketin û jev kirin*” ji cînavkên lihevxiştî, ku ji ber civitîna cînavka berbihevîn “*hev*”ê û daçekên “*bi*”, “*ji*”, “*li*” û “*di*”yê, ew dikevin forma *jev, lev, pev* û *tev*’ê. Tiştê heye ev cînavkên lihevxiştî yên ji tofa duyem, di heyna kêşanê de dikarin li hêmanên xwe yên hîmî danagerin. Lêkerên mayîn, ango lêkerên “*jê dûr ketin, temaşe lê kirin, bawer pê kirin, lê dan, jê ketin, pê ketin, tê dan, tê gihîştin û pê da ketin*” ji lêkerên veqetînbarekê pê ve ne tişteki din in û ew bi cînavkên lihevxiştî (*jê, lê, pê* û *tê*) yên ji tofa yekem pêk hatine. Nimûneyên “*pê va girê dan, tê ra hatin*”ê jî eynî wekî nimûneyên “*binra birin, rexda birin, paşda birin*”ê ne û ne aîdî tu senifana ji aliyê binyatî ve ya cureyên lêkeran in. Hêmanên ji bilî lêkerê, rewşa wan a ya hokerî nîşan didin.

Eger li ser tebîra “lêkerên alîkar” bi kurtî çend gotin bên pêşkêşkirin: Ji aliyê binyatî ve ne ji tu cureyê lêkaran in. Wekî ku berê jî amaje pê hatibû kirin, ew ji bo pêkanîna lêkerên hevedudanî û kêşana bêjeyên ji esilê navdêran, tên bikaranîn.

1.4.4. Hêmana Rêzimanê Kurdi

Ji hêla Feqî Huseyn Sagniç ve, di vê xebata rêzimana kurmancî de, “celebên lêkeran” li çar beşan hatine dabeşandin: wekî lêkerên binyatî, lêkerên çêkirî, lêkerên qertaf û lêkerên hevedudanî.¹⁰¹ Piştî vê senifanê jî, ji aliyê binyatî ve lêker di nav xwe de mîna lêkerên xwerû û lêkerên kêr hatine binavkirin. Ji bo lêkerên xwerû nimûneyên “*kolan, hzîrin, ketin, dan/dayin, çnin, bjartin, danin, ponijin, xwarin, şûştin, dotin, pehtin*”ê hatine derpêşkirin.¹⁰² Mînakên ku di bin jênavê “lêkerên kêr” de hatine nîşandan jî ev in: *werin, herin, hatin, bêj/gotin, bîn/dîtin, vîn, înan/anîn*.¹⁰³

Di bin sernavê lêkerên çêkirî de, ku mebest jê lêkerên dariştî ne, serî li sê binbeşan hatiye xistin û ev cure lêker jî wekî I) yekkîte û li pey dengdêrê bêdengek, II) yekkîte û li pey dengdêrê du bêdengek û III) pirkîte, ji hev hatine veqetandin. Ji bo senifana yekem lêkerên mîna “*nasîn, kelîn, bezîn, revîn, birîn*”, ji bo ya duyem lêkerên wekî “*biriqîn, xemilîn, tewizîn, kevilîn*” û ji bo ya sêyem jî lêkerên wekî “*ricifîn, bizivîn, cemedîn*”ê¹⁰⁴ hatine derpêşkirin. Li gorî Feqî Huseyn Sagniç ji ber ku ev hemû cure lêker ji navdêran çêbûne, loma di bin vî sernavê de hatine senifandin. Mîna “*cemed/cemedîn, bizav/bizivîn, xemil/xemilîn, birq/biriqîn, fetil/fetilîn*”ê.¹⁰⁵ Mînaka pêşîn navdêr, a duyem jî ew lêkera ku ji heman navdêrê çûbeye, nîşan dide.

Cureyê lêkerên daner jê re gotiye “lêkerên qertaf”, li gorî Celadet Bedirxan gireyên lêkera bûnê ne, ku di dema kêşana navdêr û rengdêran de jî tên bikaranîn. Her wisan Feqî Huseyn Sagniç navên “qertaf lêker” û “qertaf cînavk”¹⁰⁶ jî li wan

¹⁰¹ Feqî Huseyn Sagniç, *h.b.*, r. 94.

¹⁰² Hem rastnivîsa Feqî Huseyn Sagniç cuda ye hem jî herfên alfabeya wî ji ya Celadet Bedirxan cihê ye. Sagniç herfên “î” û “î”yê wekî alfabeya zimanê tirkî bi şekilê “ı” û “i”yê bi kar dianî. Ji lew re jî, ji bo balkêşandina ser vê taybetiya wî têkilî bi esilê jêgiranane nehat kirin. Lê ji niha bi şûn de jêgiranên ku dê jî vê berhemê bîn kirin, dê tenê bi awayê vekit û alfabeya Celadet Bedirxan bîn derpêşkirin.

¹⁰³ *h.b.*, r. 94.

¹⁰⁴ *h.b.*, r. 95-96.

¹⁰⁵ Ji bo agahiyên berfirehtir ên der barê dabaşê de *bnr. h.b.*, r. 95-98.

¹⁰⁶ *h.b.*, r. 98-99.

danîne. Divê bi bîr bê xistin ku ji bo van qertafan (ango qertafên lêkera bûnê), navên wekî “qertafên kesane” û “cînavkên pêvebestî”¹⁰⁷ jî tîrî bikaranîn. Li gorî Feqî Huseyn Sagniç “qertafcînavk”ên ji bo kesê yekem “*im, m, yim, bûm, bûme*”; ji bo kesê duyem “*î, y, bûy, bûyî*” û ji bo kesê sêyem jî “*e, ye, bit, bûye*.” Ev jî bo kêsên yekhejmar in, ji bo kêsên pirhejmar jî ev mînak hatine dayîn: Ji bo kesê yekem “*n, in, yin, î, yîn, bûn, bûne, ne, nin*”; ji bo kesê duyem “*n, in, yin, ne, nin, bûn, bûne*” û ji bo kesê sêyem jî “*n, in, yin, ne, nin, bûn, bûne*.”¹⁰⁸

Di heşt beşan de lêhûrbûn li ser lêkerên hevedudanî çêbûye û bi hûrgilî li ser wan hatiye rawestandî. Lê ji ber belavnebûn û averênebûna jî mijarê, sekinandina bi awayekî kurt a li ser vê dabaşê û behskirina jî kurtasiya mijarê hat tercîhkirin. Li gorî Sagniç, lêkerên hevedudanî ev in: I) daçekî, paşdaçek¹⁰⁹ (*rakirin*), II) alîkar (navdêrî) paşnav (*ava kirin*), III) karînî, paşlêker (*karîn kirin*), IV) qat dervazî, paşlêker (*dan kirin*), V) tebatîkirî, paşlêker (*hatin kirin*), VI) raweyî, paşlêker (*kiribûn*), VII) zivirî, paşcînavk (li *xwe kirin*) û VIII) hevayî, pêş û paşcînavk (*ketin hev, hev ketin*).¹¹⁰

Wekî ji van mînakan dixuye, senifana lêkeran ne tenê ji aliyê binyatî ve, lê ji aliyê avanî, fonksiyon, tebatî (pasîf) û lebatîya (aktîfîya) lêkeran û demên hevedudanî ve jî hatiye kirin. Lê belê, çawan di serî de jî hatibû daxuyandin, ji ber ku mijar bi nîşandana tesnîfên gramernasên kurmançî yê “ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran” hatiye vesînorkirin, dê vekolîn û nirxandin li gorî vê yekê bîn kirin.

Eger bi awayekî puxteyî were gotin; li gorî Feqî Huseyn Sagniç ji hêla binyatî ve cureyên lêkerên zaravayê kurmançî çar in: Lêkerên binyatî (*xwerû*), lêkerên çêkirî (*dariştî*)¹¹¹, lêkerên qertaf û lêkerên hevedudanî. Ji van her çar cure lêkeran, divê di serî de îtiraz li tebîra “lêkerên qertaf” bê kirin û ew jî vê polînkirinê bê derxistin. Ji lew re ew ne lêker lê gireyên kesane ne, ku ji wan re cînavkên pêvebestî û qertafên lêkera bûnê jî tê gotin. Di gel vê rewşê, rastiyeke aşkera heye ku ev gire (*im, î/yî, e/ye, in, in, in; me, yî, ye, ne, ne, ne*), kesan/tiştan dinimînin û bi saya wan hem pirhejmarî û yekhejmarî hem jî rêza kesan/tiştan tê zanîn û naskirin.

¹⁰⁷ Samî Tan, *Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmançî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Îstanbul 2005, r. 108.

¹⁰⁸ Feqî Huseyn Sagniç, *h.b.*, r. 98-99.

¹⁰⁹ Çendî paşdaçek hatibe gotin jî, qest jê pêşgir e.

¹¹⁰ *h.b.*, r. 100.

¹¹¹ Tegihên nav kevanekê aîdî me ne.

Di bin sernavê lêkerên binyatî de (ku mebest jê lêkerên sade/xwerû ye), ev cure lêker ji hêla daner ve li du binbeşan hatine levakirin. Lêkerên xwerû û yên kêr. Ji bo senifana bi awayê lêkerên xwerû û lêkerên kêr, wisan dixuye ku mijara li gorî avaniyê lêker, li gorî teşeyê lêker û ji aliyê binyatî ve lêker, hatine tevîhevkerin. Herçî “lêkerên kêr” in, ku mexsed ji vê têgihê lêkerên nerêzikî ye, ew dikevin nav polîna “ji aliyê teşeyê ve lêker” û ew jî du kom in: Lêkerên rêzikî û nerêzikî, ku jixwe di mijara “Ji aliyê teşeyê ve lêker” de, di destpêka xebatê de li ser wan agahiyên pêwîst ên li ser dabaşê hatibûn dayîn.

Ji bo lêkerên xwerû, ji hêla daner ve lêkerên “*kolan, hizirîn, ketin, dan/dayîn, çinîn, bijartin, danîn, ponijîn, xwarin, şuştin, dotin û pehtin*”ê wek mînak hatine pêşkêşkirin, lê ji wan sê lib ne lêkerên xwerû ne, lêkerên dariştî ne; ew jî “*hizirîn*”, “*danîn*” û “*ponijîn*” in. Lêkera “*hizirîn*”ê lêkerekê dariştî ya di rewşa lêkerên xwerû de ye. Wekî tê zanîn awayê wê yê “*hizir kirin*” heye ku îcar ji navdêra “*hizir*”ê, bi alîkariya paşgirên “*/-în/*” û “*/-andin/*”ê awayên wê yên teneper û têper “*hizirîn*” û “*hizirandin*” hatine dariştin. Her wisa lêkera “*ponijîn*”ê jî lêkerekê dariştî ye û bi paşgiran eynî wekî “*hizirîn*”ê hatiye çêkirin. Teşeyê xwerû ya lêkera “*ponijîn*”ê, jî “*poniştin*” e ku ew lêkerekê teneper e û “*ponijîn*” ji rayeka wê ya dema niha (ji *ponijê*) çêbûye. Herçî “*danîn*”e, lêkerekê dariştî ye, bi pêşgira */da-/yê* ji lêkera nerêzikî “*anîn*”ê hatiye dariştin û rewşa wê ya rêzikî jî “*daînan*” e.

Li ser lêkerên nerêzikî, hewce ye bê gotin ku ji nav mînakan derpêşkirî yên ji bo lêkerên nerêzikî (mîna *werin, herin, hatin, bêj/gotin, bîn/dîtin, vîn, înan/anînê*), lêkerên “*hatin*”, “*vîn*” û “*înan*”ê lêkerên rêzikî ne û hemû dem bi wan tîrêşandin. Ên mayîn nerêzikî ne, ji ber ku hemû demên rêzimanî bi wan nayên kêşandin.

Çendî ji hêla daner ve lêkerên dariştî di bin sê binbeşan de hatibin vekolan jî, ku bêtir dirêjpedana bi dabaşê were gotin, hemû mînak aîdî beşa lêkerên dariştî ne û ew bi paşgira */-în/*ê ji navdêrê hatine çêkirin. Pêwîstî bi gotinê heye ku ji ber di kurmancî de lêkerinên cêwî¹¹² hene, ev yek dibe sedema çêbûna fikara lêkerên dariştî yên ku ji bêtir esilê navdêrê pêk hatine û mîna lêkerên xwerû dixuyên. Wekî lêkerên “*birîtin*” û “*birîn/birandin*”, “*bizaftin*” û “*bizivîn, ricftin*” û “*ricifîn, guhartin*” û

¹¹² Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, *h.b.*, r. 122.

guherîn, pehtin û pijandin”ê. Ji van mînanan xweş diyar e ku hin lêkerên bi /-în/ û /-andin/ê diqedin, hatine dariştin.¹¹³

Senifana herî kêşedar a Feqî Huseyn Sagniç, a bi navê “lêkerên hevedudanî” ye. Ev kêşe hem ji hêla polînkirinê ya cureyên lêkeran ve hem jî ji hêla têgihan ve ye. Eynî bi awayê ku “lêkerên hevedudanî” ji hêla danerê herhemê ve hatine beşkirin, pêdeçûna bi mijarê û derpêşkirina nixandî û têbîniyên li ser senifan û mînanan, welê dixuye ku ji bo hêsaniyê dê hîn baştir be.

I) daçekî, paşdaçek: *rakirin, hilanîn, vekirin, wergirtin, derketin, dadan*.¹¹⁴ Divê serê pêşîn bê gotin, ev gireyên wekî /da-/ , /der-/ , /hil-/ , /ve-/ û /wer-/ê ku bi wan ji lêkerên sade lêkerên dariştî tên çêkirin, ne daçek an jî paşdaçek in, ew pêşgir in. Daçek cureyekî bêjeyan in û bi tena serê xwe ne xwedî wateyê ne. Ew di hevokê de erka danîna têkiliyê digirin ser xwe. Gire, bi gotina din qertaf, hêmanên rêziman in ku bi wan peyv tên dariştin an jî erka bêjeyê bi wan diyar dibe. Li aliyê din, ev lêkerên wek nimûne ji bo lêkerên hevedudanî hatine dayîn, ji aliyê binyatî ve tevde dikevin nav senifana lêkerên dariştî yên ku bi pêşgiran hatine çêkirin.

II) alîkar (navdêrî) paşnav: *ava kirin, hîn bûn, av dan, dar kirin*.¹¹⁵ Ev cure lêker, lêkerên hevedudanî ne ku bi alîkariya lêkereke alîkar û bi bêjeyeke ji esilê navdêrê pêk hatine.

III) karînî, paşlêker: *karîn kirin*: Di kurmancî de li şûna lêkera “*karîn*”ê, lêkerên “*kanîn*”, “*şên/şêyîn*” û “*şe kirin*”ê jî tên bikaranîn. Ji van cure lêkerên alîkar re bi îngilîzî “modal auxiliary” û bi kurmancî jî “lêkerên alîkar ên raweyî”¹¹⁶ tê gotin. Ji lew re ev lêker nakevin nav polîna lêkerên hevedudanî û tu têkiliya wan bi senifana ji aliyê binyatî ya cureyên lêker re nîn e.

IV) qat dervazî, paşlêker: “*dan kirin, dan firotin, dan şandin...*”¹¹⁷ Beriya aşkerakirina têbîniyên li ser vê binbeşê, hewce pê heye bê gotin ku cureyên lêkeran li

¹¹³ Paşê dê li ser lêkerên dariştî yên bi şeweya lêkerên xwerû ku bi paşgiran çêdibin, bi berfirehî bê sekinandin û agahiyên pêwîst bînin.

¹¹⁴ Feqî Huseyn Sagniç, *h.b.*, r. 100.

¹¹⁵ *h.b.*, r. 101.

¹¹⁶ Samî Tan, **Rêzimana Kurmancî**, Çapa nûkirî ya 3., Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Îstanbul 2015, r. 309.

¹¹⁷ Feqî Huseyn Sagniç, *h.b.*, r. 101.

gorî pîvanên wekî erka lêkeran, teşe û peywira wan a ji hêla avaniyê ve, bi awayekî gelemper dibin sê beş: I) Ji aliyê binyatî ve, II) ji aliyê avaniyê ve û III) ji aliyê teşeyê ve lêker. Di çarçoveya vê peytê de ev lêkerên bi alîkariya lêkera “*dan*”ê tên kêşandin, dikevin nav senifana “ji aliyê avaniyê ve lêker” û jê jî dikevin nav “avaniya li gorî kirdeyê” ku ji wan re lêkerên dançêker tê gotin. Ji lew re ew ne lêkerên hevedudanî ne.

V) tebatîkirî, paşlêker: “*hatin kuştin, hatin birin, hatin revandin, hatin dotin.*”¹¹⁸ Ev jî ne lêkerên hevedudanî ne, polîna wan cuda ye û li gorî avaniya lêkeran aîdî kategoriya “avaniya li gorî kirdeyê” ye. Mîna lêkerên dançêker, lêkerên tebatî jî bi alîkariya lêkerê, ku ya wê îcar “*hatin*”e, tên kêşandin. Loma nabe ku ji wan re lêkerên hevedudanî bê gotin.

VI) raweyî, paşlêker: *kiribûn*. Ev awa, bi kêşana deman a lêkeran ve têkildar e û dikeve nav senifana raweya pêşkerî. Her wiha ew di rewşa çirokiya dema borî ya dûdar de ye û ne aîdî tu cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve ye.

VII) zivirî, paşcînavk: *li xwe kirin*. Ev lêkereke hevedudanî ye. Ji ber ku ev bi alîkariya daçekê hatiye piraştin, ji lew re nabe ku çî cure lêkerên di wan de cînavka “xwe”yê hebe, ew bikevin nav polîna “avaniya lekeran.”

VIII) hevayî, pêş û paşcînavk: *ketin hev, hev ketin*. Pêşî pêdivî bi sererastkirinekê heye ku divê daçeka “*bi*”yê jî li mînaka “*hev ketin*”ê bê zêdekirin; wekî “*bi hev ketin*” ku ew lêkereke hevedudanî ye. Mînaka din jî, ne aîdî cureyekî lêkeran a ji hêla binyatî ve ye. Bi alîkariya “*ketin*”ê, cînavka berbihevîn “*hev*” tê kêşandin.

Ji van nirxandin û tiwêjanan jî aşkera dibe ku senifana cureyên lêkeran a ji hêla Feqî Huseyn Sagniç ve hatiye kirin, pir bigelş e. Ji ber ku ew li gorî pîvanên wekî erk, teşe û peywirê nehatine senifandin, her wisan hin mînak jî, li pênaseyên ji bo “ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran” hîç nayên.

¹¹⁸ *h.b.*, r. 102.

1.4.5. Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)

Wekî ji nav jî dixuye, di vê berhema Kemal Badilli de rêzimana zaravayê kurmançî bi zimanê tirkî hatiye ravekirin û ji aliyê binyatî ve jî li ser mijara lêkeran hatiye rawestandî ku tê de cureyên lêkeran bi du beşan hatiye vekolan: I) lêkerên xwerû û II) lêkerên hevedudanî. Ji bo lêkerên xwerû wek mînak, ev lêker hatine destnîşankirin: “*birin, cûyin, çandin, çûyin/çûn, dayin/dan, hatin, xwarin, kirin, mayin, şandin.*”¹¹⁹

Herçî lêkerên hevedudanî ne jî li sê binbeşan hatine parîkirin: Koma yekem (lêkerên hevedudanî xwedî du lêkerên xwerû). Ev jî sê beş in: I) *hatin şikandin, dayîn şikandin*, II) *reş bûyin, reş kirin* û II) *hati bûm, dikim b'êm*. Koma duyem; *mezin bûn, mezin kirin* û koma sêyem; ev cure lêker jî du qism in: I) lêkerên hevedudanî yên bipêşdaçek ku ew jî di nav xwe de li du beşan lewa dibin, wekî lêkerên bi pêşdaçekên besîd (*berketin, derketin, daketin, veketin, vêketin, raketin*) û lêkerên bi pêşdaçekên hevedudanî (*jê ketin, lê ketin, pê ketin, tê ketin*) û II) lêkerên hevedudanî yên dupêşdaçek (*jê...da/ ji hespê da ketin, jê... ve/va / ji sola min ve, jê ...ra / ji Fatê ra, pê....da/ bi Ruhayê da, pê... ve/va/ bi dîwêr ve kutan, pê ... ra/ ez bi Çeko ra çûm, tê....da/ di dinê de kes nema, tê....ve/va/ di dîwêr ve, têra/ di rê ra bimeş*).¹²⁰

Di vê xebatê de, wekî tê dîtin, ji aliyê binyatî ve hemû cure lêker di bin du sernavan de hatine senifandin û mînakên ji bo lêkerên xwerû hatine nîşandan, tevî navlêkirinê ne tê de, lê yên ji bo lêkerên hevedudanî hatine diyarkirin û polînkirina wan, hêjayî nixandîne ne. Lêkerên hevedudanî, ku bi sê beş û binbeşên wan ji hev hatine veqetandin, dê eynî wekî daner ji bo nixandîna mijarê ew azîn bê şopandin.

Koma yekem a lêkerên hevedudanî li sê beşan hatiye veqetandin û ji bo wan mînakên wekî I) *hatin şikandin, dayîn şikandin*, II) *reş bûyin, reş kirin* û III) *hati bûm, dikim b'êm* hatine pêşkêşkirin. Mînakên binbeşa yekem (*hatin şikandin, dayîn şikandin*) dikevin nav senifana “ji aliyê avaniyê ve lêker”, ji wê jî dikevin polîna

¹¹⁹ Kemal Badilli, *h.b.*, r. 102. Badilli jî herfa ”î”yê wekî ya tirkî bênuqte (i) bi kar aniye û rastnivîsa wî jî hinek cuda ye (mîna *di kim* ango *dikim*). Lê me ew herf û vekî jî mîna alfabe û vekîta Celadet Bedîrxan a adetî guhartin.

¹²⁰ Kemal Badilli, *h.b.*, r. 109-116.

binbeşa “avaniya li gorî kirdeyê” û bi dorê, ew ji lêkerên “tebatî” û “dançêker” in. Têkiliya wan a bi lêkerên hevedudanî re nîn e. Mînakên ji bo binbeşa duyem (*reş bûyin, reş kirin*) hatine dayîn jî aîdî senifana lêkerên hevedudanî ne. Herçî nimûneyên binbeşa sêyem in (*hati bûm, dikim b'ê*m), tu pêwendiya wan bi senifana cureyên lêkeran re nîn e. Ew têkildarî demên kêşana lêkeran in, wekî demên hevedudanî û raweya pêşkerî. Koma duyem a ji bo lêkerên hevedudanî, ku mînakên wekî “*mezin bûn*” û “*mezin kirin*”ê hatine rapêşkirin, ji lêkerên hevedudanî ne.

Koma sêyem pêşî li du binbeşan hatiye dabeşandin, paşê jî binbeşa yekem li du jêrbeşan hatiye levakirin, wekî lêkerên ku bi “pêşdaçekên besîd” (*berketin, derketin, daketin, veketin, vêketin, raketin*) û lêkerên bi pêşdaçekên hevedudanî (*jê ketin, lê ketin, pê ketin, tê ketin*) çêbûne. Ji bo jêrbeşa yekem, hemû mînak (*berketin, derketin, daketin, veketin, vêketin, raketin*) aîdî lêkerên dariştî ne ku bi pêşgiran hatine piraştin. Gotina “pêşdaçek” ku ji hêla danerê berhemê ve hatiye bikaranîn, ji bo pêşgiran ne rast e. Ji ber ku ew gire ne û bi wan ji lêkerên xwerû lêkerên dariştî hatine çêkirin. Nimûneyên ji bo jêrbeşa duyem a binbeşa yekem a koma sêyem hatine pêşkêşkirin, ango mînakên “*jê ketin, lê ketin, pê ketin û tê ketin*”ê jî dikevin nav polîna lêkerên veqetînbare. Ji ber ku ew bi cînavkên lihevxiştî yên ji koma yekem çêbûne. Hemû mînakên dawî yên ji bo binbeşa duyem a koma sêyem hatine dayîn (mîna; *jê...da / ji hespê da ketin, jê... ve/va / ji sola min ve, jê ...ra / ji Fatê ra, pê....da / bi Ruhayê da, pê... ve/va / bi dîwêr ve kutan, pê ... ra / ez bi Çeko ra çûm, tê....da / di dinê de kes nema, tê....ve/va / di dîwêr ve, tê ...ra / di rê ra bimeş*), eleqeya wan bi lêkerên hevedudanî re hîç nîn e. Ew, ji cînavkên lihevxiştî yên tofa yekem û paşdaçekan hatine pê û gava bi alîkariya lêkeran tên kêşan, bi peywira hokeriyê radîbin, loma ya esil, lêker bi xwe ye. Bi gotina kurt, ew gişt bi hev re lêkerê pêk naynin, hêmanên din, di dema kêşanê de rewşa awayê kar nîşan didin û bi erka hokerê radîbin.

1.4.6. Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi Kurmanc Lehçesi

Di vê berhemê de rêzimana kurmancî ji aliyê Mûrad Ciwan ve bi zimanê tirkî hatiye ravekirin ku bi hûrgilî dêhn li lêkeran jî hatiye kêşandin û ew ji hêla binyatî ve hatine tesnîfkirin. Lêkerên kurmancî ji hêla daner ve, ji aliyê binyatî ve li çar koman hatine dabeşkirin: I) karên besîd (lêkerên xwerû), II) karên pêkhatî (lêkerên dariştî),

III) karên hevokîn (lêkerên biwêjî)¹²¹ û IV) karên hevedudanî. Ji bo lêkerên xwerû wek nimûne lêkerên mîna “*kirin, bûyîn, dayîn, hatin, çûyîn û xistin*” hatine derpêşkirin. Herçî lêkerên dariştî ne, ew di bin du binbeşan de hatine nîşandan. Ji bo ya yekem jênavê “lêkerên ku ji navdêran an jî ji teqlîdan (onomatopeyan) pêk hatine” û “lêkerên ku ji pêşgir û lêkeran hatine dariştin” hatiye gotin. Ji bo koma yekem mînakên “*beziyan û bezandin, çêjiyan û çêjandin, weşiyar û weşandin, firiyar û firandin, geriyan û gerandin, reviyar û revandin, xuriyan û xurandin* (ku hatiye diyarkirin ev ji navdêran hatine çêkirin), *gurmî(ya)n û gurmandin, teqî(ya)n û teqandin, xuşî(ya)n û xuşandin, hîrî(ya)n û hîrandin*” (ku hatiye daxuyandin ev jî, ji dengên teqlîdî çêbûne) hatine derpêşkirin. Ji bo lêkerên ku ji pêşgiran hatine dariştin jî ev mînak hatine dayîn: “*dadan, daxistin, hilanîn, hilavêtin, rabûn, raçandin, vebestin, vebijartin, wergirtin, werkirin.*”¹²²

Li ser “lêkerên hevokîn”¹²³ jî bi kitekit hatiye rawestandî, lê ji bo mijar zêde berfireh nebe, dê qîm bi dana hin mînakên bê anîn û her wisan dê serî li pênasîya daner a li ser “lêkerên biwêjî” bê xistin: “*Bi daçekan, şêweya cînavkên lihevexistî yê kesê sêyem an jî cînavka berbihevîn ‘hev’ê ku bi ser hev de çûne û bi lêkerekê besîd an jî dariştî pêk tê.*”¹²⁴ Li gorî daner bi hatina cem hev a wan hêmanên hanê, lêkerên biwêjî tîr himatê, wekî “*lêdan, lêxistin, lihev dan, lihev kirin, pêbûn, pêxistin, pevkerin, pevçûn, jêbûn, jêhatin, jihev ketin, jihev çûn, têdan, têwerkirin, tevdan, tevketin, pêdabûn, pêdaketin, pêvedan, pêve kirin, pevde ketin, pevde xistin, pevve bûn, pevve hatin, pevve bûn, pevve kirin, jihevdebûn, jihevde kirin, jihevvebûn, jihevvekirin, têdebûn, têdekirin, têrekin/têrakin, têvekirin*”ê.¹²⁵

Lêkerên hevedudanî jî di sê binbeşan de hatine senifandin, mîna lêkerên ku I) bi navdêr û lêker, II) bi rengdêr û lêkerê û III) bi lêker û lêkeran çêdibin. Ji bo koma yekem lêkerên mînak ên wekî “*deng dan, beş kirin, ser jêkirin, dev jêberdan, dest pêkirin, pirs kirin*”ê, ji bo koma duyem lêkerên mîna “*sor bûn, dirêj kirin, binav*

¹²¹ Mûrad Ciwan, *h.b.*, r. 81. Têgihên nav kevanekê, ji bo zelaliyê ji hêla me ve hatin danîn.

¹²² *h.b.*, r. 81-86.

¹²³ Bi tirkî jê re “deyim filler” hatiye gotin, ku berginda wê ya kurmançî ya berbelav lêkerên biwêjî ye. Ji bo agahiya zêdetir *bnr. h.b.*, r. 81.

¹²⁴ *h.b.*, r. 86.

¹²⁵ *h.b.*, r. 86-88. Divê bê gotin ku ji aliyê me ve hîç dest li vekîta lêkerên biwêjî jî negeriyaye. Ev rewş, kêşe û aloziyeke rastnivîsa kurmançî ye û jixwe yek ji mijarên vê xebatê jî rastnivîsîna lêkeran e.

kirin, zelal kirin, bêhêvî bûn, bawer pê kirin, bêserûber kirin, bêpar hiştin, yek bûn”ê û ji bo koma dawîn jî lêkerên mîna “*hatin kirin, hatin şandin, hatin sorkirin, dan kirin, dan revandin û dan serjêkirin*”ê dikare wek nimûne bên dayîn.¹²⁶

Ji hemû mînakên dixuye ku polînkirina lêkeran a ji hêla binyatî ve xwedî kêşe ye û her wisan aloziya vekîta wan jî heye (ku mijara rastnivîsînê dê ji Beşa Sêyem re bê hiştin). Ji van her çar cureyên lêkeran a ji aliyê binyatî ve, senifana ku ji bo “lêkerên biwêjî” û ya ji bo lêkerên hevedudanî hatiye kirin, hewceyî nirxandinê ye.

Di nav senifana bi navê “lêkerên biwêjî” de, mînakên “*lê dan, lê xistin, pê bûn, pê xistin, jê bûn, jê hatin, tê dan, pê vedan, tê werkirin, pê de ketin, pê ve kirin, tê de kirin û tê re kirin*”ê, lêkerên veqetînbarek ên ji koma pêşîn ên cînavkên lihevxiştî ne. Dîsan lêkerên “*pev kirin, pev çûn, tev dan û tev ketin*”ê ji koma duyem ên cînavkên lihevxiştî pêk hatine û gişt lêkerên hevedudanî ne. Lêkerên “*li hev dan, li hev kirin, ji hev ketin, ji hev çûn, ji hev vebûn û ji hev vekirin*”ê jî ji aliyê binyatî ve lêkerên hevedudanî ne. Ên mayî yê “*pê de bûn, tê de bûn, tê ve kirin, pevde ketin, pevde xistin, pevde bûn, pevde hatin, pevde bûn, pevde kirin, ji hev de bûn û ji hev de kirin*”ê, ji aliyê binyatî ve ne cureyên lêkeran in. Ew kombêje û qalib in û ji bilî lêkerê hemanên din tevde di kêşanê de bi rola hokerê radibin. Divê bê gotin ku tebîra lêkerên biwêjî, ji bo wateya lêkeran a ji aliyê semantîk ve ye, loma nabe ku ji bo senifana “ji aliyê binyatî ve cureyên lêker”an bê bikaranîn.

Lêkerên hevedudanî ku di sê binbeşan de hatine senifandin, li ser beşa dawî îtiraz heye. Ji mînakên binbeşa yekem “*deng dan, beş kirin û pirs kirin*” û ji binbeşa duyem lêkerên “*sor bûn, dirêj kirin, zelal kirin, bêhêvî bûn, bêserûber kirin, bêpar hiştin, yek bûn û bin av kirin*”, lêkerên hevedudanî ne. Lêkerên “*ser jê kirin, dev jê berdan, dest pê kirin û bawer pê kirin*”, lêkerên veqetînbarek in ku bi cînavkên lihevxiştî yê ji tofa yekem çêbûne. Herçî lê lêkerên “*hatin kirin, hatin şandin, hatin sorkirin, dan kirin, dan revandin û dan serjêkirin*” in, ku ew ji bo lêkerên hevedudanî yê binbeşa sêyem hatine nîşandan, ne lêkerên hevedudanî ne. Ew aîdî kategoriya “ji aliyê avaniyê ve lêker” in û ji wê jî aîdî binbeşa “avaniya li gorî kirdeyê” ne. Bi

¹²⁶ h.b., r. 88-90.

alîkariya lêkera “*hatin*”ê lêkerên tebatî û bi alîkariya lêkera “*dan*”ê jî lêkerên dançêker tên himatê.

1.4.7. Kûrtçe Dilbilgisi Türkçe Açıklamalı, Rêzimana Kurdi

Ji aliyê A. Balî ve di xebatê de ku bi tirkî û kurmancî ye, ji aliyê binyatî ve lêker li sê beşan hatine dabeşandin: Lêkerên sade (xwerû), lêkerên hevedudanî û lêkerên alîkar.¹²⁷ Ji bo lêkerên xwerû wek nimûne lêkerên mîna “*anîn, avêtin, bûn, hatin, hebûn, ketin, nivîsîn, standin, şandin û xwendin*”ê¹²⁸ hatine dayîn. Herçî lêkerên hevedudanî ne, di bin sê jênavan de hatine vekolan û navên lêkerên hevedudanî yên koma yekem, yên koma duyem û yên koma sêyem li wan hatine danîn, ku îcar ji hêla daner ve jî ew li binbeşan hatine parevekirin.

Mînakên lêkerên hevedudanî yên koma yekem ku sisê ne, wiha hatine dayîn: I) *hatin şkandin, dayîn şkandin*, II) *sor bûyîn, sor kirin*, III) *hati bûn, di kim bêm*. Lêkerên hevedudanî yên koma duyem jî di bin sê binbeşan de hatine dayîn û pênaseya vê beşê bi awayê “*ew lêkerên ku ji navdêrek, rengdêrek an jî ji lêkerekê sade pêk tên*” hatiye ravekirin. Piştî bi dorê wek nimûne ji bo vê binbeşê ku heft in, ev lêker hatine pêşkêşkirin: I) *badan, girêdan, xeberdan*, II) *dest xistin, rêxistin*, III) *hesab dîtin, xêr dîtin, zirar dîtin*, IV) *derd kişandin, xof kişandin*, V) *avakirin, bîrkirin, zêr kirin, zîv kirin*, VI) *ava bûn, cih bûn*, VII) *dest ketin, rê ketin*. Ji bo binbeşa duyem a Koma duyem a lêkerên hevedudanî, hatiye diyarkirin ku ew ji rengdêr û lêkerekê çêdibin û du beş in, beşa yekem: I) *hûr bûn, sor bûn, tirş bûn, xwar bûn* û II) *dûr ketin, dereng ketin, nexweş ketin*. Beşa duyem jî bi peyvên ku dubare dibin û bi lêkerekê pêk tên: *qul-qul kirin, qul-qulî bûn, parçe-parçe kirin, parçe-parçe bûn*.¹²⁹ Ji bo lêkerên hevedudanî yên koma sêyem jî hatiye gotin ku ew ji pêşdaçek û lêkerên xwerû çêdibin. Her wiha hatiye diyarkirin ku di kurdî de pêşgirên di çêkirina lêkerên hevedudanî de tên bikaranîn, dibin du beş; I) Lêkerên hevedudanî yên xwedî pêşdaçekê û II) Lêkerên hevedudanî yên xwedî du pêşdaçekan. Ji bo ku ramanê zelal ji me re çêbe, bêtêketina nav hûrgilî û kitekitan dê bi tenê qîm bi dayîna hin nimûneyên vê beşê bê anîn: *bergirtin, berdan*,

¹²⁷ A. Balî, *h.b.*, r. 171.

¹²⁸ *h.b.*, r. 172. Ji aliyê A. Balî ve jî herfên “i” û “î”yê, wek yên tirkî bi awayên “i” û “î” hatine bikaranîn. Lê ew ji aliyê me ve li wekî tîpên alfabeya Celadet Bedirxan hatin guhartin.

¹²⁹ *h.b.*, r. 174-177.

*bingirtin, daxistin, dadan, derketin, derxistin, hilkirin, hildan, navkirin, dûketin, paşketin, peyçûn, pêşketin, jêbûn, têdan, têxistin, lêkirin, pêxistin, jev çûn, lev anîn, pev ketin, tev dan, serda kirin, navra çûn, pêşda ajotin, binra anîn, paşda mayîn, şunda birin...*¹³⁰ Ji hêla daner ve, ji aliyê binyatî ve lêker li sê koman hatine dabeşkirin û komek jê jî, bi navê “lêkerên alîkar” hatiye diyarkirin, lê belê tu agahî der barê ya dawîn de nehatiye dan.

Wekî yên din, dîsan mîna awayê ku daner bi mijarê de çûye, dê bi heman rêbazê li ser senifan û mînakên derpêşkirî bê rawestandî û têbîniyên der heqê wan de bîna aşkerakirin.

Ji nav lêkerên ku ji bo lêkerên xwerû hatine nîşandan, lêkerên “*hebûn*” û “*nivîsîn*”ê ne lêkerên xwerû ne. Ji ber ku berê ravekirin li ser lêkera “*hebûn*”ê¹³¹ hatibû kirin, tenê dê li ser lêkera “*nivîsîn*”ê bê rawestandî. Ev lêker, çendî wek lêkereke xwerû bixuye jî, ya rast ew lêkereke dariştî ye û awayê wê yê kevn û dêrin “*nivîştin*” e û bergînda wê ya di kirmanckî de jî “*nuştene*”¹³² ye. Her wisa di pehlewî de “*nibiştên*”¹³³ û di zimanê farisî de jî bi awayê “*nivîştên*”¹³⁴ e. Bêjeyên “*nivîşt*” û “*nivîştî*”yê ji lêkera “*nivîstin*”ê tê ku awayê wê hîn jî di zimanê me yê devkî de, li hêla Cizîr û Şîrnexê zindî ye. Rayeka dema niha ya “*nivîstin*”ê “*nivîs*” e û ji wê jî bi alîkariya paşgirên /-în/ û /-andin/ê, “*nivîsîn*” û “*nivîsandin*” hatine çêkirin ku her du jî di rewşa têper de ne.

Ji ber hin lêkerên xwerû û yên dariştî di heman formê de ne, rast e ku pir zehmet e bi awayekî vebir daraz (hikim) li ser wan bê dan. Loma hewce bi lêkolîn û tiwêjandîneke kûr û berfîreh a ji bo peyitandina lêkerên dariştî yên di dirûvên lêkerên xwerû de heye. Ji lew re jî divê mînakên lêkerên dariştî yên bi vî awayî, di rêzimanan de pir zelal bin û xwedî taybetiyeke nenîqaşbar bin.

¹³⁰ *h.b.*, r. 177-180.

¹³¹ Di xebata Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer a Dr. Kamuran Ali Bedir-Xan de, li ser lêkera “*hebûn*”ê bi awayekî hewce têbîni hatibûn diyarkirin.

¹³² Grûba Xebate ya Vateyî, **Ferhengê Kirmanckî (Zazakî) - Tirkî**, “Nuştene”, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2016.

¹³³ Rojen Barnas, “Ferhengoka Pehlewî û Kurmancî”, **Kurmancî**, h. 14-15, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs 1994, r. 2-4.

¹³⁴ Mehmet Kanar, *h.b.*, “Yazmak”, Birikim Yayınları, İstanbul 2008.

Bêyî dirêjîpêdana bi mijara lêkerên hevedudanî, ku ew li sê koman û kom jî li binbeşan hatine dabeşandin, dê bi awayekî puxteyî ji lêkerên nimûneyî bê behskirin û tiwêjan li ser wan bîn kirin. Ji mînakên koma yekem a lêkerên hevedudanî tenê “*sor bûyîn*” û “*sor kirin*” lêkerên hevedudanî ne. Lêkerên ku bi awayê “*hatin şkandin*” û “*dayîn şkandin*” hatine pêşkêşkirin jî dikevin nav senifana “ji aliyê avaniyê ve lêker” û her du jî aîdî binbeşa wê ya bi navê “avaniya li gorî kirdeyê” ne. Ya pêşîn xwedî forma lêkera tebatî, ya dawîn jî xwedî şeweya lêkera dançêker e. Her duyên din “*hati bûn* û *di kim bêm*” jî nakevin nav tu senifaneke “ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran”. Ji ber ku ew di rewşa kêşandî de û têkildarî demên keşanê yên lêkeran in.

Ji lêkerên hevedudanî yên koma duyem “*dest xistin, rêxistin, bîrkirin, cih bûn, dest ketin, rê ketin*”, lêkerên hevedudanî ne, lê pêşdaçekên wan ji wan ketine û jixwe di hin devokên kurmancî de ev yeka hanê eyan e. Awayê wan ê rast jî wiha ye: *bi dest xistin, bi rê xistin, ji bîr kirin, bi cih bûn, bi dest ketin û bi rê ketin*.

Ji bo beşa dawîn a li ser lêkerên hevedudanî amaje pê hatiye kirin ku ew ji lêkerên hevedudanî yên xwedî pêşdaçekeke û yên xwedî du pêşdaçekan pêk tên: Ji wan lêkerên “*berdan, daxistin, dadan, derketin, derxistin, hilkirin û hildan*”ê ne lêkerên hevedudanî lê lêkerên dariştî ne û bi pêşgiran, lê ne bi daçekan çêbûne. Lêkerên “*jê bûn, tê dan, tê xistin, lê kirin û pê xistin*”ê, lêkerên veqetînbar in û ew ji cînavkên lihevxiştî (*jê, lê, pê, tê*) pêk hatine. Lêkerên “*jev çûn, lev anîn, pev ketin û tev dan*”ê, ji cînavkên lihevxiştî “*lev, lev, pev û tev*”ê yên ku bi ser hev de quncivîne çêbûne. Şeweyên wan ên adetî bi awayê “*ji hev çûn, li hev anîn, bi hev ketin û di hev dan*” e. Lê di hin lêkeran de ev cînavkên lihevxiştî di dema kêşanê de êdî li hêmanên xwe yên bingehî danagerin. Mîna “*pev çûn*” û “*tev gerîn*”ê. Eger bi kurtî bê gotin, ev jî lêkerên hevedudanî ne. Ji bilî van, lêkerên “*navkirin, dûketin, paşketin, peyçûn û pêşketin*”ê lêkerên hevedudanî ne, lê pêşdaçeka wan jî ji wan ketiye. Şeweya rastnivîsana wan jî divê wiha be: *bi nav kirin, bi dû ketin, bi paş ketin, li pey çûn û bi pêş ketin*. Lêkerên din, ango “*serda kirin, navra çûn, pêşda ajotin, binra anîn, paşda mayîn û şunda birin*” bi forma qaliban in û divê şeweya wan a rast jî bi wayê “*bi ser de kirin, di nav re çûn, bi pêş de ajotin, di bin re anîn, bi paş de man û bi şûn de birin*” be, ku pêşdaçekên wan di mînakan de nehatine bikaranîn. Çawan berê jî der barê van cure mînakan de ravekirin hatin kirin, a esil lêkerên wan in. Tevî daçek û

hêmanên dîtir gava ew tên çevandin, ew hêman dikevin rewşa hokerî. Loma ew gişt bi hev re cureyeke lêkerê ya ji hêla binyatî ve naynin holê û jixwe wek navdêr bikaranîna wan wiha ye: “*kirina bi ser de, çûna di nav re, ajotina bi pêş de, anîna di bin re, mana bi paş de û birina bi şûn de.*” Ji vê rewşa wan jî pir bi aşkerahî dixuye ku ew hêman gişt bi hev re lêkerê pêk naynin. Eger ew tev bi hev re lêker bûna diviya ku wek qayde bi hev re jî bihatina nivîsandin.

1.4.8. Rêzimana Kurmancî

Di vê berhemê de ji aliyê Samî Tan ve bi awayekî berfireh li ser mijara lêkeran lêhûrbûn hatiye kiriin û bi kitekit ji taybetiyên wan hatiye behskirin. Lê ji ber mijar aliyê binyatî ve cureyên lêkeran e, eynî mîna berhemên din dê tenê bi awayekî kurtasî behs ji vê dabaşê bê kirin. Di bin sernavê “Ji aliyê peyvsaziyê ve lêker” de, ji aliyê binyatî ve lêker li du beşan hatine dabeşandin: Lêkerên xwerû û lêkerên nexwerû.

Lêkerên nexwerû jî li du binbeşan hatine veqetandin; wekî lêkerên hevedudanî û lêkerên pêkhatî.¹³⁵ Piştî ji bo lêkerên xwerû listeyeke gelek dirêj hatiye pêşkêşkirin, mîna van lêkeran: “*ajotin, aşartin, bihîstin, cûtin, çêstin, dan, efsartin, firotin, gestin, hêvotin, kelaştin, listin, malaştin, naştin, palaftin, qefaltin, rêtin, sotin, şûştin, xepartin, xistin, xwestin, zanistin.*”¹³⁶

Pênaseya ji bo lêkerên nexwerû jî bi awayê “*lêkerên nexwerû, ji lêkerên xwerû, navdêr û hevalnavan bi alîkariya qertaf, daçek û lêkerên din tên bidestxistin*” hatiye kirin û ew li du koman hatine beşkirin: Lêkerên hevedudanî û lêkerên pêkhatî.¹³⁷ Ji bo lêkerên hevedudanî, hin mînak hatine derpêşkirin; bêtî destlêgerandina li awayê wan ê vekîte, wek nimûne çend heb ji wan ev in: *olandan, diyarkirin, danzanîn, başbûn, hêvîşikestin, şopgerandin, dilman, bidestketin, bergirtin, berxwarin, agirdadan, agirxweşkirin, aramgirtin, balkêşan û bêhnvedan.* Her wiha, di berdewamiya vê beşê de, hatiye diyarkirin ku lêkerên mîna “*hêvîşikestin*”,

¹³⁵ Samî Tan, **Rêzimana Kurmancî**, Çapa nûkirî ya 3., Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Îstanbul 2015, r. 230.

¹³⁶ *h.b.*, r. 230-257.

¹³⁷ *h.b.*, r. 257.

“*dilmayin*” û “*bîrbirin*”ê jî lêkerên biwêjî ne.¹³⁸ Herçî lêkerên pêkhatî (dariştî) ne, ew jî li du beşan hatine parîkirin. Mîna lêkerên pêkhatî yên ku bi paşgir û pêşgiran tîne pê. Bêyî dirêjîpêdanê, serê pêşî dê ji bo zelaliya mijarê çend mînakên lêkeran ên ku bi paşgiran hatine dariştin bînin dan û paşê jî dê li ser lêkerên ku bi pêşgiran çêbûne bê rawestandî. Ji bo lêkerên ku bi paşgiran hatine dariştin, çend mînak: *rev* (*revîn*, *revandin*), *fir* (*firîn*, *firandin*), *kel* (*kelîn*, *kelandin*), *cemed* (*cemidîn*, *cemidandin*), *germ* (*germijîn*, *germijandin*), *kel* (*kelijîn*, *kelijandin*), *rep* (*repisîn*, *repisandin*). Lêkerên ku bi pêşgiran hatine dariştin: *wergerandin*, *wergirtin*, *dadan*, *daketin*, *rakirin*, *ragihandin*, *vedan*, *vexwarin*, *hilgirtin*, *hilgirtin*, *rokirin* û *rûniştin*.¹³⁹

Piştî senifana li ser “ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran”, amaje bi cureyekî din jî hatiye kirin û hatiye daxuyandî ku ji bilî lêkerên hevedudanî û pêkhatî “lêkerên bidaçek” jî hene ku gelek ji wan ji cînavkên lihevxiştî “*lê*, *tê*, *pê*, *jê*” pêk hatine û ew lêkerên biwêjî ne.¹⁴⁰ Ji bo vê yekê jî mînakên lêkeran ên wekî “*têdan*, *bicihkirin*, *pêde çûn*, *jêhezkirin*, *jêkirin*, *têrekirin*, *pêhesîn*, *pêvekirin*, *lêxistin*, *lêguhdarîkirin*, *bawerîpêanîn*, *bidûrketin*”ê hatine destnîşankirin. Li pev van mînakên lêkeran, bal li ser “hokerên cih” ên wekî “*ber*” û “*der*”ê hatiye kêşan ku bi wan jî lêker tîne çêkirin; mîna “*berdan*, *beranîn*, *derxistin*, *deranîn* û *beravêtin*”ê.¹⁴¹

Ji ber têgiha “lêkerên biwêjî” jî hatiye bikaranîn, senifana ji aliyê binyatî ve cureyê lêkeran dikare wek sê koman bê pejirandin; mîna lêkerên xwerû, lêkerên nexwerû û lêkerên biwêjî. Li ser nimûneyên lêkerên xwerû ku ji hêla daner ve hatine pêşkêşkirin, gotineke ku bê gotin nînin e. Lê li ser nimûneyên ku ji bo tesnîfa bi navê lêkerên nexwerû yên bi navê lêkerên hevedudanî hatine pêşkêşkirin, hewce bi tiwêjandinê heye. Ji nav mînakên “*olan dan*, *diyar kirin*, *dan zanîn*, *baş bûn*, *hêvî şikestin*, *şop gerandin*, *dil man*, *bi dest ketin*, *ber girtin*, *ber xwarin*, *agir dadan*, *agir xweş kirin*, *aram girtin*, *bal kêşan* û *bêhn vedan*”ê, lêkera “*dan zanîn*” ne ji lêkerên hevedudanî ye û ew dikeve nav polîna lêkerên dançêker.

Bi navbernavê “lêkerên daçekî” bal li lêkerên ku bi cînavkên lihevxiştî (*jê*, *lê*, *pê* û *tê*) û yên ku bi daçekan pêk tîne, hatiye kêşan û hatiye diyarkirin ku bi awayekî

¹³⁸ *h.b.*, r. 258-262.

¹³⁹ *h.b.*, r. 263-265.

¹⁴⁰ *h.b.*, r. 265-266.

¹⁴¹ *h.b.*, r. 266-267.

piranî ew lêkerên biwêjî ne û hin mînak ji bo wan hatine pêşkêşkirin. Wekî “*tê dan, bi cih kirin, pê de çûn, jê hez kirin, jê kirin, tê re kirin, pê hesîn, pê ve kirin, lê xistin, lê guhdarî kirin, bawerî pê anîn, bi dûr ketin*”ê. Carek ev *jê, lê, pê* û *tê* ne daçek in, cînavkên lihevxiştî ne, lê di hin rewşan de bi erka gireyê radibin. Loma ji nav van nimûneyên hanê “*tê dan, jê hez kirin, jê kirin, pê hesîn, lê xistin, lê guhdarî kirin, pê de çûn, pê ve kirin* û *tê re kirin*” lêkerên veqetînbare in. Lêkerên ku mane, ew jî lêkerên hevedudanî ne. Lêkerên veqetînbare ku ew ji cînavkên lihevxiştî û lêkerekê (cure çî dibe bila bibe), yan ji cînavkeke lihevxiştî, daçek û lêkerekê yan jî ji bêjeyeke ji esilê navdêrê, ji cînavkeke lihevxiştî û lêkerekê çêdibin, cudahiya wan ji cureyên lêkerên binyatî yê din ew e ku di heyna kêşanê de gava ew li hêmanên xwe yê hîmî vedigerin, tişte dikeve navbera daçek û lêkerê.

Ji bo ravekirina daner a li ser “hokerên cih” ên wekî “*ber*” û “*der*”ê û mînakên ku ji bo wan hatine dayîn, hewce bi kirina çend gotinan heye: Herçî “*ber*”a di mînakên “*beranîn*” û “*beravêtin*” de ye, ne hokera cih e, ew bi wateya “berhem”ê ye, ango ew berginda bêjeya erebî mehsûl e û navdêr e. Lêkera “*ber anîn*” tê mehneya “*ber dan*” yanê “*berhem dan*”ê, lê belê “*ber avêtin*” ji bo pez û dewaran e. Gava ajala avis bi awayekî pêşxwet hemla xwe biavêje tê bikaranîn û ji bo mirovan jî biwêja “*ji ber çûn*”ê tê bikaranîn. Ji lew re ew lêkerên hevedudanî ne ku ew ji navdêr û lêkerekê alîkar çêbûne. Der heqê /*der-*/ê de nêrînên cuda hene ku hinek dibêjin ew di rastiya xwe de ne pêşgir e,¹⁴² ji bêjeya “*derve*”yê tê, lê êdî wisan lê hatiye ku ew bi peywira pêşgirê radibe. Mîna “*derçûn, derketin, derxistin, derpê, derling, dergûş*” û hwd. Lê divê bê zanîn ku di zimanê farisî de jî pêşgirek bi navê /*der-*/ê heye û pê lêkerên dariştî çêdibin, wekî “*dergozeştin*” û “*derxwasten*”.¹⁴³ Li ser wê, fikir çî dibin bila bibin, rastiyeke li holê heye ku bi awayekî gelemper /*der-*/ wek pêşgirekê bi bêjeyê ve tê nivîsandin û bi heman fonksiyona pêşgirê mîna /*da-*/, /*ra-*/, /*hil-*/ û /*ve-*/yê bi karê xwe radibe. Ji lew re, bi ya me ew rayek ji çî hatibe bila hatibe, ew êdî pêşgir e û lêkerên “*derxistin*” û “*deranîn*” jî lêkerên dariştî ne.

¹⁴² Ji bo agahiyê *bnr.* Mistefa Aydoğan, **Rêbera Rastnivîsînê**, Weşanxaneya Rûpelê, İstanbul 2012, r. 183.

¹⁴³ Nîmet Yıldırım, **Farsça Dilbilgisi**, Genişletilmiş dördüncü baskı, Fenomen Yayınları, Ankara 2009, r. 142.

Li ser gotina “lêkerên biwêjî” jî ku ji aliyê daner ve hin lêker di bin wî navî de hatine bicihkirin, ji hêla senifana “ji aliyê binyatî ve lêker”, ne rast e. Çawan berê jî hat diyarkirin, tebîra “lêkerên biwêjî”, ji aliyê wateyayî ya lêkeran ve tê gotin, loma nabe ji bo senifana ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran bê bikaranîn.

1.4.9. Gramera Kurdî (Kürtçe Gramer)

Cureyên lêkerên binyatî di vê berhema du zimanî ya bi kurmancî û tirkî de, li jêr jêrnave “sazbûna lêkeran” ji hêla Halîl Altug ve li sê beşan, wekî lêkerên xwerû, lêkerên pêkhatî û lêkerên “pevedanî” hatiye dabeşandin.¹⁴⁴ Ji bo lêkerên xwerû, mînakên wekî “*hat, ket, çû, da, firot, kirî, anî û bû*” hatine pêşkêşkirin ku ew di rewşa rayeka dema borî de ne.¹⁴⁵ Herçî lêkerên dariştî ne, di bin du binbeşan de hatine senifandin û wisan berdewamî bi mijarê hatiye dan ku ji bo binbeşa pêşîn hatiye aşkerakirin ew cure lêker bi pêşgirên mîna /*ba-*/, /*çê-*/, /*da-*/, /*hil-*/, /*ra-*/, /*rû-*/, /*ve-*/, /*wer-*/ û /*der-*/ê pêk tên. Ji bo ku mijar zêde dirêj nebe, qîm pê hat anîn ku tenê çend lêker li xebatê bîr veguhastin ku ew ji aliyê daner ve wek nimûne hatine pêşkêşkirin: “*ba-kirin, ba-dan, çê-kirin, çê-bûn, da-ketin, da-kirin, ve-kirin, ve-dan, ra-dan, ra-girtin, hil-dan, hil-anîn, rû-kirin, rû-dan, rû-cikandin, wer-gerandin, wer-girtin, der-ketin, der-xistin.*” Beşa din jî ew lêker in ku bi paşgira /*-andin*/ê ji navdêran dariştina lêkerên têper in. Wek *rev* > *revandin*; *ken* > *kenandin*; *meş* > *meşandin*. Dîsan behsa parkîteke bi navê /*-î/yê* hatiye kirin ku bi wê jî lêkerên dariştî tên çêkirin. Wek nimûne: *bez, bez-î-in* (bezîn); *ken, ken-î-in* (kenîn); *zar, zar-î-in* (zarîn), *nal, nal-î-in* (nalîn).¹⁴⁶ Her wiha hatiye daxuyandin ku lêkerên hevedudanî ji du peyvan an jî ji du peyvan zêdetir pêk hatine û ew bi gelemperî bi alîkariya lêkerên alîkar ên mîna “*karîn, hatin, çê, bûn, kirin, dayin, êxistin, ketin*”ê çêdibin. Ji bo vê yekê jî hin mînak hatine derpêşkirin, ku çend heb ji wan ev in: *min karî herim, ez zanim bixwînem, min wêrî herim, hate pehtin, avis bûn, rût bûn, ava kirin, da kirin, derketin, serketin, dûr êxistin, ser êxistin, avdan, berxwedan, dil hiştin, bêhn vekirin.*¹⁴⁷

¹⁴⁴ Halîl Altuğ, *h.b.*, r. 404.

¹⁴⁵ *h.b.*, r. 404.

¹⁴⁶ Ji bo mijara lêkerên dariştî *bnr. h.b.*, r. 404-408.

¹⁴⁷ *h.b.*, r. 408-420.

Ji aliyê Altug ve amaje pê hatiye kirin ku bi alîkariya daçekan jî lêkerên hevedudanî tên dariştin û ji bo vê jî, lîsteyeke mînakan hatiye pêşkêşkirin. Di nav mînakan de, nimûneyên wekî “*pêbûn, berketin, derkirin, berdan, derxistin, serketin, pêkenîn, lêgerîn û jêkirin*”ê hene ku di yekê ji wan de jî ne pêşdaçek ne jî paşdaçek heye.¹⁴⁸

Di vê xebatê de, balkêşiyek heye. Hin lêker di rewşa hevokê ango kêşayî de hin jî di halê rader û qalib de hatine derpêşkirin, ku ew ne di wateya xwe ya rast de, lê belê di wateya biwêjî û mecazî de tên bikaranîn. Ji van lêkeran hin jê ev in: *bêhna min derket, serê min gêj bû, dilê min şikest, ber dest kirin, guh dan*.¹⁴⁹

Eger bi kurtasî bê gotin; ji aliyê binyatî ve lêker di bin sê sernavan de hatine nirxandin, wekî lêkerên xwerû, yên pêkhatî (dariştî) û yên pevedanî (hevedudanî)¹⁵⁰. Li gel vê rewşê, tevî ku ji senifanê cuda jê behs hatibe kirin jî, bi lêkerên hevedudanî re eleqedar, lêhûrbûn li ser lêkerên biwêjî jî hatiye kirin. Niha bi dorê dê li ser senifan û mînakên ku daner dane were sekinandin û nirxandina wan bê kirin.

Der barê lêkerên xwerû de hatiye gotin ku gava ew qertafên raderê wergirin, ew nabin lêkerên xwerû. Di vê peyta hanê de şasiyeke gelek mezin heye. Carek lêker ji cureyên bêjeyan in, lê erka wan û cureyên din ên bêjeyan ji hev gelek cihê ye û ew wek hîmên (ruknen) zimên tên pejirandin û ew hêmana bingehîn a hevokê ne. Ji lew re lêker bi tena serê xwe di rewşa raderê de ne û ji aliyê binyatî ve ji çî cureyê dibin bila bibin, nabe ku bêyî raderê ew bînin pejirandin.

Lêkerên dariştî li du binbeşan hatine senifandin, ên ku bi pêşgirên mîna /*ba-*/, /*çê-*/, /*da-*/, /*hil-*/, /*ra-*/, /*rû-*/, /*ve-*/, /*wer-*/ û /*der-*/ê û yên ku bi paşgira /*-andin*/ê pêk hatine. Ji bo binbeşa yekem nimûneyên wekî “*ba-kirin, ba-dan, çê-kirin, çê-bûn, da-ketin, da-kirin, ve-kirin, ve-dan, ra-dan, ra-girtin, hil-dan, hil-anîn, rû-kirin, rû-dan, rû-cikandin, wer-gerandin, wer-girtin, der-ketin, der-xistin*”ê hatine rapêşkirin. Ji bilî “*ba-kirin, ba-dan, çê-kirin, çê-bûn, rû-dan û rû-cikandin*”ê yên din lêkerên dariştî ne, lê ev nimûneyên diyarkirî lêkerên hevedudanî ne. Awayê din ê lêkera “*ba-kirin*”ê bi

¹⁴⁸ *h.b.*, r. 418-420.

¹⁴⁹ *h.b.*, r. 420-422.

¹⁵⁰ Têgihên nav kevanekê ji aliyê me ve hatin danîn.

şekilê “*bang kirin*”ê (ango gazî kirin’ê) ye û ew hevedudanî ye, dîsan “*ba-dan*”¹⁵¹ bi xwe jî lêkerê hevedudanî ye û çawan ku her du “*ba*” jî ji aliyê wateyê ve ne heman tişt in, her wisan ne pêşgir in jî. Lêkerên “*çê-bûn*” û “*çê-kirin*” di rastiya xwe de lêkerên hevedudanî ne û jixwe berê der barê wan de hin zanyarî hatibûn dan¹⁵². Lêkera “*rû-dan*”ê lêkerê hevedudanî ye û têkiliya “*rû*”ya vir û ya lêkera “*rû-niştin*”ê, bi hev nîn e. Di berhemê de berginda “*rû-dan*”ê ya bi tirkî wek “yüz vermek”ê (rû li xwe vekirin) hatiye diyarkirin. Ji vê raveyê jî tê zanîn ku ew “*rû*” bi wateya serçav, wech û sûret e. Loma ew ne pêşgir e, navdêr e. Bi alîkariya lêkera “*dan*”ê jê lêkerê hevedudanî hatiye piraştin. Lêkera “*rûcikandin*”ê, hatiye xuyakirin ku ew ji “*çikandin*” û pêşgira “*rû*”yê hatiye dariştin. Ev jî ne rast e, carek awayê wê yê rast “*rûçikandin*” e û bergindên wê yên din jî “*pirçikandin, pirtikandin, pûrtikandin, pûr kirin, pirçûkandin, vepirtikandin*” û hwd. in. Pir pir, dikare bê angaştin ku ew lêkerê dariştî ye û bi paşgira /-andin/ê çêbûye.

Li ser ravekirin û nimûneyên lêkerên ku bi paşgira /-andin/ê hatine dariştin, îtiraz nîn e, lê li ser “*parkîta bi navê /-î/*”yê îtiraz heye. Bi morfema /-î/yê, ji rayeka dema borî ya lêkerê, lêkera rengdêrî ango pareng tê çêkirin; mîna *bûyî, dayî, ketî, xwarî, xweastî*... Lê hatiye diyarkirin ku bi /-î/yê lêkerên dariştî tîne çêkirin. Bi wê tenê na, lê belê çawan ku ji navdêr an jî rengdêran bi alîkariya paşgira /-andin/ê lêkerên dariştî yê tîper tîne bidestxistin, her wisan bi alîkariya /-în/ê jî ji bêjeyê ji esilê navdêrê lêkerên dariştî yê tîneper tîne çêkirin. Bi kurtasî, ev her duyên hanê ku dabaş li ser wan e, paşgir in.

Di xebatê de wekî li jorê jî hatiye diyarkirin, lêkerên hevedudanî, bi navê “*lêkerên pevedanî*” hatiye binavkirin û hatiye aşkerakirin ku ew “*ji du peyv an jî ji du peyv zêdetir pêk hatine û ew bi gelemperî bi alîkariya lêkerên alîkar ên mîna ‘karîn, hatin, çê, bûn, kirin, dayin, êxistin, ketin’ê çêdibin*”. Ji bo mijarê jî mînakên wekî “*min karî herim, ez zanim bixwînê, min wêrî herim, hate pehtin, avis bûn, rût bûn, ava kirin, da kirin, derketin, serketin, dûr êxistin, ser êxistin, avdan, berxwedan,*

¹⁵¹ Di devokên Herêmên Tor, Hekarî û Behdînan de, kêşana lêkerên dariştî yê bi pêşgiran, ji devokên kurmancî yê din bi awayekî cihê tê kirin. Gireyên deman ên neyîniyê û hin gereyên deman tîne pêşiya pêşgirê. Mîna “*neberdaye, diveşart, narazê*”, lê di wan devokan de “*nabadan, dibadan*” nayê gotin. Ji vê rewşê jî diyar dibe ku “*ba dan*” lêkerê hevedudanî ye.

¹⁵² Di beşa lêhûrbûna li ser xebata Celadet Bedirxan û Roger Lescot de, der barê wan lêkeran de agahiyên pêwîst hatibûn derpêşkirin.

dil hiştin, bêhn vekirin”ê hatine pêşkêşkirin. Ji nav lêkerên ku wek lêkerên alîkar hatine nîşandan “*karîn*” û “*çê*”, ne lêkerên alîkar in. Lêkera “*karîn*”ê lêkereke alîkar a raweyî ye û pê hevokeke lêkdayî/aloz çêdibe, herçî “*çê*” ye, ew rengdêr e û bi alîkariya lêkerekên “*bûn*” û “*kirin*”ê jî, jê lêkerekên hevedudanî pêk tên. Li aliyê din, bi alîkariya lêkera “*hatin*”ê lêkerên hevedudanî çênabin. Nimûneyên ku ji bo wê hatine nîşandan (wekî *hatin pehtin, hatin kirin, hatin gotin, hatin ji ber kirin, hatin çêbûn, hatin çêkirin*) jî di rewşa lêkerên tebatî de ne û ew dikevin nav polîna “ji aliyê avaniyê ve kêker” û binbeşa wê ya “avaniya li gorî kirdeyê.” Lê awayê kêşana “*hatin çêbûn*” şaşiyêke rêzikî ya gramerê ye, ji ber ku lêkera hîmî divê di rewşa têper de be (*hatin çêkirin*).

Hin mînakên ku ji bo mijara lêkerên hevedudanî hatine dan, têkiliya wan hîç bi lêkerên hevedudanî re nîn e. Ji wan tenê lêkerên “*avis bûn, rût bûn, ava kirin, dûr êxistin, av dan, dil hiştin û bêhn vekirin*” lêkerên hevedudanî ne. Lê lêkerên “*da kirin*” û “*derketin*” lêkerên dariştî, yê *serketin* (bi ser ketin/keftin), *ser êxistin* (bi ser êxistin/xistin), *berxwedan* (li ber xwe dan) lêkerên hevedudanî ne û “*hate pehtin*” jî di rewşa çevandî ya lêkera tebatî de ye. Her siyên mayîn (*min karî herim, ez zanim bixwînem û min wêrî herim*) jî dîsan di rewşa kêşayî ya lêkerên alîkar ên raweyî de ne ku bi wan îcar hevokên hevedudanî tên pê.

1.4.10. Rêzimana Kurmancî

Ji aliyê binyatî ve lêker di berhema Bahoz Baran de li sê beşan, bi navên lêkerên xwerû, lêkerên pêkhatî û lêkerên hevedudanî hatine parîkirin.¹⁵³ Ji bo lêkerên xwerû mînakên wekî “*xwarin, bûn, birin, mirin, hatin, ketin, çûn û kirin*”ê¹⁵⁴ hatine dayîn. Lêkerên pêkhatî (dariştî) jî di bin du jênavan de, mîna lêkerên ku bi paşgiran û pêşgiran çêdibin, hatine tiwêjandin. Der barê lêkerên dariştî de yê ku bi paşgiran hatine piraştin, hatiye diyarkirin ku ew bi gireyên /-î/, /-andin/ û /-t/yê pêk tên û ji bo wan lêkerên “*ken-î- (n), rev-î- (n), pirrs-î- (n), firr-î- (n), kurr-î- (n), kux-î- (n), meş-î- (n), rev-and-(in), ken-and-(in), fir-and-(in), bir-and-(in), hel-and-(in), pelax-t-(in), kesax-t-(in), bihar-t-(in), qeşar-t-(in), guher-t-(in) û qelaş-t-(in)*”ê, wek nimûne

¹⁵³ Der barê mijarê de ji bo zanyariyên zêdetir *bnr.* Bahoz Baran, **Rêzimana Kurmancî**, Belkî, İstanbul 2012, r. 171-174.

¹⁵⁴ *h.b.*, r. 171.

hatine derpêşkirin.¹⁵⁵ Ji bo lêkerên dariştî yên bi pêşgiran jî hatiye daxuyandin ku ew bi pêşgirên wekî /ba-/ , /da-/ , /hil-/ , /ra-/ , /rû-/ , /ve-/ û /wer-/ê tên dariştin û lêkerên “*ba-ketin, ba-xistin, ba-dan, da-ketin, da-kirin, hil-dan, hil-kirin, ra-girtin, ra-xistin, rû-dan, rû-niştin, ve-ketin, ve-xwarin, wer-girtin û wer-gerandin*”ê jî wek nimûne hatine nîşandan.¹⁵⁶

Beşa din a ji hêla binyatî ve lêker jî, lêkerên hevdudanî ne. Daner daye zanîn ku lêkerên ji vî cureyî ji du yan zêdetir hêmanan, ji navdêr û ji lêkerekê pêk tînin. Li gel vê, dîsan hatiye bibîrxistin ku bêjeyên bi lêkera alîkar re tînin bikaranîn navdêr, rengdêr, cînavk, daçek û hoker in. Ji bo lêkerên hevedudanî, wek nimûne yên nîşandayî “*avdan, bikaranîn, hezkirin, rûdan, dînbûn, sorkirin, acizbûn, lêkirin, jêkirin, pêketin, pevçûn û paşketin*” in.¹⁵⁷

Ji hêla binyatî ve, di berhemê de tesnîfa lêkeran di bin sê sernavan de hatiye kirin: Lêkerên xwerû, yên dariştî û yên hevedudanî. Mînakên lêkerên xwerû yên dayî, rast in, lê li ser mînakên her du beşên din pêwîstî bi analiz û nirxandinê heye.

Der barê lêkerên dariştî de yên ku bi paşgiran hatine piraştin, hatiye diyarkirin ku ew bi gireyên /-î/, /-andin/ û /-t/yê pêk tînin. Ji van tenê paşgira /-andin/ê rast e, lê her du yên din şaş in. Bi /-andin/ê ji bêjeyên wekî navdêr û tîngî rengdêran lêkerên têper tînin çêkirin. Mîna *rev* > *revandin*, *pirs* > *pirsandin*, *ken* > *kenandin*, *fir* > *firandin*... Bi fonema /-î/yê jî ji rayeka dema borî ya lêkerê, pareng tînin dariştin; mîna *girtî*, *pehtî*, *sotî*, *xwestî* û *hwd*. Lê ji bêjeyên ji esilê navdêran bi paşgira /-în/ê îcar lêkerên tîneper bi dest dikevin. Ji bo vê rewşê çend nimûne: *meş* > *meşîn*, *ken* > *kenîn*, *kux* > *kuxîn*, *guher* > *guherîn*. Her wiha di nav nimûneyan de hatiye angaştin ku lêkera “*kirîn*” jî, lêkerekê dariştî ye û ew bi paşgira /-î/yê çêbûye. Ev yek ne rast e, lêkera “*kirîn*”ê lêkerekê xwerû ye û ew têper e ku di zimanê farisî de ew bi awayê “*xerîden*” e.

Angaşta din jî ew e ku hin lêker jî, wekî “*pelax-t-in, kesax-t-in, bihar-t-in, qeşar-t-in, guher-t-in û qelaş-t-in*”ê, bi paşgira /-t/yê çêbûne. Ev lêkerên derpêşkirî hemû lêkerên têper û xwerû ne. Taybetiyeke lêkerên kurdî ew e ku xwedî du rayekan

¹⁵⁵ *h.b.*, r. 171-172.

¹⁵⁶ Ji bo agahiyên hîn berfirehtir *bnr. h.b.*, r. 172-173.

¹⁵⁷ *h.b.*, r. 173.

in û tenê di rayeka dema niha de guherînan dengan, ango tewang çêdibe. Di rayeka dema borî de tu guhartin pêk nayê. Lê ji bilî lêkerên wekî “*mirin*”, “*girîn*” û “*jîn*”ê ku îro rayeka her du demên wan yek e; di hemû lêkeran de, piştî guherîna dengdêr û dengdaran, wek qayde dengê dawî yê rayeka dema borî dikeve. Wek nimûne; “*parastin*” bi dorê dibe “*parast*”, dengdara dawî /t/ dikeve û di pey tewanga dengdêra /a/ û dengdara /s/yê rayeka dema niha “*parêz*” tê himatê. Ev rewş ne tenê ji bo wan lêkerên têper e ku kêteya wan a dawî /-tin e, lêkerên mîna “*birin, çûn, dan, kirin, kirîn*”ê jî wisan in. Piştî hilanîna raderê rayeka dema borî, bi ketina dengê dawî jî rayeka dema niha li rastê dimîne. Ew taybetî, tenê ne xweserî lêkerên xwerû çî têper çî teneper e, xweserî lêkerên dariştî ye jî ku ew bi paşgiran çêbûne. Ji bo mînak; “*germ*” rengdêr e, bi alîkariya paşgirên /-ijîn/ û /-ijandin/ê jê lêkerên dariştî ya teneper “*germijîn*” û ya têper “*germijandin*” çêdibin. Rayeka dema borî ya “*germijîn*”ê “*germijî*” û piştî ketina dengê /i/ya li dawiyê jî rayeka dema niha “*germijî*” bi dest dikeve. Heman tişt ji bo “*germijandin*”ê jî welê ye; “*germijand*” rayeka wê ya dema borî û di pey ketina dengê /d/yê û tewanga dengdêra /a/yê bi /i/yê “*germijîn*” peyda dibe. Ji ber vê yekê, angaştta ku /t/ paşgir e û pê lêkerên dariştî tên piraştin, ne rast e.¹⁵⁸ Eger ev yek rast bê qebûlkirin, divê hemû dengê dawî yê di rayeka dema borî ya lêkeran de jî wek paşgir bên pejirandin.

Bal li lêkerên dariştî yên bi pêşgiran hatiye kêşan û hatiye daxuyandin ku ew bi pêşgirên wekî /ba-/ , /da-/ , /hil-/ , /ra-/ , /rû-/ , /ve-/ û /wer-/ê pêk tên û ji bo wan jî lêkerên nimûneyî yên wekî “*ba-ketin, ba-xistin, ba-dan, da-ketin, da-kirin, hil-dan, hil-kirin, ra-girtin, ra-xistin, rû-dan, rû-niştin, ve-ketin, ve-xwarin, wer-girtin* û *wergerandin*”ê hatine nîşandan. Divê di serî de bê gotin ku pêşgireke bi navê /ba-/yê di kurmancî de heta niha nehatiye peyitandin û ew lêkerên ku ji bo wê wek mînak hatine dan (*ba-ketin, ba-xistin, ba-dan*) yek ji wan bi xwe jî ne lêkereke dariştî ye. Herçî “*ba dan*”¹⁵⁹ e, lêkereke hevedudanî ye. Dîsan “*ba ketin*” û “*ba xistin*” lêkerên hevedudanî ne, lê şeweya wan a rast jî divê bi awayê “*li ba ketin*” û “*li ba xistin*”ê be.

¹⁵⁸ Ji bo zanyariyên hîn zêdetir ên der barê tewang û ketina dengê dawî yê lêkeran de *bnr.* Zana Farqînî, “Bideştixistina rayeka lêkeran”, *Zend* (Zivistan 2006), Weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Îstanbul, r. 42-63.

¹⁵⁹ Li ser vê lêkerê, di xebata halil Altug de ya bi navê Gramera Kurdî (Kürtçe Gramer), agahiyên hewce wek jêrenot hatibûn dayîn.

Beşa din a ji hêla binyatî ve lêker jî, lêkerên hevedudanî ne ku daner daye zanîn ew lêkerên ji du yan zêdetir hêmanan, ji navdêr û ji lêkerekê pêk tê. Her wisan, dîsan bi bîr hatiye xistin ku bêjeyên bi lêkera alîkar re tînan bikaranîn navdêr, rengdêr, cînavk, daçek û hoker in û lêkerên “*avdan, bikaranîn, hezkirin, rûdan, dînbûn, sorkirin, acizbûn, lêkirin, jêkirin, pêketin, pevçûn û paşketin*” ji bo vê mijarê hatine nîşandan. Lêkerên nîşandayî yê “*av dan, hez kirin, dîn bûn, aciz bûn, sor kirin, bi kar anîn, pev çûn û paş ketin*” bi tenê lêkerên hevedudanî ne. Lêkera “*pev çûn*” ji “*bi hev çûn*”ê çêbûye û “*paşketin*” jî “*bi paş ketin*” bi xwe ye. Her wiha lêkera “*rûdan*” di nav lêkerên hevedudanî de hatiye dayîn ku ew lêker nakeve nav polînkirina binavkirî. Eger “*rûdan*” bi wateya “*qewimîn*”ê be ew lêkerekê dariştî ya bi pêşgiran e, ku jixwe di beşa lêkerên dariştî de hatibû daxuyandin, lê ger bi mehneya nîşandana eleqeyê û şûmkirinê be, îcar ew hevedudanî ye û divê bi awayê raderî wiha be: *rû dan*. Lêkerên din, ango “*lê kirin, jê kirin û pê ketin*” jî, lêkerên veqetîbar in.

1.4.11. Temel Alıştırma ve Metinlerle Kùrtçe Dilgisi (Kurmancî Lehçesi)

Xebata dawîn a ku ji bo mijara ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran hatiye vekolan, a Kadri Yıldırım e. Di berhema duzimanî (kurmancî û tirkî) de cih ji lêkerên binyatî re hatiye veqetandin û ew wek çar beş hatine senifandin: Lêkerên xwerû, dariştî, hevedudanî û yê biwêjî.¹⁶⁰ Ji bo lêkerên xwerû mînakên pêşkêşkirî “*ketin, çûn, bijartin, birin, bûn, dan, gerandin, kirin, xistin û zan*” in. Ji bo lêkerên dariştî jî lêkerên “*hilbijartin, têkbirin, vebûn, berdan, wergerandin, daketin, rokirin, rûniştin, derxistin û razan*” hatine dayîn û hatiye diyarkirin ku ew bi pêşgiran mîna /*hil-*/, /*têk-*/, /*ve-*/, /*ber-*/, /*wer-*/, /*da-*/, /*ro-*/, /*rû-*/, /*ra-*/ û /*der-*/ê hatine çêkirin. Ji bo beşa lêkerên hevedudanî jî lêkerên “*asêbûn, asêkirin, nexweşketin, berdan, bergirtin, arbarîn, çavbirîn, çavgirêdan û serhildan*” wek nimûne hatine nîşandan. Beşa dawîn a lêkerên binyatî wek lêkerên biwêjî hatiye binavkirin û ji bo van cure lêkeran jî hin nimûne hatine pêşkêşkirin. Wekî lêkerên “*lêçûn, lihevhatin, pêkhatin* (ku mîna

¹⁶⁰ Kadri Yıldırım, *h.b.*, r. 40.

pêkatin hatiye nivîsandin), *pevçûn*, *jêkirin*, *jihevbûn*, *têgeriyan*, *tevbûn*, *pêvekirin*, *pevrebûn*, *jihevdexistin* û *jihevrebûn*.”¹⁶¹

Li gorî Yildirim di kurmancî de ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran çar in: Lêkerên xwerû, lêkerên dariştî, lêkerên hevedudanî û lêkerên biwêjî. Ji bo senifana lêkerên xwerû nimûneyên dayî “*ketin*, *çûn*, *bijartin*, *birin*, *bûn*, *dan*, *gerandin*, *kirin*, *xistin* û *zan*” in, lê ji wan “*gerandin*” lêkerekê dariştî ye û ew bi paşgira *-andin*/ê ji navdêra “*ger*”ê hatiye dariştin. Berginda lêkera “*gerîn*”ê ya farisî “*geştin*”, “*geşt zeden*” û “*gerdiş kerdin*”¹⁶² e. Di farisî de rayeka vê lêkera hanê ya dema borî, “*geşt*” e, lê di kurmancî de “*geşt*” ne wek rayeka dema borî, tenê wek navdêr maye û carinan ew û “*ger*”ê mîna hevoka “*em herin geşt û gerê*”, bi hev re tîk bikaranîn.

Hatiye diyarkirin ku lêkerên dariştî bi pêşgirên mîna */hil-*, */têk-*, */ve-*, */ber-*, */wer-*, */da-*, */ro-*, */rû-*, */ra-* û */der-*ê tîk dariştin, wekî lêkerên “*hilbijartin*, *têkbirin*, *vebûn*, *berdan*, *wergerandin*, *daketin*, *rokirin*, *rûniştin*, *derxistin* û *razan*”ê. Ji van pêşgiran û lêkerên mînak */têk/* û “*têkbirin*” ne tîk de, yê din lêkerên dariştî ne. Îcar “*têk*” cînavka lihevxiştî ya ji tofa duyem e ku ew ji daçeka “*dî*”yê û ji cînavka berbihevîn “*êk*”ê (ku ew di devoka Hekarî û Behdînan de bi rola cînavka berbihevîn “*hev*”ê radibe) pêk hatiye. Loma jî “*têk birin*”, lêkerekê hevedudanî ye.

Lêkerên “*asêbûn*, *asêkirin*, *nexweşketin*, *berdan*, *bergirtin*, *arbarîn*, *çavbirîn*, *çavgirêdan* û *serhildan*”ê ji bo lêkerên hevedudanî wek mînak hatine raberkirin. Lê ji nav wan, lêkera “*berdan*”ê, lêkerekê dariştî ya bi pêşgiran e.

Ji bo beşa “lêkerên biwêjî” mînakên nîşandayî “*lêçûn*, *lihevhatin*, *pêkhatin*, *pevçûn*, *jêkirin*, *jihevbûn*, *têgeriyan*, *tevbûn*, *pêvekirin*, *pevrebûn*, *jihevdexistin* û *jihevrebûn*” in. Ji van jî “*lê çûn*, *jê kirin*, *tê geriyan* û *pê ve kirin*” lêkerên veqetînbar in, lêkerên “*pêk hatin*, *pev çûn* û *tev bûn*” ku bi alîkariya cînavkên lihevxiştî yê ji tofa duyem çêbûne û lêkerên mayîn ango “*li hev hatin*, *ji hev bûn*” tevde lêkerên hevedudanî ne. Ev ên hanê jî, ango “*ji hev de xistin*, *ji hev re bûn*, *pev re bûn*” ne ji cureyên lêkeran in. Ew di gel yekeyên zimanî yê din hatine bikaranîn, ku di dema kêşanê de ji bilî lêkerê ew ên din bi erka hokerê radibin.

¹⁶¹ Ji bo agahiyên berfireh *bnr. h.b.*, r. 41-43.

¹⁶² Mehmet Kanar, *h.b.*, “Gezmek”, Birikim Yayınları, İstanbul 2008.

1.5. HEVBERÎKIRINA BERHEMÊN KU BÛNE MIJARA XEBATÊ

Lêker, wek tê zanîn bi pîvaneyên mîna forma lêkerê, erk û peywira wê, bi giştî li gorî rêbaza kevneşopî/adetî li sê beşan tînin levakirin. Gava ev yazdeh (11) gramer ji aliyê binyatî ya cureyên lêkeran ve hatin vekolan, li ser vê yekê jî hat rawestandî. Hat dîtin ku ji bilî çend heban, mijara lêkeran a ji aliyê binyatî, avanî û teşeyê (formê) ve bi şêweyê rêkûpêk, bipergal di bin sernav û jêrnavan de nehatine senifandin û di hinan de jî ji aliyê teşeyê ve ji lêkerên rêzîkî û nerêzîkî nehatiye behskirin. Hema wisan bi rêbazeke belawela li ser lêkeran hatiye rawestandî. Wek mînak, di xebata Kamûran Bedirxan û A. Bali de bi awayekî rêkûpêk di bin sernavan de, di xebata Celadet Bedirxan, a Kemal Badillî, ya Feqî Huseyn Sagniç, a Bahoz Baran û ya Halil Altug de bi awayekî nerêkûpêk ji aliyê binyatî, avanî û teşeyê ve ji lêkeran behs hatiye kirin. Di berhema Qanatê Kurdo, ya Mûrad Ciwan, a Samî Tan û ya Kadrî Yildirim de tenê qalkirina ji aliyê binyatî û avaniyê ya lêkeran heye. Lê divê ku lêker wek beş di bin sê sernavan de bi teherekî birêkûpêk ji aliyê binyatî ve lêker, ji aliyê avaniyê ve lêker û ji aliyê teşeyê ve lêker bihatina senifandin da ku ji aliyê metodolojiyê ve bipergal bûna û ji aliyê bikaranînê ve jî pratîk bûna.

Ji ber mijara hîmî ya xebatê ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran e, ev rêziman hem bi kitekit ji aliyê senifanên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve hatin vekolan hem jî nixandî li ser lêkerên nimûneyî hatin kirin û tîbînî hatin diyarkirin. Di encama lêkolînê de bi awayekî aşkera xuya bû ku ne senifana danerên van berheman a li ser van cure lêkeran hev digirin ne jî lêkerên ku wek mînak hatine nîşandan, wekî hev in. Ji ber vê rewşê, bi awayekî puxtîyê dê hewl bê dan ku hevberîkirinek di navbera wan de bê kirin da ramanekê giştî li ser wan bi me re çêbe. Di serî de dê were xuyakirin ku bê ji aliyê binyatî ve cureyê lêkeran ka li gorî kê çend in û paşê jî dê dêhn li lêkerên nimûneyî bê kêşan û berawirdek di navbera wan de were kirin. Ev yek jî ji bilî tîbetina nav kitekitan, dê bi awayekî serkî bê diyarkirin.

Li gorî Celadet Bedirxan ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran ên kurmancî sisê ne: Lêkerên xwerû, hevedudanî û biwêjî. Li gorî Kamûran Bedirxan çar in: Lêkerên xwerû, hevedudanî, biwêjî û yê alîkar. Li gorî Qanatê Kurdo jî wek lêkerên xwerû, lêkerên dariştî, yê hevedudanî û yê alîkar, çar in. Anegorî Feqî Huseyn Sagniç ev

cure lêker, bi navên lêkerên xwerû, lêkerên hevedudanî, lêkerên dariştî û lêkerên qertaf, çar in. Li gorî Kemal Badilli didu ne: Lêkerên xwerû û yên hevedudanî. Anegorî Mûrad Ciwan ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran bi şekilê lêkerên xwerû, lêkerên dariştî, lêkerên hevedudanî û yên biwêjî, çar in. Li gorî A. Balî sisê ne: Lêkerên xwerû, hevedudanî û yên alîkar. Li gorî Samî Tan bi awayê lêkerên xwerû û nexwerû, didu ne. Li gorî Halîl Altug û Bahoz jî ev cure lêkerên ku dabaş li ser wan e, sisê ne: Lêkerên xwerû, dariştî û yên hevedudanî. Her wiha anegorî Kadrî Yildirim jî ji hêla binyatî ve cureyên lêkerên kurmancî, wekî lêkerên xwerû, yên dariştî, yên hevedudanî û yên biwêjî çar in.

Wekî tê dîtin hejmara lêkeran a ji aliyê binyatî ve ya daneran ji hev cuda ne ku hejmara cureyên van lêkeran ji diduyan heta çaran diguhere. Ji bilî Samî Tan, di hemûyan de senifana lêkeran a bi şêweya lêkerên xwerû û hevedudanî hev digirin. Di nav senifana Samî Tan de, lêkerên xwerû û nexwerû hene, ku îcar lêkerên hevedudanî di bin jêrbeşa lêkerên nexwerû de hatine dan. Lêkerên biwêjî, wek beşeke serbixwe di nav polîna Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Mûrad Ciwan û Kadrî Yildirim de heye. Lêkerên alîkar wek beş di xebata Kamûran Bedirxan, a Qanatê Kurdo û ya A. Balî de heye. Lêkerên dariştî jî mîna beş di berhema Qanatê Kurdo, ya Feqî Huseyn Sagniç, a Mûrad Ciwan, Halîl Altug, a Bahoz Baran û ya Kadrî Yildirim de heye, ku di ya Samî Tan de, di bin jêrbeşa lêkerên nexwerû de cih girtiye. Ji van hemûyan cihê, di rêzimana Feqî Huseyn Sagniç de têgiha “lêkerên qertaf” jî heye ku mebest jê gireyên kesane ne û ew ji aliyê binyatî ve ne aîdî cureyên lêkeran in. Her wiha, lêkerên alîkar jî nakevin nav kategoriya ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran. Bi lêkerên alîkar, wekî nav li ser e, tenê lêkerên hevedudanî çêdibin û ew bi erka alîkariyê radibin.

Di van berhemana de ji bilî nimûneyên ku ji bo lêkerên xwerû hatine derpêşkirin (çend awarte ne tê de), nimûneyên din ên ku ji bo senifana cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve hatine destnîşankirin, naşibin hev. Ramanên danerên berhemana ji hev cuda ne û nikare ji lihevkirineke di navbera wan de bê behskirin. Eger bi dorê ji bo vê rewşê li ser cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve bê rawestandî:

Lêkerên Xwerû: Ew lêker bi serê xwe ne, ango ew bi alîkariya gireyên dariştinê nehatine çêkirin. Di hemû berhemana de, çendî navlêkirina wan ji hev cihê

be jî, bi rêjeyeke pir zêde mînakên lêkerên xwerû rast in. Li gel vê yekê, dîsan hewce dike ku piçek be jî li ser hin mînakan lêhûrbûnek bê kirin. Di xebata Kamûran Bedirxan û ya A. Balî de lêkera “*hebûn*”ê wek lêkera xwerû hatiye destnîşankirin, ku di esilê xwe de ew lêkereke hevedudanî ye. Di xebata Qanatê Kurdo de “*cûn/cûyîn*” û di ya Kemal Badilli de jî “*cûyin*” wek lêkereke xwerû hatiye diyarkirin, lê awayê wê yê xwerû û dêrin “*cûtin*” e. Di berhema Feqî Huseyn Sagniç de “*hizirîn*”, “*ponijîn*” û “*danîn*” ji bo lêkerên xwerû hatine dan, lê her sê jî lêkerên dariştî ne. Her du yê pêşîn bi paşgira /-în/ê û ya din jî bi paşgira /da-/yê pêk hatine. Di xebata A. Balî de lêkera “*nivîsîn*” û di ya Kadrî Yildirim de jî lêkera “*gerandin*” wek lêkerên xwerû hatine pejirandin ku her du jî dariştî ne. Lêkera “*nivîsîn*” bi paşgira /-în/ê û ya “*gerandin*”ê jî bi paşgira /-andin/ê hatiye dariştin.

Lêkerên Dariştî: Ew lêker in ku bi pêşgir û paşgiran hatine piraştin. Wekî *dagirtin*, *derkirin*, *hilgirtin*, *rabûn*, *rûniştin*, *vekirin*, *vêketin*, *wergirtin*, *gerîn/gerandin*, *germijîn/germijandin*, *repisîn/repisandin*, *germixîn/germixandin* û *beliqîn/beliqandin*ê. Di berhema Celadet Bedirxan, a Kamûran Bedirxan, a Qanatê Kurdo, ya Feqî Huseyn Sagniç, a Kemal Badilli û ya A. Balî de lêkerên dariştî yên bi paşgiran (mîna *derkirin*, *hilgirtin*, *rabûn*, *rûniştin*, *vekirin*, *vêketin*, *wergirtin*ê) wek lêkerên hevedudanî hatine nîşandan. Îcar li gorî Mûrad Ciwan, Samî Tan, Halîl Altug, Bahoz Baran û Kadrî Yildirim ew lêkerên dariştî ne. Li gorî pênaseya lêkerên hevedudanî, divê ku ew lêker ji cureyên bêjeyan pêk werin. Ji nimûneyên li jorê jî xweş dixuye ku ew bi paşgiran çêbûne û gireyên dariştinê ne ji cureyên bêjeyan in, loma ew lêkerên dariştî ne.

Lêkerên Hevedudanî; ev lêker ku bi kurtasî bê gotin, bi piranî ji du bêjeyan (bêjeyek ji esilê navdêrê û ji lêkereke alîkar) an jî ji du bêjeyan zêdetir (ji daçek, ji bêjeyeke esilê navdêrê û ji lêkereke alîkar) pêk tên. Îcar lêkerên dariştî yên bi paşgiran li gorî Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Qanatê Kurdo, Feqî Huseyn Sagniç, Kemal Badilli û A. Balî lêkerên hevedudanî ne. Dîsan lêkerên hevedudanî yên bi daçekan çêbûne, wekî *li hev hatin*, *bi lêv kirin*, *ji bîra kirin*, *li hev anîn*ê li gorî Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Mûrad Ciwan û Kadrî Yildirim ew lêkerên biwêjî ne. Dîsan lêkerên hevedudanî yên ku bi cînavkên lihevxiştî yên ji tofa duyem

(wek *jev/jêk, lev/lêk, pev/pêk* û *tev/têkê*) pêk hatine, di bin navên ji hev cuda de ji wan hatiye behskirin. Mesela li gorî Kadrî Yildirim ew lêkerên biwêjî ne.

Lêkerên Veqetînbar: Ev lêker ji cînavkên lihevxiştî yên ji tofa yekem (*jê, lê, pê* û *tê*) û lêkereke alîkar, an ji cînavkeke lihevxiştî, ji paşdaçêkek û lêkereke alîkar an jî ji bêjeyeke ji esilê navdêrê, ji cînavkeke lihevxiştî û lêkereke alîkar çêdibin. Mîna *lê xistin, pê ketin, jê kirin, tê dan, pê ve kirin, tê re kirin, dest pê kirinê*. Ev lêker ji hêla Celadet Bedirxan, Qanatê Kurdo, Kemal Badilli, A. Balî, Bahoz Baran û Halîl Altug ve wek lêkerên hevedudanî hatine pejirandin û binavkirin. Lê di rêzimana Kamûran Bedirxan, a Mûrad Ciwan û ya Kadrî Yildirim de ew di bin sernavê lêkerên biwêjî de hatine nîşandan. Ev lêker di xebata Samî Tan de jî, di bin sernavê “lêkerên bidaçek” de ji wan hatiye qalkirin.

Li aliyê din, di hin gramêran de hin tesbîten balkêş jî hene. Mesela ji aliyê avaniyê ve lêkerên tebatî (ku bi alîkariya lêkera *hatinê*) û lêkerên dançêker jî (ku ew bi alîkariya lêkera *danê* tên çêkirin), ji hêla Feqî Huseyn Sagniç, Kemal Badilli, Mûrad Ciwan, A. Balî û Halîl Altug ve di nav “ji aliyê binyatî ve lêker” de hatine hesabandin. Her wisan di xebata Kemal Badilli û A. Balî de kêşana awayê demên hevedudanî û raweya pêşkerî (*hati bûn, di kim bêm*) ji bo cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve wek nimûne hatine nîşandan.

Di van berheman de, mijareke girîng jî nêziktêdana daneran a li ser awayê rastnivîsîna lêkeran e ku jixwe dê piştê bi berfirehî li ser vê mijarê bê rawestandî. Gelşa herî zêde ya der barê vê rewşê de, di warê lêkerên hevedudanî û yên “biwêjî” de heye. Mesela lêkerên hevedudanî yên wekî “*limêj kirin, pîr bûn, ava kirin, girê dan, nas kirin, av dan, ba dan, sor bûn, olan dan, asê bûn*”ê hinekan ew ji hev cuda nivîsîne (wekî Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Qanatê Kurdo), lê hinekan jî bi hev ve nivîsîne (wekî samî Tan, Bahoz Baran û Kadrî Yildirim).

Ji van xebatan, ku tenê di ya Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Mûrad Ciwan û ya Kadrî Yildirim de wek beşeke serbixwe ji cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve cih jî lêkerên “biwêjî” re hatiye terxankirin, vekîta M. Ciwan û K. Yildirim ji ya C. Bedirxan û K. Bedirxan cuda ye. Mînak ji bo gramêra C. Bedirxan û ya K. Bedirxan: *bin av bûn, li hev hatin, bi rê ketin, dest pê kirin, hatin ser xwe, ji*

bîra kirin, lê siwar bûn. Ji rêzimana M. Ciwan ji bo awayê vekîtê çend mînakên “lêkerên biwêjî”: lihev dan, lihev kirin, pevkirin, jihev ketin, têwerkirin, tevdan, pêdabûn, pêvedan, pêve kirin, pevde ketin, pevre bûn, pevve kirin, jihevdebûn, jihevde kirin û têvekirin. Îcar di rêzimana K. Yildirim de, hemû nimûneyên ku ji bo “lêkerên biwêjî” hatine dan, gişt bi hev ve hatine nivîsandin. Çend mînak: lihevhatin, pêkhatin, pevçûn, jihevbûn, tevbûn, pêvekirin, pevrebûn, jihevdeistin û jihevrebûn.

Hewce bi amajepêkirinê heye ku nabe tebîra “lêkerên biwêjî” ji bo senifana “ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran” bê bikaranîn. Ji lew re mebest ji binyatê awayê çêbûna lêkeran, hatina cem hev a awayê yekeyên zimên û fonksiyona wan a di nav tevahiyekê de ye, ne mehneya wan e. Gava ku ji aliyê wateyê ve li ser lêkeran bê sekinandin wê hingê dikare ji wateya wan a rast, wateya wan a layekî û ji wateya wan a mecazî, her wisan ji aliyê semantîk ve jî ji lêkerên biwêjî bê behskirin.

Di van berhemana de, ji lêkerên hevedudanî yên ku bêjeya wan a ji esilê navdêrê bi paşgira /-eve/yê çêbûne mîna *çepeve bûn, dereve kirin, gêjeve bûn, reşeve hatin* û *şîreve kirinê*, qet behs nehatiye kirin. Her wisan, ji lêkerên veqetînbarekê ku bi alîkariya morfema /-a/ û /-î/yê çêdibin jî (wekî *beriya... kirin, hînî... bûn*), hîç nehatiye behskirin an jî tu tiştêk li ser wan nehatiye gotin.

Wek gotina dawî ya li ser vê hevberîkirina serkî: Bi aşkerahî dixuye ku ramanên zimannas û rêzimannasan hem li ser senifana lêkeran a ji aliyê binyatî ve ji hev cihê ne, hem jî rastnivîsana wan ne mîna hev e. Her wiha bi nêrîna me senifana wan a lêkeran a ji aliyê binyatî ve hem kêm hem jî gelşdar e. Li aliyê din, ji ber ku di navbera wan de li ser her du waran, ango li ser senifan û rastnivîsîna hin cureyên lêkeran nakokî heye, loma nikare ji hizireke wan a hevpar bê qalkirin.

BEŞA DUYEM

JI ALIYÊ BINYATÎ VE SENIFANA CUREYÊN

LÊKERÊN KURMANCÎ

Li jêr ronîya zanyarî û pênasayên li ser cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve, dê hewl bê dan ku ji aliyê binyatî ve senifaneke cureyên lêkeran ên di zaravayê kurmancî de hene, ji nû ve bê kirin. Gava ev senifan bê kirin jî, heta ji dest were dê bi mebesta zelalî û serwextbûna ji mijarê, serî li dayîna mînakan bê xistin.

Di encama lêkolîn û nirxandina li ser berhemên rêzimanê yê navborî de em gihîştin wê hizirê ku ji aliyê binyatî ve sê cure lêker di wan berhemên de hatine peyitandin: Lêkerên xwerû, lêkerên dariştî û lêkerên hevedudanî. Dê ji hêla me ve jî cureyeke din li vê senifanê bê zêdekirin ku kesî wek senifaneke serbixwe ew hilnedaye dest. Ew jî lêkerên veqetînbare in û têgih bi xwe jî wekî berê hatibû diyarkirin, aîdî me ye. Di bin sernavê vê beşê de, dê li ser van cure lêkeran xal bi xal, tevî binbeşên wan bê rawestandî û dê ravekirinên pêwîst û hewcedar jî bên kirin.

2.1. LÊKERÊN XWERÛ

Ev cure lêker, wek ku nav lê ye bi alîkariya gireyên dariştinê ji bêjeyên esilê navdêran nehatine çêkirin. Ew lêkerên hîmî ne ku ji bêjeyê tenê pêk hatine û li beşên din nayên dabêşandin, angê ew li yekeyên watedar nayên parîkirin.

Ji bo lêkerên xwerû çend mînak: *ajotin, alastin, anîn, axaftin, bihîstin, bijartin, bûn, cûtin, çûn, dîtin, dirûtin, feşartin, firotin/firoştin, gestin, gihîştin, girtin, hatin, hiştin, jendin, jîn/jîndin, kenîştin, kesaxtin, ketin/keftin, kirin, kuştin, leyîstin/lîstin, malaştin, marastin, mirin, nivistin, niştin, nixamtin, parastin, pişaftin, qelaştin, qewartin, restin, rêtin, spartin, sûtin, şikestin, şûştin, vêtin, xepartin, xistin, xwarin, xwestin, zanistin, zivartin.*

Ji lêkerên xwerû hin lêker hene ku bi domana demê re ji aliyê şeweyê ve guherîn di wan de çêbûye û ji ber pêkerên cihê deng ji wan ketine, ji aliyê fonolojîk ve qewamên dengî di wan de rûdane. Wekî “*avêtin*”, “*girîn*”, “*jîn*”, “*kirin*” û “*mirin*”ê. Ji van lêkeran forma “*avêtin*”ê ya kevn “*avêştin*” e. Jixwe ji rayeka wê ya dema niha, ji “*avêj*”ê û ji dengdara ango ji fonema “*j*”yê diyar dibe (ku li gorî rêzika giştî ya tewanga lêkeran, di rayeka dema niha de “*ş*” dibe “*j*”), awayê wê yê dêrin “*avêştin*” e. Her du rayekên lêkera “*girîn*”ê “*girî*” ye û ev yek li dijî qaydeyê gelemper e. Berginda vê lêkerê ya di pehlewî û farisî de bi awayê “*girîsten*”¹⁶³ e. Çendî roja îro ev lêker wek “*girîn*” bixuye jî, wekî di devoka Farqînê de, carina ji bo kêşana dema borî mîna “*girîtin*”ê jî tê kêşandin. Ev şeweya “*girîtin*”ê forma “*girîsten*”ê tîne bîra mirov. Herçî lêkera “*jîn*”ê ye, ji rengdêra “*zindî*”yê ya ku jê çêbûye, xweş dixuye ku teşeyê wê ya berê “*jîndin*” e. Lêkera “*kirin*”ê jî “lêkerekê deforme ye û deng jê ketiye. Di her du zaravayên kurdî, di kirmanckî û kurmanciya xwarê (sorani) de ew “*kerden*” û “*kirdin*” e. Di pehlewî û farisî de jî forma wê “*kerden*”¹⁶⁴ e û di zimanê avestayî de jî rayeka wê bi şekilê “*ker-“ê*”¹⁶⁵ xuya dibe. Jixwe ji paşgira /-ker/ê ya di bêjeyên/kirdenavên wekî “*zêrker*”, “*zîvker*”, “*palanker*”, “*sifirker*” û “*karker*” de, ku ji rayeka dema niha ya “*kirin*” ango “*kerdin*”ê ye, xweş zelal dibe ku çawan şeweya kevn a “*kirin*”a kurmanckî “*kerdin*” bûye. Mînaka dawî, lêkera “*mirin*”ê jî wekî lêkera “*girîn*”ê, ne xwedî du rayekan e, halê hazir hem dema niha hem jî dema borî li ser rayeka “*mir*”ê tê kêşandin. Lê şeweya wê ya kevnar a di kurmanckî de “*mirtin*”¹⁶⁶ e, ku di kirmanckî û kurmanciya naverast de jî ew bi awayê “*merdene*” û “*mirdin*”ê ye. Lê belê çendî ji aliyê teşenasîyî (morfolojîk) û dengnasiyê (fonolojiyê) ve guherîn di wan de çêbûbin jî, ji hêla xwerûbûnê ve tiştek ji van cure lêkeran kêmbûye.

Di kurmanckî de gelek lêkerên dariştî (yên bi paşgiran çêbûne) hene ku pir dimînin (dişibin) lêkerên xwerû, loma jî gelek kes ji ber vê şibînê bi wan dixapin.

¹⁶³ Rojen Barnas, “Ferhengoka Pehlewî û Kurmanckî”, **Kurmanckî**, h. 14-15, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs 1994, r. 2-4.

¹⁶⁴ *h.b.*, r. 2-4.

¹⁶⁵ Bêhrûz Şucaî, “Ferhenga Avestayî-Kurdî”, **Kurmanckî**, h. 36, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs 2005, r. 8-9.

¹⁶⁶ Ev awayê “*mirtin*”ê di vê mînaka gelêrî de dixuye ku ji hêla me ve li navçeya Farqînê hatiye berhevkirin: *Mele seyê me mirt, me eyar jê daçirt, tomast dagirt, helal e heram e?* Di cureyên berhemên wêjeya devkî de, di qalib, biwêj û gotinên pêşyan de, di bêjeyên dariştî û yên hevedudanî de bi awayekî fosîlîzebûyî şeweyên kevn, form û morfemên kevnare yên hêvişandî tînin ku ew ji bo peyitandina vê yekê, çavkaniyên hêja ne.

Taybetiyeke dinê jî ew e ku ev lêkerên dariştî wekî yên xwerû tên çevandin û gireyên tafan ango yên deman û raweyan li wan zêde dibin. Her wisan dikare bê gotin ku rêjeyeke zêde ji lêkerên dariştî, ji rayeka dema niha ya lêkerên xwerû çêbûne û loma ji ber vê yekê tebîra “lêkerên cêwî” ji bo wan hatiye bikaranîn, wekî “*guyaştin*” û “*guyêşandin*”ê. Lêkera “*guyêşandin*”ê, ji rayeka dema niha ya lêkera “*guyaştin*”ê, ji “*guyêş*”ê, bi alîkariya paşgira */-andin/*ê hatiye dariştin. Ji ber ku di beşa lêkerên dariştî de, yên ku bi paşgiran pêk hatine, dê bi berfirehî ji wan bê behskirin, niha tenê qîm bi bîrxistina vê rewşê û dayîna vê mînakê tê anîn.

Lêkerên xwerû, eger bi awayekî giştî were gotin, ew maka lêkerên dariştî ne ku ew bi pêşgiran tên çêkirin. Wekî lêkera “*kirin*”ê ku bi pêşgiran lêkerên din ên ji aliyê wateyê ve jê cuda ne, hatine çêkirin: *dakirin*, *derkirin*, *hilkirin*, *rakirin*, *rokirin*, *vekirin* û *werkirin*. Taybetmendiyeke din a lêkeran, nemaze yên xwerû ew e ku ew kana hilberandina bêjeyan û çavkaniyeke xurt a dewlemendkirina gencîneya peyvyan in, loma jî lêker mîna zengîniya peyv û ferhengê tên dîtin.

2.2. LÊKERÊN DARIŞTÎ

Lêkerên dariştî, ew cure lêker in ku ji hêmaneke tenê çênebûne, ango ne bi tena serê xwe ne. Ew an ji lêkereke xwerû yan ji yeka dariştî yan jî ji cureyekî bêjeyê hatine piraştin. Di kurmancî de lêkerên dariştî bi pêşgir û paşgiran pêk tînin. Ji lew re dê di du binbeşan de bi awayekî berfirehî bal li wan bê kêşandin û bi şêweyeke bikitekit ji wan bê behskirin. Lê ji ber ku hem ji cureyê navdêran bi alîkariya paşgiran lêkerên dariştî û dîsan ji lêkerên dariştî bi alîkariya pêşgiran cardin lêker tînin çêkirin, ji bo hêsaniya serwestbûnê ya ji mijarê, bi me wisan tê ku destpêkirina ji paşgiran dê baştir be.

2.2.1. Lêkerên Dariştî yên bi Paşgiran

Di zaravayê kurmancî de hin paşgir hatine peyitandin ku bi wan ji cureyekî bêjeyê, di forma lêkerên xwerû de (ji ber ku awayê kêşana wan dişibe yên xwerû) lêkerên nû tînin hilberandin. Ev paşgiran ku bi erka dariştina lêkeran radibin, ji hêla hin zimanzanan ve jî amaje bi wan hatiye kirin, ku berhemên hinekan ji wan bûn mijara vekolîna me. Di berhema Celadet Bedirxan û Roger Lescot de hatiye aşkartin ku bi gireya */-andin/*ê ji lêkerên têper lêkerên dançêker û her wisan ji bêjeyên biyanî

jî lêker tên çêkirin. Wekî “*pirsîn*” û “*pirsandin*”, “*blof*” û “*belifandin*”.¹⁶⁷ Di xebatên kesên wekî Qanatê Kurdo¹⁶⁸, Feqî Huseyn Sagniç¹⁶⁹, Mûrad Ciwan (ku dide xuyakirin ji bo çêkirina lêkerên teneper /-iyan/ û ji bo yên têper jî /-andin/ tê bikaranîn)¹⁷⁰ û Samî Tan de jî, ji paşgirên ku bi wan lêkerên dariştî çêdibin mînak hatine dan. Ji bilî Tan, di berhemên yên din de tenê behsa paşgira /-în/ û /-andin/ê hatiye kirin ku bi wan ji bêjeyên ji esilên navdêran lêker tên dariştin. Ji bo mînak: *bez* > *bezîn*, *êş* > *êşîn*, *tirs* > *tirsîn*, *werm* > *werimîn*, *bez* > *bezandin*, *êş* > *êşandin*, *tirs* > *tirsandin*, *werm* > *werimandin*.¹⁷¹ Lê Samî Tan di gramera xwe de ya ku bûye mijara xebatê, behsa çend paşgirên din jî dike, wekî /-în/ û /-andin/, /-ijîn/ û /-ijandin/, /-isîn/ û /-isandin/ê.¹⁷² Her wisan ji hêla Zana Farqînî ve, hîn beriya vê xebata Tan, di gotara bi navê “Bidestxistina rayeka lêkeran de”¹⁷³ çêlî vê heman mijarê hatiye kirin û ew paşgir hatine destnîşankirin.

Li ser /-yan/ê ku wek paşgira lêkersaz di xebata Ciwan de hatiye diyarkirin, hewce bi kirina çend gotinên raveker heye. Bêjeyên bi şêweya “*beziyan*, *firiyan*, *geriyan*, *liviyan*, *reviyan*, *weşiyân* û *xuriyan*”, ne di forma raderî ya lêkerê de ne. Ji ber ku wek qaydeyê giştî dema niha li ser rayeka yekem nayê kêşan. Her wisan, kêşana demên borî ya li ser rayeka duyem jî li gorî hemû devokên kurmancî ne eynî ye. Eger bi kurtasî bê gotin bi /-iyan/ê ji rayeka dema niha ya lêkerê navdêr tê dariştin (ji ber ku di Beşa Sêyem mijara “Rastnivîsîna Cureyên Lêkeran a di Rewşa Raderî” de bi awayekî hewcedar dê ji vê rewşê bê behskirin).

Paşgirên ku bi wan lêker tên dariştin, ên heta niha ji aliyê me ve hatine peyitandin ev pêncên hanê ne: /-în/ û /-andin/, /-ijîn/ û /-ijandin/, /-isîn/ û /-isandin/, /-ixîn/ û /-ixandin/, /-iqîn/ û /-iqandin/. Bi paşgirên ewilî lêkerên teneper û bi yên dawîn jî yên têper tên dariştin. Ji nav wan jî yên herî berbelav û bikarbar jî /-în/ û /-

¹⁶⁷ Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, *h.b.*, r. 134.

¹⁶⁸ Qanatê Kurdo, *h.b.*, r. 130-144.

¹⁶⁹ Feqî Huseyn Sagniç, *h.b.*, r. 95-98.

¹⁷⁰ Mûrad Ciwan, *h.b.*, r. 82.

¹⁷¹ Eger ev peyv ji lêkeran hatibin jî, ku ev mijareke aloz û nîqaşbar e, lê êdî ew di rewşa navdêrê de ne û bi paşgiran jî wek lêker hatine dariştin.

¹⁷² Samî Tan, **Rêzimana Kurmancî**, Çapa nûkirî ya 3., Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Îstanbul 2015, r. 258-259.

¹⁷³ Der barê agahiyên zêdetir de *bnr.* Zana Farqînî, “Bidestxistina rayeka lêkeran”, **Zend** (Zivistan 2006), Weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Îstanbul, r. 42-63. Divê bê gotin ku ev gotara Farqînî di xebata Samî Tan a navborî de wek çavkanî hatiye bikaranîn.

andin/ in ku di zaravayê kurmancî de rêjeya lêkerên bi wan hatine çêkirin ji yên din gelek zêdetir in. Bi van, ji bêjeyên ji esilê navdêran û her wisan ji bêjeyên vebeyînî (onomatopeîk) jî lêkerên dariştî tên bidestxistin. Çend mînakên ku bi van paşgiran hatine çêkirin:

bez > *bezîn* > *bezandin*, *çelp* > *çelpîn* > *çelpandin*, *êş* > *êşîn* > *êşandin*, *fir* > *firîn* > *firandin*, *gurm* > *gurmîn* > *gurmandin*, *kew* > *kewîn* > *kewandin*, *nerm* > *nermandin*, *mir* > *mirandin*, *şîrq* > *şîrqîn* > *şîrqandin*, *tirs* > *tirsîn* > *tirsandin*, *xap* > *xapîn* > *xapandin*...

germ > *germijîn* > *germijandin*, *hilm* > *hilmijîn* > *hilmijandin*, *kel* > *kelijîn* > *kelijandin*, *nerm* > *nermijîn* > *nermijandin*, *tehm* > *tehmijîn* > *tehmijandin*, *teng* > *tengijîn* > *tengijandin*...

bel > *beliqîn* > *beliqandin*, *bij* > *bijiqîn* > *bijiqandin*, *çerm* > *çermiqîn* > *çermiqandin*, *tîn* > *tîniqîn* > *tîniqandin*, *zer* > *zeriqîn* > *zeriqandin*...

hel > *helisîn* > *helisandin*, *palm* > *palmisîn* > *palmisandin*, *rep* > *repisîn* > *repisandin*, *tep* > *tepisîn* > *tepisandin*...

germ > *germixîn* > *germixandin*, *gen* > *genixîn* > *genixandin*, *xew* > *xewixîn* > *xewixandin*...

Bi awayekî giştî, bi paşgirên */-în/*, */-ijîn/*, */-iqîn/*, */-isîn/* û */-ixîn/ê* lêkerên têneper û bi */-andin/*, */-ijandin/*, */-iqandin/*, */-isandin/* û */-ixandin/ê* jî bêtî awarte lêkerên têper tên çêkirin. Awarte tek ji bo paşgira */-în/ê* heye ku hinde lêkerên pê hatine dariştin, di rewşa têper de ne: Mîna lêkerên “*nasîn*”, “*nêrîn*”, “*pirsîn*” û “*birîn*”ê. Di gel vê yekê, çendî di hemûyan de paşgirên */-în/* û */-andin/ê* hebin jî, hêmanên/morfemên mîna */ij/*, */iq/*, */is/* û */ix/ê* didin xuyakirin ku lêker bi alîkariya wan tên piraştin û wateyên din li wan tên barkirin. Mesela bêjeya “*nerm*” rengdêr e, jê bi alîkariya */-ijîn/* û */-ixîn/ê* lêkerên “*nermijîn*” û “*nermixîn*”ê hatine dariştin ku wateya wan ne eynî ye. Lêkera pêşîn bi mehneya di avê de nermbûna tiştên mîna nok û fasûliyan û ya duyem jî bi wateya pelçiqîna fêkî û zebzeyan e. Ji vê rewşa hanê jî xweş aşkera dibe ku ew paşgir tevî hemû hêmanên xwe ve divê ku wek paşgir bên dîtin û pejirandin.

Li aliyê din, di kurancî de cewiyên hin lêkeran hene ku ew piştê bi alîkariya rayeka dema niha ya lêkerên xwerû hema bibêje bi temamî, bi paşgirên /-în/ û /-andin/ê ji nû ve hatine dariştin. Wekî lêkerên *axaftin* (*axiftin*) û *axivîn/axivandin*, *guhartin* û *guherîn/guherandin*, *nihartin* û *nêrîn/nêrandin*, *peyiftin* û *peyivîn/peyivandin*, *zivartin* û *zivirîn/zivirandin*, *pehtin* û *pijîn/pijandin*. Eger bi awayê ravekirî li ser çend lêkerên ku dabaş li ser wan e, bê sekinandin: Rayeka dema niha ya lêkera “*axaftin/axiftin*”ê “*axêv/axiv*” e; ji vê bi paşgira /-în/ê rewşa wê ya teneper (*axivîn*) û bi /-andin/ê jî halê wê yê teper (*axivandin*) hatiye çêkirin. Her wisan ji rayeka dema niha ya “*nihartin*”ê (ku formên wê yên devokî wekî “*nihêrtin*” û “*nêrtin*” jî hene) cardin lêker hatiye dariştin, ango ji rayeka wê ya “*nihêr*”ê (ku ji ber civitînê ew jî bûye *nêr*) awayê “*nêrîn*”¹⁷⁴ û “*nêrandin*”ê hatine çêkirin. Awayê “*peyivîn*”ê jî bi heman rêbazê ji rayeka dema niha ya “*peyiftin*”ê, ji “*peyiv*”ê çêbûye ku îcar rewşa wê ya teper “*peyivandin*” e.

Rêzikeke zimanî ya zaravayê kurancî heye: Gava ji rayeka dema niha ya lêkerê navdêrek were çêkirin, serî li du riyên tê xistin an dengdêrek (ku bi awayekî giştî /i/ ye) jê tê xistin an jî ew dengdêr bi dengdêreke din tê guhartin. Ji bo mînak; “*peyv*” ji rayeka “*peyiftin*”ê û bi ketina dengdêra /i/ya ji “*peyiv*”ê çêbûye, “*şewat*” ji rayeka dema niha ya “*şewitîn*”ê, ji “*şewit*”ê, bi guherîna dengdêra “/i/yê bi /a/yê çêbûye; “*şewt*” jî îcar bi ketina /i/ya ji rayeka dema niha ya “*şewit*”ê, pêk hatiye.

2.2.2. Lêkerên Dariştî yên bi Pêşgiran

Ev lêker ji pêşgir û lêkereke xwerû yan jî ji pêşgir û lêkereke dariştî ya ku bi paşgiran hatiye dariştin çêdibin. Ji ber vê rewşê, ev jî di nav xwe de dibin du beş: Lêkerên dariştî yên ku bi alîkariya pêşgir û lêkereke xwerû û yên ku bi alîkariya pêşgir û lêkereke dariştî pêk tên.

Di zaravayê kurancî de pêşgirên (pêrkîten) ku bi saya wan ji lêkeran lêkerên dariştî tên çêkirin, ên ku ji hêla me ve hatine peyitandin ev in: /ber-/ , /da-/ , /der-/ , /hil-/ , /ra-/ , /ro-, rû-/ ,¹⁷⁵ /ve-/ , /vê-/ û /wer-/ . Divê bê daxuyandin ku der barê hejmara pêşgirên lêkersaz de ramanê hevpar di navbera zimannasên kurd de nîn e û li gorî

¹⁷⁴ Bilêvkirina vê lêkerê ya di devoka Nisêbîn û Qamişloyê de, bi awayê “*nerîn*”ê ye.

¹⁷⁵ Ji ber ku lêkerên mînak ên bi van pêşgiran hatine çêkirin du sê - heb in û li gorî devokan ew di cihê hev de tên bikaranîn (mîna *roniştin* û *rûniştin*), loma hewce pê hat dîtin ku ew bi hev re bînin. Di gel vî qasî, di zaravayê kirmanckî de “*rûniştin*”a kurancî bi awayê “*roniştene*”yê ye.

hinekan jî mesela, /der-/ ¹⁷⁶ ne pêşgir e. Ji nav van pêşgirên hanê hinek jê zêde nebikarbar in, wekî /ber-/, /ro-, rû/ û /vê/yê. Bi van pêşgiran jî bi qasî ku hatiye tesbîtkirin, di zaravayê kurmancî de ev lêker hene: *berdan*, *berhilistin*, *berkeftin* (*berketin*), *rûdan*, *rûniştin* (*roniştin*); *rokirin* (*rûkirin*), *vêketin*, *vêsandin* û *vêxistin*.

Erk û foksiyona van pêşgiran jî ne wekî hev e. Çendî roja îro hinek taybetiyên van guherîbin û awarteyên wan çêbûbin jî, gava bi awayekî giştî lêkolîneke hûr li ser wan tê kirin, tê dîtin ku pêşgir bandor li erka lêkerên piraştî dikan. Eger bi şeweyeke gelemper erka wan bê formulêkirin, dikare bê gotin ku mesela bi pêşgira /da-/yê berê lêkera dariştî ji jor ber bi jêr ve (*dagerîn*, *dahatin*, *daketin*, *daxistin*), ya bi /der-/ê ji hundir ber bi derve ve (*deranîn*, *derbûn*, *derçûn*, *derkirin*, *derxistin*), ya bi /hil-/ê ji jêr ber bi jor ve (*hılanîn*, *hilbûn*, *hildan*, *hilhatin*, *hilkirin*), ya /ra-/yê ji jêr ber bi jor ve (*rabûn*, *rakirin*), ya bi /ve-/yê ji derve ber bi hundir ve (*veanîn*, *vehatin*, *vekirin*, *vexwarin*) û ya bi /wer-/ê jî ji hundir ber bi derve (*werbûn*, *werçûn*, *werkirin*, *werketin*) ye.¹⁷⁷ Hewce ye bê gotin ku gelek lêkerên bi van pêşgiran hatine dariştin, êdî îro li derveyî vê rêzika giştî ne û averêbûnek bi domana demê re di vê rêzaya (qaydeyê) hanê de çêbûye.

Hebûna van pêşgiran û fonksiyona wan, ji bo zimanê kurdî derfeteke gelek mezin e ku ew dikin bi wan lêker û bêjeyên nû bînin hilberandin. Wekî berê jî amaje pê hat kirin, bi van pêşgiran tenê lêker nehatine çêkirin, her wisan bi wan bêjeyên wekî *dabeş*, *dahat*, *derpê*, *raber*, *raçav*, *radest*, *vebîr* û *veder* jî hatine hilberandin. Lê di wexta çêkirina lêker û bêjeyan de hewce dike ku taybetiya ji hêla erk û fonksiyonê ya pêşgiran li ber çavan bê girtin. Li gel vê rêzîkê, divê aheng û lihevhatina dengan jî hîç neyê jibîrkirin.

Piştî behskirina ji pêşgiran û dayîna kurteravekirina li ser wan, niha bi dorê dê di bin du binbeşan de li ser lêkerên ku bi van pêşgiran çêdibin bê rawestandî.

¹⁷⁶ Mistefa Aydogan, *h.b.*, r. 183.

¹⁷⁷ Ji bo zanyariyên zêdetir *bnr.* Zana Farqînî “Erk û Fonksiyonên Qertafên Lêkerçêker”, *Zend*, h. 6, s. 3, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Îstanbul 1999, r. 77-79.

2.2.2.1. Lêkerên ji Pêşgir û Lêkereke Xwerû

Ev lêkerên dabaş li ser wan e, bi pêşgirek û lêkereke xwerû çêdibin ku jixwe rêjeyeke gelek zêde ya lêkerên kurmançî bi van (/ber-/ ,/da-/ ,/der-/ ,/hil-/ ,/ra-/ ,/ro-, /rû-/ ,/ve-/ ,/vê-/ û /wer-/) pêşgiran hatine dariştin. Mînak: **berdan**, **berhilistin**, **berkeftin** (*berketin*), **dadan**, **dahiştin**, **derketin**, **derxistin**, **hilbûn**, **hilgirtin**, **radan**, **raxistin**, **rûniştin/rokirin**, **vebijartin**, **vexwarin**, **vêsandin**, **vêxistin**, **werdan** û **wergirtin**.

2.2.2.2. Lêkerên ji Pêşgir û Lêkereke Dariştî

Ev lêker, bi pêşgirek û lêkereke dariştî ya ku bi paşgiran çêbûye, pêk tên. Lêkerên dariştî jî, bi alîkariya paşgiran ji bêjeyeke ji esilê navdêrê hatine çêkirin. Wekî; *beş* > **beşandin** > **dabeşandin**, *çêr* > **çêrîn** > **çêrandin** > **veçêrandin**, *ger* > **gerîn** > **gerandin** > **dagerandin** > **hilgerandin** > **vegerandin** > **wergerandin**, *hûr* > **hûrandin** > **dahûrandin**, *peştik* > **peştikandin** > **dapeştikandin**, *qet* > **qetîn** > **qetandin** > **daqetandin** > **hilqetandin** > **raqetandin** > **veqetandin**...

Hebûna pêşgir û paşgirên lêkersaz, ji bo zimanê kurdî taybetiyeke pir girîng e. Ji lew re bi alîkariya wan, di kurmançî de gelek lêker hatine dariştin ku rêjeya lêkerên dariştî yê bi pêşgirên lêkersaz, ji lêkerên xwerû zehf zêdetir in.

2.3. LÊKERÊN HEVEDUDANÎ

Mijara lêkerên hevedudanî çendî mijareke kêşedar be jî, bi awayekî giştî ev lêker bi alîkariya ji bêjeyeke ji esilê navdêrê yan jî ji daçekê, ji bêjeyeke ji esilê navdêrê û ji lêkereke alîkar çêdibin. Ew bêjeya ji esilê navdêran dibe ku hokerek, navdêrek an jî rengdêrek be; her wiha ev cure bêje jî îcar dibe ku sade, hevedudanî yan jî dariştî be. Li gel vê, lêkerên ku bi rola çêkirina lêkerên hevedudanî radibin jî, dibe ku ew hem xwerû hem jî dariştî bin.

Senifana lêkerên hevedudanî, bi awayê pêkhatina ji navdêr û lêkerekê û ji rengdêr û lêkerekê jî tê kirin. Dîsan ev yek dikare bi şeweya bêjeya hevedudanî ya ku ji navdêr û rengdêrekê, ji rengdêr û navdêrekê, yan jî ji navdêr û navdêrekê û hwd. pêk hatiye, bê kirin. Lê divê bê gotin ku hin lêkerên hevedudanî yê kurmançî, ji aliyê pênaseya li jorê ku pêkhatina rêza hêmanên lêkerên hevedudanî dadixuyîne, li

derveyî rêzikê dimînin. Hin lêkerên hevedudanî berevajiyê pênasayê, ew ji lêkerê û bêjeyeke ji esilê navdêrê pêk tên; mîna “çûn ava.” Ji bo vê hevokekek nimûneyî: *roj li wan çûbû ava*. Mîna keke din jî, “*kirin cot*”; eger ev bi awayê “*cot kirin*”ê be, wate diguhere. Nimûneya pêşî ji bo wateya tiştê ku tek be mirov bike cot, lê ya din bi wateya ajotina erdê ye. Ev her du mînak nîşan didin ku awayê lêkerên hevedudanî îleh ne ku tenê ji bêjeyeke esilê navdêrê û lêkerê alîkar pêk tê, berevajiyê vê rewşê di kurmancî de ji lêkerê û ji bêjeyeke esilê navdêrê jî pêk tên. Helbet pênasayên giştî yên li ser cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve, ji bo zelalbûna mijarê rênîşander in, lê carinan dibe ku têrî rewşa taybetiya lêkerên binyatî ya zimanekî neke. Loma divê ku mirov qet nebe ji bo rewşên taybetmendî zimanê xwe, bikare di nav zimanê xwe de bifikire û wisan ew li rewşa zimanê xwe bîne û diyardeya heyî formule bike.

Ji aliyê lêkerên alîkar ve jî, yên ku lêkerên hevedudanî bi wan çêdibin, tesnîfa lêkerên hevedudanî yên bi lêkerê xwerû û bi lêkerê dariştî dikare bê çêkirin. Di gel vê yekê, dê hewl bê dan ku ji aliyê xwerûbûn, dariştîbûn û hevedudaniya bêjeyan û lêkerê alîkar ve senifaneke lêkerên hevedudanî ya di bin pênc binbeşan de (di gel beşên binbeşan) û tevî dayîna mînakan bê kirin.

2.3.1. Lêkerên bi Bêjeyeke Xwerû û Lêkerê Alîkar

Lêkerên hevedudanî yên ku di vê senifanê de cih digirin, ji bêjeyeke xwerû û lêkerê (lêker çî xwerû çî jî dariştî be) pêk tên. Ev bêjeya xwerû ya qest jê jî hema bibêje tevde yan navdêr an jî rengdêr in. Çend mînak ji bo vê mijarê; *agir dadan, aqil kirin, av dan, bac stendin, baş bûn, baş kirin, ber avêtin, ber girtin, bêhn vedan, can dan, cih girtin, çalak bûn, çav çêrandin, deng dan, derî radan, dest vegirtin, dil hiştin, dil man, dû kirin, fehl avêtin, gef xwarin, gir hildan, girê dan, gule helandin, heyf stendin, hêdî kirin, kedî bûn, kemîn danîn, kon vegirtin, pirs kirin, qirên kirin, reş kirin, rêz girtin, rojî girtin, seh kirin, serî hildan, sond xwarin, şer kirin, şor bûn, tehl kirin, tirş bûn, tol hildan, vala kirin, xweş kirin, zer kirin...*

Di kurmancî de hin lêkerên dikevin nav vê polînê hene ku îcar berevajiyê vê rewşa amajepêkirî, lêker li serî û bêjeya ji esilê navdêrê jî li dawî ye û rêjeya wan jî

gelek kê m e. Mîna van lêkerên hevedudanî: *çûn ava, çûn hev, bûn cot, bûn sayî, bûn xweşî, dan çeqlêbaskan, dan der, dan hev, dan dijûnan/xeberan, kirin cot...*

2.3.2. Lêkerên bi Bêjeyeke Hevedudanî û Lêkereke Alîkar

Ev lêkerên hevedudanî, bi bêjeyeke hevedudanî û bi lêkereke çêdibin. Ev bêjeyên hevedudanî jî bi awayekî gelemper bi hatina cem hev a du peyvvan, bêyî stendina gireyan an jî zêdebûna qertafan a li wan, pêk hatine. Wekî van lêkerên hevedudanî: *bêhn+teng bûn, bin+dest kirin, can+giran bûn, çav+sor bûn, çav+birçî bûn, dest+nimêj girtin, dest+teng bûn, dûv+dirêj bûn, kêf+xweş bûn, mal+wêran bûn, pê+pes kirin, pay+mal bûn, rû+sar bûn, ser+dest bûn, ser+mest kirin, ser+rût bûn, ser+xweş kirin...*

2.3.3. Lêkerên bi Bêjeyeke Dariştî û Lêkereke Alîkar

Di bin vê jêrbeşê de, dê li ser çar beşên cuda yên bêjeyên dariştî bê sekinandin. Ji ber ku bêjeyên dariştî yên bi wan lêkerên hevedudanî çêdibin, bi çar awayan tên piraştin. Ew jî bi pêşgiran, bi paşgiran, bi navbergiran û bi awayê hevedudanî yên kompleks çêkirina bêjeyan e. Di kurdî de ji gireyan a ku rêjeya wan ji yên din pir zêde ye, paşgir in. Ji bo zaravayê kurmançî jî ev yek wisan e. Ji ber ku dê li ser bêjeyên mînak ên bi pêşgir, paşgir û navbergiran hatine çêkirin bê sekinandin, ji lew re jî hewce pê heye ku ew bi jêrnavan ji hev bî cihêkirin.

2.3.3.1. Lêkerên bi Bêjeyeke Dariştî ya bi Pêşgiran û Lêkereke Alîkar

Ev cure lêkerên hevedudanî, pêşî bi bêjeyeke ji cureyê esilê navdêrê ku bi pêşgirekê hatiye dariştin û bi lêkereke çêdibin. Bêyî ketina nav kitekitên pêşgiran bê ka bi kîjanê navdêr û bi kîjanê jî rêngdêr tîni dariştin, dê tenê qîm bi dayîna çend lêkerên hevedudanî yên ku bi wan pêk hatine, bê anîn. Di gel vî qasî dê hewla nîşandana zengîniya dariştina bi pêşgiran bê dan. Mînak: *bêcan bûn, berdest bûn, berguman kirin, bêcan ketin, bêxwedî bûn, biav bûn, bihiş bûn, dabeş kirin, dabor bûn, derkuçe bûn, derpêş kirin, hilger bûn, neçar bûn, nexweş ketin, raçav kirin, rarû bûn, veava kirin, verê kirin, vesînor kirin, werbêj kirin...*

2.3.3.2. Lêkerên bi Bêjeyeke Dariştî ya bi Paşgiran û Lêkereke

Alîkar

Lêkerên hevedudanî yên ku di bin vî sernavê jorê de hatine senifandin, ji bêjeyeke dariştî ya ku bi paşgiran çêbûye û ji lêkereke alîkar pêk tên. Bi van paşgiran jî hem hoker, hem navdêr hem jî rengdêr tên dariştin. Bêyî dirêjîpêdana li ser vê mijarê bê ka bi çi gireyê çi cure bêje bi dest dikevin, dê tenê lêkerên hevedudanî yên nimûneyî yên cur bi cur ên aîdî van gireyan hatine hilberandin, bèn derpêşkirin. Mînak: *ronahî bûn*, *mitane bûn*, *dostanî kirin*, *mêranî kirin*, *merivanî kirin*, *kêmasî kirin*, *dijminatî kirin*, *biratî kirin*, *duristayî kirin*, *fehmbâr bûn*, *xembar kirin*, *deyndar bûn*, *xwîndar bûn*, *perwerde kirin*, *şermezar bûn*, *dehfîk vedan*, *hûrik bûn*, *çikûstî kirin*, *nazî kirin*, *şermî kirin*, *bavînî kirin*, *kurûtî kirin*, *xeternak bûn*, *derdnak bûn*, *bîrsar bûn*, *tehmsar bûn*, *kirîvtayî kirin*...

Bi van hemû paşgiran bêjeyên nû tên dariştin ku her yek ji wan bi serê xwe xwedî wate ye û bi vê rewşa wan a dariştî jî, lêkerên hevedudanî tên çêkirin. Lê paşgireke din heye ku tu kesî ji hebûna wê behs nekiriye û di tu rêzimanêke zaravayê kurmancî de nebûye mijar. Ev jî paşgira /-eve/ ye. Taybetiyeke giştî ya vê paşgirê heye; gava li rengdêrekê zêde dibe, dîsa mehneya rengdêrê ya nêzî wê dide: *Wekî gewr gewreve*, *gêj gêjeve*, *reş reşeve*, *sor soreve*, *zer zereve*. Li gorî tesbîta me, ji bilî du peyvên navdêr (şirove û zareve), ew jî wek îstisna, peyvên pê hatine duristkirin bi serê xwe ne watedar in û ji bilî lêkera alîkar nayên bikaranîn. Îcar ji ber ev paşgir ji yên dîtir cuda ye, me xwest em bi awayekî cihê balê bikêşin ser wê û ravekirinên pêwîst bikin.

Lêkerên hevedudanî yên bi vê paşgira hanê pêk hatine, çendî zêdetir di nav devoka kurmanciya hêla Serhedê û ya kurdên Qafqasyayê/Soviyeta Berê de hebin jî, di nav devoka Farqîn û ya Qerejdaxê de jî peyde dibin. Wek nimûne, çend lêkerên ku bi van paşgiran çêbûne: *beşeve bûn*¹⁷⁸, *betave bûn*¹⁷⁹, *çepeve bûn*, *dereve kirin*,

¹⁷⁸ Wezîrê Nadîrî, **Nûbar**, Ji tîpên kirilî: Mehmed Emîn Hêvîdar, Weşanên Nûbiharê, Îstanbul 2016, r. 86. Ev lêker di metna tîpguhêzkerî ya latînî de bi awayê “*lêvê xueşekirî beşe vedibû*”, derbas dibe. Heman lêker di çîroka bi navê “Kêço” de, ku ew ji aliyê Mahpus Bîlîz ve li herêma Qerejdaxê hatiye berhevkirin, îcar bi şeweya “*di bin simbelan ra beşeve dibe (dibeşişe)*” derbas dibe. *Bnr.* Mahpus Bîlîz, “Kêço” **Folklorê Kurdistan**, h. 3, Weşana Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, Îstanbul 2015, r. 47-55.

*gêjeve bûn, kuşeve bûn*¹⁸⁰, *pareve kirin*¹⁸¹, *pûrteve kirin, reşeve hatin*¹⁸², *sileve ketin, soreve kirin, şîreve bûn, şirove kirin, xîjeve kirin*¹⁸³, *zereve kirin*¹⁸⁴, *zareve kirin.*

Hewce nekir ku ji bo hemûyan çavkanî bên nîşandan, ji ber ku bikaranînan hinekan ji wan jixwe di zimanê devkî ango yê zarkî de berbelav e û di ferhengan de jî hatine tomarkirin. Lê di gel vê yekê, pêwîstî pê heye ji du lêkerên hevedudanî bê behskirin; ji ber ku di wan her duyan de paşgira ku dabaş li ser e, wekî /-ve/ xuya dike. Sedem jî ew e ku ew her du peyv bi dengdêrê diqedin, loma “e”ya pêşîn a paşgirê jê ketiye. Jixwe di bêjeyên xwerû yên kurdî de du dengdêr nayên cem hev û di wexta ravekan (terkîban) de lazim e herfa kelijandinê (navberê) bê bikaranîn. Her du bêjeyên ku dê amaje bi wan bê dan “şiro”¹⁸⁵ û “beta” ne. Ev her du peyv di nav mînakên dayî de wekî “şirove kirin”¹⁸⁶ û “betave bûn”ê hatine bikaranîn. Herçî “betave bûn” e ew mîna “beta bûn” û “beta kirin”ê¹⁸⁷ jî heye, lê ya ku hema bibêje qet nayê zanîn “şiro kirin” e. Çendî îro di zimanê nivîskî yê kurmancî de awayê rastnivîsîna “şirovekirin”ê wekî “şîrovekirin”ê pir zêde berbelav be jî, lê şeweya wê ya rast “şiro” û “şirove” ye.

¹⁷⁹ Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, **Zargotîna Kurda II**, çapa 3., Aram Yayînevi, Îstanbul 2013, r. 289. Ev lêker di çîroka bi navê “Zilfînaz, Cilfînaz” de bi şeweya “*Kalê li ber p’adşê betavedibe*”, dibihure.

¹⁸⁰ Mustafa Borak, “Goştê ciwanan dixwî tu dizanî, goştê pîran dixwî tu dizanî, na dilê te dişewite, tîrşikê jî dixwî tu dizanî”, **Folklorî Kurdan**, h. 1, Weşana Şaredariya Bajare Mezîna Amedê, Îstanbul 2015, r. 68-69.

¹⁸¹ Heciyê Cindî & Emînê Evdal, **Folklorî Kurmanca**, Ji kirîlî bo latînî: Tosînê Reşîd, Avesta, Îstanbul 2008, r. 206, Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *h.b.*, r. 254 û Erebe Şemo, **Dimdim**, Weşanên Lîsê, Îstanbul 2007, r. 127-128. Di Folklorî Kurmanca, di çîroka “Kerr û Kulik” de, bi awayê “... *yekê jî îro xuliyê pare vedikin, em îro diçin ser para xwe*”, di **Zargotîna Kurda II**, di çîroka “E’lê Newêrek” de bi şeweya “*H’evt mêşok zêrê me hene, emê para vekin...*” û di romana **Dimdimê** de jî bi awayê “*padîşahê Romê û Şahê Îranê welatê me Kurdistan di nava xwe de parevekirine*”ê hatiye bikaranîn.

¹⁸² Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, **Zargotîna Kurda I**, çapa 3., Aram Yayînevi, Îstanbul 2013, r. 28 û Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, **Zargotîna Kurda II**, çapa 3., Aram Yayînevi, Îstanbul 2013, r. 239. Di çavkaniya pêşîn, di çîroka “Memê û Zînê (şaxa 1)” de bi şekilê “...*fikir ji serê Memê delal fir’î, ç’evê wî r’êşevêhatin...*”, di çîroka bi navê “Derwêşê E’vdî (şaxa 3)” de bi awayê “...*ç’evê min r’êşeve dihatim...*” û di berhema duyem, di çîroka “Silav Li Te H’elal Be!” de jî, ji hêla rastnivîsînê ve bi şekilê “...*ber ç’evê min r’êşe vehat*” hatiye bikaranîn.

¹⁸³ Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *h.b.*, r. 213. Di çîroka bi navê “Destebiratiya r’ûvî û aşuvan” de, wiha hatiye bikaranîn: “... *hema xîje vekire ser serê wê, p’orê wê li p’encê xwe pêça...*”

¹⁸⁴ Ev li Farqînê tê bikaranîn. Gava nok, fasûlî di avê de dihêlin da binermijîn, dibêjin “*nokan zereve bikin.*”

¹⁸⁵ Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, **Zargotîna Kurda I**, çapa 3., Aram Yayînevi, Îstanbul 2013, r. 197. Di çîroka “Ûsîbê Nebîya” de wiha derbas dibe: “... *ezê xewna we şiro bikim.*”

¹⁸⁶ Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *h.b.*, r. 418. Di strana “Minê Xewnekî Dîtiye” de bi vî awayî dibihure: “*K’esekî xewna min şirovenekir.*”

¹⁸⁷ Şehîdê Îbo, **Kurdê Rêwî**, Ji kirîlî bo latînî: Xanna Omerxalî, Avesta, Îstanbul 2009, r. 150.

Divê li ser du lêkerên hevedudanî yên din jî çend gotin bên kirin. Yek jê “*pareve kirin*” e ku ew mîna “*parî kirin*”, “*parve kirin*” û “*bi par ve kirin*”ê hem di zimanê devkî de hem jî di yê nivîskî de tê bikaranîn. Her wisan çend formên ji hev cuda yên “*zareve kirin*”ê jî mîna “*zarve kirin*”, “*zalve kirin*” û “*zarî kirin*”ê hene.

2.3.3.3. Lêkerên bi Bêjeyeke Dariştî ya bi Navbergiran û

Lêkerekê Alîkar

Ew cuere lêker bi du bêjeyên ku bi navbergirekê hatine dariştin û ew bi lêkerekê alîkar tînin himatê. Navbergir (wekî *-e-*, *-an-* û *-o-yê*, ku ya herî berbelav jî */-e-/* ye) dikeve navbera du peyvên û wisan pê bêjeyeke nû tê bidestxistin. Wekî van mînakên: *berevajî bûn*, *canecan bûn*, *çaverê kirin*, *gazegaz kirin*, *kalekal kirin*, *qîjewîj kirin*, *rasterê bûn*, *sereder kirin*, *sererast kirin*, *şîreşîr kirin*, *zarezar kirin*, *beranber man*, *seranser girtin*, *paşopê bûn*, *serobin kirin*.¹⁸⁸

2.3.3.4. Lêkerên bi Bêjeyeke Dariştî ya Kompleks û Lêkerekê

Alîkar

Mebest ji gotina “kompleks” ew e ku bêje ji awayê dariştî careke din hatiye çêkirin, ango bi gireyên dariştinê, bi awayê biyekbûna bêje û lêzêdebûna gireyan pêk hatine. Ji bo ronbûna mebestê, şîtelkirin ango dahûrandina çend bêjeyan: *Bêserûber*, *serserkî*, *şîregermî*, *sarogermo*, *rojnamegerî*. Bêjeya “*bêserûber*” ji çar beşan, ji pêşgira */bê-/yê*, ji bêjeya */ser/*, ji gihaneka */û/* û ji peyva */ber/ê* çêbûye. Dîsan bêjeya dariştî ya “*serserkî*” jî ji sê hêmanan hatiye pê: *ser+ser+kî*. Bêjeya “*şîregermî*” xwedî çar beşan e; *şîr+e+germ+î*. Herçî “*sarogermo*” ye pêkhatina wê cihê ye. Peyvên “*sar*” û “*germ*” rengdêr in, dengdêra yan jî morfema “*o*”yê ya ku hatiye paşiya wan jî qertaf e (*sar+o+germ+o*). Bêjeya dawî “*rojnamegerî*”, pêşî ji bêjeya hevedudanî “*rojname*” (*roj+name*) û paşê jî bi dorê ji qertafên */-ger/* û */-î/yê* hatiye çêkirin. A ev cure lêker, ji peyveke dariştî ya kompleks a ku ji çend beşan pêk tê û ji lêkerekê alîkar çêdibin.

¹⁸⁸ Dibe ku ev “*o*”ya hanê ya her du mînakên dawî gihaneka “*û*”yê be jî, lê êdî erka wê di van peyvên dariştî û yên dîtir de guheriyê û bi peywira navbergirê radibe. Di gel vê yekê, carinan dengên “*e*” û “*o*”yê jî pev digiherin, wekî bêjeyên “*berevajî*” û “*berovajî*”, *kelegirî*” û “*kelogirî*”, *kelebêhn* û “*kelobêhn*.” Divê bê diyarkirin ku di kurmancî de */kele-/* wek pêşgir heye; mîna *keleşêr*, *kelemêr*, *keledirêj*, *kelekor* (*kilekor*), loma jî awayên “*kelogirî*” û “*kelobêhn*” devokî ne.

Ji bo lêkerên hevedudanî yên ku ji bêjeyêke dariştî ya “bikompleks” û lêkereke alîkar çêdibin, çend mînak: *babirk vekirin, bextbireş bûn, bêserûber bûn, birêkûpêk kirin, cotkarî kirin, çarmêrkî rûniştin, çalexwarî bûn, devjenî kirin, devjihev man, gelêrî kirin, jehrdadayî kirin, hûrhûrî bûn, lalomeyî bûn, malbelavî kirin, nangermî kirin, paqijî kirin, rojnamegerî kirin, serhildan kirin, seroqûnko raketin, serserkî hatin, tarûmar kirin, tînegermî kirin, veberhênan kirin, veguhêzî kirin, warguhêzî bûn, xanenişîn bûn, zimandirêjî kirin...*

2.3.4. Lêkerên bi Paşdaçêkek, Bêjeyek û Lêkereke Alîkar

Bi awayekî giştî ji bo van cure lêkeran dikare bê gotin ku ew bi piranî ji pêşdaçêkek, ji cînavka berbihevîn an jî ji pêşdaçêkek, ji bêjeyêke esilê navdêrê û ji lêkereke çêdibin. Hejmara wan pir kêm be jî lêkerên ku ji pêşdaçêkek, ji bêjeyek, ji paşdaçêkek û lêkereke çêdibin jî hene. Ji van cure lêkeran re lêkerên hevedudanî yên bidaçek jî tê gotin. Ji bo van lêkeran çend nimûne: *bi hev ketin, bi lêv kirin, bi pey ketin, bi pêş xistin, bi rê ketin, bi serî kirin, cem girê dan, di ber dan, gav sist kirin, ji bîr kirin, ji hev çûn, ji hev danîn, li êk dan, li hev asê bûn, li hev dan, li hev hatin, li hev xistin, li serî ketin, qîç beş kirin, bi par ve kirin, bi ser de girtin, bi pêş ve çûn, ji bîr ve çûn, ji şîr ve kirin, ji hal de ketin, li ser ve bûn, di ber de çûn, di kun re çûn...*

2.3.5. Lêkerên bi Cînavkeke Lihevxiştî ya Berbihevîn û

Lêkereke Alîkar

Cînavkên *jev/jêk, lev/lêk, pev/pêk û tev/têk*, cînavkên lihevxiştî yên ji tofa duyem in ku ew ji ber civitînê, ji “*hev/êk*”ê û ji daçêkên “*bî*”, “*ji*”, “*li*” û “*di*”yê çêbûne. Mîna “*jev çûn, jev kirin, jêk bûn, lev hatin, lêk dan, pev ketin, pev xistin, pêk hatin, tev dan, têk çûn*”ê. Ev jî lêkerên hevedudanî ne.

Hinek ji van lêkeran ên ku bi van cure cînavkên lihevxiştî çêbûne, bi domana demê re ev cînavkên lihevxiştî yên di wan de ji erka xwe ya bingehî averê bûne û wekî ku ew êdî bêjeyêke serbixwe bin, bi rola xwe radibin. Wekî “*pev çûn*”, “*tev dan*”, “*tev gerîn*”, “*têk çûn*”, “*têk birin*” û “*pêk anîn*”ê ku êdî di dema kêşanê de ew li hêmanên xwe yên hîmî venagerin, gava vegerin jî ji wateya xwe ya bingehîn bi dûr dikevin. Lê yên wekî “*jev kirin*”, “*lev hatin*” û “*pev ketin*”ê gava di heyna çevana

deman de ew li daçek û cînavkê dagerin jî, wateya wan naguhere. Îcar cudahiya van cînavkên lihevxiştî yên ji tofa duyem, ji yên tofa yekem (*jê, lê, pê û tê*) ew e ku di dema kêşanê de gava bêjeya civitî ji hev vebe û li esilê xwe dagere jî bireser nakeve navbera daçek û lêkerê.

Ji bo pêkanîna lêkerên hevedudanî, di kurmancî de lêkerên alîkar ên ku rêjeya wan a bikaranînê herî zêde ye, lêkerên “*bûn*” û “*kirin*” in. Bi ya pêşîn lêkerên têneper û bi ya duyem jî lêkerên têper tên piraştin.

2.4. LÊKERÊN VEQETÎNBAR

Lêkerên veqetînbar, yanê lêkerên ku di dema kêşanê de ji hev dibin, hem ji aliyê bastûrî (binyatî) ve hem jî ji aliyê kêşanê ve, ji yên din cuda dibin. Ev lêkerên ku di wexta kêşanê de cînavka wan a lihevxiştî ji hev dibe û bireser dikeve navbera daçek û lêkerê, ku bi şêweyê gelemper bê gotin, xwedî du awayan in. Koma pêşî ji cînavkeke lihevxiştî û ji lêkerê yan ji cînavkeke lihevxiştî û paşdaçekê, yan jî ji bêjeyê esilê navdêrê, ji cînavkeke lihevxiştî û ji lêkerê çêdibin. Koma duyem jî ji bêjeyê ji esilê navdêrê, ji hêmaneke rêzimanî/morfosentaktîk /-a/yê yan jî ji /-î/yê û ji lêkerê alîkar pêk tînin. Taybetiya lêkerên ji koma pêşî ew e ku di dema kêşanê de hêmanên cînavkên lihevxiştî (*jê, lê, pê û tê*) li esilê xwe vedigerin û bireser dikeve navbera daçek û lêkerê. Rewşa lêkerên ku /-a/ an jî /-î/ bi dawîya bêjeyê ji esilê navdêrê ve dizeliqê wekî hev e û diyan bireser dikeve navbera wan û lêkera alîkar. A ji ber vê yekê navê lêkerên veqetînbar ji aliyê me ve ji bo wan cure lêkeran guncan hat dîtin.

Di xebatên rêzimana zaravayê kurmancî de, ev cure lêkerên ku ji aliyê me ve wek lêkerên veqetînbar tînin binavkirin, ji hêla binyatî ve wek kategoriyeke serbixwe ya cureyên lêkeran nehatine senifandin. Tenê behs ji koma pêşî ya lêkerên ku bi cînavkên lihevxiştî hatine pê, hatiye kirin. Çawan ku di bin sernavê “Hevberîkirina Berhemên ku Bûne Dabaşa Mijarê” de hat aşkerakirin, lêkerên ku bi alîkariya cînavkên lihevxiştî hatine çêkirin (mîna yên wekî *lê xistin, pê ketin, jê kirin, tê dan, tê werdan, jê hez kirin û dest pê kirin*’ê), li jêr navên cuda ji wan hatiye behskirin. Der barê navlêkirina van lêkeran de, ramana danerên her yazdeh rêzimanan dikare di

bin sê navan de bê senifandin: Li gorî Celadet Bedirxan¹⁸⁹, Qanatê Kurdo¹⁹⁰, Kemal Badilli¹⁹¹, A. Balî¹⁹², Halîl Altu¹⁹³ û Bahoz Baran¹⁹⁴ ew lêkerên hevedudanî ne, lê li gorî Kamûran Bedirxan¹⁹⁵, Mûrad Ciwan¹⁹⁶ û Kadri Yildirim¹⁹⁷ ew lêkerên biwêjî ne û li gorî Samî Tan¹⁹⁸ jî ew “lêkerên bidaçek” in. Lê divê bê aşkerakirin ku yê hîn zêdetir bi berfirehî li ser van lêkeran sekiniye û agahî der barê wan de dane, Qanatê Kurdo ye. Li aliyê din, her çi qas ji van cure lêkeran hatibe behskirin jî, lê bi şêweyeke pir zelal dixuye ku di navbera zimannas û danerên rêzimana kurmançî de, ne li ser navdanîna wan ne jî bê ew aîdî kîjan senifanê ne, lihevkiyaneke tam heye.

Îcar ji her du yên din ên ku bi /-a/ û /-î/yê çêdibin, em rast lê nehatine ku kesî behsa van cure lêkeran kiribe.

Ji ber lêkerên veqetînbarek ên bi alîkariya cînavkên lihevxiştî çêbûne, di dema kêşanê de bi awayekî giştî cînavkên lihevxiştî wekî xwe namînin û li beşên xwe yên eslî dadigerin, loma nabe ji bo wan ev navên li jorê bînan bikaranîn. Eger bi dorê li ser van navlêkirinan bê sekinandin; bi ya me pênaseya “lêkerên hevedudanî” ji bo van lêkeran ne navekî guncan e. Ji lew re di wexta kêşana deman a lêkerên hevedudanî de, di binyata bêjeya ji esilê navdêrê de (çi xwerû, çi dariştî, çi jî kompleks be) tu guherînek pêk nayê. Ji aliyê pênaseya lêkerên hevedudanî ve, çendî bişibe wan jî ku tê gotin herî hindik ew ji du hêmanan pêk tên, lê di wextê kêşana deman de ji wan cudatir in. Her wisan tebîra “lêkerên biwêjî” jî wan nanimîne (temsîl nake). Têgiha biwêjî jî, ji aliyê wateya lêkeran ve kategoriyek e. Loma ji vî aliyê ve gava li mijarê bê nihartin, çawan hin lêkerên hevedudanî di heman demê de awayên wan ên biwêjî hene, hin lêkerên veqetînbarek ên bi cînavkên lihevxiştî hatine dariştin jî, awayên wan ên biwêjî hene. Navlêkirina “lêkerên bidaçek” jî wek navekî somdar (şimûl) hemûyan li xwe nagire. Wekî mînakên “*bi serî kirin, di ber dan, ji ber xwe kirin, li*

¹⁸⁹ Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, **Kürtçe Gramer**, 2. baskî, (Wergera ji Fransî; li jêr çavdêriya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê), Avesta, İstanbul 2004, r. 183.

¹⁹⁰ Qanatê Kurdo, *h.b.*, r. 168-175.

¹⁹¹ Kemal Badilli, *h.b.*, r. 111-117.

¹⁹² A. Bali, *h.b.*, r. 177-179.

¹⁹³ Halil Altuğ, *h.b.*, r. 418-420.

¹⁹⁴ Bahoz Baran, *h.b.*, r. 173.

¹⁹⁵ Kamuran Ali Bedir-Xan, *h.b.*, r. 48-49.

¹⁹⁶ Mûrad Ciwan, *h.b.*, r. 86-88.

¹⁹⁷ Kadri Yildirim, *h.b.*, r. 42-43.

¹⁹⁸ Sami Tan, **Rêzimana Kurmançî**, Çapa nûkirî ya 3., Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2015, r. 265-266.

hev xistin, li ber xwe dan”ê, ku îcar di van de cînavkên lihevxiştî nîn in. Eger bi kurtasî bê gotin; hem di lêkerên xwerû û dariştî de hem jî di yên hevedudanî de, ji bilî lêkera alîkar tu guherîn di hêmanên din de çênabin. Tu hêmaneke beşên ku lêker pê çêbûne, di wextê kêşana deman de ji hev venaqete û bireser jî nakeve navbera daçek û lêkerê. Ji lew re hewce ye ev cure lêker ji aliyê bastûrî ve ji yên din bîn veqetandin û bi navekî din bîn binavkirin ku mesele ne ew e bê ew ji çend hêmanan hatine pê. Lê mesele xwe di rewşa wan a di dema kêşanê de dide der.

Ev lêkerên veqetînbar, pirtir nêzî lêkerên hevedudanî dixuyên, lê eger ev lêkerên veqetînbar di nav lêkerên hevedudanî de bîn nîşandan jî, an jî ji wan re lêkerên hevedudanî yên kompleks bê gotin jî, divê ku di binbeşeke wê de cih ji bo wan were veqetandin. Bi vê yekê jî ew ê dîsan bê xuyakirin ku ew ji aliyê binyatî ve xwedî taybetmendiyeke cuda ne. Bi ya me, ev cudahî bi xwe jî dihêle ku ew di bin navekî serbixwe de bîn senifandin. Her wisan divê bê aşkerakirin ku bi saya cînavkên lihevxiştî yên ji koma yekem, ji lêkeran lêkerên din tîn piraştin. Ev cînavkên lihevxiştî di pêkhatina lêkeran de jî bi rola pêşgiran radibin, loma ew êdî dibin xwedî kategoriyeke din a ji aliyê binyatî ya cureyên lêkeran. A ev cure lêker, ango lêkerên veqetînbar, ji ber sedama ku ew xwedî şeweyên ji hev cihê ne, dê di bin sernavên cuda de bîn polînkirin û bi jêrbeşan jî dirêjî bi wesifê/çawaniya wan bê dan.

2.4.1. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkên Lihevxiştî

Beriya tîketina nav mijarê û derpêşkirina nimûneyên der barê van cure lêkeran de, divê bê daxuyandin ku cînavkên lihevxiştî, wekî ji nav jî dixuye, ne sade ne, ew ji daçekek û cînavkekê hatine pê. Bi domana demê re, ji ber sedemên cuda bi ser hev de hatine, quncivîne ser hev û ketine vê rewşê. Her çî qas li bin navê mijara “Ji Aliyê Binyatî ve Lêker”, ji cînavkên lihevxiştî hatibe behskirin û wek dubare be jî, dîsan hewce pê heye bê diyarkirin ku di kurmancî de ew du tof in. Tofa yekem ji *jê, lê, pê* û *tê* û tofa duyemîn jî, ji *jev/jêk, lev/lêk, pev/pêk, tev/têk’ê* pêk tî. Lê ji ber ku koma pêşî eleqedarî mijarê ye, bi kurtasî be jî rawestandina li ser wan, ji bo zelaliya mijarê careke din pêwîst dike:

jê: Ji daçeka /ji/yê û ji cînavka kesane yan jî ji ya îşarkî /wî/, /vî/ an jî /wê/, /vê/ yê,

lê: Ji daçeka /li/yê û ji cînavka kesane yan jî yan ji ya îşarkî /wî/, /vî/ an jî /wê/, /vê/ yê,

pê: Ji daçeka /bi/yê û ji cînavka kesane yan jî ji ya îşarkî /wî/, /vî/ an jî /wê/, /vê/ yê,

tê: Ji daçeka /di/yê û ji cînavka kesane yan jî ji ya îşarkî /wî/, /vî/ an jî /wê/, /vê/ çêbûye ku ev hemû ji ber rewşa quncivînê bi ser hev de hatine û ketine vê rewşê.

Lêkerên ji cînavkeke lihevxiştî û ji lêkereke alîkar têne pê, di dema kêşanê de ev cînavkên lihevxiştî, bi awayekî gelemper li hêmanên xwe yên ku ew bi wan çêbûne, dadigerin. Lê carinan jî bi ser hev de tên û dikevin rewşa xwe ya quncaftî. Gava di rewşa xwe ya quncaftî de ne, her ji bo cînavka kesê sêyemîn ê yekhejmar in an jî ji bo cînavkeke yekhejmar a îşarkî ne. Di van lêkerên de ya ku têperî û netêperiyê diyar dike, lêkera alîkar e. Îcar lêkera alîkar jî dibe ku xwerû yan jî dariştî be. Loma dê senifana wan ji aliyê bastûra lêkera alîkar ve bê kirin.

2.4.1.1. Lêkerên Veqetînbarekî bi Cînavkeke Lihevxiştî û Lêkereke Xwerû

Ev lêker, di rastiya xwe de ji daçekê, ji cînavkê û ji lêkereke alîkar a xwerû pêk tînin; wekî *jê çûn*, *jê hatin*, *jê ketin*, *jê xwarin*, *lê dan*, *lê kirin*, *pê ketin*, *pê kirin*, *tê dan* û *tê gihîştinê*. Bi dayîna çend hevokên nimûneyî, dê hewl bê dan ku di dema kêşana de guherîna di van cure lêkeran de pêk tînin, were nîşandan:

jê xwarin: *Wî gelek **ji kurê xelkê xwariye**.*

jê çûn: *Di leyîstikê de pir pere **ji Azad** ê qurmarbaz **çûbû**.*

lê kirin: *Were avê **li destê min bike**.*

lê dan: *Ew pir xweş **li sazê dide** ku mirov *jê re* hejmetkar dimîne.*

pê ketin: *Ew gişt **bi xwarina** nivîstî **ketibûn**.*

pê kirin: *Destê xwe hat **bi min** ê reben **kir**.*

tê dan: Rûn di nanê kartû dabû û dixwar.

tê ketin: Tu di hundirê vê malê nakevî.

Rêzik û qanûna giştî ya ji bo van lêkerên hanê wiha ye: Di wexta kêşanê de hêmanên cînavkên lihevxiştî ji hev vediqetin û tişte (bireser) dikeve navbera daçek û lêkera alîkar. Lê bi qonaxa demê re, averêbûnek di vê rêzika giştî de çêbûye û awayekî din a bikaranîna van lêkeran qewimiye. Mîna lêkerên *lê kirin* (bi wateya “ava kirin”ê), *jê kirin* (bi mehneya “birîn”ê), *pê xistin* (bi wateya “dadan”a agir); her wisan bêyî ku wateyeke din ji wan biçe, mîna lêkerên *tê ketin*, *tê kirin*, *lê dan* û *lê xistin*’ê. Wek mînak: *Min xanî lê kir*, *tiliya xwe jê kiribû*, *agir pê bixe ez xwe germ bikim*, *sazeke xweş lê dide/dixe*, *paxav nekir tê ket* govendê, *sola xwe tê kiriye piyê xwe*.

Di van hevokên nimûneyî de cînavkên lihevxiştî yên ji tofa yekem wek xwe mane, ango ew li hêmanên xwe yên hîmî danegeriyane. Ev cudabûneke ji rêzika giştî ya van cure lêkeran e ku rêjeya wan gelek hindik e. Di gel vê rewşê, di devokên wekî hêla Qerejdax, Riha û Semsûrê de qaydeyê gelemper hîn zindî ye û li şûna awayê gotina “*tê keve hundir*”, forma “*di hundir keve*”¹⁹⁹, li cihê “*Dikin ku tê bikevin bin piştîyên xwe...*” şêweya “*Dûre dikan di bin piştîyên xwe kevin û herin malê...*”²⁰⁰ tên bikaranîn. Ji bo awayên bikaranînên ji hev cuda yên lêkerên wekî “*lê kirin*”, “*pê xistin*”, “*tê ketin*” û “*tê kirin*”ê, çend hevokên nimûneyî dikare bi hêsanî ji wêjeya devkî yanê ji zargotina kurdî ya kurmancî were derpêşkirin da ku ev cihêti berbiçavtir bibe:²⁰¹ “*Siwar hin bi hin nêzîkayî li malê dikan*”²⁰², “*Agir bi xan û manê xwe t’ev xistîye*”²⁰³, “*Ez û tu, emê têk’evine kêf û h’enekê di dinê ye*”²⁰⁴, “*Lawo ar di mala we keve*”²⁰⁵, “*Ezê milê xwe ter’a têkim p’er’r û bask e.*”²⁰⁶, “*Min serê Kêço di te kirê*”²⁰⁷.

¹⁹⁹ Mustafa Gazî, *Ferheng Kurdî-Tirkî*, “Têketin”, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul 2006.

²⁰⁰ Zekî Akdag, *Çirokên Gelêrî yên Kurdan (Herêma Semsûr û Ruhayê)*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2016, r. 53.

²⁰¹ Dest li rastnivîsîna hevokên nimûneyî nehat gerandin û ew wek awayê jêgiranê hatin hiştin.

²⁰² Ordîxanê Celil & Celilê Celil, *Zargotina Kurda I*, çapa 3., Aram Yayınevi, Amed 2013, r. 86.

²⁰³ *h.b.*, r. 69.

²⁰⁴ *h.b.*, r. 69.

²⁰⁵ Mahpus Bîlîz, “Kêço” *Folklorê Kurdan*, h. 3, Weşana Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, İstanbul 2015, r. 47-55.

Qaydeyê giştî yên kêşana van lêkerên hanê, ji bilî çend lêkerên mîna yên ku li jorê ji wan hat behskirin, wisan e ku di gava kêşana tafan de hêmanên cînavkên lihevxiştî ji hev dibin û tişte dikeve navbera daçek û lêkerê.

2.4.1.2. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkeke Lihevxiştî û Lêkerekê Dariştî

Lêkerên ji vê komê, ji cînavkeke lihevxiştî û ji lêkerekê dariştî pêk tên. Têperî û teneperiya van lêkeran jî dîsan ji lêkerê diyar dibe. Cudahiya van ji ya xala berî vê, tenê ew e ku lêkerên wan ên dariştî ne. Ji bo vê binbeşê çend hevokên mînak:

*jê hılanîn: Tehm **ji** gotina çîroka xwe **hildianî** û welê didomand.*

*lê rabûn: Şênî tev **li** wan bêkesan **rabûbûn**.*

*lê vegerandin: Min kitêb gişt **li** wan cîrnexweşan **vegerandin**.*

*pê vedan: Mar **bi** binê piyê wî camêrî **vedabû**.*

*pê werkirin: Wê îsot **bi** xwarinê ku tehma wê ne xweş bû, **werkir**.*

*tê derxistin: Wî **bi** têkiliya **di** navbera wan **derxist**.*

*tê hildan: Nanên xwe **di** rîçala miz **hildidan** û dixwarin.*

2.4.1.3. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkeke Lihevxiştî û Lêkerekê Hevedudanî

Cihêtiya van lêkeran ji yên din ji ber lêkera alîkar a hevedudanî ye. Her wiha bêjeya beriya lêkerê jî dibe ku navdêreke hevedudanî be. Ji bo mijara van cure lêkeran, tişteki girîng jî heye ku divê bê diyarkirin û dêhn lê bê kêşandin, kêmbûna rêjeya wan e. Di dema kêşanê de gava ew ji hev dibin, cînavka wan a lihevxiştî ku tê pêşiyê, li esilê xwe vedigere û tişte dikeve navbera daçek û lêkera alîkar a hevedudanî, mîna van lêkerên li jêrê:

*jê mijûl bûn: Tu **ji** kê **mijûl dibî**?*

*jê xweş bûn: Ez **ji** vê kira hanê **xweş bûm**.*

²⁰⁶ Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *h.b.*, r. 364.

²⁰⁷ Mahpus Bîlîz, *h.b.*, r. 47-55.

*lê guhdar bûn: Ew **li** me qet **guh**dar nabe.*

*lê bar kirin: Bernameyê **li** kompîtera xwe ya nû **bar** bike.*

*pê aciz bûn: Ew **bi** xwarina kartû **aciz** bû.*

*pê emel kirin: Gelo tu **bi** çi karî **emel** dikî?*

2.4.1.4. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkeke Lihevxiştî, bi Paşdaçek û Lêkereke Xwerû

Ev ji cînavkeke lihevxiştî, ji paşdaçekek û ji lêkereke xwerû çêdibin. Cudahiya van a sereke ji yê din tenê ew e ku piştî cînavka lihevxiştî paşdaçekek jî heye. Ji bo zelalbûna mijarê tevî hevokên nimûneyî çend lêkerên mînak:

*pê de çûn: Sola wî **bi** avê **de** çû.*

*pê de ketin: Ew **bi** xebata xwe **de** ketiye.*

*pê re gihîştin: Eger ez **bi** vî karî **re** bigihîjim.*

*pê ve kirin: Ta **bi** derziyê **ve** kir.*

*tê de kirin: Wan zarok **di** avê **de** kiribûn.*

*tê re çûn: Av **di** dewlê **re** diçe.*

*tê re kirin: Tiliya xwe **di** kunê **re** dikir.*

2.4.1.5. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkeke Lihevxiştî, bi Paşdaçek û Lêkereke Dariştî

Lêkerên ji vê komê, ji cînavkeke lihevxiştî, ji paşdaçekek û ji lêkereke dariştî tên pê. Ji bo ronîkirina ravekirina van cure lêkeran, çend nimûne:

*pê ve danîn: Nîvzêrk **bi** bûkê **ve** danî.*

*pê re raketin: Gelek kesan xwestibû ku **bi** wê **re** rakevin.*

*tê de hilhatin: Pênc kes çawan dê **di** vî xaniyê biçûk **de** hilbên?*

2.4.1.6. Lêkerên Veqetînbar ên bi Bêjeyek, bi Cînavkeke

Lihevxiştî û Lêkereke Alîkar

Ew lêkerên ku di bin vî jênavî de hatine nîşandan ji bêjeyek, ji cînavkeke lihevxiştî û ji lekerekê (çi xwerû çi dariştî) pêk tên. Cudahiya van lêkeran ji yên berê, berî cînavka lihevxiştî hebûna peyveke ji esilê navdêran e. Cînavkên lihevxiştî di van lêkeran de jî mîna yên berê li gorî rewşê, li gorî ku di hevokê de peywir digirine ser xwe, ji hev dibin an jî nabin. Gava ji hev veqetin, bireserek an jî hêmaneke hevokê dikeve navbera daçek û lêkera alîkar. Bi vî awayî lêker dibe lêkereke veqetînbar:

*dest pê kirin: Em dest **bi** dayîne **bikin**.*

*dev jê berdan: Dev **ji** min **berde**.*

*serî lê dan: Serî **li** kar **daye**.*

*serxweşî tê dan: Me serxweşî **di** Hevînd **da**.*

Hin ji van lêkeran, ji ber ku cînavka wan a lihevxiştî ji rêşaya xwe ya adetî averê bûye, di dema kêşanê de ji hev venabin. Wekî lêkera “*ser jê kirin*” an jî “*şerjê kirin*”ê: Ev yek jî, ji “*jê kirin*”ê diqewime ku ew bi wateya “*birîn*”ê ye. Loma ew wisan êdî di zimên de cihgir bûye.

2.4.2. Lêkerên Veqetînbar ên bi Morfema “-a”yê

Lêkerên ku di bin vî sernavî de tên senifandin, ji navdêrekê û ji lêkereke alîkar pêk tên. Ev navdêr dibe ku sade yan jî dariştî bin. Ferqa van cureyên lêkeran, ji lêkerên veqetînbar ên ku bi cînavkên lihevxiştî pêk hatine, ev e: Di dema kêşanê de morfema (yan jî dengdêra) /-a/yê tê paşiya bêjeyê, piştî tişte û paşê jî lêker tê. Lê eger dawiya bêjeyê bi dengdêrekê biqede herfa pêwendiyê/pevgirêdanê tê pêşiya/-a/yê (yan /-w-/ an jî /-y-/) û piştî pêkhatina awayê ravekê (terkîbê) lêkera alîkar dikeve dewrê. Li ser vê /-a/yê jî divê bê gotin ku çendî ew bişibe veqetandeka binavkirî ya yekhejmar a mêtîyê jî, lê ew di van lêkeran de bi erka îzafeyê (veqetandekê) ranabe û pê ravek çênabe. Ew amrazeke zimanî ye û pir pir dikare bê gotin ku ew peywira berpêbûnê tîne cih. Li aliyê din, têperî û netêperiya wan, bi lêkerê ye. Wek nimûne, ji bo vê mijarê çend hevokên kurt:

Bi keviran bera wan dan.

Her tim behsa te dibû.

Kêfa zarokên taxê anî.

Qala serpêhatiya xwe kir.

Sonda te xwaribû.

Wê bêriya me dikir.

2.4.3. Lêkerên Veqetînbar ên bi Morfema “-î”yê

Ev lêker, ji bêjeyek û ji lêkerekê alîkar çêdibin. Cihêtiya van ji yên li jorê, li şûna /-a/yê bikaranîna /-î/yê ye. Hemû rêsayên (qaydeyên) zimanî yên mijara berî vê ango ya li jorê, ji bo wan jî derbasdar in. Li aliyê din bêjeya ku morfema /-î/yê tê paşîya wê, dibe ku xwerû yan jî dariştî be û her wisan ev lêker jî hem têper hem jî têneper bin. Eger lêkera alîkar têper be ew jî têper e, lê lêkera alîkar têneper be, ev cure lêker jî têneper e. Her wiha, /-î/ya ku dabaş li serê ye ne îzafê ye û pê terkîb durist nabe. Wekî /-a/yê, pir pir dikare ji bo wê jî bê gotin ku ew bi erka berpêbûnê radibe.

Divê ji rewşeke taybet a forma van lêkeran bê behskirin. Ev lêkerên hanê (ji bo yên ku bi /-a/yê û /-î/yê çêdibin), gava tişte nekeve navbera wan, ew lêker ji hev nabin û ew di rewşa lêkerên hevedudanî de dixuyên. Ji bo zelalbûna mijarê çend hevokên mînak:

Çêlî çîrokeke seyr kir.

Camêr berî wan neda.

Êrîştî wan dikir.

Ferî xwendin û nivîsandinê bûbû.

Hînî xuyekî ne xweş bûye.

Nan dirêjî min kir ku ez jê bistînim.

Xwarî erdê bû ku kevirekî hilîne.

Pirtûk radestî me bûn.

*Zimanê kurdî dabeşî ser çend zaravayan **dibe**?²⁰⁸*

Der barê van her du cure lêkeran de (yên ku bi alîkariya /-a/yê û ya /-î/yê çêdibin), di tu rêzimanêke kurmancî de em bi xwe rastî agahî yan jî dayîna mînakên eleqedarî van lêkeran nehatine. Der heqê lêkerên veqetînbare de, çend xalên girîng:

I) Eger tişte bikeve navbera daçek û lêkerê, wê gavê ew (ango hêmanên lêkerê) ji hev dibin û ew êdî lêkereke veqetînbare e.

II) Lêkerên ku ji cînavkên lihevxiştî û ji hêmanên din çêdibin, di wexta kêşanê de eger cînavka lihevxiştî ji hev nebûbe û hêmanek neketibe navbera daçek û lêkerê, cînavka lihevxiştî tenê ji bo kesê sêyem ê yekhejmar e. Di halê jihevbiyê de, ji bo her cînavkê ye.

III) Hin cînavkên lihevxiştî ji rewşa xwe ya dêrin averê bûne û bûne wek pêrkîten (pêşgirên) çêkirina lêkeran, ji lew re ew ji hev nabin.

IV) Rewşa van lêkerên ku ji cînavka lihevxiştî û ji lêkereke alîkar hatine pê, ji lêkerên sade, dariştî û hevedudanî cuda ye. Di meseleya ergatîfiyê de rewşeke din dertê holê. Loma nikare bê gotin ku “*Min li wan dan*”, ji lew re wek ku tê zanîn, gava lêker têper bin, wekî di dema niha, bê û raweya fermanî de, lêker bi kirdeyê re ahengdar e, ji lêkerê kirde tê naskirin. Îcar di demên borî de ji lêkerê tişte tê naskirin. Mînak:

Ez sêvê dixwim.

Min sêv xwarin.

Ew pirtûkan dixwîne.

Wî pirtûk xwendin.

Gava lêker lêkerên veqetînbare bin, ji ber ku beriya tiştêyê daçekêk tê, êdî di dema borî de bi lêkera têper ew yekhejmarî yan jî pirhejmariya tiştêyê nikare bê nîşandan. Tişte pirhejmar an jî yekhejmar dibe. Wek nimûne:

Wî jî min pir xwaribû.

²⁰⁸ Di hin devokan de, wekî ya Farqînê, ne bi temamî be jî di zimanê devkî de li cihê morfosentaktîka /-î/yê, ya /-ê/yê jî tê bikaranîn: Mîna “*ez hîne wan bûme*”.

*Wî **ji** nas û dosatan pir xwaribû.*

*Min **li** sazê da.*

*Wan **li** sazan da.*

*Wan **ji** zarokan hez kir.*

BEŞA SÊYEM

RASTNIVÎSÎNA CUREYÊN LÊKERAN

Ziman diyardeyeke civakî ye ku mirov di nav de difikire.²⁰⁹ Çawan bêyî zimên nabe ku ji ramînê (fikirînê) bê behskirin, her wisan çendî ziman hêmaneke xurt a çandê be jî, îcar tu çand bêyî zimên nayê afirandin.²¹⁰ Tevî vê rewşa zimên, li gorî Ferdinand de Saussure ku ew hîmdarê zimannasiya binyadgeriyê ye, aliyên fîzîkî, fîzyolojîk û ruhî yên melekeyên zimên hene û dîsan ji hêla wî ve tê daxuyandin ku pêwendiya zimên bi warên ferdî û civakî re jî heye.²¹¹

Ji ber pêkerên cografî, civakî, dîrokî, ferdî û hwd. di zimên de bi qonaxa demên dûr û dirêj, guherînên cuda jî pêk tên, ku jixwe guherîn wesifeke wisan e di cewherê zimên de çêdibe.²¹² Loma dibe ku di zimanekî de çend zarava û devok hebin. Jixwe vê rewşê kiriye ku ji du aliyê zimên bê behskirin; wekî zimanê devkî û zimanê nivîskî. Îcar zimanê afaxtinê bi dangan peyda dibe û bi bihîstinê tê wergirtin, lê zimanê nivîsînê bi nîşanên nîgarî (grafîkî) pêk tê û bi bînahiyan tê wergirtin.²¹³ Ji ber vê rewşê, zimanek hema hema wekî du zimanên ji hev cihê jî tê dîtin.

Çemkên zimanê hevpar û yên zimanê perwerdehiyê, aîdî zimanê nivîsînê/nivîskî ne. Di zimanê devkî de standardî tune ye, lê di zimanê nivîskî de hewcedarî bi zimanekî hevgirtî, bi zimanekî standard heye da ku hemû ferdên axêverên ji kom û civata wî zimanî bigihîjîn yekîtiyê û hesta zimanî û bi riya zimên jî bikarin di her warî de yekîtiya xwe ya neteweyî pêk bînin. Standardîzasyon jî,

²⁰⁹ Nermi Uygur, **Kültür Kuramı**, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul 1996, r. 45.

²¹⁰ *h.b.*, r. 19.

²¹¹ Ferdinand de Saussure; “Genel Dilbilim Dersleri”, di Mehmet Rifat (Berhevkar) **XX. Yüzyılda Dilbilim ve Göstergibilim Kuramları 2. Temel Metinler** de, Mehmet Rifat-Sema Rifat (Çev.), Yapı Kredi Yayınları, İstanbul 1998, r. 18.

²¹² Doğan Aksan, **Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim**, C. 1, 4. baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2007, r. 41.

²¹³ Mistefa Aydoğan, *h.b.*, r. 19.

polîtîkayeke zimanî ye ku rasterast bi netewesaziyê re têkildar e û koka wê diçe heta Serdema Ronensansê.²¹⁴

Gava zimanek bibe xwediyê zimanekî nivîskî, ku ew xweynorm e, bivê nevē pêwîstî bi maytêkirineke vîni (îradî) çêdibe. Ev têkilîpêkirina ji derve ve jî, divê ku xwe bispêre hin rêgezan an jî siyaseteke zimanî. Ji bo nivîsîneke sererast pêwîstî bi rêzikên vekîta zimên heye. Bi saya rastnivîsînê jî qurm û rayekên bêjeyan ango yên lekseman tên parastin, di gel çendîn diyardeyên din, rê li ber sergêjyên devokî tê girtin û ew dibe sedema afirîna zimanekî standard.²¹⁵ Standardiya zimên jî dibe sedem ku di zimanê nivîskî de cudahiyên devokî û herêmî yên wî zimanî ji holê rabin û zimanekî hevpar pêk were.

Şayanî teqdîrê ye, Celdat Bedirxan ku hîmdarê kurdîya nûjen a bi tîpên latînî ya li kar e, di warê rastnivîsîna zimanê kurdî de jî bûye rêber û ji bo vekîtê rê ji kend û kospan, ji gelş û aloziyan paqij kiriye. Belê, eger zimanê kurdî ji hêla dewletên serdestî kurdan nehatibûya qedexekirin, saziyên wan ên perwerdehiyê (wekî medreseyan) ji holê nehatina hildan û wan derbe nexwaribûya, bi îhtimaleke zêde dibû ku hem alfabeya erebî ji bilî hin guherînan, ku di destpêka sedsala XX'an de ji aliyê rewşenbîrên kurd ve li ser alfabeya erebî ya kurdî xebatên ji bo revîzekirinê hatine kirin²¹⁶, hem jî îmlaya wê ya adetî dê berdewam bikira. Lê îro halê hazir li rastê du alfabeyên vî zimanî - erebî û latînî - tevî rastnivîsîna wan di nav kurdan de li kar in. Ji ber rastnivîsîna her du alfabeyan ji hev cuda ye û ya mijara me jî li serê ye ya latînî ye, rêzikên ku behs ji wan e jî ji bo alfabeya kurdî ya latînî ye. Hemû rêzikên rastnivîsînê, tevî xalbendiyê, ne bi temamî be jî, bi giranî ji yên alfabeya latînî ne serbixwe ne. Termînolojî û metod bi awayekî giştî ji hev ne dûr bin jî, taybetmendiya rêzimana her zimanî dike ku di gel ew zimanên alfabeya latînî bi kar tînin jî, di hin warên rastnivîsînê de ji hev cihê bin.

²¹⁴ Amir Hassanpour, **Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil (1918-1985)**, İbrahim Bingöl & Cemil Gündoğan (İngilizceden çevirenler), Avesta, İstanbul 1997, r. 98.

²¹⁵ Reşo Zilan, "Çend Pirsên Rastnivîsînê", **Kurmançî**, h. 19, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs 1996, r. 9-10.

²¹⁶ Ji bo agahiyên li ser vê yekê *bnr.* Koma Xebatên Kurdolojiyê (amd.), **Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913**, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2013. r. 27-28.

Herçî Celadet Bedirxan e, ji bo danîna rêzikên rastnivîsînê xwe spartiyê rêbazê zanistî ku wiha dibêje: “*Qeydeyên vekîte ji tevahiya gramêre dertên.*”²¹⁷ Rêziman qerqûdeya (skeleta) zimên e. Eger bi puxteyî bê gotin, bi riya xebatên zanistî yên li ser deng, teşe/form û sazûna hevokan ên zimanekî, bi awayekî giştî hemû zanyarî tî peyitandin û di encama van xebatan de jî rêzik ji bo wî zimanî tî danîn. Ev helwesta Celadet Bedirxan a zanistî bi rastî jî rê li ber zimannas û rêzimannasên zimanê kurdî xweş kiriye û ji eleqedarên zimanê kurdî re jî bûye rênişandarekî ronak û rêzikên ku ji bo rastnivîsînê danîne hîn jî bi rêjeyê gelek zêde diyarker in. Ji ber ku divê “*rêsayên vekîte ji tevahiya gramêre bîdêstxistin*” loma hewce dike di vî warî de jî mirov xwe bispêre “*rênivîsa kûr (deep orthography)*” lê ne “*rênivîsa tenik (shallow orthography)*”²¹⁸ Bi hizira me, eger bi awayekî giştî rewş bê formulekirin, heta ji aliyê binyatî ve lêker neyên nasîn, der barê rastnivîsa wan de jî mirov nikare biryara rastnivîsîna wan bide. Îcar mirov der barê kurdî de, nemaze li ser warên wekî fonetîk, morfolojî û sentaksê li ser fonem û morfemên wî çî qas xwedî agahî be, çî qas haya mirov ji etîmolojiya peyvên wî hebe, ew qas kar û xebatên ji bo rastnivîsînê hêsantir dibin. Ji ber paşxaneyê me ya dîrokî ya wisan dûr û dirêj a rastnivîsîna bi alfabeya latînî ya kurdî nîn e û adetekî rastnivîsînê ya lihevkerî ya tam pêk nehatiye, di warê zimanê nivîskî de ev kêşeya hanê ya berbiçav dike mirov rastnivîsîna kûr ji xwe re bike armanc û ji bo rastnivîsînê xwe bispêre rêzikên peyitandî.

Celadet Bedirxan der barê awayê vekîta cureyên bêjeyan de jî ravekirineke ronker û tîrker kiriye. Ew dadixuyîne ku “*Di bihevîna bêjeyan de qeyda gelemper ew e ko her bêje bi serê xwe tîte nivîsandin û bi hin bêjeyîne din ve nabin, ji hin awartan pê ve.*”²¹⁹ Rîyên bihevîna û biyekkirina bêjeyan, erkên cur bi cur ên gîreyan (wekî pêşgir, paşgir, navgir, navbergiran), taybetiyên piraştina bêjeyan, ji aliyê morfolojîk ve naskirina wan gelek girîng in.

Li ber ronîya van agahî û pêzanînan dê hewl bê dan ku di bin vî sernavî de bi çend jêrnava û binbeşan, mijara rastnivîsîna awayê raderî ya lêkeran a ji aliyê binyatî

²¹⁷ Celadet Alî Bedirxan, **Bingehên Gramêra Kurdancî**, Avesta, İstanbul 2010, r. 26.

²¹⁸ Ergin Öpengin “Pîrsên Rênivîsa Kurdancî: Pêdaçûneke Rexneyî li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydoğan”, **Derwaze** (Kovara Kurdî ya Zanistên Civakî û Mirovî), h. 1, İstanbul 2017, r. 180-195.

²¹⁹ Celadet Alî Bedirxan, *h.b.*, r. 26.

ve, rewşa wan a navdêrî û ya hin awayê kêşandî ya lêkerên dariştî yên bi pêşgiran, bê ravekirin û diyarkirin.

3.1. RASTNIVÎSÎNA CUREYÊN LÊKERAN A DI REWŞA RADERÎ DE

Lêkerên zimanê kurdî, tevî radera xwe hem lêker hem jî navdêr in. Ev taybetî, di warê zimanê nivîskî de ji bo lêkerên xwerû û yên dariştî hema bibêje ne gelş e û ev yek nabe sedema aloziyan. Di zimanê nivîskî de ji bo vekîta wan bi awayekî giştî li ser wan mitebeqatek heye, lê ji bo lêkerên hevedudanî û yên veqetînbarek heman tişt nikare bê gotin. Ji ber vê yekê dê bi dorê li ser hemû cureyên lêkeran bê sekinandin û ji bo rastnivîsîna awayên wan ên raderî raman bîn derpêşkirin.

3.1.1. Rastnivîsîna Lêkerên Xwerû yên bi Awayê Raderî

Ji aliyê rastnivîsîna lêkerên xwerû yên bi awayê raderî, di navbera zimannas û danerên rêziman kurmançî de ji bilî çend lêkeran, zêde gelş nîn e û der barê vekîta wan a awayê raderî de dikare ji hebûna lihevkerinekê bê behskirin. Ev lêkerên ku îtiraz li ser awayê rastnivîsîna wan a raderî heye, hin ji wan ev in ku ew ji berhemên bûne dabaşa vê xebatê, hatine hildan. Wekî lêkerên *bûyîn*, *cûyîn*, *çûyîn*, *dayîn* û *mayîn*’ê. Di xebata bi navê “Ji bo rastnivîsînê Ferhenga Kurdî (Kurmançî) - Tirkî” de jî hinek lêker ji bo awayê raderî wiha hatine destnîşankirin: *bûn/bûyîn*, *çûn/çûyîn*, *dan/dayîn*, *jîyîn*, *man/mayîn* û *vîyan/vîn*.²²⁰

Li ser van lêkerên nimûneyî, dê bal li teşeya wan a “*bûyîn*, *cûyîn*, *çûyîn*, *dayîn*, *jîyîn*, *mayîn* û *viyan*”ê bê kêşandin û ji bo rastnivîsîna wan dê sedemên ku divê çima ew awa neyên hilbijartin bîn aşkerakirin.

Hewce dike pêşî ji raderên lêkerên kurdî were destpêkirin. Du raderên lêkerên kurdî hene; yek jê */-in/* û ya din jî */-n/* ye. Bi hilaîna van raderan a ji paşîya lêkeran, rayeka wan a dema borî tê holê. Bêyî ku tu guherîn di vê rayekê de biqewime, hemû

²²⁰ Ji bo agahiyên berfirehtir *bnr.* M. Malmîsanij (amd.), **Ji bo rastnivîsînê Ferhenga Kurdî (Kurmançî) - Tirkî**, madeyên eleqedar, Weşanxaneya Rûpelê, İstanbul 1012. Divê bê gotin ku ev xebateke kolektîf e û bi beşdariya Mîstefa Aydoğan, Zana Farqînî, Newzad Hirorî, Huseyîn Kartal, Remzî Kerîm, Mahmûd Lewendî, M. Emîn Narozî û Reşo Zilan ve pêk hatiye û biryara li ser awayê rastnivîsîna bêjeyan jî, li gorî meyla giştî ya beşdarên hatiye stendin.

gireyên demên borî bi ser rayekê ve dibin. Lê rayeka dema niha ne wisan e. Li gorî rêzikên tewanga lêkeran, di rayeka lêkerê de dengdar û dengdêr, li dengdar û dengdêrên din dadigerin. Ji ber ku di mijara “Senifana Lêkeran” de, li bin jênavê “Ji Aliyê Teşeyê ve Lêker” bi awayekî hewcedar li ser tewanga lêkeran, yanê li ser pevguherîna dengên di rayeka dema niha de agahî hatibûn dan, dê bi berfirehî ji vê rewşê neyê behskirin. Lê beriya pevguherînên dengan ên di rayeka dema niha de, wek qaydeyê geştî, dengê ji paşîya rayeka dema borî jî dikeve û piştî rayeka dema niha bi dest dikeve. Ji bo ronîkirina van ravekirinan, çend mînak:

axaft-in: *-in* rader, *axaft* rayeka dema borî, bi hilanîna /t/yê *axaf* û bi guherîna dengê/morfema /f/yê li /v/yê û dengê/morfema /a/yê jî li /ê/yê, rayeka dema niha *axêv* tê holê.

bû-n: *-n* rader, *bû* rayeka dema borî, bi hilanîna dengdêra /û/yê wek rayeka dema niha *b* li ber dest dimîne.

çû-n: *-n* rader, *çû* rayeka dema borî, bi hilanîna /û/yê îcar wek rayeka dema niha tenê *ç* dimîne.

da-n: *-n* rader, *da* rayeka dema borî û bi hilanîna dengdêra /a/yê, wek rayeka dema niha ya ku dimîne tenê *d* ye.

kir-in: *-in* rader, *kir* rayeka dema borî, bi hilanîna dengdara /r/yê rayeka dema niha *ki* dimîne.

kirî-n: *-n* rader, *kirî* rayeka dema borî, bi hilanîna /î/yê jî *kir* mîna rayeka dema niha bi dest dikeve.

kuşt-in: *-in* rader, *kuşt* rayeka dema borî, bi ketina /t/yê *kuş* û bi guherîna dengê /ş/yê li /j/yê jî rayeka dema niha *kuj* tê holê.

parast-in: *-in* rader, *parast* rayeka dema borî, bi hilanîna /t/yê, li rastê *paras* dimîne. Li gorî rêzika geştî ya tewanga lêkeran di vê rayekê de /s/ dibe /z/ û dengdêra berî wê /a/ jî dibe /ê/; bi vî awayî rayeka dema niha *parêz* tê holê.

qelapt-in: -in rader, *qelapt* rayeka dema borî, bi hilanîna /t/yê *qelap* û bi guherîna dengê/morfema /p/yê li /b/yê û denge/morfema /a/yê jî li /ê/yê, rayeka dema niha *qelêb* bi dest dikeve.

xwar-in: -in rader, *xwar* rayeka dema borî, bi hilanîna dengdara /r/yê jî *xwa* wek rayeka dema niha dimîne.

Ev hemû rêzikên giştî ne û ji bo naskirina rewşa raderî ya lêkeran jî bi ya me rênîşander in. Ji ber ku dem li ser van rayekan tên kêşandin, tesbîtkirin an jî biryardana li ser awayên raderî yên lêkeran ne tenê ji bo lêkerên xwerû, ji bo lêkerên dariştî, yên hevedudanî û yên veqetînbar jî pir girîng û hewcedar e. Îcar awayên raderî yên lêkeran bê ka bi awayê “*bûn, cûn, çûn, dan, jîn, man* û *vîn/vêtin*”ê rast e yan jî bi şeweya “*bûyîn, cûyîn, çûyîn, dayîn, jiyîn, mayîn* û *viyan*”ê rast e, bi azîna rêzikên li jorê, peyitandina wan pir hêsan e. Ji bo çareserkirina kêşeyê û peydakirina awayê raderî ya lêkeran, dikare ev rêbaz bê hawarê. Bi şeweyeke lêhûrbûnî, dê bi dorê bi awayê kêşayî hewla çareserkirina arîşeyê bê kirin. Ji lêkerê piştî hildana raderê rayeka dema borî, di pey xistina dengê dawî û piştî guherîna bi hev a dengan (ku di rayeka dema niha de hebe), rayeka dema niha dimîne. Eger bi dayîna mînakên li ser her du rayekên lêkeran dirêjî bi mijarê bêdan:

bûn:> *bû*> *b*; ez *bûm*, ez *dibûm*, ez *bûbûm*, ez *dibim*, ez *dê bibim*. Demên borî li ser rayeka “*bû*”yê tên kêşandin. Lê ku awayê raderî wekî “*bûyîn*”ê bê pejirandin, divê li gorî rêzikên giştî yên bidestxistina rayekên lêkeran wiha be: *bûyîn* > *bûyî* > *bû* be. Lê di tu devokeke kurmancî de mirov rastî awayên wê yên mîna “*ez bûyîm, ez dibûyîm, ez bûbûyîm, ez ê bibûm*”ê nayê.

cûn:> *cû*> *c*; lê rayeka dema niha ya vê lêkerê *cû* ye. Ji ber ku awayê raderî yê wê *cûtin* e û *cût* û *cû* jî her du rayekên wê ne: *cûtibû, dê bicûta, dicût, dicû, dê bicû*. Jixwe şaşiya mezin ew e ku awayê raderî ne “*cûn*” ne jî “*cûyîn*” e.

çûn:> *çû*> *ç*; ew *çû*, ew *diçû*, ew *çûye*, ew *diçe*, *dê biçe*. Herçî ev lêker di devoka Farqînê de wek navdêr di şekilê “*çûndin*”ê de ye û rengdêra “*çûndox*” jî jê hatiye dariştin. Çendî di rayeka wê de guherîn pêk hatibe jî, di warê kêşana deman de

ji rêzika giştî averê nebûye û xwedî kêşaneke rêzîkî ye. Ew li ser rayekên “çûyî” û “çû”yê wekî “ez çûyîm, ez diçûyîm, ez ê biçûm” nayê çevandin.

dan: > *da* > *d*; *te da, te dabû, te dê bidaya, tu didî, tu dê bidî*. Îcar eger awayê wê yê raderî “*dayîn*” be, divê rayekên wê wiha bin: *dayîn* > *dayî* > *da*. Li gorî vê yekê, pêwîst e ku kêşanên wê jî bi awayên “*min dayî, min dayîbû, ez didam, ez ê bidam*” bin. Pir aşkera ye ku kêşanên vê lêkerê li ser rewşa raderî ya “*dayîn*”ê hîç nayê kirin.

jîn: > *jî* > *j*; lê ev rewş li vê lêkera deformebûyî nayê. Ji ber ku awayê wê yê berê “*jîndin*” e û jixwe di gotinên pêşyan de ew wekî “*dînya mirin û jîndin e*” derdikeve pêşberî me. Her wiha, gotina “*zindî*” jî dîsan ji awayê wê yê raderî “*jîndin*”ê tê. Halê hazir her du rayekên wê jî li ser “*jî*”yê tîkêşandin; eynî mîna rayekên lêkerên “*girîn*” û “*mirin*”ê, ku rayekên wan ên dema niha û ya borî yek e: *ew jîn/jiyan, ew dijîn, ew dê bijîn*.

man: > *ma* > *m*; ev lêker jî deforme bûye ku di zaravayê kirmanckî de ew bi awayê “*mendene*” û di kurmanciya naverast de jî bi şêweya “*mirdin*” e. Ji lew re, ji ber vê terîbînê, rayeka dema niha ya “*man*”ê bi awayê “*mîn*” e: *hûn man, hûn mabûn, hîn dimînin, hû dê bimînin*. Demên wê li ser “*mayîn*”ê nayên çevandin; di tu devokeke kurmanckî de awayên wê yê kêşanê wekî “*ez mayîm, ez mayîme, ez dê bimayîma*” nîn in.

vên/vêtin: > *vê/vêt* > *v/vê*; ev lêker jî, ji ber guherîna bi ser de hatiye, ji qaydeyê gelemper bi der bûye. *Wê viya, ew divê, ew dê bivê*. Demên wê yê borî wekî ku li ser awayê wê yê raderî “*viyan*”ê be tîkêşandin, ku ev rewş ji rêzîkên peyitandî der e.

Divê ji taybetiyeke hin lêkerên kurmanckî jî behs bê kirin ku bi qonaxa demê re di hin devokan de ji ber sedemên cuda cuda yan ji rayeka wan a dema niha yan jî ji rayeka wan a dema borî dengê ketiyê û ew ji rêzîka giştî averê bûne. Mîna *ketin* (dikeve, ket) û *keftin* (dikeve, keft), *avêtin* (diavêje, avêt) û *avêştinê* (diavêje, avêşt). Dîsan lêkera “*xwarin*”ê ku di kirmanckî de “*werdene*” û di kurmanciya naverast de jî “*xwardin*” e, lê di kurmanckî de, di bêjeyên dariştî de mirov rastî rayeka wê ya dema

niha ya kevn tê ku di wan de ji bilî guherîna dengdêrê, bi awayê fosîlîze, lêkerê qurmê xwe parastîye. Wekî *nanxur, nanxwer, nanxwar; merivxur, merivxwer, merivxwar...*

Di kurmancî de, kêşana demên borî yên hin lêkerên teneper ne mîna hev e. Nemaze hin lêkerên teneper ên bi paşgiran hatine dariştin û ji du kêteyan pêk tên. Wekî lêkerên *gerîn, girîn, helîn* û *bezîn*'ê. Demên wan ên borî, di hin devokan de wiha ye:

gerîn; geriya, dê bigeriya, digeriya, geriyabû.

girîn; giriya, dê bigiriya, digiriya, giryaye.

helîn; heliya, dê biheliya, diheliya, heliyabû.

bezîn; beziya, dê bibeziya, dibeziya, beziyaye.

Lê ev lêkerên hanê yên ku ji sê kêteyan pêk tên (wekî *derizîn, kesirîn, peyivîn* û *terikînê*), demên wan ên borî wekî yên jorê nayên kêşandin. Wek mînak:

derizîn; derizî, dê bideriziya, diderizî, derizîbû.

kesirîn; kesirî, dê bikesiriya, dikesirî, kesirîbû.

peyivîn: peyivî, dê bipeyiviya, dipeyivî, peyivîbû.

terikîn: terikî, dê biterikiya, diterikî, terikîbû.

Ev lêker bi awayê mîna “*ew deriziya*”, “*hûn kesiriyana*”, “*ez peyiviyam*” û “*ew terikiyabûn*”ê nayên kêşandin. Lê belê di hin devokan de, li şûna awayên kêşanên ji bo dema borî ya tede-yî û ya dema borî ya dûdar, ên wekî “*ew geriya, ez giryam, çivîk firiya, ew beziyane, hûn reviyane, por weşiya*”, bi awayê adetî ango asayî ew wiha tên kêşandin: “*ew gerî, ez girîm, çivîk firî, ew bezîne, hûn revîne, por weşî*”.²²¹ Di xebata Celadet Bedirxan û Roger Lescot de jî bal li vê rewşê hatiye kêşan û ji bo mijarê ev mînak hatine dan: *ez giryam* û *ez girîm, ez tirsyam* (an *ez tirsiam*) û *ez tirsîm, tu beziyayî* (an *tu bezihayî*) û *tu bezî*.²²² A ji ber vê rewşa cotkêşana demên borî ya hin lêkerên teneper a di devokên cuda de, dibe sedema fikira ku divê awayê raderî yên hin lêkeran bi awayê “*beziyan, bûyîn, çûyîn, firiyana, geriyana, liviyana,*

²²¹ Wek mînak, di devoka Kolika Semsûrê, ya Macirana Meletiyê û ya Qilebana Şirnexê de, hemû demên borî yên lêkerên teneper, li gorî rêzika giştî tên kêşandin.

²²² Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, **Kürtçe Gramer**, 2. baskî, (Wergera ji Fransî; li jêr çavdêriya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê), Avesta, İstanbul 2004, r. 124.

mayîn, payîn, weşîyan, xuriyan, zayîn” û hwd. be. Ji lew re, hin danerên rêzimana kurmancî ji ber ku di bin tesîra devoka xwe de dimînin, radera lêkerên têneper, çî xwerû çî jî dariştî yên wekî *bezîn, bûn, çûn, firîn, gerîn, livîn, man, pan, revîn, weşîn, xurîn û zanê* di berhemên xwe de mîna awayê li jorê didin nîşandan.

Çawan ji ravekirina li ser lêkerên nimûneyî jî xuya bû û bi dayîna mînakên hat selmandin, ev awayê raderî ya lêkeran li derî rêsa û qanûna kêşana lêkeran e. Ev rewş rasterast ji ber bandora devoka daner bi xwe ye, ku nabe wek qaydeyekî rêzimanê bê pejirandin.

Ji van lêkerên ku bûne dabaşa lêkolîn û lêhûrbûnê, wekî “*bûn, çûn, dan, jiyîn, man û vîn/vêtin*”ê, lêkerên “*bûn, çûn, jîn û man*”ê têneper in, herçî lêkera “*dan*” û “*vêtin/vên*”ê lêkerên têper in, ku divê awayê wan ê raderî jî wekî “*bûn, çûn, jîn, man, dan û vêtin/vên*”ê bin. Çendî ji ber guherîna forma lêkerê ya dêrin (mîna ketina denga a ji wan) hin awarte di kêşana wan a deman de qewimîbe jî, ya esil ew e ku awayê raderî yên lêkeran rast bê dan û ji bo sanahiyê jî, divê di materyalên wekî yên hîndekarî û perwerdehiyê de her du rayekên lêkeran bîn nîşandan. Di gel vê yekê, ev lêkerên ku bi pêşgiran hatine dariştin jî divê rewşa wan a raderî bi awayê “*vebûn, vedan, derçûn, razan, vejîn*” û hwd. be.

Ji bo awayê raderî yê lêkerên “*bûyîn, çêran, çûyîn, dayîn, êşîyan, gerîyan, heyîn, jîyan, mayîn, payîn, pijan, rijan, şîyan, viyan, weşan û zayîn*”ê eger bi kurtasî bê gotin, ji aliyê binyatî ve ew ji çî cure kategoriya lêkeran bin jî, ew navdêrên lêkerî ne û li gorî rêzika giştî dem li ser vî awayê wan nayên kêşan. Jixwe ji hêla Celadet Bedirxan ve jî li ser awayê raderî yên hin lêkeran hatiye sekinandin û rewşa lêkerên *man, dan û panê* yên bi awayê *mayîn, dayîn û payînê* wek navdêr hatine diyarkirin.²²³ Her wiha hatiye daxuyandin ku “bikaranîna rewşa bi awayê *bûyîn* û *çûyînê* (li Diyarbekirê *çûndin*) ji bo rewşa navdêrî derbasdar e”.²²⁴

3.1.2. Rastnivîsîna Lêkerên Dariştî yên bi Awayê Raderî

Di kurmancî de lêkerên dariştî bi du awayan çêdibin; bi pêşgir û bi paşgiran. Ji lew re jî, hewce pê tê dîtin ku di bin du binbeşan de lêhûrbûn li ser van cureyên

²²³ *h.b.*, r. 1276.

²²⁴ *h.b.*, r. 127.

lêkeran bê kirin. Çendî lêkerên dariştî yên bi pêşgiran, ji pêşgir û ji lêkereke xwerû yan jî ji pêşgir û lêkereke çêkirî pêk werin jî, mijara rastnivîsîna wan a awayê raderî eynî ye. Loma ew dê li jêr du sernavî bên vekolan.

3.1.2.1. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên Bipaşgir

Ev lêkerên bi paşgiran hatine dariştin, bi rastî ji ber ku yên teneper pir dişibin hinek lêkerên xwerû, cudakirina wan ji yên xwerû pir zehmet e. Paşgirên ku bi wan lêkerên dariştî tîr pirastin, ên ji aliyê me ve hatine peyitandin ev in: /-în/ û /-andin/, /-ijîn/ û /-ijandin/, /-isîn/ û /-isandin/, /-ixîn/ û /-ixandin/, /-iqîn/ û /-qandin/. Bi yên pêşî lêkerên teneper û bi yên duyem jî lêkerên têper tîr bidestxistin. A ku dibê sedema rastnivîsîna awayê raderî ya lêkeran a ji hev cihê, paşgira /-în/ê ye.

Ji berhema Mûrad Ciwan ku bûye mijara xebatê, dê çend lêkerên bi paşgiran hatine dariştin, wek nimûne bîr hildan û wisan dirêjî bi lêhûrbûn û tesbîta rastnivîsîna wan bê kirin. Mînakên hatine hilbijartin hin jê ev in: *beziyan bezandin*, *çêjiyan çêjandin*, *weşiyane weşandin*, *firiyan firandin*, *geriyan gerandin*, *reviyan revandin*, *xuriyan xurandin*, *gurmî(ya)n gurmandin*, *teqî(ya)n teqandin*, *xuşî(ya)n xuşandin*, *hîrî(ya)n hîrandin*. Ji van jî, dê li ser awayê dayîna wan a bi teşeya “*beziyan*, *çêjiyan*, *weşiyane*, *firiyan*, *geriyan*, *reviyan*, *xuriyan*, *gurmîyan*, *teqiyan*, *xuşiyan* û *hîriyan*”ê bê rawestandî, ji ber ku kêşe ji aliyê rastnivîsîna bi şekilê /-andin/ê ya rewşa raderî ya têper tune ye.

Çawan ku li jorê (*bnr.* Rastnivîsîna Lêkerên Xwerû yên bi Awayên Raderî) bi awayekî dîr û dirêj ji dabaşê hat behskirin û rêzikên kêşana lêkeran a li ser du rayekan hatin aşkerakirin, ew rêzikên giştî ji bo van cure lêkeran jî derbas dibin û dem li ser van awayan a lêkeran nayê kêşan. Ew di rewşa navdêrî ya lêkeran de ne. Halên wan ên raderî divê bi awayê *bezîn*, *çêjîn*, *weşîn*, *firîn*, *gerîn*, *revîn*, *xurîn*, *gurmîn*, *teqîn*, *xuşîn* û *hîrîn*’ê be.

3.1.2.2. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên Bipêşgir

Pêşgirên ku bi wan di kurmancî de lêker tîr dariştin, ên ji hêla me ve hatine peyitandin /ber-/ , /da-/ , /der-/ , /hil-/ , /ra-/ , / ro- , rû-/ , /ve-/ , /vê-/ û /wer-/ in û wekî Celadet Bedirxan jî dibêje “*ev lêker, bi zeliqîna hêmaneke ne lêker a bi raderê*

çêdibin. *Hêmanên ku lêker û ne lêker in, wek bêjeyekê tenê tên nivîsandin*".²²⁵ çendî ev cure lêker, ji pêşgir û lêkereke xwerû û ji pêşgir û lêkereke dariştî pêk werin jî, qayde yek e. Loma ne hewce ye bi binbeşan lêhûbînek li ser wan bê kirin.

Ji bo zimanê nivîskî dikare bê gotin ku hema bi temamî riayet li vê rêsayê tê kirin. Di gel vê yekê, êdî ji ber çî sedemê be, di berhema Qanatê Kurdo ya navborî de du lêkerên ji vê senifanê, bi awayê "*wer anîn*" û "*wer kirin*"ê dibihurin. Divê ev her du lêker jî di awayê raderî de tevî pêşgirên xwe pevve bên nivîsandin. Mîna *weranîn* û *werkirin*'ê.

Ne ji ber nivîsîna ji hev cuda ya pêşgir û lêkerê, lê ji ber awayê dayîna rewşa raderî ya lêkerên ji vê beşê yên wekî "*daheliyan*", "*daliqîyan*" û "*hilweşîyan*"ê²²⁶ divêtî bi kirina çend gotinan heye. Rêzikên ku berê ji bo lêkerên xwerû û lêkerên dariştî yên bi paşgiran hatibûn daxuyandin, ji bo van jî derbasdar in û loma hewce dike ew bi awayê "*dahelîn*", "*daleqîn*" û "*hilweşîn*"ê bin. Her wiha, "*daleqîn*" ku wek "*daliqîyan*" hatiye dayîn jî, ji pêşgira /*da-*/ û ji lêkera "*leqîn*"ê²²⁷ çêbûye.

3.1.3. Rastnivîsîna Lêkerên Hevedudanî yên bi Awayê Raderî

Lêkerên hevedudanî ku bi alîkariya lêkereke alîkar û ji bêjeyeke ji esilê navdêran, an jî ji daçekkek, ji bêjeyek û ji lêkereke alîkar çêdibin, dê di bin pênc binbeşan de lêhûrbûn û têfikirîn li ser wan bê kirin. Wek lêkerên ku ew ji bêjeyeke sade û lêkereke, ji bêjeyeke hevedudanî û lêkereke, ji bêjeyeke dariştî û lêkereke, ji daçekkek, bêjeyek û ji lêkereke, ji cînavkeke lihevxiştî ya ji tofa duyem û lêkereke, pêk tên. Ji ber ku di mijara "Lêkerên Hevedudanî" ya Beşa Duyem de, bi dorfirehî ev cure lêker hatibûn vekolan û senifana wan hatibû kirin, loma dê bi awayekî hîn kurtasî û bi şêweyê serveyî ji wan bê behskirin. Her wisan dê li gorî xwerûbûn an jî dariştîbûna lêkera alîkar, mijar neyê tiwêjandin.

²²⁵ *h.b.*, r. 182.

²²⁶ Ji bo vê yekê *bnr.* M. Malmîsanij (amd.), *h.b.*, madeyên "*daheliyan*", "*daliqîyan*" û "*hilweşîyan*".

²²⁷ *h.b.*, madeya "*daliqîyan*". Divê bê gotin ku jixwe di berhemê de lêkera "*leqîn*" wek "*leqîn/leqîyan*" hatiye tercîhkirin. Ev nakokiyek e, eger lêker "*leqîn*" be divê dariştîya wê ya bi pêşgira /*da-*/yê jî "*daleqîn*" be.

Awayê çêbûna lêkerên hevedudanî bi çî cureyî dibe bila bibe, rêzika awayê rastnivîsîna hemûyan, mîna hev e. Lê wekî ji van berhemên li ser rêzimana kurmancî jî dixuye, ku ew wek nimûne ji bo vê xebatê hatine hilbijartin, kêşeyeke cidî ya rastnivîsîna awayên wan ên raderî heye. Li jêr dê bi binbeşan li ser vekîta wan bê rawestandî û der barê wan de dê nêrîn û têbînî bèn derpêşkirin.

3.1.3.1. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên ku bi Bêjeyeke Xwerû û Lêkerekê Çêbûne

Di navbera rêzimannas û amadekarên li ser rêzimana kurmancî de, yê ku berhemên wan ji aliyê me ve hatin vekolan, di warê vekîta lêkerên hevedudanî yê bi awayên raderî de lihevkerin nîn e, ku jixwe hatibû diyarkirin senifanên wan ên ji bo van cureyên lêkeran jî hev nagirin. Ev lêkerên ji aliyê me ve wek lêkerên hevedudanî hatine binavkirin, li gorî daneran, rewşa wan a raderî bi du awayan tê nivîsandin. Wekî ji mînakên dayî, ku di beşên eleqedar de ji wan hatibû behskirin, ji hêla Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Qanatê Kurdo, Feqî Huseyn Sagniç, Kemal Badilli, Mûrad Ciwan ve ev lêker ji hev cihê, lê ji hêla A. Balî, Samî Tan, Bahoz Baran û Kadrî Yildirim ve jî ev lêker pêkve hatine nivîsandin.

Di berhema Samî Tan de lêkerên hevedudanî ji aliyê rastnivîsînê ve wekî “*olandan, diyarkirin, başbûn, hêvîşikestin, şopgerandin, dilman, bergirtin, berxwarin, agirdadan, aramgirtin, balkêşan, bêhnvedan*”ê, di ya Baran de mîna “*avdan, hezkirin, dînbûn, sorkirin, acizbûn*”ê û di ya Yildirim de jî bi şeweya “*asêbûn, asêkirin, bergirtin, arbarîn, çavbirîn, serhildan*”ê hatine nîşandan. Ji van mînan jî tê dîtî ku di rewşa raderî de hêmanên lêkerên hevedudanî bi hev ve hatine nivîsandin. Ji bilî van, di xebata Celadet Bedirxan de “*bazdan*”, di ya Kamûran Bedirxan de “*girêdan*” bi hev ve, di gramera Badilli de bi awayê “*reş bûyîn*” û di ya Balî de jî bi awayê “*sor bûyîn*”ê ev lêker hatine pêşkêşkirin.

Li gorî qaydeyê ku Celadet Bedirxan jî îşaret pê kiriye, divê lêkerên hevedudanî di rewşa awayê raderî de hêmanên wan ji hev cuda, lê di rewşa navdêrî de jî bi hev ve bin. Dikare pirseke wiha bê kirin ku bê çima lêkerên dariştî bi hev ve lê yê hevedudanî ji hev cihê tî nivîsandin? Ji ber ku gireyên dariştinê ne ji cureyên bêjeyan in, bi wan, peyvên ji birên qisetê tî dariştin û ew hêmanên morfolojîk ên

zimên in, bi gotineke din ew morfemên dariştinê ne û bêjeyan saz dikin. Ev lêkerên hevedudanî ji cureyekî bêjeya ji esilê navdêrê, yan jî ji daçekê, ji bêjeyeke esilê navdêrê û ji lêkereke alîkar pêk tên û ew bêje bi giştî bi tena serê xwe watedar in. Îcar ji ber her bêjeyek jixwe bi serê xwe peyveke watedar e û lêkera alîkar divê ji hev cihê bîn nîşandan. Wekî van mînanan: *agir dadan, aram girtin, asê bûn, asê kirin, av dan, aciz bûn, bal kêşîn, baş bûn, baz dan, ber girtin, ber xwarin, bêhn vedan, çav birîn, dil man, diyar kirin, dîn bûn, girê dan, hez kirin, hêvî şikestin, olan dan, reş bûn, ser hildan, sor bûn, sor kirin, şop gerandin.*

3.1.3.2. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên ku bi Bêjeyeke Hevedudanî û Lêkereke Çêbûne

Cudahiya van lêkeran ji yên jorê tenê ji ber binyata bêjeyê ye, ku ew bêje hevedudanî ne, yanê ne xwerû ne. Tevî vê cihêwaziya hanê, ew jî xwedî heman rêzîkê ne û di rewşa raderî de ji hev cuda tên nivîsandin. Mîna van lêkeran: *bêhteng bûn, bindest kirin, cangiran bûn, çavsor bûn, çavbirçî bûn, destnimêj girtin, destteng bûn, dûvdirêj bûn, kêfxweş bûn, malwêran bûn, pêpes kirin, paymal bûn, rûsar bûn, serdest bûn, sermest kirin, serrût bûn, serxweş kirin...*

3.1.3.3. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên ku bi Bêjeyeke Dariştî û Lêkereke Çêbûne

Mebest ji bêjeya dariştî ew e ku ew an bi pêşgirekê yan bi paşgirekê, yan bi navbergirekê çêbûye yan jî xwedî binyateke kompleks e. Di encamê de, bi vê çeşîda bêjeyan û lêkereke alîkar a ku te divê ev xwerû yan jî dariştî be, lêkerên ji senifana lêkerên hevedudanî tên holê û eynî mîna lêkerên ji heman komê, li gorî rêzîka asayî di rewşa raderê ya lêkeran de, nivîsîna bêje û lêkera alîkar ji hev cuda ye.

Ji bo van cure lêkeran, dê serê pêşî lêkerên hevedudanî yên ku bi bêjeyên ji pêşgiran û lêkereke alîkar hatine bidestxistin, bîn dan: *berdest bûn, berguman kirin, bêcan bûn, bêcan ketin, bêxwedî bûn, biav bûn, bihiş bûn, dabeş kirin, dabor bûn, derkuçe bûn, derpêş kirin, hilger bûn, neçar bûn, nexweş ketin, raçav kirin, rarû bûn, veava kirin, verê kirin, vesînor kirin, werbêj kirin...*

Ev lêkerên dê bîn pêşkêşkirin, ji bêjeyên ku bi paşgiran hatine dariştin û ji lêkereke alîkar çêbûne: *ronahî bûn, mitane bûn, dostanî kirin, mêranî kirin, merivantî kirin, kêmasî kirin, dijminatî kirin, biratî kirin, duristayî kirin, merivantî kirin, fehmbâr bûn, xembar kirin, deyndar bûn, xwîndar bûn, perwerde kirin, şermezar bûn, dehfik vedan, hûrik bûn, çikûsî kirin, nazî kirin, şermî kirin, bavînî kirin, kurîfî kirin, xeternak bûn, derdnak bûn, bîrsar bûn, tehmsar bûn, kirîvtayî kirin, beşeve bûn, betave bûn, çepeve bûn, dereve kirin, gêjeve bûn, kuşeve bûn, pareve kirin, pûrteve kirin, reşeve hatin, sileve ketin, soreve kirin, şîreve bûn, şirove kirin, xîjeve kirin, zereve kirin, zareve kirin...*

Beşa sêyem a lêkerên hevedudanî jî, ji bêjeyê ku bi navbergiran û ji lêkereke alîkar pêk tê: wekî van lêkerên nimûneyî: *berevajî bûn, canecan bûn, çaverê kirin, gazegaz kirin, kalekal kirin, qîjewîj kirin, rasterê bûn, sereder kirin, sererast kirin, şireşir kirin, zarezar kirin, beranber man, seranser girtin, paşopê bûn, serobin kirin...*

Beşa çarem jî ew lêkerên hevedudanî ne ku ew bi alîkariya bêjeyê dariştî ya “kompleks” û lêkereke alîkar çêdibin: *babirk vekirin, bextbireş bûn, bêserûber bûn, birêkûpêk kirin, cotkarî kirin, çarmêrkî rûniştin, çalexwarî bûn, devjenî kirin, devjihev man, gelêrî kirin, jehrdadayî kirin, hûrhûrî bûn, lalomeyî bûn, malbelavî kirin, nangermî kirin, paqijî kirin, seroqûnko raketin, serserkî hatin, tarûmar kirin, tînegermî kirin, veberhênan kirin, veguhêzî kirin, warguhêzî bûn, zimandirêjî kirin...*

3.1.3.4. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên ku bi Pêşdaçêkek, Bêjeyek û Lêkerekê Çêbûne

Lêkerên ku di bin vî navî de hatine komkirin, bi piranî ji pêşdaçêkek, ji cînavka berbihevîn û lêkerekê, yan jî ji pêşdaçêkek, ji bêjeyê esilê navdêrê (carinan jî ji pêşdaçêk, ji bêjeyek, ji paşdaçêk) û ji lêkerekê çêdibin. Lê der barê rastnivîsîna wan a bi awayê raderî de kêşeyê gelek mezin heye. Amadekarên berhemên li ser rêzimana kurmancî li ser vê yekê ne hemfikir in, ango xwedî ramanên cihêwaz in. Jixwe gava li rêzimanên ji bo vê xebatê hatine hilbijartin tê nihartin, tê dîtin ku ji bo rewşa raderî hêmanên van lêkerên hanê ji hêla Celadet Bedirxan û Kamûran Berdirxan ve ji hev cuda, lê ji hêla Samî Tan û Kadrî Yildirim ve pêkve hatine

nivîsandin. Herçî rastnivîsa Mûrad Ciwan a der barê van de ji hemûyan cihêtir e. Ji bo nîşandana vê rewşê çend mînak ji berhema Mûrad Ciwan a navborî: “*lihev dan, lihev kirin, jihev ketin û jihev çûn.*”

Li gorî rêzika Celadet Bedirxan daniye, ku bi ya me jî ew rast e, divê her hêmaneke pêkhêner a lêkerê di rewşa raderî de ji hev cuda bên nivîsandin. Ji ber ku gava ew gişt bi hev re bên nivîsandin, îcar ew pêkve dibin navdêr. Çend mînak ji bo awayê rastnivîsîna wan a rewşa raderî: *bi hev ketin, bi pêş xistin, bi rê ketin, bi serî kirin, cem girê dan, gav sist kirin, , ji bîr kirin, ji hev çûn, li êk dan, li hev asê bûn, li hev hatin, li hev xistin, qîç beş kirin, bi par ve kirin, bi ser de girtin, bi pêş ve çûn, ji bîr ve çûn, ji şîr ve kirin, ji hal de ketin, li ser ve bûn, di ber de çûn, di kun re çûn ...*

3.1.3.5. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên bi Cînavkeke Lihevxiştî ya Berbihevîn û Lêkerekê Çêbûne

Ev cure lêker ji cînavkeke lihevxiştî ya ji tofa duyem û ji lêkerekê alîkar pêk hatine. Gava hêmanên cînavkên lihevxiştî (daçek û cînavka berbihevîn “hev/êk) bi ser hev de diçin, ew hêman tevde dikevin formeke din a wekî bêjeyeke serbixwe. Lê wexta hêmanên wan ji hev û din veqetin dikevin rewşa lêkerên mijara beriya vê yê ku bi cînavkên berbihevîn hatine pê. Ji bo dabaşê çend lêkerên nimûneyî: *jev belav bûn, jev bûn, jev çûn, jev ketin, jêk bûn, lev înan, lev par kirin, lêk bûn, lêk çûn, lêk dan, pev anîn, pev çûn, pev ketin, pev kirin, pêk anîn, pêk hatin, tev dan, tev gerîn, têk birin, têk çûn, têk şikandin...*

Hin cînavkên lihevxiştî yê ji tofa duyem (*jev/jêk, lev/lêk, pev/pêk û tev/têk*), bi qonaxa demê re ji rêzika giştî averê bûne û di dema kêşanê de ew li hêmanên xwe yê eslî êdî nazivirin. Ji ber qewama ku bi ser wan de hatiye ew ketine rewşeke din, mîna ku pêşgir an jî bêjeyek bin xuya dikin. Wekî van mînanan: *pev çûn, pêk hatin, tev bûn, tev dan, tev gerîn, têk çûn, têk birin, têk dan...*

3.1.4. Rastnivîsîna Lêkerên Veqetînbar ên bi Awayê Raderî

Li ser lêkerên veqetînbar dê bi tenê ji bo rastnivîsîna wan a bi awayê raderî li jêr du sernavan bê sekinandin. Ji ber ku mijara awayê rastnivîsîna wan a bi şeweya raderî ya koma yekem û ya koma duyem ji hev cihê ye. Koma yekem ji cînavkên

lihevxiştî yê ji tofa yekem pêk tên. Mîna yê bi cînavkeke lihevxiştî û lêkerekê; bi cînavkeke lihevxiştî, bi paşdaçek û lêkerekê, her wisan ên ku bi bêjeyek, bi cînavkeke lihevxiştî û lêkerekê çêdibin. Lêkera wan a alîkar jî dibe ku xwerû, dariştî û hevedudanî be. Koma duyem jî ew lêkerên veqetînbare in ku bi cînavkên lihevxiştî û lêkerekê alîkar û yê ku bi dengdêrên /-a/ û /-î/yê pêk tên.

3.1.4.1. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên Veqetînbare ên bi Cînavkeke Lihevxiştî û Lêkerekê Alîkar

Di bin vî sernavî de dê hemû lêkerên veqetînbare ên ku ji cînavkeke lihevxiştî ya ji koma yekem û lêkerekê alîkar hatine pê (lêkera alîkar dibe ku xwerû, dariştî û hevedudanî be), bî destnîşankirin; ji ber ku rastnivîsîna wan mîna hev e. Hemû hêmanên wan ên ku bi wan ev cure lêker pêk hatine (gireyên dariştinê ne tê de), di rewşa raderî de ji hev cuda tî nivîsandin. Wek mînak: *jê birin, jê çûn, jê kirin, jê hilanîn, lê kirin, lê rabûn, lê xistin, lê ketin, pê ketin, pê bûn, pê derxistin, pê hisîn, pê vedan, tê ketin, tê derxistin, tê gihîştin, jê mijûl bûn, jê xweş bûn, lê guhdar bûn, lê bar kirin, pê aciz bûn, pê emel kirin, pê de çûn, pê de ketin, pê ve kirin, tê de kirin, tê re çûn, tê re kirin, pê ve danîn, pê re raketin, tê de hilhatin, bawerî pê anîn, ceza lê birîn, çav lê gerandin, dev jê berdan, dest pê kirin, efû lê xistin, êş pê girtin, gef lê xwarin, guman tê çûn, kar tê kirin, mist lê xistin, qeşa lê xistin, serî lê xistin.*

3.1.4.2. Bi Awayê Raderî Rastnivîsîna Lêkerên Veqetînbare ên bi Morfemên /-a/ û /-î/yê û Lêkerekê Alîkar Çêbûne

Rastnivîsîna van lêkerên veqetînbare naşibe yê li jorê, vekîta wan cihê ye. Ji ber ku piştî bêjeyê, morfema /-a/yê yan jî ya /-î/yê tê, ku ew bi bêjeyê ve ne û tiştê dikeve navbera bêjê û lêkera alîkar. Pirs li vir ew e bê gava ev cure lêker wek rader bî nîşandan dê li şûna tiştê çî bê diyarkirin? An jî çî îşaret bê danîn?

Di zimanê nivîskî de, ji bo vî rewşê sê awa tî bikaranîn: a pêşîn ew e ku di nav kevanekê de “yek” an jî “tiştêk” tê nivîsandin, ku ew cihê kesê/tiştê yekhejmar ê nediyar digire. Wekî “*bera (yekî) dan*”. Jixwe di zimanê zayenddar de, di rewşê wiha de, ango ji bo nîşandana rewşa yekhejmar a nebinavkirî meyl ji bo zayenda nêr e. Ya duyem, di nav kevanekê de nîşandana sê xalan e, wekî “*alîkariya (...) kirin*” û

ya sêyem jî bêyî kevanek danîna sê xalan e; *hînî ... kirin*. Li ser vê mijarê jî, di warê vekîta van lêkeran de, lihevkirinek tune ye. Bi xwe meyla me ew e ku di nav kevanekê de ji bo kesan danîna “*yekî*” û ji bo tiştan jî danîna “*tişteki*” be.

Eger em çend mînakên ji bo rastnivîsîna van cureyên lêkerên dabaş li ser wan e, bi qaydeyê meyla xwe ya tercîhkirî, di rewşa raderî de rapêş bikin: *bera (yekî) dan, alîkariya (yekî) kirin, behsa (yekî) bûn, dizîya (yekî) kirin, piştgiriya (yekî) kirin, qala (yekî) kirin, sonda (yekî) xwarin, çêlî (yekî) kirin, berî (yekî) dan, êrîştî (yekî) kirin, ferî (tişteki) bûn, hînî (yekî) bûn, dirêjî (yekî) kirin, xwarî (tişteki) bûn, radestî (yekî) kirin...*

Bi mînakên nîşandana kêşana van lêkeran; serê pêşî dê nimûneyên bi morfema /-a/yê, piştê jî dê yên bi morfema /-î/yê bînin derpêşkirin:

Bi keviran bera wan dan.

Wê alîkariya me nedikir.

Her tim behsa te dikir.

Piştgiriya bindestan bike.

Qala serpêhatiya xwe kir.

Sonda te xwaribû.

Hînî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî bûbû

Nan dirêjî min kir ku ez jê bistînim.

Xwarî erda bikevir bû ku kevirêkî hilîne.

Pirtûk radestî me bûn.

Tu çima berî wan didî?

Cihê beredayî êrîştî wan kir.

3.2. RASTNIVÎSÎNA CUREYÊN LÊKERAN A DI REWŞA NAVDÊRÎ DE

Wek navdêr rastnivîsîna cureyên lêkeran a ji aliyê binyatî ve, ji bilî çend cureyên lêkerên veqetînbare, mîna hev e. Li gorî rêzika giştî ya rastnivîsîna cureyên bêjeyan, a lêkeran jî wisan e ku gava lêker wek navdêr bînin bikaranîn, hemû hêmanên wan ên pêkhêner pêkve tînin nivîsandin.

Di warê zimanê nivîskî de, li ser rastnivîsîna navdêrên lêkerî, ji gelşeke wisan berbiçav nikare bê behskirin. Ji vî aliyê ve bi awayekî gelemper lihevkiyê heye. Ji lew re di bin vî sernavî de dê bi du jêrbeşan li ser awayê navdêrî yê lêkeran bê sekinandin. Ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran ji aliyê me ve li çar beşan hatibûn dabeşandin; wekî lêkerên xwerû, yên dariştî, yên hevedudanî û yên veqetînbare. Dê li ser her siyên pêşî di bin jêrbeşekê de û li ser a paşîn jî dê ji wan cuda di bin jêrbeşeke din de bê sekinandin. Ji ber ku rastnivîsîna hin lêkerên veqetînbare ji yên dîtir cihê dibin.

3.2.1. Wek Navdêr Rastnivîsîna Lêkerên Xwerû, Dariştî û

Hevedudanî

Rastnivîsîna van lêkeran a bi şêweya navdêrî, xwedî heman rêzîkê ye. Jixwe, bi gotina giştî, di kurdî de lêker tevî radera xwe navdêr in. Di zimanê nivîskî de arîşeya awayê wan ê rastnivîsînê hema bibêje nîn e. Ji van cureyên lêkeran (lêkerên xwerû, dariştî û hevedudanî) dibe carinan mirov di zimanê nivîskî de rastî vekîta lêkerên hevedudanî were ku ew hev negirin. Lê divê bê gotin ku ev jî ne xwedî rêjeyeke wisan cidî ye. Ji ber vê çendê hewce pê nayê dîtî ku bi dayîna nimûneyan bal li vê nakokiya neberbelav bê kêşandin.

Lêkerên xwerû û yên dariştî (çi bi paşgir çi jî bi pêşgiran), hem wek rewşa raderî hem jî wek rewşa navdêrî bi hev ve tîn nivîsandin. Ji ber ku lêkerên dariştî bi paşgir û pêşgiran hatine piraştin, jixwe nabe ku gireyên wan jî wan cuda bîn nivîsandin. Ji ber ku gire (qertaf) ne ji cureyên bêjeyan in, loma divê ew gireyên lêkersaz bi lêkerê ve bin. Herçî lêkerên hevedudanî ne, ew ne mîna lêkerên dariştî ne. Ew bi saya lêkerên alîkar pêk hatine. Di wexta rewşa raderî de cureyên bêjeyên wan jî hev û din cuda, lê di gava bikaranîna rewşa navdêrî de hêmanên wan pêkve tîn nivîsandin. Ji lew re ew bi hev re wateyekê tînin pê.

Serê pêşîn ji bo awayê navdêrî ya lêkerên xwerû û yên dariştî çend mînak: *ajotin, bihîstin, cûtin, çûn, dirûtin, firotin/firoştin, gestin, hatin, jendin, kenîştin, leyîstin/lîstin, malaştin, niştin, parastin, qelaştin, rêtin, spartin, şûştin, vêtin, xepartin, zivartin, bezîn, bezandin, çelpîn, çelpandin, êşîn, êşandin, germijîn, germijandin, hilmijîn, hilmijandin, kelijîn, kelijandin, beliqîn, beliqandin, bijiqîn,*

bijiqandin, çermiqîn, çermiqandin, zeriqîn, zeriqandin, palmisîn, palmisandin, repisîn, repisandin, tepisîn, tepisandin, germixîn, germixandin, genixîn, genixandin, xewixîn, xewixandin, berdan, berhilistin, dadan, dahiştin, derketin, derxistin, hîlbûn, hilgirtin, radan, raxistin, rûniştin/rokirin, vebijartin, vexwarin, vêsandin, vêxistin, werdan û wergirtin.

Ev lêkerên ku dê li jêrê bên derpêşkirin, hemû ji cureyên lêkerên hevedudanî ne: *agirdadan, avdan, girêdan, başbûn, bêhnvedan, çalakbûn, çalkirin, kedîbûn, şorbûn, tirşbûn, bergirtin, cihgirtin, rêzgirtin, girhildan, tolhildan, başkirin, dûkirin, hêdikirin, qirênkirin, şerkirin, tehlikirin, valakirin, dilman, gefxwarin, heyfstendin, kerkirin, kêmgirtin, konvegirtin, sondxwarin, bêserûberbûn, birêkûpêkkirin, cotkarîkirin, çalexwarîbûn, devjenîkirin, jehrdadayîkirin, helhelîkirin, hûrhûrîbûn, kemîndanîn, nangermîkirin, paqijîkirin, rojnamegerîkirin, sersarîkirin, serserkîhatin, tînegermîkirin, veguhêzîkirin, warguhêzîbûn, zimandirêjîkirin, bihevketin, bilêvkirin, bipêşxistin, birêketin, jevçûn, jêkkirin, jibîrkirin, jihevçûn, lêkhatin, levkîrîn, liêkdan (lêkdan), lihevdan, lihevhatin, lihevexistin, pevketin, pêkanîn, tevgerîn, têkçûn, têkgerîn, têkşikandin, bipolarvekirin, biserdegirtin, bipêşveçûn, jibîrveçûn, jişîrvekirin, jihaldeketin, liservebûn, diberdeçûn, dikunreçûn...*

Awayê rastnivîsîna hin lêkerên hevedudanî yê bi şêweya navdêrî ji hev hinek cuda ye. Nemaza lêkerên hevedudanî yên ku ji lêker û bêjeyekê û yên lêkerên bidaçek, ên ku ji pêşdaçek, ji bêjeyek, ji paşdaçek û lêkerêkê pêk tên. Mesela lêkerên hevedudanî yên lêker li serî ye, di dema nivîsîna wan a pêkve hemû bêje li gorî rêza xwe bi hev û din ve nayên nivîsandin. Mîna *birin ava, çûn ava, çûn hev, dan der, dan hev, dan dijûnan/xeberan*'ê. Her wisan hin biwêj, kombêje, qalib û yekeyên derbirînê jî mîna van lêkeran awayê rastnivîsîna wan î rewşa navdêrî eynî ye. Wek mînak: *birina ava, çûna ava, çûna hev, dana hev, dana xeberan/dijûnan, bûna sond, bûna zende, dana dû, ketina mitaleyan, ketina xewê, kirina tev, xistina dorê û hilhatina rojê.*

Lêkerên hevedudanî yên bidaçek, nemaze yên ku piştî pêşdaçek û bêjeyê bi şûn de paşdaçek jî di wan de heye, gişt wek rêza bêjeyên ku ew pêk hatine di rewşa navdêrî de bi hev ve nayên nivîsandin. Mîna van nimûneyan; *girtina bi ser de, ketina ji hal de, çûna di ber de, çûna di kun re.*

Hin biwêj, qalib û yekeyên derbirîne yên kompleks jî yên wekî *anîn hişê xwe, dan ber meqesan, di dev re avêtin, hatin ser xwe, ji pêş çav ketin, ketin bin deynan, ketin ber destan, li ser xwe gerandin, nebî pê de hatin, pê de pîs bûn, tê anîn der, tê de asê bûn, tê de bi cih bûn û xwe dan revê*, li gorî rêza pêkhatina hêmanan, wek navdêr li pey hev û pêkve nayên nivîsandin. Bi ya me, awayê rastnivîsîna wan a rewşa navdêrî divê wiha be; ji bo zelalbûna mebestê dê serê ewilî teşeya ku ji aliyê me ve rast tê dîtî bê pêşkêşkirin û di dav kevanekê de jî awayê wan ê nivîsîna bi hev ve bê nîşandan: *anîna hişê xwe (anînhişêxwe), dana ber meqesan (danbermeqesan), avêtina di dev re (didevreavêtin), hatina ser xwe (hatinserxwe), ketina ji pêş çav (jipêşçavketin), ketina bin deynan (ketinbindeynan), ketina ber destan (ketinberdestan), gerandina li ser xwe (liserxwegerandin), pêdehatina nebiyan (nebîpêdehatin), pîsbûna pê de (pêdepîsbûn), têanîna der (têanînder), asêbûna tê de (têdeasêbûn), bicihbûna tê de (têdebicibûn) û xwe dana revê (xwedanrevê)*. Wekî dixuye, ev cure qalib gava wek navdêr bînan bikaranîn, bi awayekî giştî lêkera alîkar tê serî, bêje yan jî pêşdaçek û cînavka lihevxiştî û paşdaçek diçin dawiyê.

3.2.2. Wek Navdêr Rastnivîsîna Lêkerên Veqetîbar

Ji bo hemû lêkerên veqetîbar, dê li jêr vî sernavî li ser awayê wan ê navdêrî bê sekinandin û der barê rastnivîsîna wan a navdêrî de bi dorê raman û nêrîn bînan derpêşkirin.

Lêkerên veqetîbar ên ku ji cînavkeke lihevxiştî û lêkereke alîkar hatine pê (lêkera alîkar dibe ku xwerû, dariştî û hevedudanî be) di rewşa navdêrî de eynî wekî cureyên lêkerên din, rêzik ew e ku ew tevî cînavka lihevxiştî û lêkera alîkar bi hev ve bînan nivîsandin. Wekî van lêkerên nimûneyî: *jêçûn, jêhilanîn, jêkirin, lêkirin, lêrabûn, pêçûn, pêketin, pêxistin, pêvedan, têdan, têketin, têderxistin*. Lê belê awayê rastnivîsîna lêkerên veqetîbar ên bi cînavkeke lihevxiştî, bi paşdaçek û lêkerekê çêdibin naşibe ya lêkerên beriya vê. Hemû hêmanên pêkhêner bi hev ve tînan nivîsandin. Çend mînak: *çûna pê de, ketina pê de, çûna tê re, danîna pê ve, raketina pê re, hilhatina tê de*.

Herçî yê di wan de cînavkake lihevxiştî ya ji tofa yekem heye, wek navdêr di awayê rastnivîsîna wan de awarteyek heye. Ji bo zelalbûna mebestê pêşî bi awayê

raderî dana çend mînakên ji van cure lêkerên ku dabaş li ser wan e, dê baştir be: *agir pê ketin, bawerî pê anîn, ceza lê birîn, çav lê gerandin, don tê dan, efû lê xistin, êş pê girtin, geflê xwarin, guman tê çûn, qeşa lê xistin, serxweşî tê dan*. Ev lêkerên ku wek nimûne amaje bi wan hatiye kirin, wek navdêr rastnivîsîna wan, bi ya me ji rêzika giştî cuda ye. Ji lew re jî nabe ku bêyî rêza wan a li pey hev biguhere, ew bi hev ve wek navdêr bên nivîsandin. Divê ew ji bo rewşa navdêrî wiha bin: *pêketina agir* (ne *agirpêketin*), *pêanîna baweriyê* (ne *bawerîpêanîn*), *lêbirîna ceza* (ne *cezalêbirîn*), *lêgerandina çav* (ne *çavlêgerandin*), *têdana don* (ne *dontêdan*), *lêxistina efûyê* (ne *efûlêxistin*), *pêgirtina êşê* (ne *êşpêgirtin*), *lêxwarina gefan* (ne *geflêxwarin*), *têçûna gumanan* (ne *gumantêçûn*), *lêxistina qeşayê* (ne *qeşalêxistin*) û *têdana serxweşiyê* (ne *serxweşîtêdan*).

Şeweya rastnivîsîna ji bo awayê navdêrî, li gorî wateyê jî diguhere. Wekî mînaka “*dest pê kirin*”ê ya bi mehneya pêbûna dest: *pêkirina dest* (ne *destpêkirin*). A din jî mîna “*serî lê xistin/dan*”ê ya bi wateya lêdana serî ya li tiştêkî: *lêxistina/lêdana serî* (*lêdana/lêxistina bi seriyên*). Mînaka din jî biwêja “*li serî ketin*” e, eger ew bi wateya rasterast be wek navdêr divê wiha be: *ketina li serî* ye, lê ne bi awayê *liserîketinê*.

Îcar lêkerên veqetînbarekên ku bi morfema /-a/ û /-î/yê çêdibin, awayê rastnivîsîna wan ne wekî wan lêkeran e ku bi cînavkeke lihevxiştî û lêkereke alîkar çêbûne. Hêmanên wan bi dorê li dû hev, wek navdêr pêkve nayên nivîsandin; mîna “*hînîkirina zimanê kurdî*” an jî “*dirêjîminkirina wî*”. Taybetiyeke van heye ku ew hemû mîna nimûneyên jorê jî nayên bikaranîn. Wek navdêr nivîsîna wan a bi hev re çênabe û ew ji rêzika giştî bi der in. Wek navdêr nivîsîna wan mîna van nimûneyan çêdibe:

Wê alîkariya me nedikir: Nekirina alîkariya wê ya bi me.

Wî tim behsa te dikir: Behskirina wî ya tim a ji te.

Sonda te xwaribû: Xwarina wê ya sonda te.

Hînî me bûbû: Hînbûna wî ya bi me.

Ew xwarî erdê bû: Xwarbûna wî ya bi erdê re.

Wan pirtûk radestî me kirin: Radestkirina wan a pirtûkan a bi me.

3.3. DI REWŞA KÊŞAYÎ DE RASTNIVÎSÎNA LÊKERÊN DARIŞTÎ YÊN BI PÊŞGIRAN

Di zaravayê kurmancî de lêkerên dariştî yên bi pêşgiran xwedî du awayên kêşanê ne. Devoka Herêma Torê û devokên wekî hin deverên Hekarî û Behdînan, ji aliyê kêşana lêkerên dariştî yên bi pêşgiran ve ji devokên din ên kurmancî cuda ne. Ji ber ku devoka toriyan ji vî aliyê ve xwedî rewşeke homojen e, ji lew re ew dê ji bo deverên din jî wek nimanî (temsîlî) bê hîlbijartin û pêdeçûna mijarê û dayîna nimûneyan jî dê di vê çarçoveyê de bê kirin.

Di dema kêşana van cure lêkeran de, di devoka Herêma Torê de wek nimûne gireya dema niha /di-/ û gireya neyîniya vê demê /na-/ tê serê lêkera dariştî ya bi pêşgiran. Lê di devokên din ên kurmancî de ev gire dikevin navbera pêşgir û lêkera xwerû. Wek mînak; di devoka Torê de “ez *divexwim/ez navexwim*”, lê di devokên din de ku di zimanê nivîskî de jî ew form rast hatiye qebûl kirin, bi awayê “ez *vedixwim/ez venaxwim*” e.

Çendî ev mijar di rêzimanan de, ne wekî devoka Torê hatiye pejirandin jî, lê ev yek di navbera bikarhênerên kurmancî de, di navbera xwendekar û mamosteyên vî zaravayî de carinan dibe sedema nîqaşan bê çima awayê zimanê nivîskî rast e û mesela ya devoka Torê şaş e.

Mijareke din jî di dema kêşana van lêkerên hanê ya zimanê nivîsînê de bikaranîna raweya fermanî /bi-/yê ye. Îcar hin kes bi zanebûn diangêjin ku divê ev raweya fermanî di kêşana lêkerên dariştî yên bi pêşgiran de bî bikaranîn û jixwe di zimanê nivîskî de mirov carinan leqayî bikaranîna wê jî tê.

Di bin du jêrnavan de dê hewl bê dan da ku li ser van her du mijarên amajepêkirî, zanyariyên pêwîst bî derpêş kirin.

3.3.1. Di Dema Kêşanê ya Lêkerên Dariştî yên bi Pêşgiran de Cihê Gireyên /di-/ û /na-/yê

Kurmancîaxêv ji bilî lêkerên dariştî yên bi pêşgiran, cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve di dema kêşanê de hemû mîna hev dikêşînin. Wek mînak, gireya dema

niha /di-/ û gireya neyîniyê wê /na-/yê bi kar tînin û wisan riayetî rêsa û qanûnên ziman dikin. Lê tenê îxtilaf di navbera zimanê devkî yê kurmancîaxêvan de wekî kêşana dema niha, dema borî ya berdest, neyîniyên van deman û raweya fermanî heye, ku yek gireyan di serê lêkera dariştî ya bi pêşigiran de û yek jî piştî pêşgirê bi kar tîne. Bi dayîna hin nimûneyan ku bal li vê rewşê bê kêşan:

diçe naçe, diçû nediçû, meçe (lêkera xwerû); *sond dixwe sond naxwe, sond dixwar sond nedixwar, sond mexwe* (lêkera hevedudanî); *li hev dikin li hev nakin, li hev dikirin li hev nedikirin, li hev mekin* (lêkera hevedudanî); *tev digerin tev nagerin tev digerîn tev nedigerîn, tev megerin* (lêkera hevedudanî); *jê dibe jê nabe, jê dibirin jê nedibirin, jê mebe* (lêkera veqetînbar); *dikelije nakelije, dikelijî nedikelijî, mekelije* (lêkera dariştî ya bi paşgiran). Ev awa di hemû devokên kurmancî de derbasdar e û tev wekî hev kêşana wan bi kar tînin. Îcar ji van nimûneyan dixuye ku ya di hevokê de kar dike lêker e û loma ev gireyên amajepêkirî tên pêşiya wê.

Wekî çawan li jorê di mijara sernavê vê beşê de hat gotin, di devoka Herêma Torê de kêşana hin demên lêkerên dariştî ji devokên din cudatir e ku ev yek di berhemên nivîskî de jî dixuye. Ji çend berhemên nivîskarên mensûbên vê devokê, bêtir ku dest li rastnivîsîna wan bê gerandin, hin mînak hatin hîlbijartin da pê serwextiyeke tam a ji mijarê pêk were; mîna “*Bi rastî kesek Mendik nerûniştandibû ber kabokên xwe*”²²⁸, “*Li gorî kesên têde razayî û serpêhatiyên wan, ew movikên têr parsû, deng li hevûdin di vegeirînin, bilind, tuj û dirêj û bilind dike...*”²²⁹ û “*Du hefte tê ve nediçûn, ew kitêb jî li ber min didanîn*”.²³⁰ Di van hevokên nimûneyî de gireya dema niha /di-/ û gireya neyîniya çîrokiya dema boriya têdeyî /ne-/ li pêşiya pêşgirê hatine bikaranîn ku di zimanê nivîskî de divê wiha be: *rûneniştandibû, vedigerînin* û *dadiînîn (dafînin)*.

Di gramera Celadet Bedirxan û Roger Lescot de ji vê dabaşa hanê hatiye behskirin û hatiye diyarkirin ku di hin devokan de (wekî Tor Abidîn, Hevêrkan),

²²⁸ Torî, **Mendik**, Weşanên Berfin, İstanbul 2002, r. 6.

²²⁹ Medenî Ferho, **Xaltîka Zeyno I**, Weşanên Dozê, İstanbul 1997, r. 7.

²³⁰ Heznî Haco, **Tê Bîra Min**, Avesta, İstanbul 2007, r. 16.

bikaranîna /di-/yê ya di “lêkerên hevedudani”²³¹ de eynî mîna lêkerên xwerû, xwedî erkê ye.²³² Lê belê der barê rastbûn an jî şaşbûnê de tiştek nehatiye diyarkirin.

Ji bo hizirek bi mirov re çêbe, hewce pê heye mirov bala xwe bidê bê ka ev rewş di zaravayên kurdî yên kirmanckî û kurmanciya naverast (sorani) de çawan e. Di zaravayê kirmanckî de kêşana lêkerên dariştî yên bi pêşgiran eynî mîna kurmanckî li gorî devokan xwedî sê awayan e. Awayek “*nêdekerdbî, nêrakerd*” awayê din jî “*denêkerdbî, ranêkerd*”²³³ e ku her du awa jî mîna zaravayê kurmanckî ne. Lê şêweyeke din a bikaranîna van lêkerên dariştî yên bi pêşgiran îcar bi awayê “*nêkewena ra*”²³⁴ ye. Di vê mînaka hanê de, wekî dixuye paşgira /ra-/yê çûye dawiyê ku bi piranî di devoka dêrsimiyân de ev form heye. Divê bê gotin ku ev yek di kurmanckî de nîn e, ev taybetiyeke kirmanckî ye û di dema kêşanê de pêşgir ji serî diçe dawiya lêkerê. Divê bê diyarkirin ku sedema nîşandana mînanan bi awayê neyînî, ji ber wê rewşê ye ku awayê kêşana dema niha ya kurmanckî û kirmanckî ne wekî hev in. Mesela di kurmanckî de gireya dema niha /di-/ tê serî lê ya kirmanckî ku bi piranî /-en-/ û carinan jî /-n-/ ye, tê dawiya rayeka lêkerê. Wekî “*ez dikim*” û “*ez kena*”. Loma ji bo ku wêne berbiçavtir bibe, çêtir hat dîtin ku nimûne bi forma neyînî bîn dan.

Li hêla din, di zaravayê kurmanckî naverast de kêşana van cure lêkeran bi şêweya “*min dadexim*” û “*eger min dernekevim*”²³⁵ e. Ev wek forma kurmanckî ya berbelav e ku di zimanê nivîsînê de tercîh li ser wê ye.

Ji bo berawirdkirina vê rewşê, eger serî li zimanê farisî bê dan ku ew û zimanê kurdî di heman komê de ne (koma zimanên îranî), dê ji bo zelaliya mijarê baş be û dê asoya li ber me berfireh bike da ku fikirek bi me re çêke. Di zimanê farisî de jî lêkerên dariştî yên bi pêşgiran hene, wekî “*bergeştên, dergozeştên, vadaştên*”²³⁶ (ku di van lêkeran de /ber-/ , /der-/ û /va-/ pêşgirin. Şêweya kêşanê bi “*...bermîgeşt*”

²³¹ Ji aliyê danerên berhemê ve ji lêkerên dariştî re, “lêkerên hevedudani” hatiye gotin.

²³² Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, *h.b.*, r. 186.

²³³ Grûba Xebate ya Vateyî (amd), **Rastnuştîşê Kirmanckî (Zazakî)**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2005, r. 99.

²³⁴ Deniz Gündüz, **Türkçe Açıklamalı Kürtçe Kirmanca/Zazaca Dil Dersleri**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2006, r. 214.

²³⁵ Qanatê Kurdo, *h.b.*, r. 238-239.

²³⁶ Nimet Yıldırım, *h.b.*, r. 142-143.

(vedigerî)²³⁷ û awayê neyîniyê jî bi şêweya “*derneyaftem*”²³⁸ (tê negihîştim) e. Di mînakên de /-mî-/ bergînda gireya dema niha ya /-di-/yê û /-ne-/ jî bergînda gireya neyîniyê /-ne-/ya kurmancî ye.

Ji van hevberîkirina dixuye ku rewşa kêşana lêkerên dariştî yê bi pêşgiran di kurmancî û kirmanckî de xwedî awayên cuda ne. Li gorî devokan gire yan tên serê lêkera dariştî yan jî dikevin navbera pêşgir û lêkerê. Yan jî, wekî di kirmanckî de, gire tê serê lêkerê û paşgir jî diçe dawiyê. Lê di kurdiya naverast û farisî de ya esas lêker dixuye, ku gireyên demê û neyîniya wan nayên pêşiya lêkera dariştî, ew dikevin navbera pêşgir û lêkera sade.

Îcar gava bi awayekî giştî li lêkerên kurmancî tê nihartin, ji bilî lêkerên dariştî yê bi pêşgiran, tê dîtîn ku ji aliyê binyatî ve di hemû cureyên din ên lêkeran de gireyên demê û neyîniyên wan tên pêşiya lêkerê. Ji derî lêkerên dariştî yê bi pêşgiran (çi di kurmancî çi jî di kirmanckî de), rewşên din tiştekî girîng nîşan didin ku eger lêker xwerû bin, dariştî bin (ên bi paşgiran), hevedudanî bin, fraza lêkerî yan jî ji yê veqetînbare bin, a ku rewşê, bizavê, qewimînê, daraz û mêjerê diyar dike lêkera xwerû û ew bêje ye ku jê lêkera dariştî ya bi paşgiran çêbûye.

Ji ber di kurmancî de forma ku gire/morfem dikevin navbera pêşgir û lêkera sade jî heye û ya berbelav ew e, bi ya me rêzika hîmî ew e ku divê gire bîn pêşiya rayeka lêkerê ya bingehîn, ne ku bê pêşiya pêşgirê. Eger wek dubare bê gotin, di hemû cureyên lêkerên din de, ya kar dike û erk li ser milê wê ye, lêkera xwerû ye. Bi gireyan gava ji lêkeran lêker bîn dariştin, an jî bi cureyên bêjeyan lêkerên hevedudanî bîn çêkirin jî, tenê wateya lêkerê digihure, lê ya kar û kardariyê dike, rewşê diyar dike lêkera hîmî ye. Mîna “*nade*”, “*sor dike*”, “*li hev nexe*”, loma dikare bê gotin ku rewşa di devoka Torê de rewşeke averêbûyî ya ji rêşaya giştî ye û di zimanê nivîskî yê standard de tercîhkirina awayê ku divê di lêkerên dariştî yê bi pêşgiran de gireyên demê, tevî neyîniya wan di navbera pêşgir û lêkerê de bîn bikaranîn, rast e.

²³⁷ *h.b.*, r. 200.

²³⁸ *h.b.*, r. 190.

3.3.2. Di Dema Kêşanê ya Lêkerên Dariştî yên bi Pêşgiran de Mijara /bi-/ya Fermanî

Mijara raweya fermanî ya /bi-/yê ya di lêkerên dariştî yên bi pêşgiran de, di kurdî de ne xwedî standardekê ye. Di her sê zaravayên kurdî kurmancî, kirmanckî û ya naverast (sorani) de, li gorî devokan bikaranîn an jî bikarneanîna raweya fermanî ya di van cure lêkeran de hev nagire.

Di zaravayê kurmancî yê devokî de, eger bi awayekî giştî bê gotin, di lêkerên dariştî yên bi pêşgiran de /bi-/ya fermanî bi rêjeyeke gelek zêde nayê bikaranîn û loma di zimanê nivîskî de jî wek rêzik bikaranîna wê nayê pejirandin. Lê di gel vê yekê, tê zanîn ku ji aliyê hin kesan ve di zimanê nivîskî de çendî ne pir zêde be jî ew tê bikaranîn. Wekî “...ez mecbûr mam ku ji devê xelkê agahiyên wer**bigirim**”²³⁹ û her wisan yên ku bikaranîna wê di van lêkerên dariştî yên bi pêşgiran de bi awayê “ez *dê hil**bigirim***”²⁴⁰ diparêzin jî, hene.

Di lêkerên dariştî yên bi pêşgiran de, bikaranîn an jî nebikaranîna raweya fermanî /bi-/yê ne xwedî îstiqrar e. Mesela devoka Herêma Torê ji aliyê kêşana van lêkerên hanê ve, ji devokên dîtir ên kurmancî cuda ye û di vê devokê de gireya dema niha û neyîniya wê tîpên pêşiya pêşgira lêkera dariştî, lê /bi-/ya fermanî nayê bikaranîn. Lê îcar berevajiyê vê devokê, li Behdînan, nemaze di devoka Dihok û derdora wê de, di lêkerên dariştî yên bi pêşgiran de bikaranîna /bi-/ya fermanî heye û tê pêşiya pêşgirê. Wek van nimûneyan: *evan sêvan **bihilgire**, erdî baş **bihilkole** û ewî **bivexwîne ser şahiya birayê xwe***.²⁴¹ Li aliyê din, di hin devokên Behdînan de eynî wekî forma kurmanciya zêde berbelav, di van cure lêkerên de ku behs ji wan e, /bi-/ya fermanî nayê gotin û bikaranîn. Loma divê bê diyarkirin ku ev devok ji vî aliyê ve ne homojen e.

Ev yek di zaravayê kurdiya naverast de jî wekî kurmancî ye. Rewşa bikaranîn an jî nebikaranîna wê li gorî devokan diguhere. Mesela ku bi awayekî giştî bê gotin, di devoka Hewlêrê de /-bi-/ya fermanî dikeve navbera pêşgir û lêkerê, lê di ya

²³⁹ Abdulkadir Bîngol, *Kulîlkên Baxê Botan*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul 2008, r. 14.

²⁴⁰ Ji bo agahiyên der barê mijarê de *bnr*. Mistefa Aydogan, *h. b.*, r. 184-187.

²⁴¹ Der barê vê mijarê de birêz Dr. Ebdilwehab Xalid Mûsa bi nivîskî bersiva pirsên me da ku ev mînak ji wê bersivê ne û li Dihok û derdora wê tîpên bikaranîn.

Silêmaniyê de bi piranî ev /bi-/ya fermanî nayê bikaranîn. Lê di zimanê standard ê kurdiya naverast de, di lêkerên dariştî yên bi pêşgiran de /bi-/ya fermanî tê bikaranîn.

Rewşa kirmanckî jî ji bo lêkerên dariştî yên bi pêşgiran, wek van her du zaravayan ne xwedî rêzikeke giştî ye. Di vî zaravayî de, di lêkerên dariştî yên bi pêşgiran de, /bi-/ya fermanî ya dikeve navbera pêşgir û lêkera yan jî nayê bikaranîn. Wekî van nimûneyên Ji bo zelaliya mijarê: *Ti rabikewe/rakewe, şima rabikewin/şima rakewin.*²⁴²

Ji bo ku fikirek giştî bi me re çêbe, ji bo vê yekê serî li zimanê farisî jî hat xistin bê ka tê de rewşa raweya fermanî ya di lêkerên dariştî de çawan e. Îcar di zimanê farisî de, ne di lêkerên hevedudanî de ne jî di lêkerên dariştî yên bi pêşgiran de, wek qayde, /bi-/ya fermanî nayê bikaranîn.²⁴³

Ji van mînakên dixuyê ku ji bo her sê zaravayan kurdî, di rewşa wan a devkî de, der barê mijara raweya fermanî /bi-/yê de qaydeyeke bi tenê tune ye. Di kirmanckî û kurdiya naverast de /bi-/ya fermanî yan dikeve navbera pêşgir û lêkera sade yan jî ew nayê bikaranîn. Lê di zaravayê kurmancî de yan ew tê pêşiya pêşgira lêkersaz an jî nayê.

Celadet Bedirxan ji bo vê mijarê, ango ji bo /bi-/ya raweya fermanî daxuyandiye ku ew di van cure lêkeran de, yên ku dabaşa mijarê ne, nayê bikaranîn.²⁴⁴ Di “Gramera Zmanê Kurdi” ya Qanatê Kurdo de bal lê hatiye kêşan û hatiye gotin ku di kurmancî de pirtika /bi-/yê carinan nayê xebitandin, lê di soranî de pirtika /-bi-/yê dikeve navbeyna parên fiêlên bargiranî.²⁴⁵ Her wisan di “Fêrkerî Soranî” de jî, ji heyîn û bikaranîna raweya fermanî ya di lêkerên dariştî yên bi pêşgiran de hatiye behskirin. Mîna “*dabinîşin*” û “*derbikewin*”ê.²⁴⁶

Li gorî kêşana demên mîna dema niha, dema boriya berdest û neyîniyên wan ên ji bo lêkerên dariştî yên bi pêşgiran, wek qayde diviya ku pêşgira raweyê, ango /bi-/ya ji bo çêkirina rewşa fermanî, şert, dawaz û çîrokiya dema niha/dema boriya

²⁴² Deniz Gündüz, *h.b.*, r. 280.

²⁴³ Nimet Yıldırım, *h.b.*, r. 244.

²⁴⁴ Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, *h.b.*, r. 129, 130 û 186.

²⁴⁵ Qanatê Kurdo, *h.b.*, r. 238.

²⁴⁶ Kadri Yıldırım (amd), **Fêrkerî Soranî**, Şemal Medya, İstanbul 2014. r. 82.

berdest, di navbera pêşgir û lêkera sade de bihata bikaranîn. Lê li gorî encamên lêkolîn û lêpîrsînên li ser vê mijarê, bi qasî em jê agahdar in, di zaravayê kurmancî yê devokî de /bi-/ya fermanî di navbera pêşgir û lêkera sade de nayê bikaranîn. Bi ya me ji ber ku di zimanê devkî de ev yek nîn e, ne hewce ye ku rêzik bîn afirandin û piştî jî wek rêsa bîn danîn û li axêver û bikarhênerên zimên bîn sepandin. Loma rêzika ku ji bo lêkerên dariştî ya bi pêşgiran hatiye danîn, ku divê pêşgira raweyê, bi gotina din /bi-/ya fermanî neyê bikaranîn, tercîheke di cih de ye.

ENCAM

Rêziman, ku bi awayekî kurt û puxtayî bê gotin, binyata zimên û pergala xebitîna zimên vedikole; li ser mijarên wekî deng, teşe, bêje, senifana bêjeyan, kêşan, erk û pêwendîya wan a li nav hevokê, ango li ser hevoksaziya zimanekî radiweste û rêzikên wan dipeyitîne. Rêzikên peyitandî jî ji bo bikaranîna rast a zimanekî dibin alîkar. Ji lew re rêziman dikare wek rêbera zimên jî bê pênasekirin ku ew hem rênîşandera bikaranîn û axaftina rast a zimanekî hem jî ya rastnivîsîna wî zimanî ye.

Di navbera zimannas û danerên rêzimana kurmancî de dibe ku cudahiya nêzikahîtdanê ya ji aliyê metodê ve hebe. Her wisan der barê mijarên spesîfik de jî raman û nêrînên wan ne mîna hev bin. Lê divê ku bi awayekî tevahî şayes û peyitandinên wan ên rêzikên zimanekî hev bigirin, an jî qet nebe li ser mijarên hîmî yên zimanekî, nakokiyên wisan beloq û berbiçav tune bin. Hemramanbûna wan a li ser taybetî û rêsayên zimên ên peyitandî, divê pir û pir zêde bin.

Di vê xebatê de yazdeh (11) rêzimanên li ser zaravayê kurmancî ji aliyê rêbaza rêzimana klasîk ve, bi gotina dîn, ji hêla rêzimana rêzikparêz ve hatin vekolan û berawirdiyek jî di navbera wan de hat kirin. Piştî vekolana van berheman, hat dîtin ku di navbera danerên rêzimanên kurmancî de nakokî û cudahiyên gelek girîng hene ku tafîlê bi ber çav dikevin. Wekî li ser cureyên bêjeyan, senifana lêkeran a ji aliyê binyatî ve, rastnivîsîna lêkeran a ji aliyê raderî û navdêrî ve. Her wisan, hem termînolojiya wan hem jî nêzîktêdanên wan ên li diyardeyên zimanî û rêzikên rêzimanê dûrî hev in. Ne dikare ji çemkên/têgihên rêzimana kurmancî yên hevbeş bê behskirin ne jî ji şayes û senifanên beşên rêzimanê.

Piştî vekolîn û nirxandina li ser berheman, em gihîştin hin encaman. Wekî cureyên bêjeyan, senifana lêkeran a ji aliyê binyatî ve (mijara lêkerên dariştî yên bi paşgir û pêşgiran, lêkerên hevedudanî, lêkerên veqetînbar û hwd.), rastnivîsîna lêkeran a di rewşa raderî, navdêrî û kêşandî ya lêkerên dariştî yên bi pêşgiran de,

lêkerên rêzîkî û nerêzîkî, meseleya lêkerên alîkar. Bi dorê dê ji van mijarê amajepêkirî bê behskirin.

Mijara senifana bêjeyan divê bê zanîn ku meseleyeke kevn e û digihîje heta demên berî zayînê²⁴⁷. Yê ku hîn berî mîladê bi xebata xwe ya “*Tekhne Grammatike*”ê dawî li nîqaşên li ser beşên axaftinê aniye Dionysios e û li gorî wî heşt cure bêje hene: navdêr, rengdêr, herfa terîf, hoker, lêker, gihanek, daçek û cînavk. Lê, piştî ji hêla zimannasan ve li şûna herfa terîfê, bêjeya “baneşan”ê hatiye danîn, bi mebesta ku nabe zimanê grekî ji aliyê hebûna cureyên peyvan ve ji hemû zimanên din bibe mînak.²⁴⁸ Ev xebata hanê ku ew bingeha gramera klasîk e, der barê hemû mijarên zimên de 13 qîrn wek deqeke hîmî li Rojava hatiye pejirandin.²⁴⁹ Wê ji bilî rêzimana zimanê latînî, tesîr li rêzimanên neteweyên Rojava jî kiriye ku heta roja îro ev kartêkerî berdewam e. Îcar ji ber ku *Tekhne Grammatike*” ya Dionysios li zimanên neteweyên derî coğrafyaya ewrûpayê hatiye wergerandin, wekî zimanên ermenî û suryanî û ji xebatên li ser rêzimanê yên îbranî û erebî re jî bûye rênîşander²⁵⁰ loma mirov dikare bibêje ku vê gramera Dionysios, hîkarî li xebatên rêzimana zimanên neteweyên nerojavayî kiriye û ji bo wan jî bûye nimûne û çavkanî ku neteweyên din li berê rêzimana xwe şayesandiye.

Li gorî piraniya zimannas, rêzimanas û danerên gramerê, çendî di kurdî de yan jî bi gotineke din, di kurmancî de heşt cureyên bêjeyan hebin jî, lê li gorî Celadet Bedirxan û hinek dûajoyên wî “birên qîsetê” (beşên axaftinê) yên kurmancî deh in.²⁵¹ Her wiha ji aliyê Celadet Bedirxan ve “birên qîsetê” di bin navê “guhêrbarî”yê de li du beşan hatiye levakirin: Bêjeyên guhêrbar (navdêr, veqetandek, pronav, jmarnav, lêker) û bêjeyên neguhêrbar (rengdêr, hoker, daçek, gihanek, baneşan). Guhêrbarî jî ew e ku di dema bikaranîna hevokê de şeweya wan a esilî diguhere û dikeve şekilekî din. Lê berevajiyê vê rewşê, bêjeyên neguhêrbar di dema bikaranînê de teşeya wan qet naguhere.²⁵² Bêjeyên “jmarnav” û “veqetandek”ê jî, ji aliyê Celadet Bedirxan ve di koma “bêjeyên guhêrbar” de li beşên axaftinê zêde kirine. Lê belê ev her du yên

²⁴⁷ Süheylâ Bayrav, **Filolojinin Oluşumu**, Multilingual, İstanbul 1998, r. 110.

²⁴⁸ *h.b., r. III.*

²⁴⁹ Steven Roger Fischer, *h.b.*, r. 144.

²⁵⁰ Süheylâ Bayrav, **Yapısal Dilbilim**, Multilingual, İstanbul 1998, r. 30-31.

²⁵¹ Celadet Alî Bedirxan, **Bingehên Gramêra Kurdmancî**, Avesta, İstanbul 2010, r. 24.

²⁵² Ji bo agahiyên zêdetir *bnr. h.b.*, r. 24-25

hanê bi ya me nabe ku wek cureyên bêjeyan ên serbixwe bèn pejirandin. Ji ber ku “jmarnav” (ango hejmarnav) ji cureyên navdêran in û “veqetandek” jî ji ber ku bi wan ravek (terkîb) tèn çêkirin, ew gireyên rewşê ne. Bi gotineke din ew amrazên/morfemên rêzimanî ne. Ji lew re ramana ku dadixuyîne heşt cureyên bêjeyan hene, bi ya me tesbîteke rast e. Îcar lihevkerina li ser cureyên bêjeyan an jî pênaseya li ser wan, ji bo şayesandin û ravekirina hêmanên zimên pir girîng e, da ku mirov bikare bi hêsanî û bêyî fikare berhemên rêzimana kurmancî binirxîne û rexne li wan bigire.

Lêker, ji hêmanên girîng ên cureyên bêjeyan in. Ew her wisan yekeyên hîmî yên jênegar ên zimanekî ne ku îro li gorî pîvaneyên wekî forma lêkerê, erka (fonksiyona) wê, wateya wê û peywira wê ya ji hêla avaniyê (bîna) ve jî tèn tiwêjandin û polînkirin. Ji aliyê perspektîfa rêzimana klasîk ve bi awayekî giştî lêker ji aliyê binyatî ve, ji aliyê avaniyê û ji aliyê teşeyê ve li sê beşan tèn dabeşandin. Lê gava li berhemên ku bûna mijara xebata me tê mêzandin, tê dîtîn ku lêker wek beş di bin sê sernavan de bi şêweyêke biserûber ji van aliyan ve nehatine senifandin. Wek mînak, çendî di xebata Kamûran Bedirxan û A. Bali de bi awayekî rêkûpêk di bin sernavan de ew hatibin polînkirin jî, lê di xebata Celadet Bedirxan, a Kemal Badillî, ya Feqî Huseyn Sagniç, a Bahoz Baran û ya Halil Altug de bi awayekî nerêkûpêk ji aliyê binyatî, avanî û teşeyê ve ji lêkeran behs hatiye kirin. Di berhema Qanatê Kurdo, ya Mûrad Ciwan, a Samî Tan û ya Kadrî Yildirim de tenê qalkirina ji aliyê binyatî û avaniyê ya lêkeran heye. Di gel vê rewşê, ji bo serwextiya ji mijarê, li jêr navê “ji aliyê binyatî ve lêker”, li ser lêkerên xwerû, lêkerên dariştî, lêkerên hevedudanî û hwd. hat sekinandin. Ji encama lêkolînên li ser van berhemên rêzimana kurmancî xuya bû ku, ne senifana lêkeran a ji aliyê binyatî ve ya danerên rêzimana kurmancî ne jî mînakên ku wan ji bo senifanan dane, dişibin hev. Dîsan hejmara lêkeran a ji aliyê binyatî ve ya amadekarên van berhemên jî ne mîna hev û din in. Li gorî hinekan didu (wekî Kemal Badilli), li gorî hinekan sisê (wekî Celadet Bedirxan, A. Bali), li gorî hinekan jî çar in (mîna Kamûran Bedirxan, Qanatê Kurd). Eger bi awayekî tevayî bê gotin; li gorî van berhemên ku bûne dabaşa xebatê, di kurmancî de ji aliyê binyatî ve şeş cure lêker hene: Lêkerên xwerû, lêkerên dariştî, lêkerên hevedudanî, lêkerên alîkar, lêkerên biwêjî û lêkerên qertaf.

Ji nav van şeşên hanê, lêkerên alîkar (li gorî Kamûran Bedirxan, Qanatê Kurdo, A. Bali), lêkerên biwêjî (li gorî Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Mûrad Ciwan û Kadrî Yildirim) û lêkerên qertaf (li gorî Feqî Huseyn Sagniç) ji aliyê binyatî ve rast nehatin dîtin. Ji ber ku li gorî pênaseya binyatê ku têkildarî awayê çêbûn û pêkhatina lêkeran e, nabe ev her siyên hanê ew wek lêker bîn dîtin. Lêkerên alîkar, di lêkerên hevedudanî de bi rola alîkariyê radibin û bi saya wan bêjeyê ji esilê navdêrê tê kêşan. Loma ji hêla binyatî ve lêkera alîkar ne cureyê lêkerê ye. Herçî tebîra “lêkera biwêjî” ye, ji bo vê polînê wek çemkeke rast nehat dîtin. Ji ber ku bi gotina “biwêjî”ê, bal li wateya lêkerê tê kêşan û ew ji aliyê semantîk ve rewşa lêkerê derdibe. Her wisan “lêkerên qertaf” jî ku mebest jê gireyên kesane ye ((*im, î/yî, e/ye, in, in, in; me, yî, ye, ne, ne, ne*), nakeve nav senifana “ji aliyê binyatî ve lêker”. Ev gire kesan/tiştan dinimînin û bi saya wan hem pirhejmarî û yekhejmarî hem jî rêza kesan/tiştan tê zanîn û naskirin. Eleqeya wan bi cureyên lêkeran a ji aliyê binyatî ve nîn e. Wek nav her siyên din (lêkerên xwerû, dariştî û hevedudanî) rast in.

Kêşeya heyî ya ji bo lêkerên xwerû, dariştî û hevedudanî, kêşeya nimûneyan e ku ji aliyê danerên berhemana ve ji bo wan hatine nîşandan. Ji bo lêkerên xwerû çend awarte ne tê de (wekî di xebata Kamûran Bedirxan de lêkera *hebûnê* ku ew hevedudanî ye, di ya feqî Huseyn Sagniç da lêkera *danînê* ku ew dariştî ye û di xebata Kadrî Yildirim de jî lêkera *gerandinê* ku ew jî dariştî ye), mînakên ku hatine derpêşkirin îtiraz li wan nîn e. Gelşa herî zêde li ser nimûneyên lêkerên dariştî û yên hevedudanî ne. Mesela lêkerên ku bi pêşgiran hatine dariştin (wekî *dagirtin, derkirin, hilgirtin, rabûn, rûniştin, vekirin*), di berhema Celadet Bedirxan, a Kamûran Bedirxan, a Qanatê Kurdo, ya Feqî Huseyn Sagniç, a Kemal Badilli û ya A. Balî de, ji bo lêkerên hevedudanî hatine nîşandan. Lê li gorî pênaseya lêkerên hevedudanî, divê ku ew lêker ji cureyên bêjeyan pêk werin, ne ku ji pêşgir û lêkeran. Eger ew ji pêşgir û lêkeran çêbûbin, divê ew aîdî lêkerên dariştî bin. Xwediyê van berhemên ku dabaş li ser wan e, li ser nimûneyên lêkerên hevedudanî jî xwedî ramanên li dijî hev in. Wek mînak, lêkerên hevedudanî yên ku bi daçekan çêbûne (mîna *li hev hatin, bi lêv kirin, ji bîra kirin û li hev anînê*) li gorî Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Mûrad Ciwan û Kadrî Yildirim ew lêkerên biwêjî ne. Her wiha lêkerên hevedudanî yên ku bi cînavkên lihevxiştî yên ji tofa duyem (*jev/jêk, lev/lêk, pev/pêk û tev/têk*) pêk hatine, di bin navên ji hev cuda de ji wan hatiye behskirin. Mesela li gorî Kadrî

Yildirim ew lêkerên biwêjî ne. Li aliyê din, li ser lêkerên ku ji cînavkên lihevxiştî yê ji tofa yekem (*jê, lê, pê û tê*) pêk hatine jî di navbera danerên rêzimana kurmancî de lihevkiyên nîn e. Mîna van lêkeran: *lê xistin, pê ketin, jê kirin, tê dan, pê ve kirin, tê re kirin, dest pê kirin*. Ev lêker ji hêla Celadet Bedirxan, Qanatê Kurdo, Kemal Badilli, A. Balî, Bahoz Baran û Halîl Altug ve wek lêkerên hevedudanî, lê ji hêla Kamûran Bedirxan, Mûrad Ciwan û Kadîrî Yıldırım ve wek lêkerên biwêjî hatine nîşandan. Îcar di xebata Samî Tan de, ew bi navê “lêkerên bidaçek” de hatine binavkirin. Eger tebîra “lêkerên bidaçek” rast bê pejirandin, divê ku lêkerên hevedudanî yê di wan de daçek hene tevde bikevin nav vê kategoriya hanê. Lê ji ber ku mebest ji “lêkerên bidaçek” ew cure lêker in ku di wan de cînavkên lihevxiştî yê ji tofa yekem hene, ev jî bi me rast nehat. Ji lew re, her çî qas ev cure cînavkên lihevxiştî hevdudanî bin (ku ji daçek û cînavkekê hatine pê), bi tena serê xwe ne daçek in. Ew hem cînavkên lihevxiştî ne hem jî pêşgir in ku bi rola dariştina lêkeran radibin.

Piştî lêkolîn û nirxandinên li ber roniya xebatên teorîk ên li ser rêzimanê û terîfa cureyên lêkeran a ji aliyê binyatî ve, senifaneke nû ya van cure lêkeran, tevî dayîna lêkerên wan ên nimûneyî, ji hêla me ve hat kirin. Wekî lêkerên xwerû, lêkerên dariştî, lêkerên hevedudanî û lêkerên veqetînbare (ku ev nav aîdî me ye).

Lêkerên xwerû, lêkerên wisan in ku ne bi alîkariya gireyên dariştinê ne jî bi riya hêmanên zimên hatine çêkirin. Eger bi gotineke hîn aşkera bê gotin; ew lêkerên eslî ne ku ji yek bêjeyê pêk hatine û di rewşa rayekê de ne. Wekî van lêkeran: *ajotin, bihîstin, bûn, cûtin, çûn, dirûtin, firotin/firoştin, gestin, hatin, jendin, ketin/keftin, leyîstin/lîstin, malaştin, nivîstin, parastin, qelaştin, rêtin, spartin, şûştin, vêtin, xistin, xwarin, zivartin*.

Lêkerên dariştî: Ev cure lêker ji hêmaneke tenê çênebûne. Ew an ji lêkerekê xwerû yan ji yeka dariştî yan jî ji cureyekê bêjeyê bi alîkariya pêşgir an jî paşgir hatine piraştin.

Di kurmancî de pêşgirên ku ji aliyê me ve hatine peyitandin jî ev in: */ber-/*, */da-/*, */der-/*, */hil-/*, */ra-/*, */ro-*, *rû-/*, */ve-/*, */vê-/* û */wer-/*. Gava pêşgir tê serê lêkerê, pê ve ve dizeliqe û lêkerekê din tê himatê. Wekî van mînakên: *berdan*, *berhilistin*,

berkeftin (berketin), rûdan, rûniştin (roniştin); rokirin (rûkirin), vêketin, vêsandin û vêxistin.

Paşgirên ku heta niha ji aliyê me ve di zaravayê kurmancî de hatine peyitandin, ku bi wan lêkerên tîr duristkirin ev in: /-în/ û /-andin/, /-ijîn/ û /-ijandin/, /-isîn/ û /-isandin/, /-ixîn/ û /-ixandin/, /-iqîn/ û /-iqandin/. Bi paşgirên ewilî lêkerên tîrper û bi yêr dawîn jî yêr tîrper tîr dariştin. Mînak: *bez* > *bezîn* > *bezandin*, *germ* > *germijîn* > *germijandin*, *bel* > *beliqîn* > *beliqandin*, *hel* > *helisîn* > *helisandin* û *germ* > *germixîn* > *germixandin*.

Divê bê gotin ku di kurmancî de hejmara pêşgiran ji ya paşgiran zêdetir e. Hebûna paşgir û pêşgirên lêkersaz, ji bo dariştina lêkeran, derfeteke mezin e. Bi saya wan, gencîneya ferhengî zengîntir dibe û ew gelek bi kêrî dabînkirina pêwîstiyên zimên tîr.

Lêkerên hevedudanî: Bi awayekî giştî ev lêker bi alîkariya ji bêjeyê ji esilê navdêrê yan jî ji daçekê, ji bêjeyê ji esilê navdêrê û ji lêkerê alîkar çêdibin. Li gorî vê pênaseyê, lêkerên wekî “*av dan, baş bûn, gef xwarin, heyf stendin, kon vegirtin, pirs kirin, bêcan bûn, bihiş bûn, dabeş kirin, hilger bûn, nexweş ketin, raçav kirin, ronahî bûn, mitane bûn, dostanî kirin, xembar kirin, deyndar bûn, bi hev ketin, bi lêv kirin, bi rê ketin, di ber dan, ji bîr kirin, li êk dan, li hev hatin, qîç beş kirin, bi par ve kirin, bi pêş ve çûn, ji bîr ve çûn*”ê lêkerên hevedudanî ne.

Lêkerên ku di wan de cînavkên lihevxiştî yêr ji tofa duyem (*jev/jêk, lev/lêk, pev/pêk û tev/têk*) hene jî, ji aliyê me ve ji lêkerên hevedudanî hatin hesibandin. Mîna van lêkeran: *jev çûn, jev kirin, jêk bûn, lev hatin, lêk dan, pev ketin, pev xistin, pêk hatin, tev dan, têk çûn.*

Ji hêla me ve lêkerên ku bi paşgira /-eve/ çêbûne û lêkerên ku îcar lêker li serî, cureyê bêjeyê ji esilê navdêrê piştî wê tîr jî (*kirin cot, bûn heval*), ku di tu gramêran de ji van her du cure lêkeran nehatiye behskirin, li lêkerên hevedudanî hatin zêdekirin. Ji bo /-eve/yê çend mînak: *beşeve bûn, betave bûn, çepeve bûn, dereve kirin, gêjeve bûn, kuşeve bûn, pareve kirin, pûrteve kirin, reşeve hatin, sileve ketin, soreve kirin, şîreve bûn, şirove kirin, xîjeve kirin, zereve kirin, zareve kirin.* Ji bo

lêkerên hevedudanî yên ku lêkera alîkar li serî ye çend nimûne: *bûn cot, bûn sayî, bûn xweşî, çûn ava, çûn hev, dan çeçlebaskan, dan der, dan hev, dan dijûnan/xeberan, kirin cot, kirin tarî...*

Lêkerên veqetînbar: Di bin vî navî de du cure lêker hatin destnîşankirin ku di rêzimanan de bi awayekî serbixwe ji wan nehatiye behskirin. Jixwe li ser yekê jî hîç agahî nîn e. Ev lêker di dema kêşanê de ji hev dibin, yanê hem ji aliyê binyatî ve hem jî ji aliyê kêşanê ve, ji yên din cuda dibin. Lêkerên ku ji cînavkên lihevxiştî yên ji tofa yekem (*jê, lê, pê, tê*) çêbûne, li gorî hinek lêkerên hevedudanî, li gorî hinekan lêkerên biwêjî û li gorî hinekan jî lêkerên bidaçek in, ku li jorê der barê van de agahî hat dan. Ji ber lêkerên bi van cînavkên lihevxiştî hatine çêkirin, di çaxa kêşana deman de ji hev vediqetin, li hêmanên xwe yên eslî vedigerin û bireser dikeve navbera daçek û lêkera alîkar, ku ev taybetiyeke cudaker a ji lêkerên din e, ji aliyê me ve bi navê lêkerên veqetînbar hatin binavkirin.

Çend nimûne ji bo koma yekem a ku bi cînavkên lihevxiştî pêk hatine: *jê çûn, lê dan, pê ketin, tê dan, jê xweş bûn, lê guhdar bûn, pê emel kirin, pê de ketin, pê re gihîştin, tê re kirin, tê de hilhatin, dest pê kirin, serî lê dan, serxweşî tê dan*. Çi lêkerên ku ev cînavkên lihevxiştî di wan de hebûn, ji aliyê me ve wek lêkerên veqetînbar hatin binavkirin, ji ber ku di dema kêşanê de hêmanên wan ji hev dibin û li esilê xwe dadigerin.

Koma duyem a ji lêkerên veqetînbar jî, ew lêker in ku di dema kêşanê de ew jî ji hev dibin. Cudahiya van ji ya pêşî ew e ku di wan de cînavkên lihevxiştî tune ne. Ev lêker ji bêjeyeke ji esilê navdêrê, ji hêmaneke rêzimanî/morfosentaktîk /-a/yê yan jî ji /-î/yê û ji lêkereke alîkar pêk tên, ku di tu rêzimanê li ser zaravayê kurmancî de ji wan nehatiye çêlkin. Mîna van nimûneyan: *behsa...kirin, bera...dan, bêriya...kirin, kêfa...anîn, sonda... xwarin, berî... dan, çêlî...kirin, dirêjî...kirin, êrîştî...kirin, ferî...bûn, hînî...kirin, radeştî...bûn. xwarî...bûn*.

Di zaravayê kurmancî de lêkerên nerêzikî jî hene. Yên ku tenê dema niha, dema bê, raweya fermanî, xwestek, daxwazî û hwd. bi wan tên kêşan û yên ku tenê demên borî bi wan tên kêşan. Ev lêkerên nerêzikî yên ku ku heta niha ji hêla me ve hatine peyitandin, ev in: *bêj'in, bîn'in, her'in, vebêj'in, vebîn'in û wer'in*. Ji van şeş

lêkeran, tenê lêkera “*wer’in*”ê ji yên din hinekî cuda ye. Bi yên din dema niha, dema bê û wekî raweya fermanî, xwestek hwd. tên kêşan, lê bi “*werin*”ê tenê dema niha nayê kêşandin. Lêkerên nerêzikî yên ji bo demên borî jî *anîn, danîn (da+anîn), deranîn, hılanîn, veanîn, weranîn, dîtin, vedîtin, gotin, vegotin, hiştin, vehiştin, miştin û vemiştin* in. Ev çardeh lêker tev li gorî demên borî wekî ku rêzikî bin, tên çevandin, lê kêşana wan a wekî dema niha û ya raweyan, wekî raweya fermanî, xwestek û daxwaziyê nîn e

Mijara rastnivîsana lêkeran jî mijareke din a vê xebatê ye ku hema bibêjê bi tevahî bi binyata lêkeran ve eleqedar e. Lê çî heye hem di zimanê nivîskî de hem jî di rêziman û keresteyên li ser zimên de ev kêşe bi her awayî xwe bi xwîner û eleqedarên zimên dide hisandin. Di van hemû rêzimanan de jî ev rewş hat destnîşankirin. Bi ya me heta binyata lêkeran neyê zanîn, an jî ji aliyê morfolojîk ve cureyên bêjeyan neyên naskirin, biryardana li ser awayê rastnivîsîna lêkeran jî pir zehmet dixuye. Ji ber sedema ku rastnivîsîna zaravayê kurmancî ya bi alfabeya latînî xwe dispêre rêzikên rêzimanê, ku hîmdarê kurdiya nûjen Celadet Bedirxan wiha amaje pê kiriye “qeydeyên vekîtê ji tevayîya gramêrê dertên”²⁵³ û xwedî vekîteke kûr e, divê ji aliyê binyatî ve lêker bîn destnîşankirin û wisan li gorî rêzikên wan biryara rastnivîsîna wan bê dayîn. Ji bo rastnivîsînê jî rêzika giştî ew e ku her bêje bi serê xwe tê nivîsandin. Cureyên bêjeyê çî dibe bila bibe; te divê dariştî be te divê hevedudanî be. Lê belê, nemaze rastnivîsîna lêkerên hevedudanî û yên veqetînbar xwedî qaydeyên din in. Ew, wek lêker ji hev cihê, lê wek navdêr bi hev ve ne. Jixwe eger bêjeyek dariştî be yan jî hevedudanî be, rêsa ew e ku pêkhênerên wê pêkve bîn nivîsandin.

Li gorî vî qaydeyê hanê, gava li ser rêzimanên kurmancî lêhûrbûnek tê kirin, tê dîtin nêrîna amadekarên van berhemana a der barê rastnivîsîna lêkeran de jî (hem bi awayê raderî hem jî bi awayê navdêrî) ne wekî hev. Di vê xebatê de bal li vê rewşê jî hat kêşandin. Ji bo çareseriyê vê rewşê, bi ya me divê riayet li rêzika giştî bê kirin ku ew jî ev e: Lêker gava wek navdêr bin divê pevve û gava wek rader bin jî, divê hêmanên wan ên ji esilê navdêrê jev cuda bîn nivîsandin. Wekî *av dan (avdan), gef xwarin (gef xwarin), pirs kirin (pirskirin), bêcan bûn (bêcanbûn), nexweş ketin*

²⁵³ Celadet Alî Bedirxan, **Bingehên Gramêra Kurmancî**, Avesta, Stenbol 2010, r. 26.

(*nexweşketin*), *bi hev ketin* (*bihevketin*), *ji bîr kirin* (*jibîrkirin*), *li êk dan* (*liêkdan/lêkdan*) û *bi pêş ve çûn* (*bipêşveçûn*)ê. Yên pêşî di rewşa raderî û yên di nav kevanekê de jî di rewşa navdêrî de ne.

Gelşeke din jî awayê rastnivîsîna lêkerên xwerû û yên dariştî ya rewşa wan a raderî û navdêrî ye. Ji bo nimûne, lêkerên ku ji bo rewşa raderî bi awayê “*beziyan, bûyîn, çêjiyan, çêran, çûyîn, dayîn, êşiyân, firiyân, geriyân, jiyân, mayîn, payîn, pijan, reviyân, rijan, teqiyân, weşan, weşiyân û zayîn*”ê tên dayîn. Bi ya me, dayîna lêkeran bi vî awayî ya ji bo rewşa raderî, ji ber tesîra devokî ya danerên/amadekarên berhemana e. Di kurdî de dem li ser du rayekan tên kêşan. Wekî *dan* >*da* >*d*; rayekên vê lêkerê ya dema niha *d* (di+d+im) û ya borî jî *da* (di+da; dê bi+da+ya) ye. Wekî dixuye, demên borî li ser awayê “*dayî*”yê (*dayîn* >*dayî* >*da*) nayê kêşan ku ev lêker jixwe lêkereke têper e. Li gorî rêzika giştî, rêsa ew e ku dem li ser awayê lêkeran ên li jorê, nayên kêşan. Bi taybetî, lêkerên teneper ên du kîteyî, li gorî devokan, demên wan ên borî ji hev cuda tên kêşan. Mîna “*ez gerîm/geriyam*”, “*ew tirsîbû/tirsiyabû*”, “*em bezîn/beziyan*”û “*ew bezîne/beziyane*”. Ji lew re awayê wan ê raderî divê wiha be: *bezîn, bûn, çêstin, çêrîn, çûn, dan, êşîn, firîn, gerîn, jîn, man, pan/pandin, pijîn, revîn, rêtin/rijîn, teqîn, weşîn û zan*.

Mijareke din jî awayê kêşayî ya lêkerên dariştî yên bi pêşgiran e ku kesin hene birijd dibêjin divê /-bi-/ya fermanî di wan de bê bikaranîn. Mîna “*ez dê bar hilbigirim*”. Lê eger bi awayekî giştî were gotin, di zimanê devkî yê kurmancî de jixwe /bi-/ya fermanî di lêkerên dariştî de yên ku bi pêşgiran çêbûne, bi vî awayî nayê bikaranîn. Tenê li Dihok û devokên derdora wê /bi-/ya fermanî li pêşiya pêşgira lêkersaz tê bikaranîn; wekî “*ewî bivexwîne*” ango “*wî vexwîne*.” Loma bi ya me nabe ku di zimanê nivîskî de /bi-/ya fermanî di van cure lêkeran de bê bikaranîn.

Li aliyê din, ne tenê mijara bikaranîna /bi-/yê, her wisan di hin devokan de (mîna ya Herêma Torê) wekî gireya dema niha /di-/ û neyîniya vê demê /na-/ jî tên pêşiya pêşgira lêkera dariştî (*divexwe, navexwe*). Çendî bi pêşgirê wateya lêkerê bê guhartin jî, ji ber ku ya hîmî lêkera xwerû ye, ya kar dike ew e. Jixwe ji bilî kêşana van lêkerên ku dabaş li ser wan e, hemû devokên kurmancî, cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve wekî hev dikêşin. Ev jî dide nîşan ku ya esil lêkera xwerû ye. Ji lew

re divê gireyên deman, tevî gireyên neyîniyê piştî pêşgirê bên; wekî (*vedixwe*, *venaxwe*).

Di vê xebatê de nemaze der barê van mijarê amajepêkirî de li gorî rêzikên ji binyata zimên hewla danîna çarçoveyekê hat kirin û ji bo çareserkirina hin mijarên eleqedarî rastnivîsîna lêkeran ên bi awayê raderî, navdêrî û awayê kêşayî ya lêkerên bi pêşgiran jî rêzikên peyitandî hatin pêşkêşkirin.

Wek gotina dawî: Di rêzimanan de dibe ku nêrînên zimannas û amadekarên rêzimana kurmancî di mijarên spesîfîk de ne wekî hev bin, lê di mijarên giştî de divê ku ew lihevkirî bin. Ji ber ku rêziman berhemeke rêber û rênîşander e, hewce ye agahî û zanyariyên rast li xwe bigire, ji kêşe û aloziyan jî dûr be. Rêzik û qanûnên zimên, awayê xebitîna/şixulîna zimên tên vedîtin û tesbîtkirin, ne ku tên danîn. Ji lew re jî nabe ku her rêzimanek tiştên ji hev gelek cihê bibêje. Rêzimana zimanekî, tevahiya rêzikên giştî ya zimanekî ye. Ji ber sirûştê xwe rêziman rêzikparêz û xwedî norman e. Ew ji bo axaftin, nivîsîn û têgihîştineke rast a zimanekî, tişteki pêwîst e. Loma rêziman ji bo zimanê standard rênîşander e ku ji lew re zimanê nivîskî yê standard ê neteweyekê jî bi awayekî gelemper xwe dispêre rêzikên peyitandî yên gramera zimanê xwe.

ÇAVKANÎ

AKDAG, Zekî, **Çîrokên Gelêrî yên Kurdan (Herêma Semsûr û Ruhayê)**, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2016.

AKSAN, D. (oğan), “Sözcük Türleri”, di Neşe Atabay, Sevgi Özel & İbrahim Kutluk **Sözcük Türleri** de, 2. baskı, Papatya Yayıncılık, İstanbul 2003.

AKSAN, Doğan, **Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim**, 4. baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2007.

ALTUĞ, Halil, **Gramera Kurdî (Kürtçe Gramer)**, Avesta, İstanbul 2013.

ATABAY, Neşe, Sevgi ÖZEL & İbrahim KUTLUK, **Sözcük Türleri**, 2. baskı, Papatya Yayıncılık, İstanbul 2003.

AYDOĞAN, Mistefa, **Rêbera Rastnivîsînê**, Weşanxaneya Rûpelê, İstanbul 2012.

BADILLI, Kemal, **Türtçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)**, Med Yayınları, İstanbul 1992.

BALİ, A. **Kürtçe Dilbilgisi Türkçe Açıklamalı Rêzimana Kurdi**, Alan Yayıncılık, İstanbul 1992.

BARAN, Bahoz, **Rêzimana Kurmancî**, Belkî, İstanbul 2012.

BARNAS, Rojan, “Lêkerên Hevedudanî”, **Kurmancî**, h. 5, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs 1989.

BARNAS, Rojan, “Ferhengoka Pehlewî û Kurmancî”, **Kurmancî**, h. 14-15, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs 1994.

BAYRAV, Süheylâ, **Filolojinin Oluşumu**, Multilingual, İstanbul 1998.

BAYRAV, Süheylâ, **Yapısal Dilbilimi**, Multilingual, İstanbul 1998.

BEDİR HAN, Celadet Ali & Roger LESCOT, **Kürtçe Gramer**, (Wergera ji fransî; li jêr çavdêriya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê), Avesta, İstanbul 2004.

BEDİRXAN, Celadet Alî, **Bingehên Gramêra Kurdmancî**, Avesta, İstanbul 2010.

BEDİR XAN, Emîr Celadet & Roger LESCOT, **Kürtçe Dilbilgisi**, 3. baskı, Doz, İstanbul 1997.

BEDİR-XAN, Kamuran Ali, **Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri**, Weşanên Deng, İstanbul 1991.

BÊKES, Kamiran, **Bingehên rêzimana kurdî/zaravê kurmanciya bakur**, Weşanxane?, Osnabrück 2004.

BÎLÎZ, Mahpus, “Kêço” **Folkloru Kurdan**, h. 3, Weşana Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, İstanbul 2015.

BÎNGOL, Abdulkadir, **Kulîkên Baxê Botan**, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul 2008.

BORAK, Mustafa, “Goştê ciwanan dixwî tu dizanî, goştê pîran dixwî tu dizanî, na dilê te dişewite, tirşikê jî dixwî tu dizanî”, **Folkloru Kurdan**, h. 1, Weşana Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, İstanbul 2015.

CELÎL, Ordîxanê & Celîlê CELÎL, **Zargotina Kurda I**, çapa 3., Aram Yayınevi, İstanbul 2013.

CELÎL, Ordîxanê & Celîlê CELÎL, **Zargotina Kurda II**, çapa 3., Aram Yayınevi, İstanbul 2013.

CINDÎ, Heciyê & Emînê EVDAL, **Folkloru Kurmanca**, Ji kirîlî bo latînî: Tosinê Reşîd, Avesta, İstanbul 2008.

CIWAN, Mûrad, **Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanc Lehçesi)**, Weşanên Jîna Nû, Balinge 1992.

DE SAUSSURE, Ferdinand, “Genel Dilbilim Dersleri”, di Mehmet Rifat (Berhevkar) **XX. Yüzyılda Dilbilim ve Göstergibilim Kuramları 2. Temel Metinler** de, Mehmet RİFAT-Sema RİFAT (Çev.), Yapı Kredi Yayınları, İstanbul 1998.

DÎZMAN, Ridwan, “Bûk, bûka Êzerlîkê”, **Folkloru Kurdan**, h. 1, Weşana Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, İstanbul 2015.

FARQÎNÎ, Zana, **Ferhenga Kurdî- Tirkî**, Çapa yekem, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2004.

FARQÎNÎ, Zana, “Tewang û Rayeka Lêkeran”, **Zend** (Havîn 2005), Weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul.

FARQÎNÎ, Zana, “Bidestxistina rayeka lêkeran”, **Zend** (zivistan 2006), Weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul.

FARQÎNÎ, Zana, “Erk û Fonksiyonên Qertafên Lêkerçêker”, **Zend**, h. 6, s. 3, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 1999.

FARQÎNÎ, Zana, “Lêkerên nerêzikî”, **Zend** (Bihar 2007), Weşana Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul.

FERHO, Medenî, **Xaltîka Zeyno I**, Weşanên Dozê, İstanbul 1997.

FISHER, Steven Roger, **Dilin Tarihi**, 3. basım, Muhtesim GÜVENÇ (Çev.), Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul 2015.

GAZÎ, Mustafa, **Ferheng Kurdî-Tirkî**, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul 2006.

GÜNDÜZ, Deniz, **Türkçe Açıklamalı Kürtçe Kirmanca/Zazaca Dil Dersleri**, Vate Yayınevi, İstanbul 2006.

Grûba Xebate ya Vateyî, **Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî**, Weşanxaneyî Vateyî, İstanbul 2016.

Grûba Xebate ya Vateyî (amd), **Rastnuştîşê Kirmanckî (Zazakî)**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2005.

HACIEMİNOĞLU, Necmettin, **Türk Dilinde Yapı Bakımından Fiiller**, Bilge Kültür Sanat, İstanbul 2016.

HACO, Heznî, **Tê Bîra Min**, Avesta, İstanbul 2007.

HASSANPOUR, Amir, **Kürdistan’da Milliyetçilik ve Dil (1918-1985)**, İbrahim Bingöl & Cemil Gündoğan (İngilizceden çevirenler), Avesta, İstanbul 1997.

HENGİRMEN, Mehmet, **Türk Dilbilgisi**, 8. baskı, Engin Yayın Evi, Ankara 2005.

HUBER, Emel, **Dilbilime Giriş**, Multilingual, İstanbul 2008.

ÎBO, Sehîdê, **Kurdê Rêwî**, Ji kirîlî bo latînî: Xanna Omerxalî, Avesta, İstanbul 2009.

İMER, Kâmile, Ahmet KOCAMAN, A. Sumru ÖZSOY, **Dilbilim Sözlüğü**, Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi, “Yapı”, İstanbul 2011.

KANAR, Mehmet, **Büyük Sözlük Türkçe Farsça**, Birikim Yayınları, İstanbul 2008.

KARAAĞAÇ, Günay, **Dil Bilimi Terimleri Sözlüğü**, Türk Dil Kurumu Yayınları, “Yapı”, Ankara 2013.

KIRAN, Zeynel & Ayşe (Eziler) KIRAN, **Dilbilime Giriş**, 3. baskı, Seçkin Yayıncılık, Ankara 2010.

KOCADAG, Çeko, **Ferheng Kirmanckî (zazakî) - Kurmancî Kurmancî - Kirmanckî (zazakî)**, Weşanên Komkar, Berlîn 2010.

Koma Xebatên Kurdolojiyê (amd.), **Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913**, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2013.

KORKMAZ, Zeynep, **Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)**, 3. baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2009.

KURDO, Qanatê, **Gramera Zmanê Kurdi (kurmanci-sorani)**, Koral Yayınları, İstanbul 1991.

MALMÎSANIJ, M. (amd.), **Ji bo rastnivîsînê Ferhenga Kurdî (Kurmancî) - Tirkî**, Weşanxaneyê Rûpelê, İstanbul 1012.

NADIRÎ, Wezîrê, **Nûbar**, Ji tîpên kirîlî: Mehmed Emîn Hêvîdar, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2016.

ÖPENGİN, Ergin, “Pirsên Rênivîsa Kurmancî: Pêdaçûneke Rexneyî li ser Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydoğan”, **Derwaze** (Kovara Kurdî ya zanistên Cîvakî û Mirovî), h. 1, İstanbul 2017.

ÖZDEN, Ragıp, **Dil Türeyîşi Teorilerine Toplu Bir bakış**, Ankara 1944.

SAĞNIÇ, Feqi Huseyn, **Hêmana Rêzîmanê Kurdi**, Melsa Yayınları, İstanbul 1991.

ŞEMO, Ereb, **Dimdim**, Weşanên Lîsê, İstanbul 2007.

ŞUCAÎ; Bêhrûz, “Ferhenga Avestayî-Kurdî”, **Kurmancî**, h. 36, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs 2005.

TAN, Samî, **Rêzîman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî**, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2005.

TAN, Samî, **Rêzîmana Kurmancî**, Çapa nûkirî ya 3., Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2015.

TOPTAŞ, Hüseyin, **Türkçe Dersler 1. Kitap**, Papatya Yayıncılık Eğitim, İstanbul 2016.

Torî, **Mendik**, Weşanên Berfîn, İstanbul 2002.

Türkçe Sözlük, Türk Dil Kurumu Yayınları, 11. baskı, Ankara 2011.

UYGUR, Nermi, **Kültür Kuramı**, Yapı Kredi Yayınları, İstanbul 1996.

VURAL, Hanifi & Tuncay BÖLER, **Ses ve Şekil Bilgisi**, Kesit Yayınları, İstanbul 2014.

YERGÜZ, İsmail, “İkinci Baskıya Önsöz”, di Süheylâ Bayrav **Yapısal Dilbilimi** de, Multilingual, İstanbul 1998.

YILDIRIM, Kadri, **Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilgisi (Kurmancî Lehçesi)**, 2. baskı, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul 2012.

YILDIRIM, Kadri (amd), **Fêrkerî Soranî**, Şemal Medya, İstanbul 2014.

YILDIRIM, Nimet, **Farsça Dilbilgisi**, Genişletilmiş dördüncü baskı, Fenomen Yayınları, Ankara 2009.

ZÎLAN, Reşo, “Çend Pirsên Rastnivîsînê”, **Kurmancî**, h. 19, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs 1996.





T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

KUZEY KURMANCÇA
GRAMER KİTAPLARINDA
YAPI BAKIMINDAN FİLLER VE İMLALARI

Mehmet Gemsiz

14711025

Danışman

Dr. Öğr. Üyesi Mustafa Aslan

Mardin 2018